JOHN BEVERE

NIVÎSKARÊ KU PIRTÛKA WÎ HERÎ PIR TÊ FIROTIN

# TIRSA XWEDA

TİRSA XWEDA YA Bİ TENDURİSTÎ,
Dİ JİYANA WE DE VEGUHERÎNEKE
BÊHEMPA DİAFİRÎNE.

Dostê min î delal,

Mirov dikare Tirsa Xweda, weke hîseke rêzdar û bi rûmetê re tevlihev ku bi xof an jî matmayînê dagirtî ye, pênase bike. Divê her bawermend li tirsa Xweda ya bi tenduristî, rêzdar û pîroz bigere, ji ber ku her yek ji van ji bo her soza Xweda di asta bingehê de ye.

Pejirandina vê tirsê; ji bo avakirina zanabûn, nêzîkahiya bi Xweda re, mayîndebûna di xizmetê de, rûmet, ewlehî û mîraseke mayînde, fêdeyên wê yên bêhempa hene. Nivîsên Pîroz bi awayekî pir zelal û eşkere diyar dikin ku Xweda nêzî kesên ku jê re îteatê dikin û bi rastî Wî dişopînin, dibe. Îsa, di ser her tiştî re qedir û qiymetê dide vê dilpakiyê û ji ber vê eger em heman tiştî bikin wê ev bibe zanabûnek.

Bi hêviya ku hûn jiyaneke monoton û jirêzê ya oldariyê li paş xwe bihêlin û ji bo hûn gavê bavêjin nava têkiliyeke azad ku nêzî Xweda ye, ku heta temenê we hebe berdewam bike, bi wate be, berhemdar be û ji hemû tirs û endîşeyên dûr be, ez we teşwîq dikim.

Birayê we yê bi Mesîh re ye,

John
JohnBevere@ymail.com



MessengerX

Messenger INTERNATIONAL

# TIRSA XWEDA

## TİRSA XWEDA YA Bİ TENDURİSTÎ, Dİ JİYANA WE DE VEGUHERÎNEKE BÊHEMPA DİAFİRÎNE.

JOHN BEVERE

**Awe of God,** Kurdish Latin, by John P. Bevere
© 2026 Messenger International
MessengerInternational.org
Originally published in English as Awe of God
ISBN 978-1-400-33670-8
Author photo © Meshalli Mitchell

Additional resources in Kurdish Latin by John and Lisa Bevere
are available for free download and video streaming at
**MessengerX.com** and on the **MessengerX** App
To contact the Author: JohnBevere@ymail.com
This international leadership seeding edition of the Awe of God book
has been produced in collaboration between Thomas Nelson and
Messenger International.

This book is a gift from Messenger International and is
NOT FOR SALE

**Tirsa Xweda,** Nivîskar John Bevere, Kurdî Latînî
© 2026 Messenger International
MessengerInternational.org
Navê wê yê Îngîlîzî yê resen Awe of God
ISBN 978-1-400-33670-8
Fotografê nivîskar © Meshalli Mitchell

Hûn dikarin xebatên din yên John û Lisa Bevere yên ku bi Kurdî Latînî çapbûne ji malpera
**MessengerX.com** û sepana **MessengerX**'ê belaş daxînin û online temaşe bikin.
Ji bo têkiliya bi nivîskar re: JohnBevere@ymail.com
Ev çapa rêbertiyê ya navneteweyî ya Tirsa Xweda, bi hevkariya Thomas Nelson û
Messenger International'ê hatiye amadekirin.

Ev pirtûk xelateke xizmeta Messengera Navneteweyî ye û NAYÊ FIROTIN!

App Store, marqeyeke tîcarî ya şîrketa Apple Inc.ê ye ku li Amerîka û welatên din qeydkiriye.
Google Play û Google Play logo jî marqeyên tîcarî yên şîrketa Google LLC'yê ne.

*Xanima min ya delal, hevala min ya herî baş,*
*evîndara min î hêja, Lisa Bevere.*

*"Jina ji Xudan ditirse hêjayî pesnê ye."*
*(Şîretên Silêman 31:30)*

*Min ev pirtûk di çil saliya zewaca me de nivîsand. Her sala ku bi te re derbas dibe xweştir dibe û eger şensê min hebûya, bêtirs ez ê dîsa bi te re bizewiciyama. Tu peyv, hez û coşa te di dilê min de avakiriye nikare bîne ziman. Eger ne ji hezkirin û piştgiriya te bûya, ez ê îro ne ev zilam bûma. Tu bi hikmet î, tu kêfxweşî yî, tu dilovan î, tu hêzdar î, tu maceraperest î û tu bêhempa yî. Ez pir û pir ji te hez dikim.*

# NAVEROK


*HÛN Ê DI VÊ PIRTÛKÊ DE ÇAWA TEVBIGERIN* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . IX

*DESTPÊK*. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . XIII

**HEFTEYA PÊŞÎ: XWEDAYÊ KU TIRSÊ ŞIYAR DIKE**

1. XEZÎNEYA XWEDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 3

2. TIRSÊN NAKOK . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 9

3. TIRSA PÎROZ ÇI YE? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 15

4. HEBÛNA XWEDA YA ŞÊNBER . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 21

5. ÊVAREKE NAYÊ JIBÎRKIRIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 27

6. NÊRÎNA LI XWEDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 33

7. MEZINAHIYA (RÛMET) XWEDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 39

**HEFTEYA DUDUYAN: MIROV ÇI BE DIVÊ WEKE XWE BE**

8. NIRXÊ WE . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 47

9. LIHEVKETINA KUJER . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 53

10. GELO XWEDA JI BÎR KIR? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 59

11. TIRS Û RÊZGIRTIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 65

12. DURÛTIYA BELAVKER (VEGIRTÎ) . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 71

13. SISÊ ÎMAJ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 77

14. BIRYARÊN EBEDÎ. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 83

## HEFTEYA SISÊYAN: PÎROZIYA KU MIROV NIKARE XWE LI BER BIGIRE

15. TIRSA MIROVAN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .91
16. ŞAŞITIYA ÎMTIYAZÊ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .97
17. JI XERABIYÊ DÛR BIKEVIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .103
18. MAYÎNDEBÛN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .109
19. XWE PAK Û PAQIJ BIKIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .115
20. HEWLDANA ME. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .121
21. AREZÛ Û HÊZ. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .127

## HEFTEYA ÇARAN: BERSIVA ME YA JI BO GOTINA XWEDA

22. LERIZANDINA JI BER GOTINA XWEDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .135
23. YA PÊŞÎ (BERÎ HER TIŞTÎ). . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .143
24. QET NAKEVE SERÊ MIROV . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .149
25. LI GORÎ TÊ XUYAKIRIN TU FÊDEYA WÊ TUNE . . . . . . . . . . . . . . . . .155
26. ÊŞEKE RAST . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .163
27. HAT TEMAMKIRIN. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .169
28. WÎJDAN ÇAWA DISOJE? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .175

## HEFTEYA PÊNCAN: NÊZÎKAHIYA LI XWEDA

29. NÊZÎKAHÎ LI KUDERÊ DEST PÊ DIKE? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .183
30. ÎSAYEKÎ CUDA . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .189
31. MIN HÛN NAS NEKIRIN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .195
32. RAZA REB. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .201
33. NAVEROKA BÛYERÊ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .207
34. RÛBIRÛ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .213
35. HÛN DOSTÊN MIN IN . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . .221

## HEFTEYA ŞEŞAN: FÊDEYÊN XEZÎNEYÊ


36. BICÎHANÎNA SOZÊN WÎ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 229

37. TIRSA KU HEMÛ TIRSAN TUNE DIKE. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 235

38 MÎRAS . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 241

39. TIŞTA HERÎ GIRÎNG . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 247

40. JIYANA SERFIRAZ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 255

41. XELASKIRINA BI SERFIRAZÎ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 261

42. DÎTINA XEZÎNEYÊ . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 267

*PÊVEK: NÊRÎNEK LI MEZINAHIYA XWEDA* . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 277

# HÛN Ê DI VÊ PIRTÛKÊ DE ÇAWA TEVBIGERIN

Xwendevanên Hêja,

Ev ne tenê peyameke ji rêzê ye, eger hûn jê bawer bikin, wê di jiyana we de bibe peyameke ku heta hetayê we biguherîne. Ez baweriya xwe pê tînim ji ber ku van rastiyan hem jiyana min û hem jî jiyana gelek kesên din guhertiye. Kengî gava hinek ji min dixwazin ku ez şîretan li wan bikim -çi li ser zewac, malbat an jî xizmetê be- tişta ku di cîh de serî lê dixim naveroka vê pirtûkê ye.

Ji ber girîngiya wê, gelek dem û dua li ser çawaniya pêşkêşkirina vê peyamê hatiye xerckirin. Gava ku em tempoya bilez, çûn û hatinên jiyana me ya rojane û bernameyên me yên her dem mijûl, di ber çavan re digirin, min xwe mecbûr hîs kir ku van rastiyan parçe bikim û wan di perçeyên biçûk de pêşkêş bikim ji bo ku hûn bikaribin li ser wan bifikirin.

Gava ku hûn cara pêşî lê dinêrin dibe ku hûn weke xebateke rojena lê bifikirin lêbelê ez dikarim dilê we têxim cîh ku ne wisa ye. Ez diyar bikim. Xebatên rojane bi piranî ji bo her roj ne xwedî peymaneke kin, xwerû û pergalî ne ku venaguherin mijarên cuda.

Ev pirtûk weke xebateke rojane bê dîtin jî, di esasê xwe de her roj li ser mijara roja berê tê avakirin û şêwaza pirtûkeke normal distîne. Avantaja vê yekê divê hûn birayarê bidin bê hûn ê çawa wê bixwînin. Eger tercîha we ev be, teqez di rojekê de an jî di du rojan de dikare bê xwendin lêbelê ez ji dil û can pêşniyar dikim ku hûn an di şeş hefteyan de (rojê beşekê) an jî di sê hefteyan de (sibehê beşekê û êvarî beşekê) roj berî rojekê bixwînin.

Di dawiya her beşê de, hûn ê pênc amûran bibînin ji bo hûn bereketên ku we ji naveroka beşê distînin kûrtir bikin -em ê navê "TAKEKESÎKIRIN" lê bikin û ev ew ji van beşan pêk tê:

1. Pasaj: Ez ê beşek ji Nivîsên Pîroz lê zêde bikim ku ji bo peyama rojê girîng e, di metnê de nayê dîtin an jî di beşa sereke de nayê pêşkêşkirin, lê tiştê ku tê pêşkêşkirin xurt dike. Ez we pêşniyar dikim ku van pasajan jiber bikin.
2. Fikra sereke: Fikreke navendî ye ku girîngiya peyama beşê destnîşan dike. Ji nû ve seredana wê, wê bandora wê xurt bike û gava hûn vegerin û beşê binirxînin wê referanseke bilez bide we.
3. Fikra kûr: Ev di girîngiyeke krîtîk de ye. Nivîskarê Zebûrê wisa dinivîsîne: "Ez li ser şert û mercên te kûr kûr difikirim, dema ku ez li rêyên te dinêrim" (Zebûr 119:15). Em kûr difikirin û di hişê xwe de li hev vedigerînin bê ka Gotina Xweda çawa li rewşa me ya niha tê barkirin. Dema ku em vê yekê dikin, ji me re tê gotin ku rêyên me wê pîroz bibin û em ê serfiraz bibin (binêrin: Yêşû 1:8, Zebûr 1, û 1 Tîmotêyos 4:15).
4. Dua: Ji bilî van wê duayeke ku doktrîna beşê bide xuyakirin jî hebe. Pir girîng e ku Xweda dengê me bibihîze û em jê bipirsin ku me li gorî Gotina Xwe biguherîne.
5. Daxuyanî: Em dixwînin ku gotinên me dikarin me ber bi mirin û jiyanê ve jî bibin (Şîretên Silêman 18:21). Bi vegotina tiştên ku Wî li ser me diyar kirin; giyanê me, canê me û laşê me bi îradeya Wî ya ji bo me re hevaheng dibe û ev daxwaz rêya îspatkirî ye ji bo ceribandina jiyaneke xweş û mezin.

Careke din, ez ji we daxwaz dikim ku hûn wextê xwe li ser vê pirtûkê derbas bikin ji bo ku rastiyên di Gotina Xweda de derbasî dil û hişê we bibin. Her roj derbaskirina hefteyên pêş ku li ser van rastiyan hûr bibin wê ji wan re bibe alîkar ku kûrtir pêde lê herin û wê di jiyana we de cîh bigire. Ev ji zanîna hişk wêdetir e, ev ew rê ye ku em nêzîkî Xwedayê xwe bibin. Di heman demê de ez pêşniyar dikim ku hûn beşan bixwînin û bila li cem we lênûskek hebe ji bo notan ku hûn karibin xalên “TAKEKESÎKIRINê” di ber çavan re derbas bikin. Her roj raman û duayên xwe di lênûska xwe de binivîsin ji bo ku hûn bikarin serî li tiştê ku Giyanê Pîroz di hişê we de eşkere kiriye, bixin û careke din li wan vegerin.

Çend pêşniyarên din: Berî her tiştî, gava ku we di telefona xwe de an jî bi saeta xwe beşek xwend û gava hûn di ser “TAKEKESÎKIRINê” re derbas bûn û gava we not stendin, bala xwe bidinê bê çiqas wext digire. Nelezînin, ev ne pêşbirkek e. Sedema bê çiqas wext digire ew e ku piştî çend beşan hûn dikarin bi aqilmendî ji bo beşên pêş li ser bingeha dema xwe ya navîn planê bikin.

Ya duyemîn, hewl bidin ku ji we re bibe tebîetek û nehêlin ku tiştekî din, dema ku hûn her roj destnîşan dikin asteng bike. Dua û hêviya min ew e, tişta ku Xweda di van çil salên dawî de bi min re çêkiriye, gava hûn di ser vê pirtûkê re çûn, ji bo we jî bike.

Ya sêyem, peyamek her gav bereketa herî mezin peyda dike an dema ku ez wê bi hinekan didim hînkirin an jî dema ku ez bi komek hevalên xwe re dixwînim. Hin hevalên nêzîk ji xwe re hilbijêrin û bi wan re bixebitin. Piştî ku we beş bi tena serê xwe, tenê bi Giyanê Pîroz re, temam kir; bi hevalên xwe re werin cem hev ji bo ku tiştê ku Wî nîşanî we daye hûn bi hevalên xwe re parve bikin. Vê yekê bi rêkûpêk bikin.

Ez ji we re duayan dikim gava ku hûn di nav Tirsa Xweda de derbas dibin ji bo ku hûn hîn bêtir nêzîkî Xweda bibin. Li şûna ku hûn derbasî beşa yekem bibin, girîng e ku hûn beşa destpêkê bixwînin ji ber ku ev beş dilê me li mijara ku em ê nîqaş bikin vedike. Û gava ku hûn

pirtûkê biqedînin, ez dixwazim ji we bibihîzim bê ka bawerî û jiyana we çawa ji tirsa Xweda ya pîroz bandor lê bûye.

Silav û rêz.

JOHN BEVERE

Not: Ji bo ku hûn xwe di ser beşa destpêkê re neqevizînin, tenê tiştekî bînim bîra we. Ez duayan dikim ku çirûskek pêkeve, ji bo ku hûn serserkî xwe bavêjin nava wê û tirseke pîroz di nava we de zîl bide.

# DESTPÊK

Tirs. Mirovan bi salan hewl dan ku wê ji holê rakin. Gelek kesan ji wan li ser wê lêkolîn kirin, pê re şer kirin û ji bo ku bandora wê ji jiyana me pak bikin, seferberî li dar xistin. Gotina navdar a Serok Franklin D. Roosevelt balê dikişîne ser vê yekê: “Tişta ku divê em jê bitirsin tirs bixwe ye.” Dengên ku ji hemû platforman tên, diqîrin ku divê em têkbirina tirsê bibînin ku em karibin ji bin derkevin û em dikarin bi sedan pirtûkên pêşkeftina kesane bibînin ku ji bo vê yekê hatine nivîsandin. Ji dawiya salên 1980’yî û vir ve, mirovan li her deverê tîşortên ku li ser wan “Tirs Tuneye” hatiye nivîsandin, li xwe kirin. Em di lêgerîna xwe de bi biryar xuya dikin ku em hemû tirsên di jiyana xwe de ji holê rakin.

Ev seferberî bi mantiq, hêja û hişmend xuya dike û her çiqasî li ser gelek aliyan wisa be jî, rastî ev e ku hemû tirs ne xerab in. Baş e îcar çima em evqasî pê ve diawiqin? Ez bawer dikim ku ev ji komkirina hemû tirsan pêk tê ku di nava kategoriyeke mezin de û di bin etîketa “zerardar” de derdikeve holê. Lêbelê gelo ev texmîn rast e?

Berî her tiştî, her çiqasî ew bi mantiq xuya bikin jî girîng e ku em bizanibin ku ew bi rastî tirsên wêranker in. Eger em ji windakirina hemû pere û dewlemendiya xwe bitirsin, em ê bi îhtîmaleke mezin bi wan ve bên girêdan û em ê bibin kesên xesîs û komker ku xwe ji her tiştî zêdetir bi milkên madî ve girêdidin. Eger em ji windakirina hevjîna/ê

xwe bitirsin, em ê bi tundî xwe bi wê/î ve girêbidin an jî em ê ji her tevgera wê/î guman bikin. Her du rewş jî dibin sedema nerazîbûn û dilşkestinê û di dawiya dawî de zerarê didin têkiliyê. Eger tirsek kûr a windakirina tiştekî me hebe, ev dikare me ber bi lêgerîna heyecan û ezmûnên nû ve bibe û ev lêgerîn wê xweşbûna ku bi civaka saxlem, têkiliyên rastîn û pabendbûnê re tê, ji me re bibe sedema xweşiyê. Eger em ji ewlehiya zarokên xwe bitirsin, em ê bi teşwîqkirina tevgerên bêserûber wan bêzar bikin an jî mezinbûna wan asteng bikin. Weke ku dawiya lîsteya me nayê.

Ji aliyekî din ve, tirsên avakar hikmetên bi kêrhatî didin me. Tirsa ketina ji sê sed metreyî ya ji zinarekî, hikmeta dûrketina ji bo em ji qiraxê wî zinarî dûr bikevin, dide me. Tirsa ji hirça gewr, hikmeta ku em çêlîkên wê tehdît nekin dide me. Tirsa ji şewitandina pileya sêyemîn, dema ku em tepsiyeke firinê ji firineke pir germ derdixin hikmeta li xwekirina lepikên parastinê dide me.

Lêbelê dîsa jî tirsa avakar, her çiqasî sûdmend be jî, dikare di heman demê de jiyana me teng û asteng bike. Eger bê kontrol bê hiştin, tirsa ketinê dikare me ji siwarbûna balafirê asteng bike û me li erdê bihêle. Tirsa bêserûber a hirça gewr dikare me ji meşeke xweş ya di nav daristanê de mehrûm bike û tirsa şewitandinê dikare me ji kêfa xwarineke pijandî asteng bike.

Pirsa rastîn a ku divê em bipirsin ev e: Em herî pir ji çi ditirsin? Ev lêpirsîneke pir çêtir e ji balkişandina ser bê ka mirov çawa tirsên wêranker ji holê radike an jî yên avakar birêve dibe. Ev pirseke aqilmend e û eger bi awayekî rast were bersivandin, ew ê hemû tirsên din bixe bin perspektîfa xwe û jiyana me baştir bike -hem aniha û hem jî heta hetayê. Ew rêya jiyaneke baş û têrker ronî dike. Pirtûka Pîroz gelek tiştên wê li ser tirsê hene ku bibêje û kevirê wê yê bingehîn ev e: Bingeha zanînê tirsa REB e (Şîretên Silêman 1:7) û ew ne zanîneke ji rêzê ye lê ev zanîna Xweda ye. Ji bo destpêkê ne cîhekî xerab e.

Naxwe wisa be li ser vê yekê bifikirin: Îcar eger tirsa bi awayekî rast bibe armanc ku dilpakiyek be wê çi bibe? Ya ku tirsa Xweda rêya paradoksal a ber bi têkiliyeke rastîn bi Wî re bûya wê çi bibûya?

Baş e ev tirsa pîroz ew be ku bi rastî me digihîne tijîbûna jiyanê ku xwendekarên Îsa di seranserê sedsalan de jiyan kirine wê çi bibûya? Ya ku ev tirs hemû tirsên din -weke mînak tirsa avakirina karê xwe, tirsa ji tiştên ku rêveberiya we wê çi bike, tirsa ji tiştê ku wê bi serê zarokên we de were, tirsa ji nexweşiyê, tirsa ji sedema nexweşiya derûnî an jî ya depresyonê (dawiya vê lîsteyê tuneye)- ji holê rake wê çi bibûya?

Berî ku em dest bi rêwitiya xwe bikin, destûrê bidin ez van çar rastiyên li jêr diyar bikim:

1. Em mirov in û em ditirsin.
2. Tirsa Xweda, ji xeyalkirina gelek kesan ku ditirsin bînin ziman hîn kûrtir, xweştir û nêzîktir e.
3. Tirsa Xweda, hemû tirsên hilweşîner dadiqurtîne.
4. Tirsa Xweda, destpêka hemû tiştên baş e.

Hin mirov bi awayekî mafdar wê bînin bîra xwe ku Pirtûka Pîroz hema hema 365 caran dibêje “netirsin” û bi vî awayî gelek bawermend digihîjin wê encamê ku Xweda naxwaze em bitirsin. Lêbelê ev ayet behsa tirsa wêranker dikin. Wekî din, ez dikarim bi qasî 200 ayetan di Pirtûka Pîroz de nîşan bidim ku me teşwîq dikin ku em “ji Xweda bitirsin.” Û beşa bêşens ev e: Di lêgerîna me ya ji holêrakirina her tirsa di jiyana me de (dilpakiya tirsa ji Xweda jî tê de), ev beşa baweriya me nehatiye vekolandin, nehatiye ceribandin û bêkêr hatiye hiştin.

Tirsa Reb ji ya ku em dikarin xeyal bikin bêtir bi heybet, bêtir mirov dibe heyranê wê û heta bêtir bişad û xweş e. Dema ku em berdewam dikin, ez dixwazim nîşan bidim ku tirsa rast -bi taybetî jî dilpakiya tirsa ji Xweda ji her tiştî zêdetir- bê ka çawa rê li ber jiyaneke ku we qet xeyal nekiriye, vedike. Û tenê wê demê em dikarin bi wêrekî li hemberî her rewşeke ku em di jiyanê de pê re rû bi rû dimînin, bisekinin. Bi gotinên Charles Spurgeon, “Tirsa Xweda, mirina hemû tirsên din e; weke şêrekî bihêz, ew hemû tirsên din diqewirîne.”

Hêviya min ew e, dema ku hûn vê pirtûkê bixwînin, hûn têde germ bibin û xwe têde ji bîr bikin, hûn ji her ramanên pêşwext ên li ser tirsa Xweda pak bibin û hûn kifş bikin bê mirov çawa dikare bi

awayekî saxlem lingên xwe bide erdê. Belê, ji xerabiyê netirsin -lê şaş fêhmkirina dilpakiya tirsa ji Reb bê çawa jiyana we bi awayekî xweşik vedigiherîne, kifş bikin.

Werin em bi kifşkirina bê ka Xwedayê me çiqas bêhempa ye dest pê bikin.

Em ê ji vê re bibêjin "Tirsa Xweda!"

# XWEDAYÊ
# KU TIRSÊ
# ŞIYAR DIKE

## HEFTEYA PÊŞÎ

TIRSA XWEDA, XEZÎNE Û GEWHERA HILBIJARTINA WÎ YE; TENÊ DIDE YÊ KU PIR JÊ HEZ DIKE.

– JOHN BUNYAN

# 1| XEZÎNEYA XWEDA

Ya ku ji we re bihata gotin ku dilpakiyeke veşartî heye ku di eslê xwe de mifteya hemû jiyanê ye, wê çawa bibûya? Ew xilqa armanca hebûna we vedike û hebûn, parastin û dabînkirina Afirînerê we mîsoger dike. Ew koka hemû karakterên eslî ye, bingeha hemû bextewariyê ye û ji bo hemû rewşên dibe ku hûn rastî wan werin, sererastkirinên pêwîst peyda bike. Himbêzkirina jidil ya vê dilpakiyê dikare jiyana we dirêj bike, dikare şîfayê bide we, dikare serkeftin û ewlehiyê ava bike, dikare bêbereketiyê ji holê rake û dikare mîrateyeke hêja mîsoger bike.

Mirov ji bihîstina van bawer nake ku rast bin, ne wisa? Dibe ku hûn meraq bikin, gelo ev pirtûk ne rast e? Ez ji we re piştrast dikim ku ne wisa ye -tiştê ku ez dibêjim rast e.

Dema ku ev rastî li ber çavên gelek kesan tê raxistin, dibe ku ew bi tinazî bibêjin, “Dilpakiyeke wisa tune!” Lê dîsa jî her soza jorîn, bê guman ji hêla kesê herî zanê yê ku heta niha jiyaye, hatiye nivîsandin û yeka din jî, wî ev gotin di bin îlhama Afirînerê me de nivîsandine -û gotinên Wî bêqusûr in!

Lêbelê berî ku Silêman ji vê jiyanê koç bike, ew ji bextewariya ku nivîsandibû dûr ket ji ber ku dilê wî Çavkaniya zanyariya xwe terk kir û di encamê de ji rêya jiyana baş dûr ket.

Destûrê bidin ez bi kurtasî çîroka wî vebêjim. Dema ku Silêman zarok bû, ew bi vê dilpakiyê hat perwerdekirin û ew pejirand. Ew di kesayetiya xwe ya esil de mezin bû û biryardariya xwe ya tûj pêş xist. Ew di rêbertiyê de zû serketî bû û di dawiya dawî de ew li ser serê bi mîlyonan kesan bû rêvebir. Piştî ku ji Xweda xwesteka xwe xwest, ew bû xwediyê zanebûneke ecêb. Di rastiyê de, hindik tişt hebûn ku wî ji wan fêhm nedikir. Wî bi hezaran şîret nivîsandin û bi sedan melodî çêkirin: "Silêman li ser şînahiyê, ji dara sedrê ya Lubnanê heta giyayê cehtirê ku di qelîştokên dîwaran de şîn dibe, digot. Wî li ser heywanan, çivîkan, afirîdên ku bi erdê ve dişêlin û masiyan jî digot" (Padîşah I, 4:33).

Ev zilamê jîr û zane; serkeftin, dewlemendî û navdariyeke wisa bi dest xist ku heta wê rojê qet nehatibû dîtin an jî nehatibû bidestxistin. Qral, qralîçe, şandî û serokên payebilind ji dûr û nêzîk ve wê bihatana ji bo ku li cem wî bin, gotinên wî yên têgihîştî bibihîzin, bibin şahidê jêhatîbûn û yekîtiya gelê wî û bibin şahidê nûjeniyên ku hêz û dewlemendiya mezin a neteweya wî mîsoger kirine. Bandora wî ewqas bi tesîr bû ku qralîçeyekê nikarîbû baweriya xwe bi nûçeyên ku beriya serdana wî bihîstibû, bîne. Lêbelê piştî ku bi wî re dem derbas kir, wisa got: "Lê heta ku ez nehatim û min bi çavên xwe nedît, min bawer nekir. Bi rastî nîvî tenê jî, ji min re nehatibû gotin. Şehrezayî û dewlemendiya te ji ya ku min bihîstiye gelekî zêdetir e. Xwezî bi zilamên te û bi van xulamên te! Çimkî herdem li ber te disekinin û şehrezayiya te dibihîzin" (Padîşah I, 10:7-8).

Ji tiştên ku me xwendine, em dibînin mirovên ku wî rêberiya wan dikir di karê xwe de bextewar û berhemdar bûn. Xizanî tune bû, her malbateke di qraliyetiya wî de xwedî mal û baxçeyekî bû. Gotina Xweda radigihîne ku gel "xwar û vexwar û bi şahî jiya" (Padîşah I, 4:20). Ew di nava aştî û ewlehiyê de jiyan.

Lêbelê bi derbasbûna demê re, ev rêberê mezin di dawiyê de ji rastiya li pişt destkeftiyên xwe dûr ket. Wî xwe jîr û zana didît û êdî pêwîst nedidît ku guh bide vê zanebûna dilpakiyê. Wî rêya xwe winda kir û di dawiya dawî de bû zilamekî tinazker ku nava wî tije êş bû. Ew ne bi tenê bû ku ji ber darizadina xwe ya xelet êş dikişand -mirovên ku wî rêberiya wan dikir jî para xwe ji vê yekê stendin.

Ji bo wî, jiyan bêwate bû. Wî daxuyaniyên nebaş û xerab ên weke, “Her tişt mirov diwestîne û bi gotinan nikare bê ziman. Çav qet ji dîtinê têr nabin, guh ji bihîstinê” û “Tiştê ku berê qewimîye dê dîsa bibe. Tiştê ku berê hatiye kirin dê dîsa were kirin. Di bin tava rojê de tiştekî nû tune.” Hê bi awayekî dramatîktir, wî îfadeyên weke, “Roja mirinê ji roja jidayikbûnê çêtir e” û “Tiştê çewt û xwar nayê rastkirin, tiştê kêm nayê jimartin” bi kar anîn. Ya rastî, wî pirtûkek nivîsand ku hebûna bêwate ya jiyanê disêwirand, li gorî wî her tişt vala bû. Ev zilam, di demeke kurt de, ji lûtkeyên herî bilind ên serkeftinê ber bi kûrahiyên herî kûr ên têkçûn û xerabiyê ve bi awayekî eşkere ket. Îro roj dê gelek derûnnasan ew weke bûyereke cidî ya depresyona manîk bihesibandana. Zilamek çawa dikare ewqasî ber bi seriyên ku pir li dijî hev in bê kişandin?

Mizgîniya baş ev e: Çîroka wî di kûrahiyên bêhêvîtiyê de bi dawî nabe. Di dawiya dawî de ew vegeriya ser dilpakiya herî girîng ya jiyanê. Em nizanin wî çend meh an jî çend sal ji bo nivîsandina pirtûka xwe ya xemgîn û dilteng derbas kir lêbelê beşa dawî fikrekê dide me ku wî şîfa bi dest xistiye. Ew bi vî awayî an jî bi wî awayî heft caran “Afirînerê xwe bi bîr bîne” dinivîse û gotinên wî yên dawî ev in:

*“Her tişt hat bihîstin, encam ev e:*
*Ji Xwedê bitirse û emrên wî bigire,*
*Wezîfeya hemû mirovan ev e.”*
(Waiz 12:13)

Dilpakiya binirx, rêzgirtina ji Xweda re, ango ji tirsa Xweda pê ve ne tiştekî din e. Nivîskar ango Qral Silêman, vê yekê weke şertê pêşî yê jiyaneke tatmînker û têrker, îlan dike. Em di Nivîsên Pîroz de wisa dixwînin: “Her kî ku bitirse ji Xudan, Ew hînî wî dike riyan” (Zebûr 25:12). Kêm kes vê rêyê dibînin, ji ber ku mixabin, gelek kes bawer dikin ku zanyariya wan dê serkeftin û bextewariyê bîne, weke ku Qral Silêman di demên xwe yên tarî de kir. Îcar tirsa pîroz jî me bi zanyariya Afirînerê me ve girêdide -Ew tenê dizane çi me çêtir dike û çi me xera dike.

Girîngiya tirsa pîroz heta niha ji hemû dilpakiyên din ên ku Nivîsên Pîroz îlan dikin, derbas dibe ku tirsa REB ji Îsa re xweş e (Îşaya 11:3) û “xezîneya gel” e (Îşaya 33:6). Li ser vê yekê bisekinin û demekê li vê

bifikirin: Li xweşa Xwedayê mezin diçe û xezîneya gel e. Balkêş e! Em ê di demeke kurt de li ser vê rastiya balkêş kûrtir bikevin lê pêşî, em vegerin Qral Silêman.

Çima min ev peyam bi serkeftin, têkçûn û başbûna wî ya dawî re vekir? Di salên pêşîn ên xizmeta min de, rêberekî jîr û zana gotineke berbiçav got ku min bi dehan salan di dilê xwe de xwedî kiribû. Wî got: “Min ew kiriye prensîbeke giştî ku ez kesekî bi tomarên bêkêmasî ji bo pozîsyoneke desthilatdariyê dûr bixim.”

Dema ku sedema wê hat pirsîn, “Ez karakterê mirovekî ji her tiştî bêtir ji berteka ku didin têkçûnê fêr dibim. Gelo wan berpirsiyarî girt ser xwe, tobe kirin û ji vê ezmûnê ders ji xwe re derxistin? An jî wan tevgera xwe mafdar dîtin û kesekî din sûcdar kirin? Ev tevger nîşan dide bê ka ew ji bo berpirsiyariyê guncaw in an na.” Tişta ku ez ji vê yekê fêr bû ev bû: Nîşan dide bê ka ew tiştê ku herî zêde qîmetê didinê zanyarî ye an na.

Her çiqasî Silêman di bin îlhama Giyanê Pîroz de hîn dikir jî, wî bi temamî nirxa tirsa Xweda fêhm nekiribû! Ji ber vê yekê, pêkan bû ku ew jê dûr bikeve. Berî ketina wî, tirsa Xweda li xweşa wî neçû an jî ne xezîneya wî bû, ji bo armanc û kiryarên wî ne bingeheke saxlem bû. Dema ku ew terpilî, gava ku bêaqilî kir û gava ku di dawiya dawî de baş bû, wî bi temamî mezinbûna hêza tirsa Xweda fêhm kir.

Di ronahiyeke weke vê de, Pawlosê Şandî wisa nivîsandiye:

> “Ez cefayê didim bedena xwe û wê bindest dikim, da ku piştî min hinekên din hîn kirin, ez bi xwe neyêm redkirin.” (Korîntî I, 9:27)

Pawlos, girîngiya nirxandina zanyariya ku ji hêla Giyanê Xweda ve hatibû spartin wî û dûrketina ji heman xeletiya trajîk a weke Qral Silêman fêhm kir. Rastîyên veşartî yên peymana Xweda ku ji bo azadkirina mirovahiyê hatibû çêkirin, ji wî re hatin eşkerekirin, lê eger ew tirsa Xweda bêqîmet nebîne û bi tundî pê ve girêdayî nebe, ew jî dê bibe kesekî tinazker yê bêhêvî, weke ne guncaw, nepejirandî û derewîn were redkirin. Qebûlkirina tirsa Xweda weke xezîneya me ya herî hêja me xurt dike ku em bi rastiyê re dilsoz bimînin û bi vê yekê, me li ser rêyeke jiyanê ya tijî bereket dihêle.

Di serdemeke ku gelek kes tirsê weke tiştekî zirardar an jî bi zirar

dibînin, dibe ku îlankirina ku tirsa REB weke dilpakiyeke bikêr û hêja were ragihandin, bêmantiq xuya bike. Lêbelê, bi karanîna otorîteya Nivîsên Pîroz, ez ji we re piştrast dikim ku gava em wê qebûl bikin, em ê xurt bibin ku li ser rêya jiyanê bimînin. Li vir em ê nêzîkatiya rastîn bi Xweda re û bereketên ku jiyanê diguherînin tecrube bikin û yek ji van ya herî mezin veguherîna me ya di şibandina Îsa Mesîh de ye. Ji ber vê yekê, werin em rêwîtiya xwe ya kifşkirina tirsa Xweda dest pê bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Ew ewlehiya serdemên te ye, Rizgarî, şehrezayî û zanîn wê zêde bibe. Tirsa Xudan xezîneya gel e" (Îşaya 33:6).

**Ramana sereke:** Tirsa pîroz xezîneya Xweda ye û divê bibe xezîneya me.

**Ramana kûr:** Gava mirov tirsa pîroz bi qedir û qiymet dike, ji aliyê pratîkê ve dişibe çi? Divê ez çawa nêzî vê bibim? Divê ez çawa li ser vê bisekinim? Ez çawa dikarim wê ji dest bernedim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez hêvî dikim ku di rêwitiya kifşkirina tirsa REB de, ez wê nas bikim, pê re bijîm û jê kêfê bistînim. Bila tirsa Xweda bibe xezîneya min. Ji bo jiyaneke serkeftî, tatmînker û di çavên Te de baş e, bi dest bixim; bila zanyarî û zanebûna ji min re lazim e, bide min. Yeka din jî bila kesên ji bo min bi qedir û qiymet in bi pêş bikevin û her kesê ku bi min re têkiliya wan heye, bila qedir û qiymetê wê fêhm bikin. Ez vê li ser navê Reb û Xelaskerê xwe Îsayê Mesîh dixwazim. Amîn.

**Daxuyanî:** Ez tirsa pîroz weke xezîneya herî mezin a jiyanê hildibijêrim ku qedir û qiymetê didimê. Bi vê yekê re ji bo li ser rêya jiyana baş û rast bim, ez ê bi hêz bibim.

JI XWEDA BITIRSIN LÊ JÊ VENECINIQIN.

– J. A. SPENDER

# 2| TIRSÊN NAKOK

Di havîna sala 1994'a de, ji min hat xwestin ku li konferanseke dêrê ya li Başûrê Rojhilatê Amerîkayê xizmetê bikim. Ew civateke mezin bû ku du sal berê, şiyarbûneke çar-hefteyî ya bihêz lê çêbûbû ku ji aliyê mizgînxêrekî navdar ê cîhanê ve hatibû bi rêvebirin. Şiyarbûna giyanî; li ser qencî, hez û kêfxweşiya Xweda sekinî, bandoreke xweşik li ser gelek kesan kir. Lê mixabin, dêr di serpêhatiya şiyarbûnê de asê ma û di naskirina dilê Xweda de nekarî bi pêş ve biçe. Bi kurtasî, ew di vê rewşê de asê mabûn û kirin û gotinên wan li hew nedikirin.

Di wan deman de, ez di nava rêwîtiyeke kifşkirina tirsa pîroz de bûm. Min girîngiya wê didît lê hîn jî min hewl dida ku wê hîn bibim û ji ber vê yekê ez dudilî bûm ku wê bi eşkereyî ji her kesî re parve bikim. Dîsa jî, min hewcedariyeke mezin hîs kir ku vê fikarê deynim aliyekî û di civîna yekem a êvarê de li ser tirsa REB xizmetê bikim.

Ez derketim ser dikê û bi têgihiştina xwe ya bi sînordar min ji civata amade re dest bi axaftinê kir. Min dît ku mirov bi çavên ecêb li min dinêrin û ji ber ku bi temamî bê bertek mabûn, baweriya min têk çû. Weke ku min gotinên xwe ji keran re dikirin, bi min dihat. Ez mafdar bûm û min ê sedema vê yekê di demeke nêz de fêhm bikira.

Êvara din piştî hebandinê; serpastor, ji bo axaftineke vekirinê ku ez

difikirîm wê pir danasîneke jirêzê be derket ser dikê lê rewş ne wisa bû. Panzdeh deqeyan wî tiştên ku min êvara berê gotibûn rast kir. Bi awayekî jixwebawer got: "Tirsa REB tenê ji bo demên Peymana Kevin derbasdar e lêbelê weke Xirîstiyanan 'giyanê tirsonekiyê' nedaye me." Bi vî awayî weke referans serî li Tîmotêyos II, 1:7ê da.

Ez li rêza pêş bûm û bi awayekî matmayî rûniştîbûm û min hîs kir ku ez di nava kabêsekê de me. Her ku wî axaftina xwe dirêj dikir, rewş hîn bêtir ket nava rewreşeke xerabtir. Wî wisa berdewam kir: "Di Peymana Nû de ji me re wisa dibêje: 'Di hezkirinê de tirs tuneye. Berevajî vê hezkirina kamilbûyî tirsê pak dike' (Yûhenna I, 4:18). Ji ber vê yekê, tişta ku John şeva borî hînî me kir xelet e û ez dixwazim we ji vê biparêzim." Wî çend deqeyên din berdewam kir ku peyama min bi baldarî rast bike.

Piştî ku wî qedand, bi awayekî surprîz wî ez dîsa vexwendim ser dikê ji bo ku ez xizmetê bikim. Ez tînim bîra xwe ku ez rabûm ser piyan û min di dilê xwe de wisa got: "Ez ê çawa piştî evqas tiştên ku gotin, îcar karibim xizmetê ji van kesan re bikim? Ev nabe." Lê waye dibû û her çiqasî min tenê dixwest ku ez ji wir bi lez û bez birevim jî, ez mecbûr mam ku xwe bidim ser hev. Dev ji peyameke jiyanî ku ez karibim bidim wan mirovên hatine konferansê berdin, bi min zor dihat ku ez karibim ramanên xwe bidim ser hev û pêşkêş bikim. Dema ku ez diaxivîm, hişê min her dem vedigeriya ser gotinên pastor, min nikarîbû gotinên wî ji bîra xwe derxim. Ev serpêhatî hem ecêb û hem jî tirsnak bû. Çend caran ez mecbûr mam û min hewl da ku ramanên xwe kontrol bikim ji bo ku li ser mijarê bisekinim. Min li dijî dengên ku di hundurê min de bilind dibûn şer dikir: "Ji bîr bike, dev ji axaftinê berde û ji vir derkeve û here." Ez pir xemgîn bûm. Piştî peyameke kurt, min merasîm radestî wî kir û pir zû vegeriyam otelê. Min xwe bi temamî şaş û xerîb hîs dikir û bi vî halî min xwe avêt nava livînên xwe.

Sibeha din, min li nêzîkî otêla xwe şantiyeke bêdeng dît, karker lê tunebûn. Min bi dil û can bi rêberiya Xweda re dua kirin. Min bi dil û can pirsî: "Ya Reb, gelo min neheqî li dêra te kir? Gelo min tiştekî nerast hînî wan kir? Gelo min gelê te xist bi koletiyê?"

Min hinekî din jî berdewam kir û gava min dua kirin, min dît ku gotinên min jî guherîn. Min dev ji gumanên li ser peyama xwe ya wê êvarê berda û min dît ku ez bi dilgermî dixwazim tirsa pîroz çêtir fêhm bikim. Ev daxwazeke

ji kûrahiya dilê min bû û ez ji tiştên ku qewimîn matmayî mam. Min ne nerazîbûna Xweda lê min hîs kir ku Xweda ji ber tişta min kir kêfxweş e. Min dest pê kir û gelek beşên di Peymana Nû de ku li ser tirsa Xweda ne bi bîr anîn. Piştî demekê min dît ku ez êdî ne di rewşeke matmayî de me, îcar aniha min dît ku ez bi dengekî bilind û bi coş diqîrim, "Bavo, ez dixwazim tirsa Xweda bizanibim, ez dixwazim di nav de bimeşim!"

Nivîskarên Peymana Nû, ayetên ku pastor ji wan vedigotin nivîsandin lêbelê hinek din jî nivîsandin:

- Pawlosê şandî wisa dinivîse: "...lê belê hê bêtir di dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin" (Filîpî 2:12).
- Careke din, ew vê talîmatê dide: "Îcar hezkirîno, madem ku em xwediyê van sozan in, em xwe ji her cûreyê murdariya ruh û bedenê paqij bikin û bi tirsa Xwedê pîroziyê temam bikin" (Korîntî II, 7:1).
- Nivîskarê Nameya Îbraniyan wisa dibêje: "Loma em şikir bikin ku em padîşahiyeke ku nayê vehejandin distînin û bi vî awayî em bi tirs û hurmetê biperizin Xwedê, wek ku li wî xweş tê" (Îbranî 12:28).
- Petrûsê şandî wisa dinivîse: "Eger hûn ji yê ku cihêtiyê naxe nav mirovan û her kesî li gor kirina wî dîwan dike re, dibêjin Bav, dema xwe ya xerîbiyê ya li ser dinyayê bi tirsa Xwedê derbas bikin" (Petrûs I, 1:17).
- Cihûdayê şandî vê daxuyaniyê tîne ziman: "Û bi tirsê dilovaniyê li hinekan bikin" (Cihûda ayeta 23.).
- Û Îsa ji me re wisa dibêje: "Ji wan ên ku bedenê dikujin, lê nikarin can bikujin netirsin. Hê bêtir ji wî bitirsin ê ku dikare hem can û hem bedenê di dojehê de helak bike" (Metta 10:28).

Ez dikarim bi ayetên din berdewam bikim û bê guman ez ê di pêş de berdewam bikim lê ez hêvî dikim ku we mijar fêhm kiribe: Tirsa pîroz rastiyeke ji Peymana Nû ye. Ev tenê çend ji wan ayetan in ku Reb di dema ku min dua dikir de xistin dilê min.

Wê sibehê min ferq kir ku pastor "giyanê tirsonekiyê" bi "tirsa REB" re tevlihev dike. Cudahiyeke mezin di nava wan de heye û ev cudahî eşkere xuya dibe dema ku Mûsa Îsraîliyan ber bi Çiyayê Sînayê ve bir ji bo ku bi Xweda re hevdîtinê bikin.

Dema ku hemû gel hat, Mûsa ji bo civîna pêşî ya taybet derket ser çiyê. Xwedayê ku hêza Wî têra her tiştî dike, armanca rizgariya bi hêz a ku Wî bi xwe ava kiribû, diyar kir:

> "Mûsa derket ber Xwedê. Xudan ji çiyê deng lê kir û got: "Tê ji Mala Aqûb re, ji gelê Îsraêl re wiha bêjî: 'We dît ku min bi Misriyan çi kir û çawa we li ser baskê eyloyan siwar kirin û anîn ba xwe." (Derketin 19:3-4)

Sedema sereke ya ku Xweda gelê xwe bi hêz xelas kir, ew bû ku *hemû mirovan* bîne ba xwe. Wî bêriya wan dikir û eynî weke Mûsa, dixwest ku wan li hev bicivîne ji bo ku Wî nas bikin. Lêbelê piştî sê rojan, gava ku Xweda ji bo xwe bide naskirin ji çiyê daket, mirovan bertek nîşan da û bi lez vekişiyan. Bi tirs û xof, wan kir hawar û ji Mûsa re gotin: "Tu bi me re bipeyive, emê guhdariya te bikin. Bila Xwedê bi me re nepeyive, yan na emê bimirin" (Derketin 20:19). Ji bo ku wan aram bike, rêberê wan wisa bersivê dide wan: "Netirsin, çimkî Xwedê ji bo we biceribîne hat ku tirsa wî di dilê we de hebe û hûn gunehan nekin" (Derketin 20:20).

Di dîtina pêşî de, weke ku Mûsa bi xwe re di nava nakokiyê de ye xuya dike: "Netirsin ji ber ku bila tirsa Xweda li ser we hebe." Ma li vir du kesên cuda diaxivin? Bersiv na ye. Mûsa tenê xwedîbûna cûdahiya di navbera "veciniqandina ji Xweda" û "tirsa Xweda" de ji hev diyar dike. Cudahiyeke mezin di nava wan de heye.

Kesekî ku ji Xweda vediciniqe, tiştekî wî heye ku vedişêre. Bînin bîra xwe, dema ku Adem guneh kir, wî û Hewa xwe ji hizûra Reb veşartin. Berteka wan ne tenê ji bo wan bû; em di seranserê Nivîsên Pîroz de, di kesên ku dikevin nava tariyê de bertekên tevgerî yên weke van dibînin.

Lê kesekî ku ji Xweda ditirse, tiştekî wî yê veşartî tuneye. Ew ditirse ku ji Xweda dûr bikeve. Ev tirs gava ku gel bi paş ve vekişiya di nêzîkbûna Mûsa ya ku nêzî Xweda bû de tê dîtin. Kesekî ku ji Xweda ditirse, di dilê xwe de nabêje: "Ez çiqasî dikarim bigihîjim ber xeta gunehê bêyî ku bikevim nav wê?" Na, ew dibêje: "Ez dixwazim pir nêzîkî Xweda bibim û ez ji wê xetê ewqasî dûr im ku ez êdî nikarim Wî bibînim."

Ji ber vê yekê, berî ku em diyar bikin bê ka tirsa pîroz çi ye û li ser

bereketên wê nîqaşan bikin, em pêşî zelal bikin bê ka ew ne çi ye. *Ew ne veciniqandina ji Xweda ye û ji ber vê yekê ne dûrketina ji Wî ye.* Em çawa dikarin ji nêzîkatiya kesekî ku em jê vediciniqin kêfê bistînin? Dûrketina ji Wî ew e ku tam berevajî tiştê ku Ew dixwaze. Di Zebûrê de em wisa dixwînin: "Ya Xudan, te got, Li rûyê min bigerin, Dilê min ji te re got, Ez li rûyê te digerim" (Zebûr 27:8). Hûn banga Wî ya nêzîkbûnê dibihîzin? Ew dixwaze ku hûn nêzîkî Wî bibin, bi Wî re têkiliyê deynin, bi hev re bikenin, bi hev re parve bikin û bi hev re bijîn. Nivîskarê Zebûrê her wiha wisa dinivîse: "Xudan sirra xwe bi yên ku jê ditirsin re parve dike" (25:14). Rastiya teqez ev e: Xweda dixwaze bi we re nêzîk û samîmî be. Ji ber vê yekê ji vê piştrast bin ku tirsa pîroz nêzîkbûnê venamirîne; berevajî vê dike, ew têkiliya me ya bi Xweda re bi pêş dixe.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Netirsin, çimkî Xwedê ji bo we biceribîne hat ku tirsa wî di dilê we de hebe û hûn gunehan nekin" (Derketin 20:20).

**Ramana sereke:** Tirsa pîroz, ne ji veciniqandina ji Xweda ye û bi vî awayî nedûrketina ji Wî ye. Dûrketina ji Wî ye ku mirov dixe nava rewşeke pir xetere.

**Ramana kûr:** Armanca rastîn a Xweda çi bû ku xwest Îsraîl ji Misrê rizgar bike? Armanca rastîn a Xweda çi ye ku dixwaze min ji koletiya girêdanên bi dinyayê ve rizgar bike?

**Dua:** Bavê Asîmanî yê delal, spas dikim ji bo te bi alîkariya Rebê min Îsayê Mesîh, ji giyanê tirsê rizgar kir. Ez ji te dixwazim ku tu tirsa pîroz di hundurê min de biçînî ji bo ku ez li hemberî te gunehê nekim ji ber ku guneh zirarê dide nêzîkbûna ku em dixwazin bi te re bin. Ez vê yekê bi navê Îsa dixwazim. Amîn.

**Daxuyanî:** Xweda gazî min kiriye ku ez nêzîkî Wî bim, ji ber vê yekê ez ji Xweda naveciniqim lê ez dixwazim ji Wî bitirsim ji bo ku ez gunehan nekim.

TIRSA JI XWEDA, YEK JI ERKÊN YEKEM Û HERÎ MEZIN YA AFIRÎNERÊN XWEDÎ AQIL E.

– CHARLES INGLIS

# 3| TIRSA PÎROZ ÇI YE?

Ne mimkun e ku tirsa pîroz di hevok, paragraf an jî beşekê de were pênasekirin. Ev, ji hewildana ravekirina ku mirov bi her awayî hezkirina Xweda di heman qadê de bîne ziman, ne cudatir e. Beş dê derbas bibin û tewra wê demê jî, em ê ji têgihîştina wê ya tevahî dûr bin. Ya rastî, ez bawer dikim ku em ê di seran serê heta hetayê de, kûrahiyên hem hezkirina pîroz û hem jî tirsa pîroz kifş bikin.

Yeka din, destûrê bidin ez pêşnûmayeke giştî ya pênaseya tirsa pîroz pêşkêş bikim. Zarokatiya xwe bi bîr bînin dema ku pirtûkek boyaxkirinê û qelemên rengîn didan we. We pirtûk vekir, rûpelek jê hilbijart û wêneyek dît ku li benda boyaxkirinê ye. Bi heman awayî, ev beş dê sînoran bide me, lêbelê di qismê mayî yê pirtûkê de, em ê hewl bidin ku nava wan sînoran boyax bikin. Eger we tenê ev beş bixwenda, we yê di derbarê tirsa pîroz de ramaneke berfireh bi dest bixista, lêbelê we yê rastiyên wê yên veguherîner ji dest bidana. Di beşa berî vê de, me destnîşan kir ku tirsa Reb me ji hebûna Xweda dûr naxe lê berevajî vê yekê dike. Tirseke baş û bêhempa me nêzîkî Wî dike û berî ku mirov berdewam bike danîna saxlem ya vê bingehê, girîngiyeke mezin e.

Hin kes dibêjin ku tirsa Reb tenê tê wateya hebandina Xweda ya bi rêzdarî. Min ev gotin li kursiyan, di sohbetan de û ji xizmetkarên navdar ên ku min bi wan re xwarin xwariye, bihîstine. Her çiqasî ev

pênase destpêkek be jî, ew ji tevahiya wêneyê dûr e. Ev, tenê dişibe pênasekirina hezkirina Xweda ya ku weke “sebir û dilovaniyê” tê nîşankirin (Korîntî I, 13:4). Lê eger em pênaseyê di wê astê de bihêlin, ew ê kêm bimîne û em ê armancê zeft nekin.

Dema ku ez û Lisa di destpêka çil saliya xwe de bûn, zavayê rêberekî rêzdar ji bo ku behsa fersenda kar û bar û fêdeya ku şîrketa ava kiriye bike, serdana mala me kir. Em çend demjimêran civiyan û dilovanî û sebra ku wî nîşanî me da xweş tê bîra min. Eger we tevgera wî bidîtaya, we yê jî piştrast bikira ku ew mirovekî dilovan bû. Lêbelê piştî ku me çend rojan dua kirin, berê min û Lisa neket ser fêdeya ku wê ji vê şîrketê bihata ji me re. Niha, piştî salan, ez kêfxweş im ku me pereyên xwe nexistin wê şîrketê ji ber ku ew bi çêkirina tiştên nebaş yên mezin hate mehkûmkirin û gelek salan di zindanê de ma. Gelo ew zilam bi sebir û nazik bû? Bêguman. Baş e, gelo ew di nava hezkirinê de dimeşiya? Bêguman na. Çima? Ji ber ku Nivîsên Pîroz ji me re dibêjin: “Hezkirina Xwedê pêkanîna fermanên wî ye” (Yûhenna I, 5:3). Dizî xweperestî ye û fermana hezkirina Xweda binpê dike (Efesî 4:28). Kesekî ku tacizî zarokan dike, dikare bi sebir û heta dilovan be, lê di heman demê de dikare jiyana ciwanekî tarûmar bike. Ma ew ji wî zarokî hez dike? Bêguman na!

Bi heman awayî, tirsa pîroz tenê bi sînorkirina hebandina rêzdar re dikare bibe sedema ku em bingehê ji dest bidin û xwe şaş bikin. Ji ber vê yekê, em wê destnîşan bikin û dûv re em ê bi hînkirin, mînakên ji Nivîsên Pîroz û em rengan li çîrokan di beşên pêş de bi cîh bikin. Berî ku em dest pê bikin, ez dixwazim we hişyar bikim ku hûn ê gotinên tirsnak yên dibe ku dema hûn tirsa pîroz pênase bikin, bibihîzin; lê ez ji we re piştrast dikim ku berevajî vê rast e. Li ser tevahiya peyamê zîq bibin û hûn ê kifş bikin ku tirsa pîroz diyariyeke hezkirin û parastinê ye ji Afirînerê me ku jidil û can bi me dadikeve û bêriya me dike.

Ji bo destpêkê gelek ayetên Peymana Nû hene, lê ez bawer dikim ku yên jêrîn wêneyê giştî nîşan didin:

> “Loma em şikir bikin ku em padîşahiyeke ku nayê vehejandin distînin û bi vî awayî em bi tirs û hurmetê biperizin Xwedê, wek ku li wî xweş tê. Çimkî Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike.” (Îbranî 12:28-29)

Eger hûn bi baldarî lê binêrin, hûn ê bibînin ku du term hene: rêzgirtin û tirsa (*xwedayî*). Ev di cîh de nîşan dide ku tirsa xwedayî nikare tenê bi rêzgirtinê ve sînordar be; eger ne wisa be, nivîskar wê tenê bi peyva duyemîn xwe dubare bike. Ev ne tenê di Tirkî de, lê di Grêkî de jî du peyvên cuda ne: *aidos û eulabeia.*

Rêzgirtin, wergereke bêhempa ya peyva pêşî ya Grêkî ye. *Ferhenga Lêkolîna Peyvan a Tam* li vir rêzgirtinê wekî "rêzgirtineke kûr û pesindar" pênase dike. Ez ji vê pênaseyê hez dikim; hûrbûna li ser vê têgihîştina me digihîne asteke din!

Peyva duyemîn; *tirs*, tê wateya *heybetê*. Ji bo pênaseya heybetê, min li çapa orîjînal a 1828an a ferhenga Noah Webster nêrî. Ha tişta min dît ev e: "Stûxwarkirina li ber Xweda ya bi dilê tijî lerz û tirs; bandora bi tirs, rêz û sawê." Li hemberî peyvên tirs û xofê nekivin tevlihev. Her çiqasî ev peyv di ferhenga Grêkî de jî bên bikaranîn, ji bîr nekin ku tirsa pîroz bandoreke wê ya balkêş heye. Ji ber vê yekê divê em bipirsin: Ma aliyeke erênî û saxlem yên van peyvan heye? Ez bawer dikim ku Nivîsên Pîroz vî alî nîşan didin û piştre gava em reng lê zêde bikin, em ê bibînin bê ka çi dibe.

Werin em bi rêzkirina pênaseyên xwe dest pê bikin. Tirsa ji Xweda, tê wateya rêzgirtin û sawa li ber Wî.

Tirsa ji Xweda, tê wateya pîrozkirina Wî. Pîrozkirina Wî weke "rêzgirtina mezin" tê pênasekirin.

Tirsa ji Xweda tê wateya ku mirov ji her kesî an ji her tiştî bêtir rêzê li Wî bigire, Wî bi rûmet bike û bibe heyranê Wî.

Dema ku em ji Xweda ditirsin, em dilê Wî parve dikin. Em ji tiştên ku Ew jê hez dike, hez dikin û ji tiştên ku Ew jê nefret dike, em nefret dikin. (Bala xwe bidinê ku ne ji tişta jê "hez nake," ji tişta ku Ew jê nefret dike, lê di vir de "nefretkirin" ew e ku ji tiştên Ew jê nefret dike). Tişta ku ji bo Wî girîng e ji bo me jî girîng dibe. Tişta ku ji bo Wî ewqasî ne girîng e ji bo me jî ne ewqasî girîng e.

Tirsa ji Xweda, nefretkirina ji gunehê ye.

Tirsa ji Xweda, nefretkirina ji neheqiyê ye.

Tirsa ji Xweda, ew e ku mirov bi her awayî xwe ji xerabiyê dûr bixe -di raman, gotin û kirinê de. Ew rev e ku mirov xwe ji axaftina xapînok

dûr bixe. Ew ji gotin an jî negotina tiştekî ku ne li gorî dil û ramanên mirov be dûr bisekine. Ew, ew e ku tevgera me ya derveyî bi raman, motîv û baweriyên me yên hundurîn re li hev bike.

Tirsa ji Xweda, ew e ku mirov li ber Xweda û li ber mirovan bi dilnizmiya rastîn bijî.

Tirsa ji Xweda, ew e ku mirov pesn, heyranî, spasî û hebandina ku ew heq dike, bide Wî.

Tirsa ji Xweda ew e ku mirov her tiştê ku ya Wî ye, bide Wî.

Tirsa ji Xweda tê wateya lerizîn û rêzgirtina li ber Wî. Tê wateya ku em bi temamî bala xwe bidin Gotina Wî û hebûna Wî.

Tirsa ji Xweda tê wateya îteata ji bo Wî. Ev ne tenê xwestekek e, bedêla wê çi dibe bila bibe, hêzeke hundurîn e biryar daye ku xwesteka Wî bîne cîh. Em bi xwezî û dilxwazî û di cîh de îteatê jê re dikin -her çiqasî em tu sûdê nebînin an jî bi mantiq neyê jî- û em vê îteatê heta dawiyê didomînin.

Tirsa ji Xweda tê wê wateyê ku mirov ji her cure gilî û gazinan an jî ji mizmizandinê dûr bisekine.

Tirsa ji Xweda tê wateya rêzgirtin, rûmetdan û teslîmbûna ji rayedariya rasterast ya ku ji Wî re hatiye şandin. Di heman demê de îteata ji desthilatdariya ku Wî tayîn kiriye û tekane îstîsnaya vê yekê ew e ku desthilatdarî ji me re dibêje ku em gunehê bikin.

Tirsa Reb niyet, raman, gotin û kirinên me bi şekl û şemal dike.

Niha em hin fêdeyên tirsa pîroz rêz bikin. Li vir çend sozên pirjimar ên ku ji kesên ku bi tirsa Xweda dijîn re hatine dayîn hene:

Tirsa Reb xala destpêkê ye ji bo têkiliyeke nêzîk bi Xweda re. Em dibin hevalên Wî û Ew sirên xwe ji me re eşkere dike.

Tirsa Reb destpêka zanyarî, têgihîştin û zanînê ye. Ew pêşbînî û rêberiya xwedayî ya zelal peyda dike.

Tirsa Reb ew e ku em di xelasiya xwe de bigihêjin û bibin weke Îsa.

Tirsa Reb paqijî ye; ew di jiyana me de pîroziya rastîn ava dike.

Mayîna di tirsa Reb de misogerkirina mîrateya heta hetayê ye.

Tirsa Xweda bawerî, bêtirsiyê û ewlehiyê ava dike. Ew hemû tirsên din, tevî tirsa ji mirovan jî, ji holê radike.

Tirsa Reb nasnameyê dide me, me berhemdar dike û me hêzdar dike ku em zêdetir bibin.

Tirsa Reb alîkariya ferîşteyan, bicîhanîna daxwazan, serkeftina mayînde, esalet, çalakî, temendirêjî, rojên berhemdar, kêfa jiyanê, bextewarî, kêfê ji keda tê dayîn distîne, şîfa ji bo bedena me dide û gelek tiştên din bi xwe re tîne.

Tirsa Reb heta hetayê berdewam dike -qet bi dawî nabe. Tirsa Reb, diyariyeke hêja ye ji Bavê me yê Asîmanî.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Loma em şikir bikin ku em padîşahiyeke ku nayê vehejandin distînin û bi vî awayî em bi tirs û hurmetê biperizin Xwedê, wek ku li wî xweş tê. Çimkî Xwedayê me agirek e ku dixwe û tune dike" (Îbranî 12:28-29).

**Ramana sereke:** Tirsa Reb, ew e ku mirov ji tiştên ku Xweda jê hez dike, hez bike û ji tiştên ku Ew jê nefret dike, mirov jê nefret bike. Tiştê ku ji bo Wî girîng e, ji bo me jî girîng dibe. Tiştê ku ji bo Wî ne ewqasî girîng e, ji bo me jî ne ewqasî girîng e.

**Ramana kûr:** Ji aliyê pratîkî ve, gelo ji min ve wê çawa xuya bike ku mirov ji her kesî an her tiştî bêtir rêzê li Xweda bigire, rûmetê jê re bike, hurmetê bidêyê û heyranê wî be?

**Dua:** Bavê Asîmanî yê delal, ji kerema xwe fêrî min bike bê ez ê çawa ji navê Te, Gotina Te, hebûna Te û her tiştê ku Tu di nav de yî, bitirsim. Bihêle ez ji tirsa pîroz hez bikim û jê zewqê bistînim. Giyanê Pîroz, dema ku ez di vê rêwîtiyê de berdewam dikim, rêyên Xweda fêrî min bike û wan di min de biçîne; bila tiştên ku ez dixwînim ne tenê ji bo armancên agahdariyê bin, lê bila ev gotin jiyana min veguherînin şibandina Rebê min Îsayê Mesîh. Ez van hemûyan bi navê Îsa dixwazim. Amîn.

**Daxuyanî:** Bila gotin û ramanên di dilê min de ji Xweda re xweş bin.

HEMÛ KARAKTERA WÎ FERMANÊ LI ME DIKE KU EM RÊZÊ JÊ RE BIGIRIN JI BER KU EW HETA HETAYÊ PÎROZ E. NAVÊ WÎ GOTINEK E KU MIROV JÊ SAWÊ DIGIRE KU DIVÊ TU CARÎ BI BÊHURMETIYÊ NEYÊ BI BÎRANÎN, DIVÊ BÊYÎ RAMANEKE NE JIDIL Û XWETEWANDINEKE DILINÎ YA LI BER WÎ, TU CARÎ NEYÊ BILÊVKIRIN.

– C.H. SPURGEON

# 4| HEBÛNA XWEDA YA ŞÊNBER

Weke ku berê jî hatiye gotin, tirsa Xweda dijberî mantiqa mirov xuya dike. Dema ku em peyva *tirsê* dibihîzin, hişê me wê bi tiştekî xerab, heta zirardar ve girêdide. Lê ez ji we re piştrast dikim ku tirsa ji Xweda di rastiyê de çavkaniya herî mezin a ewlehî, rehetî û parastinê ye ku ji bo her hebûneke di gerdûnê de peyda dibe. Vê rastiyê gava ku em di rêwîtiya xwe de çûne bi pêş ve, em ê wê kifş bikin. Lê pêşî, tirsa pîroz dikare di du kategoriyên sereke de were dabeş kirin:

1. Lerizîna li ber Xweda
2. Lerizîna ji ber gotina Wî

Em ê li ser herduyan jî bisekinin û nîqaş bikin lêbelê em ya pêşî derxînin pêş û dest pê bikin. Nivîskarê Zebûrê wisa rave dike: "Di civata ezmaniyan de ew Xwedêyek pirr bi heybet e, Ji hemû yên li der û dora xwe ew bêtir tirsdar e" (Zebûr 89:7). Bala xwe bidinê ku Xweda "tirsê şiyar dike." Li vir rastiyeke teqez heye: Hûn qet nikarin hebûna bêhempa ya Xweda li hawîrdoreke ku rêzgirtin ji Wî re tuneye û tirsandina Wî tuneye, bibînin.

Ev yek ji bo min di Çileya sala 1997'a de bû rastiyek. Ji min hat xwestin ku di konferanseke neteweyî de ku li paytexta Brezîlyayê hate lidarxistin, biaxivim. Ez pir kêfxweş bûm ku cara pêşî çûm vî welatê mezin.

Balafir li ber destê sibehê li Brezîlyayê daket û hîn rojek min hebû ku ez duayan bikim, xwe amade bikim û di odeya xwe de bêhna xwe vedim. Wê êvarê, dema ku em bi erebeyê ber bi salonê ve diçûn, hîn berî ku em bigihêjin wir min dît ku gelek erebe li kolanê li dû hev park kirine. Weke ku dihat gotin, parka erebeyan tije bibû, vê jî nîşan dida ku wê gelek kes beşdarî konferansê bibin.

Ez birin salonê û piştî ku ez bi çend rêberan re axivîm, rasterast ez çûm ser platformê. Ji ber ku min ê li kêleka bi hezaran bawermendên dilsoz hebandin bikira, ez pir bextewar bûm. Lêbelê kelecana min pir neajot ji ber ku min zû fêhm kir ku di nava wê civatê de hebûna Xweda tuneye. Ez matmayî mabûm, ev konferanseke bawermendan bû û koma hebandinê di nav yên herî baş ên welêt de bû. Naxwe çima min hebûna Wî hîs nedikir?

Berî ku ez berdewam bikin, destûrê bidin ez çend tiştan li ser hebûna Xweda zelal bikim. Nivîsên Pîroz du cureyên hebûna Xweda pênase dikin. Ya yekem, hebûna Wî ya li her derê. Dawid şahidiya vê yekê dike: "Ez dikarim herim kuderê ji ber ruhê te, Birevim kuderê ji ber te? Eger ez derkevim ezman, tu li wê derê yî, Nivîna xwe raxim li diyarê miriyan, tu li wê derê yî. Tarî jî ji bo te ne tarî ye, Şev, wek rojê dibiriqe, Tarî û ronahî ji bo te yek e" (Zebûr 139:7-8, 12). Ev hebûna Xweda ye ku soz: "Ez tu caran te nahêlim, Ez tu caran te bernadim" (Îbranî 13:5). dide. Ya duyemîn, ev di gotina Îsa de tê pênasekirin: "Ezê ji wî hez bikim û xwe ji wî re eşkere bikim" (Yûhenna 14:21). Peyva Grêkî ya ku weke "eşkere bikim" tê wergerandin *emphanizo* ye ku tê wateya "berbiçavkirin... ku mirov destûrê dide ku xwe bi awayekî nêzîk dide naskirin û fêhmkirin"ê. Ev yek gava ku Xweda xwe ji hiş û hestên me re eşkere dike, diqewime. Îsa wisa dibêje: "Li kuderê du an sê kes bi navê min civiyan, ez li wir di nav wan de me" (Metta 18:20). Diyar e ku li vê derê behsa hebûna Xweda ya li her derê nake, nexwe çima hewce bike ku ew vê gotinê dike? Berevajî vê, ew behsa hebûna Wî ya xuyakirî

dike. Hebûna xuyakirî ya Xweda wê êvarê di salonê de tunebû. Weke kesekî ku ji vê yekê haydar, min çavên xwe girtin û min ji Giyanê Pîroz pirsî: "Hebûna Te li ku ye?"

Min çavên xwe vekirin û di nava çend saniyan de tiştek li ber çavên min ket ku heta wê kêliyê min ferq nekiribû. Piraniya mirovan bi hebandinê re ne meşgûl bûn. Hin ji wan, destên wan di bêrîka wan de an jî destên xwe li hev pêçabûn û ji xwe re li derdora xwe dinêrin an jî aciz bûne. Jin li qewlik û çenteyên xwe dixebitîn; gelek ji wan li dora salonê digeriyan an jî ji bo kirîna xwarinên sivik ji stantên bexşê derdiketin derve. Gelek beşdar bi hev re dikeniyan û diaxivîn. Reftarên wan ji girseya ku li benda destpêka şanîdanekê ne, ne cudatir bû. Min di dilê xwe de wisa got: "Bêguman ev ê bi vî rengî berdewam neke û wê mirov dest bi hebandinê bikin." Lê rewşê wisa berdewam nekir.

Her çiqasî ez matmayî mabûm jî, gava îlahî bi dawî bûn û yek ji rêberên tevgerê rabû ji bo xwendina Nivîsên Pîroz bike jî tiştek neguherî lêbelê aniha muzîk qut bibû û salon bi mirmirandina kesên ku di nava xwe de sohbet dikirin, tijî bû. Min nikarîbû ji van tiştên dibûn bawer bikim û ji ber vê jî ez hêrs dibûm.

Piştre min bihîst ku Giyanê Xweda bi dilê min re dike pitepist: "Ez dixwazim tu rasterast bi vê yekê re rûbirû bimînî."

Piştî ku danasîna min hat kirin, ez û wergêrê xwe çûn ser platformê. Min biryar da ku tiştekî nebêjim û min tenê li mirovan nêrî. Ez gihîştim wê encamê ku yekane rêya gengaz a ku ez bala her kesî bikişînim ew bû ku ez hemû çalakiyên li ser platformê rawestînim. Ev bi kêr hat û bêdengiya ku tam deqeyekê berdewam kir, bala her kesî kişand. Tevgera mirovan sekinî, her kesî berê xwe da platformê û salon bêdeng bû. Di wê kêlîkê de, min zanibû ku çavên her kesî li ser min in.

Min peyama êvarê ne bi gotinên "Ez pir kêfxweş im ku li Brezîlyayê me" an jî "Spas ji bo we ez vexwendime vir" da dest pêkirin. Min xwe jî neda naskirin. Di şûna wê de, min bi dengekî hişk ev pirs pirsî: "Gava ku hûn bi kesekî li hemberî we li ser masê rûniştiye re bikin ku biaxivin, eger ew kes xwe di we de dernexîne, berê xwe bide aliyekî din û bi we danekeve an jî bi kesekî li tenişta xwe re biaxive û bala xwe nede we,

hûn ê xwe çawa hîs bikin?"

Piştî bêdengiya ku deqîqeyekê ajot, min pirsa xwe bi xwe bersivand: "Wê li xweşa we neçûya, ne wisa?

Min mesele hinekî din tevlihev kir: "Eger her cara ku we li deriyê cîranê xwe bixista û cîranê we jî her carê bigota; 'wî dîsa tu yî?' û bi nêzîkatiyeke sar hûn pêşwazî bikirina, ma hûn ê dîsa jî biçûna mala cîranê xwe?"

Dîsa, piştî bêdengiyekê, min bersiv da: "Na!"

Piştre min wisa got: "Ma hûn difikirin li cîhekî ku Qralê Gerdûnê neyê rûmetkirin û rêzgirtin lê neyê kirin, hebûna xwe bide xuyakirin an jî biaxive?"

Vê carê min bi tundî bersiv da: "Qet nabe!"

Min berdewam kir: "Eger serokê welatê we li ser vê platformê bûya, we yê bala xwe bidayê û rêz jê re bigirta. An jî eger yek ji lîstikvanê fûtbolê yê ku hûn pir jê hez dikin li vir bûya, piraniya we wê bi kelecan li benda her peyva wî bûya. Lêbelê berî aniha gava ku Gotina Xweda dihat xwendin, we qet guh nedayê; ew ji bo we tenê weke dengekî ji paş ve dihat!"

Piştre ez tam saetek û nîvê li ser tirsa Reb axivîm. Eger derziyek biketaya erdê wê dengê wê bihata bihîstin. Ew ji ber vê pevçûnê hinekî matmayî xuya dikirin lê dîsa jî bi baldarî guhdarî kirin. Piştî ku min qedand, min bang wan kir: "Eger hûn bawermend in lê hûn ji tirsa pîroz bêpar bin û eger hûn dixwazin ku tobe bikin, rabin ser lingan!"

Bê dudilî, ji sedî 75ê qelebalixê rabûn ser piyan. Di nav çend deqeyan de, berî ku ew bikaribin bi hev re dua bikin, hebûna Xweda ya xuyakirî salon tije kir. Mirovan dest bi girî kirin û bû îskeîska wan, ji ber ku hebûna Xweda ya bêhempa destê xwe dida jiyana wan. Tirsa pîroz ew ji Xweda dûr nexistin; ew bêtir nêzîkî Xweda kirin.

Tiştê ku piştre qewimî yek ji tecrubeya herî ecêb bû ku di nava çil salên xizmeta min de qewimî. Lêbelê berî ku em dest bi wê çîrokê bikin, em bi van gotinan dawî li axaftina xwe bînin:

> "Min dengê gotinên wî bihîst, ez ketim erdê û di xeweke giran re çûm. Piştre destek li min ket, wî ez rakirim ser dest û çokan. Wî ji min re got: "Daniyêlo, zilamê ku gelek jê hatiye hezkirin.

> Rabe ser lingan û gotinên ku ez ji te re dibêjim fêm bike. Çimkî ez hatim ba te.” Piştî vê gotinê ez bi lerizîn rabûm ser lingan.” (Daniyêl 10:9-11)

Daniyêl ji aliyê Xweda ve pir dihat hezkirin lêbelê ji ber dengê ku bihîst, ew ser dev ket erdê û bêhiş ket. Dema ku ew li ser çokan û destan û dû re jî li ser piyan hat rakirin, ew di temamiya rê de ji tirsan lerizî. Eger ew li ber qasidekî, ango li ber ferîşteyekê wisa bibe, îcar dema ku Xweda bi xwe were wê çi bibe?

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Di civata ezmaniyan de ew Xwedêyek pirr bi heybet e, Ji hemû yên li der û dora xwe ew bêtir tirsdar e” (Zebûr 89:7).

**Ramana sereke:** Em ê hebûna Xweda ya xuyakirî, tenê di hawirdora ku rêzgirtina herî mezin jê re tê girtin de bibînin.

**Ramana kûr:** Lerizîna di hizûra Xweda de tê çi wateyê? Gava ez tenê me ev rewş ji aliyê pratîkî ve çawa pêk tê? Dema ku ez bi hevalên xwe re me? Li cîhên giştî? Li civîneke dêrê?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez ji bo demên ku ez bi helwesteke bêxem û bêrêzî ketim hawirdora hebandinê, ez ji te lêborînê dixwazim. Ji ber ku min hebûna te bi tiştekî nehesiband û ji ber ku ez hebûna te weke tiştekî jirêzê dibînim, ez tobe dikim. Bila xwîna Îsa min paqij bike. Ez li ber te bejna xwe ditewînim û ji bo xwe biguherînim ji Te xweşiyê dixwazim. Ez li kuderê bim ferq nake û çi dikim jî xem nake, ez dixwazim ji hebûna te haydar bim û rêzê ji te re bigirim. Ez dixwazim her gav bi tirs û xofa rêzdar bi te re bijîm. Ez vê yekê bi navê Îsa dixwazim. Amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê her gav bala xwe bidim Gotina Xweda û di her tiştê ku ez dibêjim û dikim de hebûna Wî bi rûmet bikim.

BERÎ DUAKIRINÊ ZANIBIN BÊ
HÛN NÊZÎ HEBÛNA KÊ DIBIN
Û BANG LI KÊ DIKIN, VAN
DI HIŞÊ XWE DE BIGIRIN Û
HEWL BIDIN BÊ HÛN DIKIN
BI KÊ RE BIAXIVIN.

– TERESA AVIL

# 5| ÊVAREKE NAYÊ JIBÎRKIRIN

Mizgîniya Marqos dibêje ku Reb bi xwendekarên xwe re dixebite û diyar dike ku bi "nîşaneyên diyarkirî re gotina xwe piştrast dike" (Marqos 16:20). Ev xebata hevpar bi çûyîna Îsa ya ber bi ezmanan ve dest pê kir û di tu devereke Peymana Nû de nayê gotin ku heta hatina wî ya duyemîn wê raweste.

Ji ber vê yekê em vegerin wê êvarê li Brezîlyayê. Gava ku banga tobekirinê ji bo bêrêziya wan hat kirin, ji sedî 75ê qelebalixê rabûn ser piyan. Min serê xwe xwar kir û bi dengekî bilind dua kirin: "Ya Reb Xweda, Peyva xwe ya ku îşev hatiye îlankirin piştrast bike."

Di cîh de piştî wê, min dît ku dengê giriyê mirovan tê. Di seranserê çend deqeyên piştî vê de, pêla hebûna Xweda salon dagirt, dilên kesên amade teze û paqij kir. Heta piştî ku rewş arambû jî, hesteke bêhempa ya aramiyê di salonê de ma.

Mirovan bi devkî bexşandin nexwestibûn an jî dua nekiribûn lêbelê ji ber dilên wan yên ku guherîn, hebûna Xweda xwe nîşan da. Piştre gava ku ez li ser vê yekê fikirîm, min ferq kir bavê ku kurê wî windabûyî

li benda bihîstina lavakirina bexşandinê ji kurê xwe nesekinî berî ku ber bi wî ve bireve. Na, tenê ew bû ku dema guhertina di dilê kurê wî de bi vegera malê re çêbû, wî himbêzek û maçek bi coş ji bavê xwe wergirt. Wisa xuya bû ku heman tiştî di vê salonê de jî diqewimî. Em di kêliyeke taybet de bûn; mirov di nava bêdengiyeke rêzdar de bûn, dilê wan nerm bûbû. Fikreke baş bû ku min ew ber bi duayeke tobekirinê ve birin û ne hewce bû ku mirov ferq bike ku gotinên wan ji dil û can in an na. Piştî duayan bi çend deqîqeyan, pêleke duyemîn a hebûna Xweda ya xuyakirî salon dagirt. Careke din min di nav mirovan de girî û îskeîsk bihîstin lê vê carê rewş dijwartir bû. Bi rastî jî pir xweşik bû lê piştî çend deqeyan dîsa hebûna Xweda ji wir derket. Ez ji ber nûbûna ku bi her du xuyakirinên hebûna Xweda yên bêhempa re ku hatin salonê, spasdar im. Ji ber ku aramiyeke îlahî xwe li salonê danî, em hemû di nava bereketê de bûn. Di wê bêdengiyê de, min bihîst ku Giyanê Xweda ji dilê min re dike pistepist: "Ez ê careke din xwe nîşan bidim."

Min bi dengekî bilind tiştê ku min bihîstibû dubare kir lêbelê tu kesî ji me nizanibû bê wê ji vir şûnde çi biqewime -nîşandaneke cuda li benda me bû. Ji bo min zor e tiştê ku qewimî vebêjim ji ber ku gotin têra vê rewşê nakin. Tiştê ku ez ê binivîsim dibe ku kes jê bawer neke an jî rast xuya neke lê piştî bîst salan ji hêla gelek kesan ve hatiye piştrastkirin.

Xeyal bikin ku hûn di nava daristanekê de ne û bahozeke bihêz rabûye. Hûn dibihîzin ku ba bi dengekî bilind di nava darên li ser serên we re difikîne. Ha tam dengekî wisa bi ser serê salonê ket. Me ew hîs nedikir lê me dibihîst. Hema bêje di heman demê de, dua û lavayên germ ji nava qelebalixê bilind bûn. Dengê wan gur bû lêbelê dengê ba, dengê wan tepisand. Ez di nav tirs û xofê de sar sekinîm û ji ber hebûna Wî ez lerizîm û ditirsiyam. Min nikarîbû xwe tev bidim, ez nedikarîm biaxivim û mûyên laşê min bûn weke şûjinan. Di odeyê de desthilatdariyek hebû ku min berê qet nedîtibû. Min ji xwe re wisa got: "Ev ne hebûna Abba Bavo ye, ev Qralê me yê pîroz, mezin û bihêz e!

Gurîna ba nêzîkî nod saniyeyan berdewam kir. Her ku ba hêdî hêdî kêm dibû, mirovên digirîn li dû xwe dihiştin, hinekan ji wan xwe avêtin erdê, hinek jê jî li ser kursiyên li ber xwe ketin -lê em hemû di nava tirs û xofê de dilerizîn. Ev rewş nêzîkî deh deqeyên din berdewam kir.

Min nikarîbû tiştekî bibêjim; em hemû bêliv û bêdeng man. Piştre min xizmet radestî rêber kir û bi his û deng ez ber bi otomobîlê ve çûm.

Wê êvarê, vokalîsta ku îlahî digotin û mêrê xwe, piştî min bi çend deqîqeyan, hatin li erebeya me siwar bûn. Di cîh de, ew qêriya û got: “Weçdengê ba bihîst?”

Min nexwest rasterast bipejirînim. Min dixwest ku ji bilî min kesekî din piştrast bike bê ka bi rastî çi qewimîye. Ji ber vê yekê min got: “Belkî jî ew balafirek bû ku li ser serê avahiyê nizm difiriya.” (Di navbera dîwarê jorîn û banê holê de ji bo hewakirinê valahiyek hebû, ji ber vê yekê hûn dikarin dengên ji derve pir hêsantir ji avahiyeke girtî bibihîzin.)

Ew li kursiya pêşiyê rûnişt, bi awireke matmayî li min zîvirî, berê xwe da min û bi dengekî bilind got: “Na, ew Giyanê Xweda bû!”

Mêrê wê yê ku zilamekî bêdeng bû, mudaxele kir û got: “Ezbenî, ew ne dengê balafirekê bû.”

Min jê pirsî: “Tu çawa pê dizanî?”

Wî wisa bersiv da: “Li derveyî salonê karmendên ewlehiyê û polîs hebûn û piraniya wan ne bawermend bûn. Dema ku dengê ba bihîstin, ew beziyan hundur û ji tîma me, li dengê bayê ku ji hundurê avahiyê dihat, pirsîn. Wekî din, ez li wir li ser panela deng a sereke bûm [dema ku jina wî stran digot, piştrast dikir ku asta deng rast e]. Ji pergala deng dengek jî derneket; di tevahiya dema ku ba lê dida de pîvanên desîbelê tiştek tomar nekirin.”

Jina wî, bi hêsirên ku ji çavên wê diherikîn re wisa berdewam kir: “Min dît ku pêlên agir li ser avahiyê dikevin û min li her derverê ferîşte hîs dikirin.”

Min xwest rasterast biçim otêla xwe. Di seranserê rêwîtiyê de em bêdeng man. Piştre wê êvarê, ez bi saetan li balkona odeya xwe rûniştim; tişta ku min dikarî bikim ev bû ku ez Xweda bihebînim. Tiştê ku wê êvarê qewimîbûn ez pir lerizandibûm.

Dema ku em sibeha din ketin salonê, atmosfer bi temamî cuda bû. Hebûna Xweda ya xuyakirî, ku di dema xizmeta şeva berê de bandor li me kiribû, hîn jî diyar bû. Tirsa Xweda di dilê mirovan de ji nû ve bi cîh bibû û wan hebûn û bereketên Wî bi awayekî bêhempa tecrube dikirin.

Weke ku berê jî hate gotin, gelek kesan bûyera awarte ya wê êvarê

piştrast kirin û bandora wê li ser jiyana xwe bi rêya name, e-name û bi awayekî şexsî parve kirin. Di sala 2016an de, ez çûm Goiania bajarê Brezîlyayê, ji bo ku ji diwanzdeh hezar rêberan re biaxivim. Gotinên pêşîn ên pastorê ku ez pêşwazî kirim, ev bûn: “Bîst sal berê, ez di wê civîna Brezîlyayê de bû ya ku ba lê rabû. Ji wê demê ve jiyana min ji sedî sed guherî.” Ew rêberê toreke dêrê bû ku tenê di şazdeh salan de gihîştibû zêdetirî 300.000 kesan.

Dema ku jina min di sala 2019’a de li Brezîlyayê bû ji bo ku beşdarî konferansekê bibe, yek ji rêberên tevgereke cuda jê re got ku ew wê êvarê, zêdetirî bîst sal berê, dema ku ba lê dida, li wir bû. Wî diyar kir ku ji wê rojê ve jiyana wî heta hetayê guheriye.

Ji bo tenduristiya giyanî ya her bawermendekî, hebûna di hizûra Xweda de pir girîng e. Berê, ji bo min pir dijwar bû ku di demên duayên xwe de bikevim hizûra Xweda. Lê rojekê, hema bêje bi tesadufî, min dest bi tiştekî kir. Min biryar da ku di demên duayên xwe de bi îlahiyan an jî bi gotinekê dest pê nekim. Ez tenê li mezinbûn û pîroziya Xwedayê me fikirîm. Hema bêje di cîh de, ez rastî hebûna Wî hatim. Min biryar da ku roja din jî heman tiştî bikim û min heman encam dît. Û di roja sêyemîn de, ew dîsa qewimî.

Ez matmayî mam. Min pirsî: “Reb, çima di van sê rojên dawî de hatina min a ber bi hizûra te ve ewqasî hêsan bû?” Min bihîst ku Giyanê Xweda wisa got: “Îsa xwendekarên xwe çawa hînî duayan kirin?”

Min dest pê kir û ji Duaya Reb jêgirtin kirin: “Bila Bavê me yê li Asîmanan, navê te pîroz bike...”û” Ez qêriyam: “Ha ev e! Îsa, xwendekarên xwe hîn kirin ku bi tirs û rêzgirtina pîroz re derkevin hizûra Xweda!” Niha ji bo min ew bi temamî bi wate dihat.

Dawid vê rastiyê bi gotina “Belê ezê, bi wê kerema te ya mezin, Di hundurê mala te kevim, Bi tirs serî li ber perestgeha te ya pîroz deynim” (Zebûr 5:7) piştrast dike. Xweda Bavê me ye, Îsa; Reb û Xelaskarê me ye û Giyanê Xweda ji me pir kûr hez dike. Lê ji bîr mekin ku di Peymana Nû de, Xweda weke “agirê ku hildiweşîne û tune dike” tê binavkirin (Îbranî 12:29). Îsa şahidê mirina hevalê xwe yê herî nêzîk, Şandiyê hezkirî Yûhenna bû, ku ev yek bu sedem ku weke mirîyekî hilweşe erdê (Peyxam

1:17) û Giyanê Xweda ew e ku hêza Xweda nîşan dide da ku bala tevahiya bajarekî bikişîne ser xwe (Karên Şandiyan 2), avahiyan bihejîne (Karên Şandiyan 4) û gelek kirinên din ên ecêb pêk bîne.

Rastiya bingeha meseleyê ev e: "Li kuderê rêz ji Reb re bê girtin, hebûna Wî xwe nîşan dike."

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Ez bi qelsî û bi tirs hatim ba we; ez gelek jî dilerizîm. Peyv û danezana min, ne bi qanîkirina peyvên şehrezayiyê, lê bi berçavanîna hêza Ruh bû, da ku baweriya we ne li ser şehrezayiya mirovan be, lê li ser hêza Xwedê be." (Korîntî I, 2:3-5)

**Ramana sereke:** Tirsa Reb civatan diguherîne. Ew hawîrdoreke guncav ava dike ji bo ku hêza Giyanê Pîroz hem jiyana me û hem jî jiyana yên din biguherîne.

**Ramana kûr:** Gelo ez li benda xuyabûna hebûn û hêza Xweda mam û baweriya min pê hat an na? Gava ku ez bi tirsa pîroz nêzîkî Wî bibim, wê jiyana min a duayan çawa bêguhertin? Ez çawa dikarim vê veguherînê bikim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, eger min ji ber tecrubeyên xwe hebûna Te sînordar kiribe an jî eger sînorkirinên yên din di derbarê tiştên ku Tu dikarî bikî de bandor li min kiribe, ji kerema xwe min bibexşîne. Ez ê bi tirsa pîroz bikevim hizûra Te û ez ê tu sînorkirinê li ser Te nekim. Ji kerema xwe, gava ku Tu hêza Xwe diyar dikî, ji tiştê ku ez ê bixwazim, ku ez ê lê bifikirim an jî ez ê jê hêvî bikim, bi wêdetir biçe. Ji kerema xwe vê yekê bike ji bo ku ez bikaribim Rebê xwe Îsa bi rûmet bikim û ji bo ez xizmeta mirovên di nav qada bandora min de ne bikim, vê yekê bike. Ez bi navê Îsa duayan dikim. Amîn.

**Daxuyanî:** Eger ez tenê bi tirs û baweriya pîroz nêzîkî Xweda bibim, her tişt mimkun e.

GAVA KU EM DI PIROZIYA WÎ YA BÊHEMPA Û MEZINAHIYA WÎ YA REWNAQ DE RÛBIRÛ MAN, WÊ BI ME NE PÊKAN XUYA BIKE KU EM DERBARÊ WÎ DE XWEDÎ RAMANÊN JIRÊZÊ BIN.

– JOY DAWSON

# 6| NÊRÎNA LI XWEDA

Tirsa me ya pîroz li gorî têgihîştina me ya mezinbûna Xweda mezin dibe. Lêbelê rastî ev e: “Xudan mezin e û hêjayî pesindanê ye, Aqil nagihîje mezinahiya wî” (Zebûr 145:3), ji ber ku mezinahiya Wî ji têgihîştinê wêdetir e. Hiş û aqil nagihêje mezinahiya wî, sînorên Wî tunene, bêdawî ye û bi tiştekî din re mirov nade ber hev. Dîsa jî divê em hewl bidin ku têgihîştina xwe baştir bikin.

Cihûda sala ku Qralê wî Ûziya mir, ango li dora sala 742yan berî zayînê, pêxember Îşaya dîtinek asîmanî dît. Wî dît ku Rebbê mezin û bi heybet, li ser textê xwe rûniştî bû. Mezinahî û bêhempabûna Wî, bêguman bi milyaran afirînde hundurê perestgeha mezin dagirtin.

Îşaya li ber hebûna Afirîner ne tenê ecêb ma û xofê xwe lê girt, lê di heman demê de bi heybetiya ferîşteyên bihêz ên bi navê Serafî ku li ser text difiriyan jî, bandor lê kir. Ji devê van hebûnên ku mirov heyranî wan dima Îşaya ev gotin bihîstin:

> “Pîroz e, pîroz e, pîroz e Xudanê Karîndar. Rûmeta wî tevahiya dinyayê dadigire” (Îşaya 6:3).

Gelek ji me îlahiya “Pîroz, Pîroz, Pîroz” ku ji hêla John Bacchus Dykes ve di salên 1800î de hatiye nivîsandin û ji van gotinan îlham girtiye, nas

dikin. Ew ji du sedsalan zêdetir e ku di dêran de îlahiyeke bingehîn e û di dawiya dawî de weke straneke nerm a hebandinê bûye straneke klasîk. Lê tiştê ku Îşaya dîtibû ji vê yekê pir dûr bû.

Ev hebûnên bi heybet, ji bo ku Xweda xwe baş hîs bike straneke xweşik nabêjin, berevajî vê, ew tiştên ku wan dîtiye radigihînin! Mezinbûna Wî ya ku aqil tênagihijêyê; aliyên nû û teze her dem derdixîne holê û tekane tişta ku dikarin bikin û biqîrin: “Pîroz, pîroz, pîroz…” e.

Girîng e ku Serafî peyva “pîroz” sê caran dubare dikin. Dema nivîskarekî Îbranî weke Îşaya dixwest ku li ser peyvekê bisekine, ew peyv du caran dinivîsand. Em vê yekê di gotina Îsa de ya ku dibêje “Ne ku her kesên ji min re dibêjin: ‹Ya Xudan, ya Xudan› wê bikevin Padîşahiya Ezmanan!” (Metta 7:21), dibînin. Eger hûn rûniştina û we xwe bixista şûna Mettayê ku guh dide Îsa, îcar gava Îsa digihêje peyva Reb we yê ferq bikira ku di dengê Îsa de kirpandineke girîng heye. Ji bo ku kirpandina Wî zeft bike, Metta ev du caran nivîsandiye. Di demên nûjen de, ji bo em di nivîsekê de cîhê em dixwazin li ser bisekinin ango bikirpînin, an em qalin dinivîsînin an jî îtalîk dikin.

Nivîskarekî Îbranî pir kêm caran peyvekê digihîne asta sêyemîn a kirpandinê. Ya rastî, ev tenê du caran di Nivîsên Pîroz de xuya dibe. Ev şêwaz asta herî bilind a kirpandinê dide peyv an jî hevokê. Di esasê xwe de, derî û berdevkên perestgehê ji ber dengê gurîna ferîşteyan hejiyan.

Dema ku malbata me li Florîdayê bi cîh bû û ji ber ku rezervên ava binê erdê nêzîkî rûyê erdê bûn me kifş kir ku bodrim li vê herêmê tunene. Emlaqfiroşê me ji min re got: “Eger bahozek li herêma we rabe, bikevin bin çarçoveyên deriyê odeyên xaniyê xwe, ji ber ku ew cîhên herî saxlem ên avahiyên we ne.” Ev ecêb e ku Îşaya bi taybetî behsa lerzîna çarçoveyên deriyê di vê hola mezin a ezmanî de dike. Bi vê yekê re, ecêb e ku tevahiya avahiyê ji ber qîrîna van ferîşteyên bihêz hejiya!

Gava ku Îşaya mezinahiya Reb dît, çawa tevgeriya? Bê guman wî negot “Wey wey ha waye li wir e!” Wisa nekir.

Ew qêriya û got: “Na.” “Wey li min! Ez helak bûm. Çimkî ez zilamekî lêvqirêj im û di nav miletekî lêvqirêj de rûdinim. Lê çavê min Padîşah, Xudanê Karîndar dît” (Îşaya 6:5). Li vê rastiyê bifikirin: Ev yek, di beşa pirtûka xwe ya berî vê de zilamekî an jî pêxemberekî ku ji Xweda

ditirse, diqîre û dibêje: “Wey li wan ên ku xerabiyê baş û qenciyê xerab dibînin û dibêjin... yên ku xwe zana dibînin... yên ku bê sînor şerabê vedixwin!” (Îşaya 5:20-22). Lê aniha, beşek piştî wê, dema ku ew li mezinahiya Xweda dinêre, qêrîna wî êdî ne “Wey li wan gunehkaran,” lê di şûna wê de ev e: “Wey li min! Ez perîşan bûme” (6:5). Wî digot qey ez pê zanim, lê aniha ew bêtir hay ji Xwedayê Herî Baş û Mezin heye. Ew di heman demê de li ber vî Xwedayê pîroz, zane bê ew kî ye. Di encama vê hevdîtinê de çi bû? Tirsa wî ya pîroz gelek astan zêde bû!

Di Nivîsên Pîroz de, ew kesên ku li mezinahiya Reb dinêrin, bertekên wekhev nîşan didin. Gelo hûn ê ji bo Eyûb çi bibêjin? Xwedayê Mezin li ser wî wisa dibêje: “Gelo te baş dêhna xwe da Eyûbê xulamê min? Çimkî li dinyayê mirovekî wekî wî tuneye, mirovekî kamil û dilrast e. Ew ji Xwedê ditirse û xwe ji xerabiyê dûr dixe” (Eyûb 1:8). Ma hûn dikarin xeyal bikin ku Xweda ev yek li ser te an jî li ser min gotiye? Em ê ji kêfan bifiriyana! Lê dîsa jî ev zilam rastî mezinahiya Xweda tê û wisa diqîre: “Min li ser te bi guhan bihîstibû, Lê niha ez bi çavê xwe te dibînim. Loma ez xwe kêm dibînim Û di nav toz û xweliyê de tobe dikim” (Eyûb 42:5-6).

Hûn ê ji bo Hezekiyêl çi bibêjin? Wî Reb dît û wisa nivîsand: “Xuyabûna sûretê rûmeta Xudan wiha bû. Gava min ev yek dît, ez deverû çûm erdê û min dengê yekî ku dipeyive bihîst” (Hezekiyêl 1:28)

An jî ji bo Birahîm em ê çi bibêjin? Gava ku Xweda xwe nîşanî wî da: “Avram deverû çû erdê” (Destpêk 17:3).

Gava ku Xweda xwe bi hemû mezinahiya xwe li ser Çiyayê Sînayê nîşan da: “Dîtin wisa tirsehêz bû ku Mûsa got: «Ez gelek ditirsim û dilerizim” (Îbranî 12:21).

Yûhennayê şandî yê ku Îsa jê hez dikir, li ser hevdîtina xwe ya bi Îsayê me yê Mezin re wisa dinivîsîne: “Gava min ew dît, ez wek yekî mirî ketim ber lingên wî” (Peyxam 1:17).

Ev ne lîsteyeke berfireh e. Di Nivîsên Pîroz de gelek bûyerên din ên bi vî rengî hene.

Di serdema nûtir a dîroka dêrê de, di navbera salên 1266 û 1273yan de, Thomas Aquinas berhema ku wî weke berhema xwe ya herî girîng dihesiband, *Summa Theologica* dinivîsand. Rojekê ji rojan ew bi Xweda re ewqasî bi hêz li hev rast hat ku vê hevdîtinê nêrîna wî heta hetayê

guherand û wî bi temamî dev ji nivîsandinê berda. Hevalê wî Reginald israr kir ku ew berdewam bike lêbelê Aquinas wisa bersiv da: "Dawiya xebatên min hat. Piştî tiştên ku ji min re hatine eşkerekirin, her tiştê ku min nivîsandine ji min re weke qirşikekî xuya dikin."

Di serdemeke dîroka Îsraîlê de, Xweda bi hin pirsên diyar hewl da ku tirsa pîroz a gelê xwe bilind bike. Ji Îşaya re ku haya wî ji mezinahiya Reb hebû, dipirse: "Ma kî bi fikra Xudan dizane? Ma kî şêwirmendê wî bû ku hînî wî bike? Ma ew bi kê şêwirî ku fêm bike, Kê riya edaletê hînî wî kir? Kê zanînê hînî wî kir Û riya fêmdariyê nîşanî wî da? Hûn Xwedê dişibînin kê? Hûn wî dişibînin çi?" (Îşaya 40:13-14, 18).

Piştre Xweda rasterast dipirse: "Hûn min dişibînin kê Ku ew hempayê min be?" (Îşaya 40:25).

Eger di dîrokê de, demek hebûya ku ev pirs hewce bûna ku bi kûrahî werin nirxandin û qet neyên paşguhkirin, ew dem aniha ye. Îro roj, piraniya me ewqasî bi lehiya ku her dem diherike ya van agahiyan ve mijûl in ku ne cîh û ne jî dem heye ku em li ser van pirsên girîng bifikirin. Pêşketina tirsa pîroz hatiye astengkirin û di encamê de, gelek bawermend bêparastin dimînin ku bi hêsanî têne kişandin nav pergala cîhanê ya ku li ser bingeha xwestek, qezenc û serbilindiya destkeftiyên mirovan e.

Ji xeynî van; em bi berdewamî bi pesnên werzişvanên jêhatî, stêrkên bedew ên Hollywoodê, muzîkjenên jêhatî, karsaz, rêberên karîzmatîk û kesayetiyên din ên navdar têne bombebaran kirin. Navûdengê wan li ser televîzyon, medyaya civakî, medyaya çapkirî û platformên din ên bêhejmar tê pesinkirin. Rastiya trajîk ev e ku ev perçeyên agahdariyê û destkeftiyên mirovan ên ku bi eşkere bêzerar xuya dikin, bala me belawela dikin, heta me ji vexwendina mezin a ku em werdigirin ku em nêzîkî Xweda bibin û li Wî binêrin, dûr dixin.

Eger tenê em rawestin, eger em li nava xwe vegerin û eger em li bêhempabûna Wî binêrin, em ê dewlemend bibin, bi hêz bibin û em ê bi hizûr bibin. Ji me re wisa soz hat dayîn:

> "Çimkî, Xwedayê ku got: «Bila ji tariyê ronahî bibiriqe», di dilê me de jî biriqî, da ku ronahiya zanîna rûmeta Xwedê ya li ser rûyê Îsa Mesîh, bide me." (Korîntî II, 4:6)

Di bêdengiya giyanên me de, bi hevkariya Giyanê Pîroz re, em dikarin Îsa bibînin gav ku li ser Gotina Wî difikirin. Nêrîna li rûyê Wî, mezinbûna Xweda ya di dilê me de ronî dike û di dawiya dawî de dihêle ku tirsa me ya pîroz bilindtir bibe. Em dibin weke Îşaya û mirovên din ên mezin, ên ku baweriya xwe pê anîn, bi Wî re meşiyan, Wî razî kirin, sozên peymanê wergirtin û baş bi dawî kirin. Ya herî baş, di şopandina Wî de, soz ji me re hatiye dayîn ku em ê "li ser mezinahiyê bişibin Wî ku em ê bi vî awayî jî bên guhertin" (2 Korîntî 3:18).

Tu dixwazî bişibî kê -bibî weke navdarên roja me an jî bibî weke afirînerê gerdûnê? Bi aqilmendî hilbijartinê bikin, guh bidin tiştên ku hûn dibihîzin û bala xwe bidinê.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Di nav berziya pîroz de biperizin Xudan! Ey tevahiya dinê li pêş wî bilerizin!" (Zebûr 96:9)

**Ramana sereke:** Tirsa me ya pîroz, li gorî têgihîştina me ya mezinbûna Xweda mezin dibe.

**Ramana kûr:** Eger ez rojê sê caran deh deqeyan navberekê bidim, xwe ji hemû bandorên derveyî dûr bixim û li ser mezinbûna Xweda bifikirim wê çi bibe? Ma hêjayî ku mirov demê jê re veqetîne? Gelo ez dikarim di dawiyê de bi zêdekirina tirsa xwe ya pîroz di jiyana rojane de bibandortir bibim ku ev yek wê min aqilmendtir bike?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, nêrîneke nû derbarê Îsa de bide min. Ez ji te rîca dikim ku tu vê yekê qebûl bikî. Tu soz didî min gava ez di dilê xwe de li Reb dinêrim ku ez ê bi mezinbûna Wî re veguherim û bişibim Wî. Bila tirsa min a pîroz zêde bibe gava ku mezinbûna Wî ji min re rasttir dibe. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez bi navê mezinbûna Wî re, bi şibandina ku bişibim Îsa re têm guhertin.

MIROV JI HEV RE RÊZÊ DIGIRIN LÊ NE XWEDA RE.

– HENRY DAVID THOREAU

# 7| MEZINAHIYA (RÛMET) XWEDA

Hun nikarin bêyî ku li mezinahiya Xweda zîq bibin, derbarê tirsa pîroz de biaxivin. Di beşa berî vê de me behsa vê yekê kiribû lê aniha em bêtir pêde biçin.

Bedena ku wê di dawiya dawî de bibe ax, nikare xwe li ber hizûra mezinahiya Xweda bigire. Pêxember Habaqûq li ser Xweda wisa dibêje: “Ew mîna rojê dibiriqe, şewq ji destên wî diçirise, sira hêza wî di destên wî de ye” (3:4). Pawlos rave dike ku Îsa Xweda ye ku “tu mirovî nediye û wê nebîne ji ber ku ew di nava şewqeke ku kes nikare xwe bide ser de dijî” (1 Tîmotêyos 6:16). Bi heman awayî, nivîskarê Nameya Îbraniyan dibêje ku Xweda “agirek e ku her tiştî dişewitîne û tune dike” (12:29).

Piştî bihîstina van gotinan, bila agirekî êzingan neyê bîra we ku her tiştî dişewitîne û tune dike lê ku dîsa jî mirov dikare nêzîkî wî bibe. Di şûna vê de, em li agirekî bi şewqtir û yê ku tune dike, bifikirin -hûn ji roja ku cîhana me ronî dike re çi dibêjin? Ew dişewitîne, tune dike û mirov nikare nêzîkî wê bibe lê ev mînak jî kêm dimîne û têrê nake ji ber ku “Xweda ronahî ye, di wî de tarî tune” (Yûhenna I, 1:5). Roj, her çiqasî

şewqê bide jî deqên reş li ser wê hene. Ya rastî, Pawlos wisa dinivîsîne: “Ya padîşah, nîvro di rê de, min ji ezmên ronahiyek dît ku ji ya rojê bi şewqtir bû û dora min û yên bi min re ronahî kir” (Karên Şandiyan 26:13).

Pawlos rûyê Îsa nabîne, ew tenê ronahiya ku ji wî dibiriqe dibîne û ev ronahî tava Rojhilata Navîn ya biriqandî, ditepisîne! Li vir, ya ku tê behskirin ne tava sibê an jî ya esir e, tava nîvro ye.

Min gelek caran serdana gelek deverên cîhanê kiriye. Carinan ez ji bîr dikim ku berçavka xwe ya rojê bi xwe re bibim. Li gelek deveran ez dikarim bêyî berçavkê îdare bikim lêbelê li Rojhilata Navîn nikarim. Di rêwîtiya xwe ya yekem a wir de, min kifş kir ku berçavka rojê pir girîng e. Bêyî berçavkê, ji ber şewqa rojê ez neçar mam ku her tim çavên xwe bi ser hev de bikiçînim. Ji ber sê sedeman ev herêm hîn pirtir dibiriqîne: kişwera beyebanê ya ziwa, rengê ronahiya şewqdar a erdê û nêzîkbûna wê ya li ekvatorê. Her çiqasî di demjimêrên rojê yên zû an jî yên dereng de pir ne dijwar be jî, di nîvro de bêyî lensên parastinê şewqeke ku çavan kor dike, hebû.

Aniha em li ser tiştê ku me berî aniha xwendin bifikirin. Pawlos dibêje şewqa ku ji Îsa diçe ji tava nîvro ya Rojhilata Navîn bêtir dibiriqe! Mezinbûna wî ji ronahiya rojê pir zêdetir e.

Ev yek, rave dike bê çima hem Yoêl û hem jî Îşaya dibêjin ku di hatina duyemîn a Îsa de wê ji ber çi roj û heyv reş bibin û stêrk wê nebiriqin (Îşaya 13:9-10; Yoêl 2:31-32). Bihêlin ez hûrgiliyan bidim. Gava ku em di şeveke sayî de derdikevin derve, em çi dibînin? Asîmanekî bi stêrkan dagirtî. Lê gava roj di sibehê de hiltê çi dibe? Stêrk winda dibin. Divê em vê bipirsin: Gelo hemû stêrk gava ku roj hiltê di cîh dûr dikevin û dema ku roj diçe ava ji nişkê ve vedigerin asîman? Bersiva vê yekê bêguman, na ye. Baş e naxwe çi dibe? Mezinahiya stêrkan di astekê de ye, lê mezinahiya rojê di ser asteke pir bilindtir de ye. Bi vî awayî, dema ku roj hiltê, ew stêrkan tarî dike ji ber ku ew ji wan pir bi şewqtir e.

Gava ku Îsa vegere, mezinahiya Wî wê ji rojê pir mezintir be û eger li wir bimîne jî wê rojê reş bike! Hûn îcar mezinahiya wî çêtir fêhm dikin gelo? Ji ber vê yekê wê mirov ji çiya û keviran re bibêjin: “Bi ser

me de bikevin! Ji ber yê ku li ser text rûniştiye û ji ber xezeba Berx me veşêrin!" (Peyxam 6:16).

Aniha pirsa rast ev e: Mezinahiya Reb çi ye? Ji bo bersiva vê yekê, em daxwaza Mûsa bi bîr bînin: "Lava dikim rûmeta xwe nîşanî min bide" (Derketin 33:18).

Di Îbranî de, peyva rûmetê "kabod" e. Ferhenga Strong'ê ya Pirtûka Pîroz vê weke "giraniya tiştekî" pênase dike. Ew di heman demê de mezinahî û şanaziyê jî nîşan dide. Ji ber vê yekê, daxwaza Mûsa ev e: "Xwe bi hemû mezinahiya xwe nîşanî min bide." Bala xwe bidin bersiva Xweda:

> "Xudan got: Ezê hemû qenciya xwe di ber te re derbas bikim, ezê navê xwe, navê Xudan li pêş te eşkere bikim. Zilamê ku ez jê re dilovaniyê dikim ezê dilovan bim, yê ku ez li ber dikevim ezê li ber bikevim." (Derketin 33:19)

Xweda xwesteka Mûsa ya ji bo mezinahiyê weke "hemû qenciya min" bi nav dike. Peyva Îbranî ya ku weke "qenciyê" tê wergerandin tê wateya "qenciya herî ber fireh." Bi gotineke din, tiştek jê nayê veşartin.

Piştre Xweda dibêje: "Ezê navê xwe, navê REB li ber te ragihînim." Berî ku qral bikevin odeya text, berî her tiştî pêşî qasidek navê qral radigihîne. Trompet tên lêxistin û qral bi hemû mezinahiya xwe dikeve odeya text. Mezinahiya qral tê eşkerekirin û di qesrê de guman tuneye bê kî qral e. Lêbelê ji bilî vê eger ev hukumdar bi cilên jirêzê bêyî rêberî di nav gelê xwe de bigere, dibe ku mirov bêyî ku wî nas bikin di ber wî derbas bibin.

Di beşa berî vê de, em hîn bûn ku mezinahiya Reb di rûyê Îsa Mesîh de tê dîtin. Gelek kesan îdîa kirine ku Îsa di dîtinekê de dîtine. Ev pir mimkun e lê wan ew bi hemû mezinahiya Wî nedîtine. Pawlos vê yekê bi vî rengî rave dike: "Çimkî niha em di neynikê de, ne zelal dibînin, lê hingê emê rû bi rû bibînin. Niha ez hinekê dizanim, lê wî çaxî, çawa ku ez tam têm zanîn, ezê tam bizanim" (Korîntî I, 13:12). Mezinahiya Wî di Peymana Kevin de bi ewrekî tarî hatiye veşartin. Çima? Ji ber ku tu mirov nikare li mezinahiya Wî binêre û bijî.

Piştî vejîna Îsa yekem kesê ku pê re axivî Meryema Mejdalînî bû. Lêbelê Meryemê difikirî ku ew baxçevanek e (Yûhenna 20:15-16). Şandiyan li kêleka golê bi Îsa re masî xwarin lê di destpêkê de wan ew nas nekir (Yûhenna 21:9-10). Du xwendekar bi Îsa re di rêya Emmausê de meşiyan, "lê çavên wan ji naskirina wî bêpar hatibûn hiştin" (Lûqa 24:16). Van hemûyan rûyê wî dît ji ber ku mezinahiya xwe bi eşkereyî nîşan neda.

Di Peymana Kevin de, kesên ku REB dîtine hebûn lê ew di nava mezinahiya xwe de nehatiye dîtin. Reb li daristana berûyan ya Mamreyê ji Brahîm ve xuya bû lê xwe di nava mezinahiya xwe de nîşan neda (Destpêk 18:1-2). Yaqûb bi Xweda re bi navê lîst lê bi mezinahiya xwe re pê re nelîst (Destpêk 32:24-30). Yêşû, Reb li nêzî Erîhayê bi şûrekî kişandî ku di destê Wî de bû, dît û jê pirsî gelo ew li aliyê Îsraîlê ye an na. Gava wî fêhm kir ku ew REB e, xwe avêt ber lingê Wî û Ew heband. Lîste bi Gîdeon, dê û bavê Samson û yên din berdewam dike.

Berevajî vê, Yûhennayê şandî, di bin bandora Giyan de li girava Patmosê, Reb bi hemû mazinahiya Wî dît. Yûhenna rûyê Wî şiband rojê ku bi hemû hêza xwe dibiriqe û ew weke miriyekî li erdê dirêj bû. Baş e, Yûhenna çawa dikaribû li Wî binêre? Ji ber ku ew ne di bedenê de bû, ew di giyan de bû. Heman tişt ji bo Îşaya û çend kesên din jî derbasdar e. Ji aliyekî din ve, Mûsa nikaribû li rûyê Xweda binêre ji ber ku Mûsa di bedeneke mirî de dijiya.

Mezinahiya Reb, hemû tiştê ku Xweda dike Xweda ye. Hemû taybetmendiyên Wî, rayedariya Wî, hêza Wî, zanebûna Wî -bi rastî jî giranî û mezinbûna bêpîvan a Xweda. Tiştek nayê paşguhkirin an jî li paş nayê hiştin! Ew, ew kes e ku stêrkan bi tiliyên xwe li cîhên wan datîne û her yekê nav lê dike. Ew, ew kes e ku tevahiya gerdûnê bi tiliyên xwe, bi bihosta xwe dipîve. Ew, ew kes e ku dikare temamiya rûyê erdê weke libek qûmê di destê xwe de bigire. Ew, ew kes e ku dikare her dilopeke avê di kefa destê xwe de bipîve. Ew, ew kes e ku dikare dinya û çiyayan li ser teraziya xwe bipîve. Ew, ew kes e ku em dikarin di dilê xwe de lê binêrin û em bi rûmet li ser rûmetê vediguherin wî, da ku em bibin weke Wî!

Kesê jidil û can ji me hez dike ev e, -ewqasî hez dike ku wî hilbijart ku ji bo gunehên me darizandina giran bide ser xwe da ku em bibin beşek ji malbata Wî. Ez bi we nizanim lê ev yek min pir bi kelecan dike!

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Ma hûn nizanin ku bedenên we endamên Mesîh in? Ma ez endamên Mesîh bistînim û bikim endamên fahîşeyê? Na, tu caran! Ma hûn nizanin yê ku bi fahîşê ve bizeliqe, bi wê re dibe bedenek? Ji xwe hatiye gotin: «Herdu wê bibin bedenek.»” (Korîntî I, 6:15-16).

**Ramana sereke:** Mezinahiya Reb, hemû tiştê ku Xweda dike Xweda ye. Hemû taybetmendiyên Wî, rayedariya Wî, hêza Wî, zanebûna Wî -bi rastî jî giranî û mezinbûna bêpîvan a Xweda. Tiştek nayê paşguhkirin an jî li paş nayê hiştin!

**Ramana kûr:** Ronahiyeke ewqas geş û paqij xeyal bikin ku tu tarîtî, sî, zenûnî, an jî sawêrî (reşahî) nikare hebe. Xeyal bikin ku ev ronahî di dilê min de dibiriqe. Çima ez ê bifikirim ku tiştekî ji Wî veşêrim an jî bixwazim vê yekê bikim? Ev tiştekî bê îmkan e.

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez ji te dixwazim ku ez bikaribim tam di ferqa mezinahiya te de bim. Ez naxwazim ev rastiyeke ne girîng, tiştekî jirêzê an jî tiştekî ku caracaran tê hişê min be; berevajî vê, ez dixwazim ku mezinbûna te her gav ji dinyaya ku dora min dorpêç dike, rasttir be. Bila mezinahiya te her gav li ber dil û hişê min be. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Di Mesîh de, ez ronahiya cîhanê me û mezinahiya Wî nîşanî her kesê ez lê rast têm, dikim.

# MIROV ÇI BE
# DIVÊ WEKE
# XWE BE

**HEFTEYA DUDUYAN**

DIVÊ EM JI BER HEZKIRINÊ JI XWEDA BITIRSIN, NE JI BER TIRSÊ EM JÊ HEZ BIKIN.

– KEŞÎŞ FRANCÎSÊ DE SALES

# 8| NIRXÊ WE

Ev beş wê hin mijarên giran û dibe ku hin mijarên ku hinekan ji we êsîr bigire, di xwe de bihewîne. Naxwe wisa be, berî ku em berdewam bikin, em rawestin û têgihîştina xwe ya hezkirina mezin a Xweda ya derbarê me de, kûrtir bikin. Ez ê bi gotineke bihêz, hema hema yeka tirsnak a Îsa dest pê bikim ku wê bibe beşek girîng a diyaloga me ya di vê beşê de be. Eger di çarçoveya hevgirêdanê de neyê fêhmkirin, ev ayet dikare xelet were şîrovekirin û dibe ku tirsek nexweş belav bike. Ji ber vê yekê, ez ji we dixwazim ku hûn vê gotinê bi dilekî rêzdar û bi stêxwariyekê li ber Xweda bixwînin:

> "Lê ez nîşanî we bidim ku hûnê ji kê bitirsin: Ji wî bitirsin, ku piştî dikuje, dikare bavêje dojehê; erê, ez ji we re dibêjim ku ji wî bitirsin!" (Lûqa 12:5)

Îsa ji me re dibêje ku em ji Xweda bitirsin û ew vê tenê carekê nabêje, ew vê fermanê dubare dike û li ser disekine. Daxuyaniya balkêş ya bi rastî jî ev hevoka ecêb e: "dikare bavêje dojehê." Ev zimaneke bihêz e! Lêbelê li hevoka din binêrin:

> “Ma pênc çivîk bi du peran nayên firotin? Lê dîsa Xwedê yek ji wan jî ji bîr nekiriye. Wisa jî hemû mûyên serê we hejmartî ne. Loma netirsin, hûn ji gelek çivîkan hêjatir in.” (Lûqa 12:6-7)

Bala xwe bidin ferqa di navbera “Ji Xweda bitirsin” ya di ayeta 5an de û “Netirsin” ya di ayeta 7an de. Careke din, em ferqa di navbera “tirsa pîroz” û “tirsa ne pîroz” de dibînin. Ez qet nikarim têra xwe diyar bikim ku tirsa pîroz nayê wê wateyê ku mirov ji Xweda bitirse û ji ber vê yekê ji Wî vekişe, lê tirsa ne pîroz tê wê wateyê û vê yekê dike. Girîng e ku em ferqê bizanibin û em mecbûr in xwe li ser vê rastiyê ava bikin.

Îsa bi îfadeyeke tund, hema bêje bi yeka tirsnak dest pê dike lêbelê di heman demê de ew nirxa me ya bêhempa di çavên Xweda de rave dike. Di esasê xwe de, ew rave dike ku Xweda pir qîmetê dide me û ji ber vê yekê diyariya tirsa pîroz daye me. Ev diyarî me nêzîkî “Jiyanbexş” (yê ku jiyanê dibexşîne) dike û me ji “tirsa mirovan” ya ku bi temamî berevajiya tirsa pîroz e, dûr dixîne. Ev her du, wê bibin beşek girîng a nîqaşa me ya berdewam lê berî ku em dest pê bikin, em ê li ser nirxa xwe biaxivin.

Li gorî Îsa, Xweda ewqasî qîmetê dide we ku Ew bi hejmara porê serê we jî dizane. Li gorî lêkolînên zanistî ku texmîn dikin bi serê mirovekî ve 100.000 tayê por hene. Eger hûn 10.000 kesan têxin odeyekê, hûn dikarin pê derxin bê ka bi serê kê ve 99.569 mû hene? Eger hûn rast texmîn bikin jî, hûn ê di nav çend deqeyan de xelet bibin, ji ber ku mirovek di nava rojekê de 50 heta 100 tayê porê wî diweşe. Lê Xweda her gav bi hejmara rast dizane! Ev ji me re çi dibêje? Em pir bi qîmet in û Ew her gav li me difikire. Dawid wisa dinivîse:

> “Fikrên te yên ji bo min, çiqas bi rûmet in, ey Xwedê, Tevahiya wan, çiqas pirr in! Eger ez wan bijmêrim, ji sêlakê zêdetir in. Ez hişyar dibim, hê ez bi te re me.” (Zebûr 139:17-18)

Hemû libên qûmê! Li hemû libên qûmê yên li ser rûyê erdê bifikirin -li her berav, çol an jî qadeke golfê. Ev hejmareke hişê mirov tê nagihêje! Meraqdarên zanist û matematîkê, li gorî mezinahî û bê çiqasî bi ser hev de hatiye eciqadin de, texmîn dikin ku li metreyeke plajê li dor pênsed milyon û milyareke libên qûmê hene. Tenê li beravên Florîdayê hişê me

tênagihêje bê çend libên qûmê hene. Lê ka lê bifikirin -her çiqasî hûn hemû libên qûmê yên li ser gerdûnê berhev bikin jî, hûn ê dîsa jî negihîjin hejmara ramanên ku Xweda li ser we dike!

Vê pirsê ji xwe bikin: Hûn bi piranî li ser çi difikirin? Hûn kêm caran li ser tiştekî ku hûn qîmetê nadinê difikirin. Ez û Lisa her sal di Noelê de, dema ku em diçin dolaba depoya xwe, tiştên ku em kifş dikin hene. Ez peyva "kifşkirinê" bi kar tînim ji ber ku ez ji bîr dikim ku em xwediyê wan in. Ez di nava salê de carekê jî li ser van tiştan nafikirim ji ber ku ew ne bi qîmet in. Lêbelê eger ez hemû ramanên xwe yên li ser Lisa di çil salên zewaca me de bi hejmar bikim, belkî ez karibim qedehekê avê bi libên qûmê tije bikim. Ev nêzîkî du sed milyon raman dike ku her ji 6.3 saniyeyan ramanek dike. Mêrek ku pir li ser jina xwe difikire, ev weke ku ji wê pir hez dike tê hesibandin.

Ramanên Xweda yên derbarê we de ji hemû libên qûmê yên li ser rûyê erdê zêdetir in! Ma hûn dikarin vê yekê fêhm bikin? Tiştê mirov şaş dimîne ev e: Xweda tiştan mezin nake! Her çiqasî em hemû bi mirovên ku tiştan mezin dikin û daxuyaniyên dûrî rastiyê didin dorpêçkirî bin jî, Xweda ji rastiyê piçikekî jî dûr nakeve, Ew derewan nake. Ji ber vê yekê, diyarkirina Wî ya ku ramanên Wî yên derbarê we de ji hemû libên qûmê yên li ser rûyê vê erdê zêdetir in, meseleyeke cidî ye! Werin em hîn bi pêştir ve biçin. Bi rastî nirxê me tam çi ye? Nirx, ji aliyê kesê dikire ve tê diyarkirin. Kurê min beşdarî mezadeke werzîşê bû ji ber ku şîrketa wî dixwest cilê ku lîstikvanê basketbolê Bill Russell di lîstikeke şampiyoniyê ya salên 1960'î de li xwe kiribû, bikire. Ji ber ku teklifa herî bilind gihîşt 1.044.000 dolarî, wan dev ji kirîne berda! Her çiqasî Bill Russell lîstikvanekî pir mezin bû jî, ez bi xwe ji bo cilê wî, an jî cilê lîstikvanekî din ê NBA-yê ji çend sed dolaran zêdetir nadim. Ev tenê perçeyekî cil û bergan e.

Pirs, ne ew e ku nirxa me ji bo mirovan çi ye, ji ber ku ev diguhere. Jixwe, di mijara nirxdayînê de ya ku dinya mirovan bi qedir û qiymet dike, dinya ne xwedî sicîleke baş e. Bi mîlyonan pitik di malzaroka dêya xwe de têne kuştin. Gelo mirovan qedir û qîmet dida jiyana van pitikan? Îcar jinên ku dikin karkerên seksê û bi zorê tên revandin? Ji ber kesên ku wan neçarî vê rewşê kirine, nirxa wan daketiye çend qirûş dolaran.

Li vê gerdûnê yê ku pîvana rastîn a nirxdayînê diyar dike Xweda ye, ne mirov. Û heta ji bo tiştên ku em pir girîng dibînin jî, Îsa tîne bîra me ku “tiştên mirov pê serbilind in, ji Xweda ve beradayî xuya dikin” (Lûqa 16:15). Heta, ew vê îfadeya balkêş jî bikar tîne: “Mirovek hemû dinyayê bi dest bixe jî, lê jiyana xwe winda bike, çi feyda wî heye? An dikare çi di ber jiyana xwe de bide?” (Metta 16:26).

Ka kêliyekê li hemû dewlemendiyên cîhanê bifikirin. Li xaniyên ku bi mîlyon dolaran in, mal û milkên xweşik, li gewheran, metalên hêja, erebeyên biha û hêja, li yat û balafiran bifikirin. Hema bibêjin hemû nayên xeyalkirin jî. Li gorî lêkolînên dawî hilberîna navxweyî ya giştî ya cîhanê li dor 84.97 trîlyon dolarî ye. Ev mîqdareke wisa ye ku hişê mirov tênagihêje. Lê dîsa jî Îsa ji me re dibêje ku eger hûn jiyana xwe bi van hemûyan biguherînin, hûn ê xisareke mezin bibînin!

Baş e, îcar nirxê we çi ye? Pawlos wisa dinivîse: “Çimkî hûn bi bihayekî hatin kirrîn” (Korîntî I, 6:20). Bihayê ku Xweda ji bo we daye di van gotinan de tê dîtin: “Çimkî Xwedê wisa ji dinyayê hez kir ku Kurê xwe yê yekta da” (Yûhenna 3:16). Çi gotineke mezin yaw! Ev ji formayê Bill Russell pir zêdetir e! Xweda nirxê me, weke hebûna xwe ya herî hêja nirxand. Ha rastiya mirov lê şaş dimîne ev e: Eger em di çavên Xweda de ji Îsa qurûşekî kêmtir bûna, wê demê wê ev danûstandin çênebûya ji ber ku Xweda ji bo tiştekî kêm qîmet, tiştekî bi qîmettir nade û peymaneke bê fêde nake. Hûn fêhm dikin bê hûn ji bo Xweda çiqasî bi qedir û qîmet in?

Hezkirina Xweda ya ji bo we çiqas bêhempa ye? Îsa di duaya xwe de ev gotina bi rastî ecêb got:

> “Ez bi wan re, tu jî bi min re, da ku ew bigihîjin yekîtiyeke temam û dinya bizane ku te ez şandime û çawa ku tu ji min hez dikî, tu ji wan jî hez dikî.” (Yûhenna 17:23)

Ne pêkan e ku mirov vê fêhm bike! Xweda bi qasî ku ji Îsa hez dike, ji we jî hez dike! Lêbelê dibe hûn bifikirin ku *ew tenê behsa xwendekaran* dike. Ev xelet e, ji ber ku Îsa wisa diyar dike: “Ez ne tenê ji bo wan, ji bo kesên ku bi gotinên wan ji min bawer dikin jî ez daxwazan dikim”

(Yûhenna 17:20). Eger hûn baweriya xwe bi Îsa Mesîh tînin, hûn vê yekê rasterast an jî nerasterast bi rêya şahidiya şandiyan hûn dikin. Kûrahiya hezkirina Xweda û qîmeta ku Xweda dide we, di ser her tiştî re ye.

Piştî ku ev rastî bi awayekî teqez hatiye destnîşankirin, em berdewam bikin li ser nîqaşkirina vê yekê, bê ka çima diyariya tirsa pîroz di têkiliya me de bi Wî re ewqas girîng e.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Kes nikare bedelê jiyana birayê xwe bide, Li ba Xwedê fîdye çênabe. Ji ber ku biha ye fîdya can, Kes wê nade ber çavan. Eger ne weha be, Wê her û her bijî însan. Nebîne rûyê goran.” (Zebûr 49:7-9)

**Ramana sereke:** Çi mirovê xwedî aqil bazareke bêfêde nake -ew tiştekî bi qîmet nade bi tiştekî kêm qîmettir. Bi heman awayî, Xweda jî qet bazareke bêfêde nake. Bedela ku Xweda ji bo we da, jiyana Kurê xwe yê yekta bû, ango bi qasî ku qîmetê dide Îsa, qîmetê dide we jî. Ev di heman demê de tê wê wateyê ku Xweda; bi qasî ku qîmetê dide Îsa, qîmetê dide mirovên li derdora we jî.

**Ramana kûr:** Gava ku ez qîmeta mezin ya ku Îsa dide jiyana min di ber çavan re digirim, îcar ez aniha xwe çawa dibînim? Ev yek çawa bandorê li ser raman û tevgerên min ên li hemberî mirovên ku ez rojane rastî wan têm, dike?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez spasiya te dikim ku te jiyana min hêjayî wê dît ku Tu Îsa di bedêla min de bihêle ku bimire. Reb Îsa, ez spasiya te dikim ku te cîhê min girt û darizandina min hilgirt û te ji xwe bêtir qîmet da min. Giyanê Pîroz, ez ji te dixwazim ku tu têgihîştineke xurt bidî dil û hişê min bê ka tu çiqasî ji min hez dikî û qîmetê didî min, ji bo ku ez jî bi heman awayî ji yên din hez bikim. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Weke ku Xweda ji min hez dike û qîmetê dide min, ez ê jî ji yên din hez bikim û qîmetê bidim wan.

DEMA KU HEZKIRINA XWEDA TÊ WAZKIRIN, XETEREYEK HEYE KU WERE JIBÎRKIRIN KU NIVÎSÊN PÎROZ DI SERÎ DE NE HEZKIRINA XWEDA LÊ PÎROZIYA WÎ YA WÊRANKER KU HEZKIRIN DI NAVENDA WÊ DE YE, RAVE DIKE.

– OSWALD CHAMBERS

# 9| LIHEVKETINA KUJER

Di beşa yekem de, me li ser mezinahiya Xweda nîqaş kir, tenê me di ser re behs kir. Di vê beşê de, em ê li ser mezinahiyên cûrbecûr ên hebûna Xweda zîq bibin. Werin em bi vegera serdemekê dest pê bikin dema ku Xwedayê Mezin çû serdana konekî -em herin wê serdema ku dema gelê Îsraîlê li beyebanê rêwitî dikir.

Piştî xebatên dirêj, berfireh û aloz, Konê Civînê ji aliyê tîmeke karkeran ve hate çêkirin. Ew li gorî plana ku Xweda li çiyê dabû Mûsa hate çêkirin û modeleke nimûne ya konê ezmanî bû (Îbranî 8:1-5). Dema ku kar qediya, Xweda hebûna xwe ya bi heybet eşkere kir:

> "Ewr ser Konê Hevdîtinê nixamt û rûmeta Xudan mesken dagirt. Mûsa nikaribû biketa Konê Hevdîtinê, çimkî ewr li ser wê disekinî û rûmeta Xudan mesken dagirt." (Derketin 40:34-35)

Xweda careke din bi ewrekî reşî tarî Îsraîl ji mezinahiya xwe parast. Bi gelê xwe yê delal re wê bi awayekî bijiya ku gel bikaribe xwe li ber vê bigire. Tenê wê destûra serkahîn bihata dayîn ku salê careke bi xwîna

heywanan bikeve Cîhê Herî Pîroz. Yên ku di vê peywirê de bûn ji aliyê Xweda ve hatibûn tayînkirin û yê yekem Harûnê birayê Mûsa bû.

Rojekê, du kurên Harûn ku weke wî kahîn bûn, ketin kon û “agirek li dijî fermanên Reb pêşkêş kirin” (Lêwiyî 10:1). Li ser tiştê ku bi rastî qewimî nêrînên cuda hene lêbelê ji bo ku em bigihîjin dilê meseleyê, em kiryarên wan derbas bikin û li ser niyetên wan zîq binin. Pênaseyeke îfadeya “dijber” ev e: “bêrêziya li himberî tiştekî pîroz e.” Ev tê wê wateyê ku tiştê pîroz weke tiştekî jirêzê an jî derasayî bê hesibandin. Di esasê xwe de, kurên Harûn bi bêrêzî hatin hizûra Xwedayê mezin û bi rûmet. Tiştê ku piştre qewimîn hişyarker in, heta tirsnak e:

> “Agirek ji hizûra Xudan rabû û ew daqurtandin. Ew li hizûra Xudan mirin.” (Lêwiyî 10:2)

Ev herdu zilamên ku ji bo derkevin hizûra Xweda rayedar in, ji ber bêrêziya xwe di cîh de mirin. Gelo Xweda bi bêrehmî êrîşî wan kir? Na, wan xwe bi destê xwe xistin xetereyê. Bi vî awayî li vê yekê bifikirin: Dinya 150.000.000 kîlometre dûrî rojê ye. Ji bo gelek mirovan ku xwe li peravan didin ber rojê, kêfek e lêbelê eger kêfa we ya ku hûn xwe didin ber rojê 10.000 kîlometre dûrî rojê pêk bê, hûn ê di cîh de bimirin.

Wan xeletî kir ku haya wan pir ji hebûna pîroz û mezin a Xweda hebû û di dawiya dawî de bi awayekî wisa tevgeriyan ku felaketek hat serê wan. Li van gotinên ku Mûsa piştî mirina kurên xwe, ji Harûn re got, guhdarî bikin:

> “Xudan gotibû: Bi saya kesên ku nêzîkî min dikin, Ezê pîroziya xwe nîşan bidim. Li ber çavê tevahiya gel, Ezê birûmet bim.” (Lêwiyî 10:3)

Tiştê ku Mûsa diyar kiriye fermaneke gerdûnî û ebedî ye. Gerdûniya wê tê wê wateyê ku ew ji bo her hebûneke afirandî derbas dibe ku ev çi mirov be û çi jî ferîşte be. Ebediya wê jî tê wê wateyê ku tiştê ku her gav hebûye, wê her gav hebe -ew ê qet neguhere. Hûn tenê bi dil û helwesteke rêzdar dikarin nêzîkî hizûra Wî bibin. Em li wê êvara li Brezilyayê bifikirin. Gava ku ba dihat li hizûra bêhempa ya Xweda, ez bi tirsa pîroz re matmayî mam. Eger ez tam bînim ziman, ramana ku di

serê min de diçû û dihat, ev bû: John Bevere; eger tu tenê gaveke şaş biavêjî, tenê peyveke xelet bibêjî, tu zilamekî mirî ye!

Bi rastî wê ev bibûya gelo? Ez teqez nizanim lê tişta ku ez ê karibim teqez bibêjim, di Peymana Nû de jinek û mêrek li cîhekî weke hev eger tevgereke şaş û xelet bikin, dimirin (Karên Şandiyan 5:1-10). Ev jin û mêr, li ber rêberên dêrê û li ber bawermendên din pêşkêşiyek kirin. Lê dîsa jî li dû hev mirin û hatin veşartin. Gava ku ev bûyer qewimî, bawermendên din çawa tevgeriyan?

> "Tirseke mezin ket ser tevahiya civîna bawermendan û ser hemûyên ku ev tişt bihîstin." (Karên Şandiyan 5:11)

Çend tiştên ku divê mirov baladarê wan be. Nabêje "Tirseke mezin bajêr dorpêç kir." Na, dibêje "Tirseke mezin ket ser tevahiya civîna bawermendan." Ya din jî baldar bin ku tenê nabêje, "tirs" dibêje, "tirseke mezin." Nivîskarên Îbranî, weke em di çanda Rojavayî de her dem meseleyê mezin dikin, nakin. Gotina ku di Nivîsên Pîroz de dibêje "tirseke mezin," ev nîşan dide ku asta tirsa pîroz pir bi hêz e.

Di beşa 2. a Karên Şandiyan de, gava ku Giyanê Xweda di Roja Pentîkostê de rijiya, hin kesên li dora wan difikirîn ku xwendekaran di saet nehê sibehê de şerab vexwarine û serxweş ketine. Rawestin û bifikirin bê ka kesekî serxweş çawa tevdigere. Ew bi gelemperî ne bêdeng û ne fedyokî ne, berevajî vê, pirî caran ew bi ken in û kêfa wan li cîh e. Ew atmosfera wê roja girîng ha wisa bû. Hebûna Xwedayê me yê dilovan, bi zewq û xweş bû. Lêbelê gava hebûna wî ya mezin û heta ya tirsnak, ji bo darizandinê di nav heman mirovan de xuya bû, dêr bi tirs û heybeteke mezin tijî bû. Vê bûyerê hişmendiya wan a di derbarê pîroziya Xweda de bi awayekî girîng zêde kir.

Gelek caran ji min tê pirsîn: "Çima di demên nûjen de mirov nakevin û namirin?" Ev pirsek baş e. Vî jin û mêrî derew li Petrûs û di dawiya dawî de li Giyanê Pîroz kir. Di sedsala bîst û yekê de gelek pastoran derew kirine, baş e îcar çima ew kesên ku sûcan dikin heman çarenûs para wan nakeve? Werin em li tiştê ku piştî mirina vî jin û mêrî di cîh de bûye binêrin:

> "Wisa ku xelkê nexweşên xwe derdixistin kuçeyan, ew li ser doşek û şeltan vedizelandin, da ku gava Petrûs derbas bibe, qet

> nebe siya wî bikeve ser hinekan. Gelek mirov ji bajarên der û dora Orşelîmê jî civiyan, nexweş û yên ku ji ruhên nepak cefa dikişandin anîn, ew hemû jî sax bûn." (Karên Şandiyan 5:15-16)

Gava mirov li ser vê bûyerê difikire hişê mirov disekine. Bala xwe bidin peyva "kuçeyan" (pirjimar)! Û yên ku baş bûn ne "hinek" bûn, lê "hemû" bûn! Werin em vê yekê li gorî demên nûjen li hev bînin. Wê Petrûsê Şandî, biketa nexweşxaneyeke mezin û di korîdoran re derbas bibûya û nexweşên li her qatê rehet û bi silametî bikirina. Hêzeke ewqasî mezin tenê di hebûna mezin ya Reb de dikare bê dîtin.

Werin em vê yekê bi mînakeke din a ji Pirtûka Pîroz piştrast bikin. Bi sedan salan piştî tiştê ku bi serê her du kurên Harûn de hat, du bira, Hofnî û Pinehas, ku ew jî kahîn bûn, bi jinên ku li ber deriyê Konê Civînê kom bûbûn re zinê dikirin. Wan ev yek hema hema nod metreyî dûrî cîhê ku kurên Harûn lê hatibûn kuştin, dikirin! Weke ku ev ne bes be, wan gef li perestvanan dixwarin û qurbanên wan ji wan distandin. "Kurên Elî gelek xerab bûn, wan Xudan nas nedikir. Guh nedidan rêznameya kahinan a li ser xelkê" (Samûêl I, 2:12-13). Xweda derbarê van zilaman de wisa got: "Ji ber vê yekê min sond xwar û got: Wê gunehê Mala Elî bi tu awayî ne bi qurban, ne jî bi pêşkêşiyê were bexişandin" (Samûêl I, 3:14). Hûn qet naxwazin van gotinan ji devê Xwedayê Mezin bibihîzin!

Reftarên wan li hemberî Xweda pir êrîşkar bûn, heta çend dereceyan ji kurên Harûn bêrêztir bûn lêbelê dîsa jî ev zilam di heman konî de di cîh de nemirin. Çima? Bersiv di van gotinan de ye: "Di wan rojan de gotina Xudan kêm dihat. Dîtinî jî kêm bûbûn" (Samûêl I, 3:1). Kêmdîtina Gotina Xweda ya hatiye wehiykirin, nîşan dide ku hebûna Wî ya eşkere tuneye, ev ji xizmeta hebandina li Brezîlyayê ne cudatir e. Lêbelê di dema Mûsa de, hebûna Wî tam eşkere bû.

Ji van mînakan em dikarin encameke çawa derxînin? Mezinahiya Xweda ya eşkere çiqasî mezin be, darizandina bêrêziyê jî ewqasî mezin û xurt çedibe. Ji ber vê, darizandina derengmayî ne betalkirina darizandinê ye. Ji ber vê Pawlos wisa dinivîse:

> "Gunehên hin mirovan kifş in û ji berî wan diçin ber dîwanê, lê gunehên hinekan jî li pey wan tên." (Tîmotêyos I, 5:24)

Rewş çi dibe bila bibe, wê aqilmend be ku mirov qet rê nede helwesteke bêrêz, bêxem an jî ya sivik ya li hemberî Xweda. Ya rastî, gava ku mezinahiya Wî eşkere nebe, xeternaktir e. Çima? Ji ber ku nebûna darizandinê, hêsantir e ku mirov ji xapandinê bawer bike ku em tên pejirandin û bikevin nav bêrêziyê. Eger ev bibe, weke ku em ê di beşa bê de bibînin, em dikarin bi hêsanî bikevin wê baweriyê ku Xweda xema bêrêziya me naxwe.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Xudan gotibû: "'Bi saya kesên ku nêzîkî min dikin, Ezê pîroziya xwe nîşan bidim. Li ber çavê tevahiya gel, Ezê birûmet bim.'" Harûn bêdeng ma." (Lêwiyî 10:3)

**Ramana sereke:** Mezinahiya Xweda ya eşkere çiqasî mezin be, darizandina bêrêziyê jî ewqasî mezin û xurt çedibe. Ji ber vê, darizandina derengmayî ne betalkirina darizandinê ye.

**Ramana kûr:** Gava ku Gotina Xweda tê hînkirin an jî gava di jiyana rojane de ez ji Reb re duayan dikim, li dêrê, di hebandinê de ez çawa nêzî Reb dibim gelo? Gelo gava ez nêzî Wî dibim, min helwesteke bêxem pêşxistiye? Gelo min ji bîr kiriye ku Ew ne tenê Bavê min e, lê di heman demê de Xwedayê pîroz e ku agirekî dişewitîne û wêran dike?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji ber ku ez bi awayekî bêxem û bêrêzî nêzî Te bûm ez lêborîna xwe dixwazim. Min ji bîr kir bê Tu kî ye û ez pir hînî Te bûm. Ez tobe dikim û êdî ez ê te weke "heval"ê xwe nebînim lê ez ê te weke Xwedayê pîroz bihesibînim û rêzê li Te bigirim. Ez ji Te re spas dikim ku Tu ewqasî dilovan û bi merhamet î û ji bo ku Te ez ji ber bêrêziya min, bexşandim jî spasdarê Te me. Ez bi navê Îsa duayan dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Xweda, hebûna xwe çiqasî bi hêz an jî bê hez nîşan bide jî bila bide, ez ê jê re rêzê bigirim.

“HEMÛ RIYÊN MIROVAN LI BER ÇAVÊN XUDAN IN,

EW HAY JI HEMÛ RIYÊN WAN HEYE.”

– ŞÎRETÊN SILÊMAN 5:21

# 10| GELO XWEDA JI BÎR KIR?

Weke ku berê jî hatiye gotin, tirsa me ya pîroz li gorî têgihîştina me ya mezinahiya Xweda mezin dibe. Berevajî vê jî rast e: Em çiqasî kêmtir jê bitirsin, em mezinbûna Wî, heta ku bigihêje sînorên mirovî jî, em kêmtir dikin.

Pergala vê dinyayê weke çemekî ye ku li dijî jiyana mirovan diqelişe û li dijî wan derdikeve, bi armanca kêmkirina mazinahiya Xweda vê dike. Esas û bingehê vî çemî ji gotin, raman, wêne, vîdeyo an jî ji her rêbazeke din pêk tê ku dikare were bikaranîn ji bo ku mirovê mirî bi lêçûna kêmkirina mezinbûna Afirînerê me were rûmetdarkirin.

Kesekî ku ji tirsa pîroz bêpar e, bi hêsanî li ber vê hêzê têk diçe û bawer dike ku Xweda kirinên wî ferq nake an jî wan bi tiştekî nahesibîne. Ramanên weke van di serê wî de çêdibin: “Ez îstîsnayek im, ez mûaf im, ez ji piraniya mirovan ne cuda me, Xweda xwe ji niyet, gotin an jî kirinên min nebihîstî dike, gelek tişt hene ku Xweda nikare hemûyan bişopîne bê çi dibe û çi nabe.”

> “Di dilê xwe de dibêjin, «Ji bîr kir Xwedê, Nixamt rûyê xwe, hew dibîne vê.»” (Zebûr 10:11)

Cûrbecûr guhertoyên vê zîhniyeta xelet û xeternak hene lêbelê hemû di rastiyê de bi kêm dîtina hêza Xweda ve girêdayî ne. Ev ji wê ramanê ne cuda ye ku dêûbav, patron, mamoste, rahêner an jî rêberên din ku tevgera me teqdîr nekin an jî bala xwe nedin wê. Yên ku dikevin vê xefikê, bi baweriya ku pir hûrgulî hene ku mirov lê binêre, xwe teselî dikin û bi vî rengî hêza Xweda kêm dibînin.

Werin em gaveke din biçin bi pêş ve. Eger kesek di vê rêya şemitok de berdewam bike û ji tirsa pîroz dûr bikeve, ew dikeve bin gefa ramaneke şeytanî ku dibêje, “Xweda niyetên min, gotinên min an jî kirinên min nabîne.” Bawerkirina ku Xweda naşopîne bêrêzî ye, ramana ku dibêje, “Ew nikare bişopîne” asteke hîn mezintir a bêrêziyê ye!

Mimkun e ku em gotin, kirin û niyetên xwe ji mirovên din veşêrin. Em dikarin bi dizî, di tariyê de, heta di bin siyê de jî bixebitin, ji bo ku kesên din ferq nekin. Lêbelê gava ku em bawer bikin ku em dikarin raman an jî rêyên xwe ji Xwedayê Mezin veşêrin, em wê demê xwe dixapînin. Ev texmîna xelet, çi bi hişmendî be û çi jî bê hişmendî be, di giyanekî de ku ji tirsa pîroz bêpar e, tê dîtin. Nivîsên Pîroz ji me re wisa dibêjin:

> “Wey li kesên ku pîlanên xwe Ji Xudan di kûrahiyê vedişêrin. Karên wan di tariyê de ne. Ew dibêjin: Ma kî me dibîne? Ma kî bi me dizane?” (Îşaya 29:15)

Di destpêkê de, dibe ku hûn bifikirin ku Îşaya behsa xeraban dike, ango bêbawerên ku naçin dêrê an jî ji bo hebandinê kom nabin. Lêbelê dîsa jî yên jorîn bi taybetî ji bo kesên ku îdîa dikin ku bawermend in hatiye nivîsandin. Ev rast e ji ber ku berî vê ayetê em van dixwînin:

> “Reb got: Ev gel bi devê xwe nêzîkî min dibe Û bi lêvên xwe rûmetê dide min. Lê dilê wan ji min dûr e. Tirsa wan a ji min jî, Tenê emrên mirovan in Ku ji wan hîn bûne.” (Îşaya 29:13)

Destûrê bidin ku ez vê yekê bi awayekî ku bi serdema me ve girêdayî ye vebêjim. Ev kes îdîa dikin ku bi Îsa re di nav têkiliyê de ne ji ber ku

ew bi kerema Wî hatine xelaskirin. Ew bi gotinên xwe Wî bi rûmet dikin, beşdarî konferansên Xirîstiyanan dibin û li ser Spotifyê li îlahiyan guhdar dikin -lêbelê li cîhekî giyanê xwe, ew bawer dikin ku Reb nikare raman û kiryarên wan bibîne an jî bibihîze. Rewşa wan a hişî ji ya gelek kesên ku qet nedane dû şopa Îsa, xerabtir e. Ew baweriya xwe bi derewekê tînin û ya xerabtir, haya wan ji bêaqiliya wan tuneye.

Hûn dikarin nerazîbûnê nîşanî vê bidin û bibêjin, "Nabe! Evqasî jî nabe." Lêbelê dîsa wan jin û mêrê ku me di beşa berê de behsa wan kir, di ber çavan re derbas bikin: Hananya û Safîra (Karên Şandiyan 5). Çîroka li pişt vê meseleyê, ji bo têgihîştina tevgerên xelet ên vî jin û merî girîng e. Çîroka wan ya rastî di beşa 4an de dest pê dike:

> "Bi navê Ûsiv yekî Lêwî ji Qibrisê hebû. Şandiyan jê re digot Barnabas, ku bê wergerandin: «Kurê handanê»." (Karên Şandiyan 4:36)

Di wê serdemê de, Qibris giraveke dewlemend bû bi madenên hêja, kanên sifir û hesin û rezervên mezin ên kereseteyan. Ew bi gul, fêkî, şerab û rûnê xwe navdar bû. Eger li Qibrisê erdê we hebûya, bi îhtîmaleke mezin rewşa we ya aboriyê baş bû.

Vê jî xeyal bikin: Lewiyiyekî dewlemend ku ji Qibrisê dihat, pereyekî pir gelek ku erdê xwe firotibû û bi dest xistibû, ji bo ku li ber çavê hemû dêrê bide, anîbû. Piştî vê çi dibe?

> "Îcar mirovekî ku navê wî Hananya bû, bi jina xwe Saferyayê re milkek firotin." (Karên Şandiyan 5:1)

Destpêka ku beşa pêncemîn bi vî awayî dest pê dike, girêdana wê ya bi çîroka di dawiya beşa çaremîn de nîşan dide.

Ev kesê dewlemend yê ku nû hatibû tevlî dêrê dibe û pêşkêşiyeke mezin ku her kesî dît, bi xwe re tîne. Xelata ku da bandorekê li ser vî jin û mêrî dike. Di cîh de milkekî difiroşin û...

> "Haya jina wî jî jê hebû, ku wî hinek ji peran ji xwe re hilanî û hinek jê anî û li ber lingên Şandiyan danî." (Karên Şandiyan 5:2)

Çi hişt ku ev bertek dest pê bike? Gelo heta wê demê vî jin û mêrî dikaribû navûdengê mezintirîn bexşvanên dêrê bi dest xistibana? Eger wisa be, gelo bala rêber û raya giştî kişand? Divê em ji bîr nekin ku dayîn diyariyek e û her weke ku gelek kes diyariyên cûrbecûr nas dikin û heta pesnê wan didin (weke xizmetkirin, hînkirin, mêvanperwerî, waz, rêbertî û yên din) comerdî jî ne îstîsna ye û tê pîrozkirin (Korîntî II, 9:12-13). Gelo vî jin û mêrî ji rêz û baldariya ku li wan hat nîşandan, kêfxweş bûn? Gelo îtîbara wan ji hêla vî zilamê nû ve di bin gefê de bû? An jî temamiya civakê diyariya wî ya mezin pîroz dikir, qala wê yekê dikir ku ev pere çawa alîkariyeke mezin bû ji bo mizgînî û dayîna ji bo feqîran û êdî xema Hananya û jina wî nedixwarin?

Belkî jî vî jin û mêrî dixwestin baldariya ku winda kiribûn ji nû ve bi dest bixin, ji ber vê yekê wan bi firotina milkekî re bersiv dan -bêguman ew serweta wan a herî mezin bû. Ew wisa fikirîn: “Ev gelek pere ye ji bo ku mirov dev jê berde. Lê em dixwazin wisa xuya bikin ku em her tiştî xwe didin. Ji ber vê yekê em tenê perçeyekî bidin lê em bibêjin: ‘Pereyê ku me hemû stend ev e.’” Ev ramana xapînok, dibe ku bi mantiqa ku ew ê yên din jî teşwîq bike ku diyariyên mezin bidin, hatibe bi hêzkirin.

Şikl û şemal ji rastiyan girîngtir bû û ev yek bû sedema xapandinê. Ev jin û mêr, çawa fikirîn ku haya Xweda ji tiştê ku diqewime tuneye?

Ew berê li ser vê nêzîkbûnê fikirîbûn, plan kiribûn û li hev kiribûn. Bi baweriya ku ew dikarin planên xwe ji Reb veşêrin, wan xerabiyên xwe di tariyê de kirin! Û di cîhekî giyanê xwe de, ew fikirîn ku Reb wê nebîne bê ka çi diqewime! (Hema bêje jêgirtinek rasterast ji Îşaya 29:15ê). Lêbelê ev bawerî bû sedema ku her du jî jiyana xwe ji dest bidin, her du jî di heman rojê de hatin veşartin!

Di beşên berê de piştî ku ev her du bawermend bûn şahidê mûcîzeyan (bayê ku ji ezmanan dihat û ev bûyera ku bala temamê bajêr dikişand ser xwe, bi hezaran kesên ku piştre hatin rizgarkirin, zilamê qotî yê ku bi mûcîzeyî dimeşiya, hêza Xweda ya ku avahiyek dihejand û hwd.) çawa dikarin bawer bikin ku ew dikarin niyetên xwe ji Xwedayê Mezin veşêrin? An jî Adem û Hawaya ku li bexçe bi Xweda re meşiyan, piştî ku guneh kirin îcar çawa bawer kirin ku wê ji Xweda vê guneha xwe veşêrin? (Destpêk 3:8)

Gelê Îsraîlê çawa li xwe danî û got “REB nabîne!” (Hezekiyêl 9:9)

An jî hûn ji vê îfadeya ku mirov matmayî dihêle re çi dibêjin: “Wî ji min re got: “Ya kurê mirovan, gelo te dît ku rîspiyên Mala Îsraêl di tariyê de, di odeyên pûtên xwe de çi dikirin? Çimkî ew dibêjin: ‘Xudan me nabîne, Xudan dev ji welêt berda.’” (Hezekiyêl 8:12).

Em gelek caran difikirin ku bi bêaqiliyê em dikarin ya dilê xwe ji Reb veşêrin?

Bi kurtasî, ev senaryo hemû; rehekî hevpar yên vê xeteya mezin parve dikin: Nebûna tirsa pîroz. Bi qasî ku em ji wê bêpar in, şiyanên Xweda di giyanên me de kêm dibin û tiştа herî tirsnak ew e ku haya me ji rewşa me tune be, ji ber ku têgihiştina me qels dibe. Ev ew mijar e ku em ê di çend beşên pêş de li ser biaxivin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Û ezê li zarokên wê bixim û bikujim û hemû civîn wê bizanin ku yê li dil û daxwazan dikole ez im û ezê li gor kirinên her yekî ji we bidim we.” (Peyxam 2:23)

**Ramana sereke:** Xweda ne tenê bi tiştê em dikin dizane, di heman demê de bi sedem û niyetên li pişt kirinên me veşartîne jî dizane.

**Ramana kûr:** Gelo ez her dem bi wê hişmendiyê dijîm ku haya Xweda ji raman, xwestek û niyetên min ên herî kûr dizane? Ez çawa dikarim hişmendiya xwe ya derbarê vê rastiyê de bi pêştir bixim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez dixwazim ku xwestek û niyetên min weke yên Îsa pak û paqij bin. Destûrê bide ez hemû raman, xwestek, gotin û kiryarên xwe bi hişmendiya ku Tu bi berdewamî rêyên min dinirxînî, parzûn bikim. Dixwazim ev rastî di têgihîştina min a ji bo Te de qet kêm nebe. Ez bi navê Îsa duayan dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê bi hişmendiya ku haya Xweda bi temamî ji niyet, raman, gotin û kirinên min heye, bijîm.

# “LOMA ÇIMA EV GEL AVERÊ DIBE”

– YÊREMYA 8:5

# 11| TIRS Û RÊZGIRTIN

Hebûna Xweda ya bi heybet û di encama vê de, darizandina Hananya û Safirayê ya ku ji ber vê yekê pêk hat “tirseke mezin” li ser dêrê çêkir. Dîsa jî, girîng e ku mirov bîne ziman, îfadeya ku tê bikar anîn ne “bajar” e lê “civata bawermendan” e. Gava ku em li peyvên Grêkî yên di îfadeya “tirsa mezin” de dikolin, wate tîrtir dibe.

Peyva yekem “mezin” ji peyva Grêkî “megas”ê tê ku weke “rêjeya jorîn a pîvangekê... pîvana zêde, tîr, tirsnak” tê pênasekirin. Peyva roja me “mega” ji vê peyvê tê. Ne mimkûn e ku mirov şaş fêhm bike bê ka çi tê vegotin; di bingeha xwe de, mirov dikare weke “tirsa mega” wergerîne. Ji bîr mekin ku nivîskarên Nivîsên Pîroz îfadeyan zêde mezin nakin.

Peyva duyem “tirs” di seranserê Peymana Nû de ji bo “tirsa pîroz” pir caran peyva “phobos” tê bikaranîn. Weke “tirs, xof, hurmet, rêz, rûmet”ê tê pênasekirin. Çavkaniyek din vê weke “rêz û xofa kûr -rêz, hurmeta ji bo Xweda” pênase dike. Em dîsa li peyvên xof û tirsê rast tên û ev yek pileya tirsê ya pir mezin û ecêb diyar dike. Pawlos heman peyvê di ayeta jêr de bi kar tîne:

> “Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lê belê hê bêtir di

> dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin. Çimkî Xwedê ye yê ku di dilê we de dixebite, da ku hem daxwaz û hem jî kirina we li wî xweş bê.” (Filîpî 2:12-13)

Rizgariya me ne bi hezkirin û dilovaniyê, lêbelê weke ku em ê piştre ji nêz ve lêkolîn bikin, bi rêzdarî û tirsê wê pêk bê. Careke din, tîrbûna wateya ku tê ragihandin bi peyveke nû re kirteke din bilind dibe: rêzdarî. Peyva Grêkî ya ku weke rêzdarîyê tê wergerandin “tromos” e û tê wateya “lerizandina ji tirs û dehşetê an jî hurmet, xof û rêzdariya kûr.” Ev bikaranîn ne bi tena serê xwe ye ji ber ku Pawlosê Şandî ev her du peyv çar caran di Peymana Nû de bi hev re bikar tîne.

Her çiqasî lêkolîna me ya tirsa pîroz temam nebibe jî, em tenê dikarin meraq bikin bê ka çawa mamosteyek Gotina Xweda dikare bi “perestina rêzdar” sînordar bike. Tenê di vê beşê de, bi çend ayetên ku em li ser sekinîne, em rastî tûrikê ferhengeke pir bi hêz hatin. Li vir listeyeke berhevkirî heye: tirsa mezin, heybet, dehşet, rêzdariya kûr û lerizîn.

Ev ne tenê ew peyv in ku aliyekî biçûk ê jiyana me ya di Mesîh de pênase dikin; ji vê zêdetir, ew rave dikin bê ka rizgariya me çawa çalak dibe -çawa hewildanên me, bi hevkariya Giyanê Pîroz û bi xurtkirina wê re, rizgariya ku Îsa bi dilxwazî pêşkêşî me dike, digihîne gihîştina wê ya herî temam. Ji vê gavê û pê ve, em ê wê bi vî rengî îfade bikin: rizgariya me bi rêzdarî û tirsê gihîştî dibe.

Gava ku em li ser vê yekê difikirin, çima tirsa pîroz ne yek ji rastiyên herî girîng e ku di dêrên me, komên biçûk û dibistanên Pirtûka Pîroz de tê hînkirin? Gelo ev dibe sedema hejmareke mezin ji Xirîstiyanên bêbandor û bêhêvî li cîhana Rojavaê? Û gelo ev dibe ku bibe sedema hişyariya Nivîsên Pîroz ku wê di rojên dawî de “veger” ji baweriyê hebe? Pawlos wisa dinivîsîne: “heta ku pêşî ew vegerîna ji baweriyê çênebe û ew mirovê bêqanûniyê yê ku kurê helakê ye, eşkere nebe, ew roj nayê” (Selanîkî II, 2:3). Vegera ji baweriyê, bi tirsa me ya pîroz ku ji holê rabe re, gelo dibe ku gur bibe? Piştî çil salên jiyana dua, xebat û xizmetê ku min li her eyaleta Amerîkayê û li şêst welatên din derbas kir, ez bawer dikim ku ev wisa ye.

Em gaveke din herin bi pêş ve. Yek ji doktrîna bingehîn an jî ya pêşî ya dêrê “darizandina heta hetayê” ye. Van gotinan baş bixwînin:

> “Ji ber vê yekê em hîndariya pêşî ya li ser Mesîh bihêlin, ber bi bêkêmahîtiyê ve pêşve herin. Û em dîsa bingeha wan tiştan daneynin: ... baweriya bi Xwedê, ... dîwana herheyî.” (Îbranî 6:1-2)

Rastî ev e ku em ê hemû hesabê bê em çawa dijîn bidin. Encama vê darizandinê wê heta hetayê berdewam bike -ev bê dawî ye! Ji bo bawermendan ev darizandin weke “kursiyê darizandinê yê Mesîh” tê bi navkirin.

Werin em li ser du peyvên ku me di van ayetan de anîn ziman, nîqaş bikin. Peyva me ya yekem “pêşî” ye. Zarokek biçûk di dibistana seretayî de çi fêr dibe? Xwendin, nivîsandin, lêzêdekirin, jihevderxistin û tiştên din ên bingehîn. Di esasê xwe de, em blokên avahiyê yên pêwîst ji bo pêşvebirina perwerdehiya xwe bi dest dixin. Hûn dikarin xeyal bikin, bêyî zanîna xwendin, nivîsandin, lêzêdekirin û jihevderxistinê mirov dikare perwerdeya lîse an jî zanîngehê berdewam bike? Ne pêkan e!

Ez dibînim ku gelek bawermend ji cezayê ku ew ê pê re rûbirû bimînin bêagahdar in an jî di rewşa herî baş de tenê bi vê têgehê dizanin lê bi temamî li ser lêkolîn nekirine. Mirov dikare vê bişibîne zanîna ku hînkirinên dibistana seretayî girîng in lê qet bi rastî wan fêr nabin. Pirsek pir girîng a ku divê were pirsîn ev e: Bawermend bêyî vê rastiya pêşî çawa jiyana xwe di Mesîh de ava dikin?

Werin em li peyva din a ku li ser hatiye sekinandin bifikirin: bingeh. Hûn xeyal dikin ku avahiyeke bê bingeh ava bikin? Eger rewşa hewayê aram be, avahî dikare bê çêkirin û li ser lingan bisekine. Lê gava bahozeke bihêz rabe, avahî wê di cîh de hilweşe! Ev rewş dikare vegera ji baweriyê temsîl bike. Koma Lêkolînê ya Barna’yê ragihand ku di navbera salên 2000 û 2020an de zêdetirî çil mîlyon Amerîkî ji baweriyê vegeriyane! Nîvê wan aniha dibêjin ku ew êdî ne Xirîstiyan in, ateîst an jî agnostîk in. Gelo nebûna me ya hînkirina bingehîn dibe ku bibe alîkarê vê îstatîstîka wêranker?

Derbarê darizandina me de em çavekî li ayetên jêr bigerînin:

> "Erê, ewlehiya me heye û em hê bêtir dixwazin ku ji bedenê dûr û li ba Xudan bin." (Korîntî II, 5:8)

Em di cîh de fêhm dikin ku Pawlos li vir tenê derbarê bawermendan de diaxive. Gava ku yekî bawer neke ji bedenê dûr be, ew ne di hizûra Xweda de ye.

> "Ji bo vê yekê dixwazî bila em di bedenê de bijîn, dixwazî jî bila em ji bedenê dûr bin, armanca me ev e ku em li Xudan xweş bên." (Korîntî II, 5:9)

Gava ku kurên me di xortaniya xwe de bûn, ez û Lisa li derfetan digeriyan ku wan di xwedaparêziyê de perwerde bikin. Aliyekî girîng a perwerdehiya wan ew bû ku em wan ji helwesteke ku her dem xwe mafdar bibînin û vê bi pêş bixin, biparêzin. Êvarekê min ji wan re got: "Xortno, hûn nikarin tiştekî bikin ku bibe sedema ku ez û diya we ji niha zêdetir an jî kêmtir ji we hez bikin."

Hezkirina me ya bê şert û merc ji bo wan bi fermî hate piştrastkirin. Lê piştî wê min di cîh de ev got: "Lê berpirsiyarê bê em çiqasî ji we xweş in hûn bi xwe ne." Ew kêliyeke wisa bû ku çavên wan beloq bûn.

Ha rastî ev e. Em nikarin tiştekî bikin ku Xweda ji me hîn zêdetir an jî hîn kêmtir hez bike lêbelê berpirsyarê bê ka Ew çiqasî ji me razî ye, em bi xwe ne. Ji ber vê yekê Pawlos dibêje ku armanca wî "Razîkirina Reb" e. Çima?

> "Çimkî divê em hemû li ber kursiyê Mesîh ê dîwanê xuya bibin, da ku her kes li gor tiştên ku hê ew di bedenê de bû, kirine – qenc bin an jî xerab bin – bistîne. Îcar, ji ber ku em dizanin tirsa Xudan çi ye, em dixwazin baweriya mirovan bînin. Em ji Xwedê ve eşkere ne û hêviya min heye ku em ji wijdana we ve jî eşkere ne." (Korîntî II, 5:10-11)

Li ser vî kursiyê darizandinê, ji bo gunehên me yên ku me ji wan tobe kiriye, em nayên darizandin -ew jixwe bi xwîna Îsa ji holê hatine rakirin. Xweda "rojhilat ji rojava çiqasî dûr be, serîhildanên me ewqasî dûr xistin ji me" (Zebûr 103:12). Dîsa, Xweda dibêje "ez ê sûcên te bibexşînim, ez ê êdî behsa gunehên te nekim" (Îbranî 8:12).

Naxwe, darizandina me wê çi di xwe de bihewîne? Em weke kesên

bawermend li gorî jiyana xwe em ê bên darizandin û hem kirinên me yên baş û hem jî yên xerab wê werin lêkolînkirin.

Tiştê ku ji bo nîqaşa me ya aniha girîng e, “tirsa Reb” e ku ji aliyê Pawlos ve li darizandina bawermendan hatiye zêdekirin. Weke ku berê jî hate gotin, peyva ku di Grêkî de weke tirsê tê wergerandin “phobos” e ku di heman demê de ev peyv ji bo danasîna berteka civaka bawermendan li hemberî darizandina Hananya û Safirayê jî tê bikaranîn. Ev me tîne ser pirseke girîng: Gelo tiştê ku bi serê vî jin û mêrî hat, dibe ku pêşdîtineke veşartî ya darizandina bawermendan be? Em ê di çend beşên pêş de li ser vê îhtîmalê bisekinin û lêbikolin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Bi awayekî ku hêjayî Xudan e rêve herin, hûn bi her awayî li wî xweş bên, di her karê qenc de ber bidin û di naskirina Xwedê de bigihîjin.” (Kolosî 1:10)

**Ramana sereke:** Hûn nikarin tiştekî bikin ji bo ku Xweda ji we hîn zêdetir an jî hîn kêmtir hez bike. Lê berpirsyarê bê ka Ew çiqasî ji we xweş e, hûn bi xwe ne.

**Ramana kûr:** Jiyana min Xweda dil xweş dike gelo? Ez çawa dikarim hîn bibim bê ka gelo çi dilê Wî xweş dike an jî ne xweş dike?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez ji Te dixwazim ku Tu bi rêya Peyv û Giyanê xwe ji min re eşkere bikî bê ka çi Te kêfxweş dike û çi Te kêfxweş nake. Ji her tiştî bêtir, dil û hişekî bide min ku li dû tiştên Tu ji wan kêfxweş e, digerin. Ji bo ku ez dilê te nas bikim û bi awayekî bijîm ku te rûmetdar bikim. Bila daxwazên min, min amade bikin ku rojekê bi darizandina bawermendan re rûbirû bimînim û xelatên herheyî yên ku Tu dixwazî bidî min werbigirim. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Dilxweşkirina Xweda di jiyanê de daxwaza min ya pêşî ye. Ew, di nava min de tiştên ku ji wan dil xweş e, ji bo ku hem ez bixwazim û hem jî bikim, dixebite.

DERBARÊ XWEDA DE TIŞTEKÎ KU BALA MIROV DIKIŞÎNE EV E: GAVA KU HÛN JI XWEDA TIRSIYAN ÊDÎ HÛN HEW JI TIŞTEKÎ DIN DITIRSIN LÊ GAVA HÛN JI XWEDA NETIRSIN, HÛN Ê JI HER TIŞTÊN DIN BITIRSIN.

– OSWALD CHAMBERS

# 12| DURÛTIYA BELAVKER (VEGIRTÎ)

Girîng e ku xalek girîng di derbarê wî jin û mêrê ku jiyana xwe ji dest dane de, di pirtûka Karên Şandiyan de were zelalkirin. Mesele ne kirinên Hananya û Safîra bûn, wan tenê di xizmeta dêrê de pêşkêşiyek kirin. Dayîna diyariyeke madî ya ji bo xizmeta Xweda; pîroz û xweşik û xwedayî ye. Gunehê wan helwesta di dilê wan de bû -arezûya navdariyê.

Ev pirseke girîng derdixîne rojevê: Li ser kursiyê darizandinê ma wê tenê gotin û kiryarên me werin lêkolînkirin an wê raman û niyetên me jî werin hesibandin?

Em hişyariyeke ku Îsa ji xwendekarên xwe re gotiye, bixwînin û wisa dest pê bikin:

> "Di wê demê de, çaxê ku xelk bi hezaran civiya, wisa ku pêlhev dikirin, Îsa pêşî ji şagirtên xwe re dest pê kir û got: «Hay ji haveynê Fêrisiyan hebin ku durûtî ye. Tiştekî nixumandî tune ku xuya nebe û tiştekî veşartî tune ku neyê zanîn." (Lûqa 12:1-2)

Di van her du ayetan de gelek tişt hatine eşkerekirin. Xeyal bikin ku hûn xizmetkarekî Mizgîniyê ne û bi hezaran kes kom bûne ji bo ku guh bidin we. Ev xewna gelek mizgînvanan e! Lê Îsa çi dike? Ew nake pistepist û ji tîma xwe re nabêje: "Waa zarokno, ez ji bo vê yekê li vir im. Gava ku ez karê xwe dikim, xwe bidin aliyekî!" Na. Di şûna vê de, ew sê tiştan dike: Pêşî, ew vê derfetê bikar tîne ji bo ku peymaneke dîtbarî bide wan ku ew nekevin bin bandora cazîbeya kêliyê. Ew van rêberên pêşerojê, hem bi mînak û hem jî bi hînkirinê, li ser mijara durûtiyê hişyar dike. Bi Grêkî ji bo durûtiyê "hupókrisis" tê gotin û ew weke "dayîna bandora xwedîbûna armanc an jî motîvasyonên diyarkirî ku di rastiyê de mirov xwedî armancên pir cûda ye." tê pênasekirin.

Ferîsî di mijara durûtiyê de pispor in -wan qet derfet ji dest nedidan ji bo ku xwe nîşan bidin û dekûdolaban bikin. Îsa hişyarî dide me ku em di niyetên xwe de saf bin û nekevin vê xefkê. Di esasê xwe de, divê em nehêlin ku populerbûn an jî erêkirina mirovan rêberiya me bike lêbelê divê em hem di hînkirina xwe de û hem jî di jiyana xwe de bi rastiyê re girêdayîbin û ji aliyê Giyan ve werin bi rêvebirin.

Ya duyemîn, Îsa destnîşan dike ku durûtî çiqasî zû dikare belav bibe. Ew vê, dişibîne hevîrtirşê ku li seranserê hevîr belav dibe û dibe sedema ku hevîr tirş bibe û binepixe. Mînaka Îsa, nîşan dide ku durûtî belavker (vegirtî, ango ji hev pêdikevin) e, lêbelê berevajî hevîrtirş, ew ji bo başî û qenciya me pir zirardar e.

Ya sêyemîn, ew teqez diyar dike ku durûtî nikare veşartî bimîne. Niyeta li pişt gotin an jî kiryarên mirovekî bê guman di dawiya dawî de wê eşkere bibe. Daxuyaniya wî ya din, derdixîne holê bê ka çi me ji niyetên nepak diparêze:

> "Lê ez ji we dostên xwe re dibêjim: Ji wan netirsin, yên ku bedenê dikujin û ji wê pê ve nikarin tiştekî xerabtir bikin. Lê ez nîşanî we bidim ku hûnê ji kê bitirsin: Ji wî bitirsin, ku piştî dikuje, dikare bavêje dojehê; erê, ez ji we re dibêjim ku ji wî bitirsin!" (Lûqa 12:4-5)

Îsa careke din ji bo tirsê zimanekî bihêz bikar tîne. Peyva "phobéõ"

dişibihe “phóbos”ê ku me di beşa berê de destnîşan kir û me bala xwe da ser wê. Peyva “phobéõ” weke “saw girtin, tirsandin, dehşetê jê bigire” tê pênasekirin. Îsa, “avêtina dojehê” bi paşguhkirina tirsa pîroz ve girêdide. Ev yek, ramaneke tirsnak e ku divê mirov biçûk nebîne. Li vir dîsa em girîngiya tirsa pîroz dibînin û careke din tê piştrast kirin ku ew ji perestina rêzdar zêdetir e.

Îsa ji me re dibêje ku ji Xweda bitirsin, ne ji mirovan. Eger bi hêsanî bêgotin, “tirsa ji Xweda, me ji tirsa ji mirovan xelas dike û tirsa ji mirovan, şiyana me ya tirsa ji Xweda ji holê radike û me dike kole.” Ji bîr nekin, dema ku em ji mirovan bitirsin, niyetên me di bin bandorê de dimînin. “Tirsa ji mirovan” weke “tirsa ji Xweda” bifikirin. Ne sawa ji mirovan e; di şûna vê de, ew li ser wê yekê ye ku em ji bo razîbûna kesane, ewlehî an jî qezencê ji kesên li dora xwe razî bibin. Tirsa ji mirovan me di nav hevîrtirşê durûtiyê de mehkûm dike. Ew me ber bi wê yekê ve dibe ku em ji bo erêkirina mirovan bijîn.

Dîsa, kiryarên Hananya û Safîrayê ji şermezarkirinê wêdetir xuya dikirin lêbelê niyetên wan li ber çavê civaka wan ew ber bi îmajeke diyarkirî ve dahf dan û ev yek bû sedema hilweşîna wan. Mirov dikarin çalakiyan bikin û gotinên xwedayî bibêjin lêbelê bêyî tirsa pîroz, ew bi niyetên xwe gunehan dikin. Di salên 1980’î de gava ku min li dêra xwe ya herêmî xizmet dikir, ez bi rastî jî dîlgirtiyê tirsa mirovan bûm. Heta ku Giyanê Pîroz niyetên min eşkere nekirin, ez ne di ferqa vê de bûm. Wê demê di dêra me ya pir mezin de pozîsyoneke min ya pir bilind hebû. Li hemberî kesê ku ez bi wan re di nava têkiliyê de bûm, ez her dem nazik bûm û her çiqasî ne rast be jî min her dem pesnê wan dida. Min ji rûbirûbûnê nefret dikir û ez weke nexweşiyekê jê direviyam. Gotegotên ku digotin ez yek ji zilamên li derê yê herî bi hezkirinê tevdigere, min dibihîstin. Van gotegotan ez kêfxweş û tatmîn dikirim.

Rojekê gava min dua dikirin, min bihîst ku Reb wisa dibêje: “Kurikê min, mirov ji bo te dibêjin zilamakî nazik e û dilê wî bi hezkirinê lê dide.” Baş tê bîra min bê ev çawa ji dilê min re got, min hîs nekir ku tona dengê Wî ev rewş erê dikir.

Ji ber vê min bi tedbîr got: “Erê, wisa dibêjin.”

“Ne rast be jî, tu pê dizanî bê tu ji bo çi xweşgotin û peyvên xweş ji mirovan re dibêjî?”

“Ji bo çi?”

“Ji ber ku tu ditirsî ku ji aliyê wan ve tu bê redkirin. Baş e, navenda hezkirinê kî ye -tu yî an ew in? Eger bi rastî te ji mirovan hez bikira, wan tu red bikira jî te yê rastî bigota lê te derew nedikirin.” Ez şaş mam. Her kesî ez weke zilamekî dilê wî bi hezkirinê lê dida, pênase dikirim lê di rastiyê de mesele pir cuda bû.

Bi heman awayî, endamên dêra destpêkê bi îhtîmaleke mezin Hananya û Safîra weke kesayetiyên xwedayî didîtin, nemaze ji ber ku wan di raya giştî de diyariyên mezin ji pastorên xwe re dianîn. Lêbelê niyeta wan a rastîn derket holê. Bi heman awayî, armanca min ew bû ku ez xwe mezin bikim, biparêzim û xelat bikim. Paşxaneya tevgera min çîrokeke durûtiyê bû.

Gava ku mirov li ber çavê cîhanekê karên xwedayî û sûdwer dikin, hêsan e ku veşartina niyeteke xweperest ku li pişt wê li berjewendiya xwe digere. Em dikarin bi peyameke Mizgîniyê ya bêhempa qelebalixiyê bi rêve bibin lêbelê di kûrahiya dilê xwe de dibe ku em ji hêla hewesa xweperest ve werin motîve kirin (Filîpî 1:15-16). Em dikarin diyariyên mezin bidin feqîran lê em dikarin weke ku ji hezkirinê bêpar in vê bikin (Korîntî I, 13:3). Em dikarin mirovan ber bi hebandinê ve bibin lêbelê dibe ji bo ku em bên nasîn an jî navdar bibin, niyeteke me ya bi dizî hebe. Em dikarin di axaftinên xwe de bi mirovan re nazik bin lêbelê em dikarin di dilê xwe de wan bidarizînin û rexne bikin. Em dikarin ji bo pastorekî ku ji ber kiryareke xwe ya ne exlaqî ku jê tê xwestin îstifa bike, xemgîniya xwe nîşan bidin lêbelê em dikarin di dilê xwe de kêfxweş bibin ku wî ev tişt heq dikir. Em dikarin dilnizm xuya bikin û bibêjin “Hemû mezinahî ji Îsa re” lê di dilê xwe de em dikarin pejirandin û pesnê bixwazin. Lîste wisa berdewam dike.

Rastiya xav ev e: Ya pêşî, armancek an jî niyetek jî ji Xweda nikare bê veşartin û ya duyem ew ê di dawiya dawî de derkeve holê. Pirsa girîng ev e: Ma ew ji me veşartî ye? Tirsa Reb, me bi niyetên me yên di dilê me de, di têkiliyê de dihêle û ev pir girîng e ji ber ku nebûna wê me ji xapandina durûtiyê re bêparastin dihêle.

Temamiya civata bawermendan li ber darizandina ku Hananya pê re rûbirû ma matmayî man lê ji Hananya û piştre ji Safîra bêtir matmayî neman. Nebûna tirsa pîroz a vî jin û mêrî, ew ji xerabiya niyetên wan kor kirin. Dîsa, divê em vê bipirsin, gelo çîroka wan pêşdîtineke darizandina li ser kursiya dadbariyê ya Mesîh e? Em ê di beşa bê de bibînin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Peyva Xwedê jîndar û bi bandûr e. Ji her şûrê dudev hê tûjtir e. Û heta can û ruh, hem jî movik û mejî ji hev veqetîne, lê diçe; dîwana niyet û ramanên dil dike." (Îbranî 4:12)

**Ramana sereke:** Tirsa Reb, me bi niyetên me yên di dilê me de, di têkiliyê de dihêle û ev pir girîng e ji ber ku nebûna wê me ji xapandina durûtiyê re bêparastin dihêle.

**Ramana kûr:** Ji ber tatmîna şexsî ya di bingehê wê de, ewlehî an jî bi niyeta qezencê, ez çawa berê xwe didim mirovan ku wan kêfxweş bikim? Gelo gava ez di bin zextê de me ev tiştekî wisa ye ku ez otomatîk dikim? Ev yek di kîjan waran de bûye sedem ku ez ji rastiya xwe tavîzan bidim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez lêborîna xwe ji Te dixwazim ji bo ku ez hewl didim ji bo berjewendiya xwe dilê yên din xweş bikim. Giyanê Pîroz, ez ji te dixwazim ku tu hemû warên jiyana xwe ji min re eşkere bikî ku ez bi hêsanî ketim bin bandora vê zextê. Ez tobe dikim ku Te mirov li şûna Îsa Mesîh kirine çavkaniya şahî û bextewariya min. Ez ji Te dixwazim ku Tu dilê min bi tirsa pîroz tijî bikî, da ku ez her gav bi rastî ji yên din hez bikim û teslîmî durûtiyê nebim. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Mirovên ez bi wan re têkildar im, ez ê ji wan re rastiyê bibêjim û ji xwe bêtir, ez ê li berjewendiyên wan bifikirim û ji wan hez bikim.

“ÇIMKÎ DIVÊ EM HEMÛ LI BER KURSIYÊ MESÎH Ê DÎWANÊ XUYA BIBIN, DA KU HER KES LI GOR TIŞTÊN KU HÊ EW DI BEDENÊ DE BÛ, KIRINE – QENC BIN AN JÎ XERAB BIN – BISTÎNE.”

– KORÎNTÎ II, 5:10

# 13| SISÊ ÎMAJ

Werin em li hevoka “qenc bin an jî xerab bin” a di ayeta rûpela din de derbas dibe, ji nêz ve binêrin. Her mirovek di derbarê xwe de xwedî sê îmajan e: îmaja me ya ku yên din derbarê me de têdigihêjin bê em çawa xuya dikin ango îmaja têgihîştî, îmaja ku em didin der ango îmaja pêşandanê û îmaja me ya rastîn.

Îmaja têgihîştî; ew îmaj e ku yên din me çawa dibînin, diyar dike. Îmaja me ya pêşandanê; daxwaza me ya ku em dixwazin yên din me çawa bibînin, diyar dike. Îmaja rastîn jî di rastiyê de em çi bin wê nîşan dide û her çiqasî ji aliyê yên din ve neyê dîtin an jî bê veşartin jî ew di çavên Xweda de eşkere ye. Li ser kursiyê darizandinê, çi baş be û çi jî xerab be, îmaja me ya ku wê diyar bibe ev e.

Li Îsa bifikirin -şaş hat fêhmkirin, bêbextî lê hat kirin, weke kesekî serxweş û yê ku tim ji kîsê xelqê dixwe û vedixwe hat pênasekirin, weke kesekî sapiq hat binavkirin û heta bi wê yekê jî hat tawanbarkirin ku ji hêla cinan ve hatiye şandin. Rêberên olî û yên din ew red kirin. Îmaja wî ya têgihîştî; di çavên gelek kesan de, bi taybetî jî di çavên kesên malmezin û dewlemend de, neyînî bû. Birayên Îsa -wê demê gumanbar bûn- ji bo ku îmajeke pêşandanê ya li ser Wî ferz dikirin, derxîne holê tundî lê kirin: “Ji vir derkeve û here Cihûstanê, da ku şagirtên te karên

ku tu dikî bibînin. Çimkî mirovê ku dixwaze bi eşkereyî xwe bide naskirin, kirinên xwe venaşêre. Madem ku tu van karan dikî, xwe nîşanî dinyayê bide" (Yûhenna 7:3-4). Ji aliyê têgihiştinên kesên din ve hatin kontrolkirin û hewl dan ku Îsa têxin bin heman koletiyê ango xwestin têxin bin tirsa mirovan de.

Dîsa jî îmaja rastî ya Îsa, ji têgihiştina gelek kesan pir cuda ye ji ber ku "Ew, xuyakirina Xwedayê nayê xuyakirin e" (Kolosî 1:15). Gava ku gelek kesan Ew red kir, Xwedayê Mezin bi deng wisa anî ziman: "Ev e Kurê min ê delal. Dilê min bi wî xweş e" (Metta 3:17). Îmaja Îsa ya mayînde; ne îmaja têgihiştî ye, îmaja rastî ye.

Dema ku li ser rûyê erdê bû, ew ji xwemezinkirinê û hewldanên avakirina îtîbara xwe dûr ket. Gava ku hewcedariya kesekî bi başbûnê hebû û ew baş dikir, ew kes gelek caran hişyar dikir û digot: "Bila kes pê nizanibe" (Metta 9:30). Ew ji populerbûn, navdarî û pesn û pejirandina mirovan dûr ket. Gava ku mirovan hewl didan Wî teşwîq bikin ku bibe qral, Wî xwe bi paşve vekişand. Di wî de ne xwe nîşandan ne jî xeyal û ne jî xapandin hebû. Ew bi tirsa Reb kêfxweş bû û vê tirsê hişt ku li ser Bav zîq bibe.

Em jî divê îmaja rastî ya Îsa bînin ziman. Azadî; gava ku em li gorî rastiya di nava xwe de dijîn, bi reva ji xwemezinkirin an jî veşartinê, ava dibe. Em koka tevgera ku li xwe zîq dibe, di Adem û Hewayê de kifş dikin. Wê kêlîka ku dikevin gunehê em dixwînin: "... çavên herduyan jî vebûn û wan fêm kir ku tazî ne" (Destpêk 3:7). Zîqbûna wan ji Xweda dûr ketibû û şemitîbû ser wan bi xwe û îcar aniha hewl didan ku qusûrên xwe yên nû kişf kiribûn, rast bikin. Jin û mêrê pêşî hewl dan ku tazîbûna xwe binixumînin. Di rewşa me de dibe ku bi awayekî cuda derkeve holê lêbelê pirsgirika bingehîn hîn heman tişt e. Eger ez li xwe zîq bibim, ez ê hewl bidim ku îmajekê ava bikim ji bo ku qusûrên min yên diyar binixumîne. Îsa ji bo ku me ji vê koletiyê rizgar bike, canê xwe da. Pawlos wisa dinivîsîne: "Ji xwe em newêrin ku xwe bi hinekên ku xwe tewsiye dikin re yek bigirin an jî rû bi rû bikin; lê ew ên ku xwe bi hev re dipîvin û xwe bi hev re rû bi rû dikin, bêfêm in" (Korîntî II, 10:12).

Eger em bikevin bin zexta berawirdkirinê, em kêmasiyên xwe derdixînin pêş û bi vî awayî an em xwe mezin dikin an jî xwe vedişêrin û her tişt ji armanc û niyetên me dest pê dike. Di cîhana me ya îro de,

îmaja me ya têgihiştî ji îmaja me ya rastîn bêtir girîng e. Eger bi awayekî basît bê gotin, ew navûdengê me ye ku em diparêzin. Hewldanên me êdî li ser xuyakirinê, statuyê, unvanan, populerbûnê, pejirandinê, navûdengiyê û hwd. zîq dibe; ji ber ku ew kêmasiyên me vedişêrin.

Di dema darizandinê de tişta ku wê bê diyarkirin û lê bêkolandon, ne ev e. Li şûna vê, îmaja me ya rastî ku li dora armanc û niyetên me dibe navend, wê bibe mijara darizandinê:

> "Ji ber vê yekê, heta ku Xudan bê, beriya wext, dîwana tiştekî nekin. Xudan wê tiştên di tariyê de veşartî ronahî bike û niyeta dilan eşkere bike. Hingê pesnê her kesî wê ji Xwedê be." (Korîntî I, 4:5)

Gelek kes difikirin ku ev ayet derbarê kesên bawer nakin de ye û ji ber vê van gotinan paşguh dikin. Ne wisa ye ji ber ku tu kesê bêbawerî wê di dema darizandinê de pesnê wî neyê dayîn. Li vir tenê behsa kesên bawermend dike.

Gava hûn dibihîzin ku "tiştên ku di tariyê de veşartî ne" û "armancên di dilan de" li ber hizûra hemû civata li ezmanan îfşa bû, bêguman ev dibe sedema ku hûn bi awayekî tendirustî bitirsin. Sedemeke ku Pawlos darizandina bawermendan weke "tirsa ji Reb" bi nav dike, dibe ku ev be. Hişmendiya me ya derbarê rastiyê de, tirseke pîroz diafirîne ku me di bin kontrolê de dihêle û dihêle ku em îmaja xwe ya rastîn bijîn. Bi vê re, berevajî vê jî rast e: Em çiqasî ji tirsa Reb bêpar bin, em ew qas bêtir xwe dispêrin îmaja xwe ya pêşandanê.

Ev dafika kujer bû ku Hananya û Safîra ketibûn hundurê wê. Ew bêtir bi wê yekê eleqedar bûn ku ew di çavên reqîb, heval, endamên dêrê û kesên ku ew weke rêberên xwe dihesibandin de çawa dihatin dîtin.

Ji bo ku çîroka wan li gorî serdema me li hev siwar bikin, em rêça bûyerên ku bûne sedema hilweşîna wan di çarçoveya demên nûjen de xeyal bikin. Dêr tenê çend meh berê hatibû damezrandin. Şandiyan û endamên dêrê li bawermendan temaşe dikirin ji bo ku bibînin bê ka kî wê di warên cuda de weke rêber derkeve holê.

Ji bo vî jin û mêrî, ew rojeke kêfxweşiyê bû dema ku wan Îsa qebûl kir û gunehên wan hatin bexşandin. Hezkirina Xweda û civaka birayên

wan yên bawermend, ew dorpêç kiribûn. Lêbelê piştî demekê wê bala wan biguheriya. Balkêş e ku ev guhertin bi îhtîmaleke mezin bi xebata Xweda bi rêya wan dest pê kir -dibe ku pêşkêşek, şîretek, îlahiyek di komeke hebandinê de -îhtimal bêdawî ne. Wan ji hîskirina spasdariyê ku ji naskirina xizmetên wan dihat kêf stendin. Endorfîn bilind bûn û hestên tatmînker û bextewariya ku kelecanê dide, bi xwe re çêkir. Naskirina wan zêde bû. Bi vê re, ji bo parastina navûdengên xwe yên nû, wan hewce kir ku hin tevgerên gumanbar bi gotin û kiryarên ku xuya dikin bêzerar in, veşêrin. Dibe ku ew xwe di nava pevçûneke dijwar a navmalî de bibînin û piştre xwe di nava dijminatiyeke dirêj de dîtin. Hêrs û nîqaşên wan xerabtir û dirêjtir bûn lêbelê gava ew bi bawermendên din re civiyan, wan tevgerên xwe guhertin ji bo ku kêmasiyên xwe veşêrin. Vî jin û mêrî; nexwestin ku nakokî û pevçûnên wan ku wê îmaja wan a têgihîştî xerab bike, ji hêla civakê ve bê dîtin, ji ber vê yekê wan helwesteke hezkirî û baldar li hemberî hev nîşan dan.

Li ser Instagram û TikTokê, wan wêne û vîdyoyên xwe yên ku hev himbêz dikin, dikenin û kêfa çalakiyên xweş derdixînin, parve kirin. Wan li bin parvekirinên xwe îfadeyên weke "jiyankirina xewn û xeyalan" û "armancên têkiliyê" an jî "Ez bi wî/wê re ji jiyanê hez dikim!" nivîsandin. Wan her wiha gelek parvekirin çêkirin ku jiyana xwe ya serkeftî (li ber xwe dide), karsaziyên mezinbûyî (yên ku her diçe biçûk dibin), zarokên xwe yên bedew (serhildêr, xweperest û bêrêzdarî) û gelek destkeftiyên din nîşan didan. Weke ku bi kêr tê xuya dibû ji ber ku şopînerên wan ên medyaya civakî bi lez zêde dibûn.

Hananya û Safîra hewl didan ku îmaja xwe ya pêşandanê bi hêz biparêzin. Her tişt bê zirar xuya dikir lêbelê bi her kiryareke durûtiyê, tirsa wan a xwedayî her ku diçû kêm dibû. Dilê wan êdî ji ber durûtiya wan nediket cîh. Her tişt baş xuya dikir û ew weke bexşvanên herî comerd ên dêrê xwedî navûdengeke baş bûn. Roj hat û Barnaba pêşkêşiya xwe anî ber devê deriyê dêrê. Bala hemû civatê li ser wê bû. Hananya û Safîra li paş man û îmaja wan ya têgihiştî qels bû. Mixabin, heta wê demê, li ser sekna îmaja ku wan bi xwe ava kiribû, jixwe bi pêş ketibû. Ya mayî jixwe li ber çavan e. Her tişt ji bo yên din bêzerar û weke ku îlhamê dide wan xuya dikir lê ew ber bi rêyeke xeternak û wêranker ve birin. Gelo sedema ku Giyanê Pîroz çarenûsa vî jin û mêrî di Nivîsên

Pîroz de eşkere kir, gelo ew e ku me hişyar bike û ramanekê bide me bê ka kursiya darizandinê wê çiqas cidî be? Pawlos wisa dinivîse:

> "Gunehên hin mirovan kifş in û ji berî wan diçin ber dîwanê, lê gunehên hinekan jî li pey wan tên." (Tîmotêyos I, 5:24)

Gunehê Hananya û Safîrayê di wê roja jibîrnekirî de li ber hemû kesî eşkere bû. Berî wan gihîşt kursiya darizandinê. Bi vê yekê re, tiştê ku divê bêtir endîşeyê bide ew e ku gunehên gelek kesan wê piştre derkevin holê. Ji kerema xwe bînin bîra xwe, darizandina Xweda ne kirinên wan lê niyetên wan ên veşartî ji xwe re kiriye hedef.

Mizgîniya baş ev e: Em dikarin ji niyetên xwe yên tarî tobe bikin û wê demê Xweda ne tenê wê me bibexşîne lê eger em bi tirsa pîroz li ber Wî bigerin û hişê xwe bi Nivîsên Pîroz nû bikin, em dikarin bi niyetên paqij werin pîroz kirin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Çimkî tiştekî veşartî tune ku neyê eşkerekirin û ne jî tiştekî nixumandî heye ku neyê zanîn û nekeve ber ronahiyê." (Lûqa 8:17)

**Ramana sereke:** Her mirovek sisê îmajên wî hene: îmaja têgihîştî, îmaja pêşandanê û îmaja rastîn.

**Ramana kûr:** Ez ber bi kîjan îmajê ve diçim? Ez li cîhekî ku rastî lê heye dijîm an ji bo ku îtîbara xwe biparêzim, ez derewan dikim an jî ez gotinên xapînok dikim? Ez li hemberî kesên ku bi wan re di têkiliyê de me durust û eşkere tevdigerim gelo?

**Dua:** Ji îmaja xwe ya rastîn bêtir, ji ber ku ez bêtir li ser îmajên xwe yên têgihiştî û pêşandanê sekinîm, ez tobe dikim. Ji durustiyê min tavîz dan û ez hêvî dikim Tu min bibexşînî. Ajo û niyetên min ji hev derxîne. Bila zîqbûna min ne li ser min lê li ser Îsa û yên din be.

**Daxuyanî:** Ez ê bihêlim ku şûrê tûj î dudevî yê Gotina Xweda raman û armancên dilê min eşkere bike.

GAVA KU TIRSA XWEDA
YA BI RASTÎ KETE DILÊ
MIROV, TIRSA MIRIN Û
DARIZANDINÊ JI DILÊ
MIROV DERDIKEVE Û DI VÊ
TIRSÊ DE ÎŞKENCE TUNEYE,
BEREVAJÎ VÊ JI BEDÊLA KU
MIROV BIWESTÎNE MIROV
BÊHNA XWE PÊ BERDIDE Û
JI BO GIYANÊ MIROV BAREKÎ
SIVIK Û HÊSAN E.

– A. W. TOZER VE HARRY VERPLOEGH

# 14| BIRYARÊN EBEDÎ

Gava ku mirov bi heta hetayê re dide ber hev, jiyana me ya niha weke mijekê ye. Lê ya rasttir jî, ev jiyan ne tiştek e ji ber ku zanista matematîkê fêrî me dike ku dabeşkirina her hejmareke bidawî bi bêdawîtiyê re beramberî sifirê ye. Ji ber vê yekê, gava ku mirov bi bêdawîtiyê re dide ber hev, heştê an jî nod sal hebe tunebe sifir e. Li ber ronahiya vê rastiya sosret, wê bi aqilmendî be ku em xwe ji ebediyetê re amade bikin.

Li ser kursiya darizandinê birayarên ku Îsa wê ji bo her yekî ji me bide, ebedî ne (Îbranî 6:1-2). Eger bi hêsanî bê gotin, di darazên Wî de wê qet guhertin, revîzyon an jî başkirin çênebin. Ango bê me çawa bertek dabe çarmixê, diyar dike bê em ê ebediyeta xwe li kuderê derbas bikin lêbelê em weke kesên bawermend bê em çawa dijîn, diyar dike bê em ê di ebediyetê de jî çawa bijîn.

Gelek kes xwedî têgeheke bihuştê ne ku ev jî tenê ji tecrubeyeke manevî pêk tê. Ew xeyal dikin ku kesên ezîz weke hebûnên giyanî ne ku li ser ewran diçin û tên, li lîrê didin û tirî dixwin. Hinekên din jî bihuştê weke xizmeteke bêzar û bênavber a hebandinê dibînin. Ji ber van nêrînan, di hebûneke ewqasî monoton a bêdawî de hestkirina heyecanê dijwar dibe.

Lê ev nêrîn qalib in ku di tu devereke Nivîsên Pîroz de nayên dîtin. Tişta herî baş ya vê jiyanê, ji siya tişta ebedî wêdetir ne tiştekî din e. Civakên ku wê bên plankirin, bajarên ku wê bên avakirin, neteweyên ku wê bên çavdêrîkirin, galaksiyên ku bên keşifkirin û bên bi pêşvexistin û serpêhatiyên din ên ku bi armanca me ya afirandinê re lihevhatî ne, wê hebin. Ji bo bajarê ebedî yê Reb pozîsyonên berpirsiyariyê hene ku werin dagirtin. Ji ber vê yekê, hûn dikarin kursiya darizandinê weke hevpeyvînek û nirxandinekê bifikirin ku pozîsyona me ya ebedî di paytexta erdê nû û ezmanê nû de diyar dike.

Em vê di hişê xwe de bigirin û em vegerin ser jiyana xwe ya niha bê di dema darizandinê de çawa lê tê lêkolînkirin:

> "Çimkî divê em hemû li ber kursiyê Mesîh ê dîwanê xuya bibin, da ku her kes li gor tiştên ku hê ew di bedenê de bû, kirine – qenc bin an jî xerab bin – bistîne." (Korîntî II, 5:10)

Em weke kesên bawermend, gunehên me yên ku wê me mehkûmî dojehê bikin, bi xwîna Îsa ji holê radibin û heta hetayê tên jibîrkirin (Îbranî 8:12). Dîsa jî, di darizandina bawermendan de hîn tevgerên xerab yên ku divê em hesabê wan bidin hene. Divê ev bala me bikişîne.

Grêkiya peyva "xerabî"yê peyva "kakós" e û weke "bi îmaya zirar û wêranker ku derbarê xerabiyê de ye" û "paşvevekişîn, destjêşûştin û paşvekişîne di şer de" tê pênasekirin. Ev peyv tenê ne di tiştên em dikin de, di heman demê de ji paşvekişînê, ji destşûştinê an jî bi îfadeyeke hîn basîttir ji tiştên ku em nakin jî çêdibe. Ji ber vê yekê, ew ne tenê destkeftiyên me lê di heman demê de derfetên winda jî dorpêç dike. Tirsa pîroz me li ser berpirsyariyên me yên di qraltiyê de û her weha li ser niyet an tevgerên neyînî yên ku zirarê didin jiyana kesên ku Xweda ji wan hez dike, hişyar dihêle.

Nivîsên Pîroz gelek caran weke "avakar" behsa me dikin. Hûn dikarin vê têgehê weke mutahîtên ku mala taybet a Xweda ava dikin, lê bifikirin ku ew ê her û her li wir bijî. Navekî navê mala Wî heye -Siyon (Zebûr 132:13-14) û malzemeyên vê malê kevirên zindî ne ango hemû pîrozên Wî ne (Petrûs I, 2:5). Îsa kevirê bingehîn e (Îşaya 28:16).

Pawlos peywirên me bi zelalî destnîşan dike: "Çimkî em berhema

Xwedê ne û em bi Mesîh Îsa hatine afirandin, da ku em di van karên qenc ên ku Xwedê ji pêşî ve amade kirine de, rê ve herin" (Efesî 2:10). Bala xwe bidinê ku Pawlos dibêje em ji bo kirina van karên qenc hatine afirandin. Eger em bi hilbijartina jiyana ku ji ber qezencên xweperest ên demkî hatine motîvekirin, ji peywirên xwe dûr bikevin, ev weke tevgereke "xerab" tê hesibandin.

Pawlos vê jî dinivîsîne: "Bila her kes bala xwe bide bê ka çawa ava dike" (Korîntî I, 3:10). Bêguman bê em çawa ava dikin, pir girîng e. Gelo em bi Peyva wî ya ebedî ava dikin an em guh didin giyanê vê serdemê? Gelo em bi Giyanê Wî ava dikin an jî em xizmeta arezûyên xwe yên xweperest dikin? Pawlos wisa berdewam dike:

> "Eger yek li ser vê bingeha zêr, zîv, kevirên hêja, dep, giya, qirş ava bike, karê her kesî wê eşkere bibe. Çimkî ew Roj wê wî nîşan bide, çimkî kar wê bi êgir xuya bibe û agir bi xwe wê karê her kesî biceribîne ku çi cûre ye." (Korîntî I, 3:12-13)

Ji bo dema ku Xweda daye me ku em derbas bikin, gelek rê hene ku em dikarin hilbijêrin. Eger em berjewendiya xwe, ango ji bo ya demkî ava bikin bijîn, ev weke madeyeke şewatbar tê pejirandin. Eger em ji bo ku qraltiya Wî ya ebedî ava bikin, bi awayekî fedakarî bijîn, ew dibe madeyeke ku nayê tunekirin lê tê pakkirin. Agirê ku jiyanên me vedikole wê bibe Gotina Xweda, bi gotineke din; niyet, gotin û kiryarên me heta çi radeyê bi Gotina Xweda re li hev dikirin?

Pawlos wisa berdewam dike: "Eger karê ku mirovekî li ser wê bingehê ava kiriye bimîne, ewê xelat bistîne" (Ayet 14). Eger kiryar û keda me ji bo îtaeta Gotina Wî û îradeya Wî ya ji bo jiyana me be, destkeftiyên me wê her û her bidomin. Du tişt hene ku divê mirov bala xwe bide wan: Ya yekem, serkeftinên me bê wê bandoreke çawa li jiyanên kesên din bike û şiyanên me yên ku Xweda dane me ji bo avakirina qraltiya Wî, bê em ê wan çawa bikarbînin wê di xwe de bihewînin. Ya duyemîn, xelata me ya ebedî wê cîhê me yê ebedî di qraltiya Wî de diyar bike.

Gotinên Pawlos yên piştî van, zexmtir in:

> “Eger karê yekî bişewite, ewê zirarê bibîne. Lê ew bi xwe wê rizgar bibe, lê wek ku di agir re derbas bibe wê rizgar bibe.” (Korîntî I, 3:15)

Di vê ayetê de gelek tişt hene ku bên diyarkirin. Pêşî, bala xwe bidinê ku avaker wê xelas bibe. Ev ayet ne li ser bêbawerekî ye ku mehkûmî gola agir a bêdawî ye lê li ser kesekî ye ku wê her û her di qraltiya Xweda de bijî.

Ya duyemîn, wê zerarê bike. Peyva Grêkî ya ku li vir tê bikaranîn dikare bê wateya ceza an jî windahiyê. Piraniya pisporan bawer nakin ku ew ceza ye û ez jî bawer nakim. Lêbelê, ev îfade hesteke kûr a windahiyê tîne bîra mirov. Ji bîr nekin ku ev zerar wê ne tenê di darizandinê de bê hîskirin, di heman demê de wê bandorê li ser awayê jiyana me ya bê heta heyayê em ê çawa bijîn jî bike. Ya sêyemîn, mînaka hatiye dayîn dişibe rewşa kesekî ku bi zorê ji agir xelas bûye. Werin em hewl bidin ku vê yekê li gorî serdema me li hev bînin. Rojavayî bi piranî xwe ji bo teqawidbûnê amade dikin. (Ez bi xwe ji vê zîhniyetê ne razî me ji ber ku teqawidbûn tê wateya vekişîna ji peywirê -pênaseya “xerabiyê” [kakos]. Lêbelê ji ber ku ew têkildarî hev in, ez ê teqawidbûnê weke mînak bikar bînim.)

Em xeyal bikin roja ku kesek teqawid dibe, banqe îflas dike. Hemû danhevên teqawidbûnê bi avê de diçin û tenê çend dolar di berîka wî de mane. Di heman rojê de, Ewlekariya Civakî û hemû şîrketên ku prîmên xwe li wan razandine îflas dikin. Bi ser van halan de xaniyê kesê teqawidbûyî jî dişewite û tenê ew û kincên ku lê ne dimînin. Ew her tiştî xwe winda dike. Ev rewş, senaryoyek e ku wê weke felaketê bê pejirandin. Lêbelê ravekirina Pawlos a bê ka çawa wê hin bawermend bikevin nava bêdawîtiyê, dişibe vê pênasekirinê. Û ne ji bo demeke bîst û pênc salan (temenê teqawidbûnê kêm zêde) ev rewşek e ku ji bo tevahiya bêdawîtiyê derbas dibe. Pawlos her wiha dibêje ku bawermend xelas dibe lêbelê her tişt dişewite û heta hetayê winda dibe. Ji bîr nekin, ev darizandineke ebedî ye. Ji kerema xwe şaş fêhm nekin -xelasî ne tiştekî ji rêzê ye, ew ji windabûna heta hetayê ya di gola agir de pir çêtir e. Em ê hemû ji têgihîştina xwe wêdetir kêfxweş bibin -lê wê texmîneke me ya bê ka wê çi bibe, çêbibe.

Divê em şaş nebin ku Pawlos bi van gotinan berdewam dike: “Îcar, ji ber ku em dizanin tirsa Xudan çi ye, em dixwazin baweriya mirovan bînin” (Korîntî II, 5:11). Ji kerema xwe ya dilê min bibihîzin -ez hêvî dikim ku ev tirsa pîroz a ku Pawlos behsa wê dike wê we îkna bike ku hûn dema xwe li ser tiştên ku wê ji we re ne sûdwerbin winda nekin, an jî li ser îmaja xwe ya pêşandan û têgihîştinê bisekinin. Ez hêvî dikim ku hûn ê dema xwe ji bo îtaetkirina Gotina Wî û Giyanê Wî veqetînin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Çimkî divê em hemû li ber kursiyê Mesîh ê dîwanê xuya bibin, da ku her kes li gor tiştên ku hê ew di bedenê de bû, kirine – qenc bin an jî xerab bin – bistîne. Îcar, ji ber ku em dizanin tirsa Xudan çi ye, em dixwazin baweriya mirovan bînin. Em ji Xwedê ve eşkere ne û hêviya min heye ku em ji wijdana we ve jî eşkere ne.” (Korîntî II, 5:10-11)

**Ramana sereke:** Me çawa bertek dabe çarmixê, diyar dike bê em ê ebediyeta xwe li kuderê derbas bikin lêbelê em weke kesên bawermend bê em çawa dijîn, diyar dike bê em ê di ebediyetê de jî çawa bijîn.

**Ramana kûr:** Gelo ez her roj ji bo ebediyetê li ser avakirina jiyana yên din bi rastî û hezkirina bêdawî disekinim an ez hêz, enerjî û dema xwe ji bo avakirina xwe xerc dikim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji bo ku ez bala xwe, enerjî, hêz û dema xwe ji bo avakirina tiştên demkî xerc dikim, min bibexşîne. Ez ji te dixwazim ku tu nîşanî min bidî bê ez ê çawa her roj Desthilatdariya Îsa ava bikim. Ji kerema xwe hêzê bide min ku ez heta hetayê bandorê li jiyana mirovan bikim. Ez bi navê Îsa spas dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê ne tenê li kesên ku bi vê jiyanê re winda bûn û çûn, ez ê li fersendê ebedî bigerim û bi van re meşgûl bibim.

# PÎROZIYA KU MIROV NIKARE XWE LI BER BIGIRE

HEFTEYA SISÊYAN

KESEKÎ NORMAL NE JI XWEDA, JI MIROVAN DITIRSE. MESÎHIYÊ BIHÊZ NE JI MIROVAN, JI XWEDA DITIRSE. MESÎHIYÊ LAWAZ JI MIROVAN PIR LÊ JI XWEDA KÊM DITIRSE.

– JOHN FLAVEL

# 15| TIRSA MIROVAN

Pîroziya rastîn ew e ku mirov bi temamî aîdî Xweda be. Pênaseya rastîn a pîroziyê "xweveqetîna ji bo Xweda" ye. Qada wê ewqas fireh e ku mirov dikare bi cildan pirtûkan li ser vê mijarê binivîsîne. Ji ber ku tirsa Xweda beşek ji pîroziyê ye, em ê li vir li ser xalên sereke bisekinin. Lêbelê berî ku em dest pê bikin, girîng e ku bi zelalî ev yek bê gotin: Pîroziya rastîn ne koletî ye, ew azadiya rastîn e.

Darizandina ku hatiye serê Hananya û Safîra, pêkan e ku bibe danasîna darizandina ku rojekê wê bê serê her mirovî. Pirsa ku di hişê mirov de dimîne ev e: Gelo ev jin û mêr mînakek e ji wan "kesên zerarê" dibînin li asîman, an jî xwe di cîhana miriyan de dîtin?

Ew kesên ku dibêjin ev jin û mêr hetahetayê lanetkirî ne, pirî caran balê dikişînin ser gotinên Îsa yên di metnên beşên pêşî yê Mizgîniyê de cîh digirin: "lê belê kî ku çêrî Ruhê Pîroz bike, tu caran lê nayê bihûrtin; ew bi gunehê herheyî sûcdar e" (Marqos 3:29). Xeletiya vê ramanê ji pênaseya çêrê diyar e ku tê wateya "bi awayekî ku zirarê bide an jî zirarê bide navûdengê kesekî û li ser kesekî xerab biaxivin." Vî jin û mêrî derew li Giyanê Pîroz kirin lêbelê ji ber pênaseyê li dijî Wî çêr nekirin. Ev yek çarenûsa wan ne diyar dike. Di her rewşê de, bila kesek ji me

dawiya wan parve neke.

Ji ber vê yekê, gelo di Nivîsên Pîroz de mînakek heye ku mirovek, her çiqasî em dizanin ku ew li bihuştê ye jî, li kursiya darizandinê winda bike? Ez bawer dikim ku heye. Destûrê bidin, ez ramanên xwe bi gotinên Pawlos rave bikim:

> "Ma niha ez lê digerim ku li mirovan an li Xwedê xweş bêm? An ez dixebitim ku mirovan dilxweş bikim? Eger min hê bixwesta ku ez mirovan dilxweş bikim, ez nedibûm xulamê Mesîh." (Galatî 1:10)

Çi gotineke bi hêz. Eger em bikevin bin bandora lêgerîna populerbûnê û di vir de têk herin, em wê îmtiyaza ku bibin xizmetkarê Mesîh winda dikin. Ji ber ku bi ser navê populerbûnê, em her dem îmajeke ku ji bo têgihîştineke erênî pêwîst e pêşkêş dikin. Wê bi tiştekî wisa re tu eleqeya Pawlos tunebûya û divê em jî weke vê yekê tevbigerin.

Pawlos di asteke bilin de bi tirseke pîroz jiya, em bînin bîra xwe: "bi tirs û lerizînê xelasiya xwe pêk bînin" (Filîpî 2:12). Ne li ser îmaja xwe ya pêşandanê, li ser îmaja rastî, ango li ser ya ku wê di darizandinê de derkeve holê zîqkirîbû. Ev zîqbûn, gava ku bi xeyalsîkestina kesên din, îtîraza wan an jî bi jêneraziya wan re bê beramberî hev jî ew di pîroziya rastî û Mesîh de, di îteatê de hişt.

Divê em her tim vê rastiyê li ber çavan bigirin: Hûn ji wî kesê ku hûn jê ditirsin re koletiyê dikin! Eger hûn ji Xweda bitirsin, hûn ê îteatê ji Xweda re bikin. Eger hûn ji mirovan bitirsin, hûn ê di dawiya dawî de ji daxwazên mirovan re îteatê bikin. Pirî caran, bi taybetî eger em hezkirin an jî hevaltiya kesekî dixwazin, em ji acizkirina Xwedayê ku me ew bi çavan nediye bêtir em xemgîn dibin ku wî kesê li hemberî xwe aciz bikin. Ji ber vê yekê, hatiye gotin ku "Tirsa mirovan dafik e" (Şîretên Silêman 29:25) ku Hananya û Safira bê guman ketine vê dafikê.

Ez dikarim xeyal bikim ku pevçûnek ku Pawlos bi rêberên din re jiya agirê wî gur kir û ew neçar kir ku van gotinên hişyariyê paşê di heman nameyê de binivîse:

> “Lê gava ku Kîfas hat Entakyayê, ez bi eşkereyî li ber wî rabûm. Ji ber ku sûcdar bû. Çimkî, beriya ku hin kes ji aliyê Aqûb ve bên, Kîfas bi bawermendên ku ji miletan bûn re xwarin dixwar. Lê piştî ku ew hatin, Kîfas ji yên ku li pey sinetbûnê diçin tirsiya, xwe da paş û ji wan veqetiya. Cihûyên Mesîhî yên din jî bi wî re durûtî kirin, wisa ku Barnabas jî bi durûtiya wan hat girtin. Lê gava min dît ku ew li gor rastiya Mizgîniyê rêve naçin, min li pêş hemûyan ji Kîfas re got: «Eger tu Cihû yî û tu bi xwe ne wek Cihûyan, lê wek miletan dijî, tu çawa miletan mecbûr dikî ku bibin Cihû?»” (Galatî 2:11-14)

Petrûs, Barnabas û bawermendên din ên Cihû ji nerazîbûna kesên ku wan rêz ji wan re nîşan didan, ditirsiyan. Ev arezûya pejirandinê bû sedem ku Petrûs û piştre yên din, bi awayekî durû tevbigerin. Îmaja wan ya pêşandanê, beriya durustbûna wan derket pêş û bi vî awayî bû sedema tevgereke xerab. Wergereke din a Şîretên Silêman ya ayeta 29:25ê ji me re wisa dibêje: “Talûke ye ku mirov bi ramana bê ka yên din li ser me çi difikirin, dakeve.”

Pawlos’ê ku durustiya xwe parast, bi Barnaba û yên din ên ku teslîmî zexta hawîrdorê bûn, Petrûs şermezar kirin. Pawlos destnîşan kir ku di nebûna rêberên Cihû yên muhafezekar de, Petrûs û hevalên wî li gorî rastiyê û li gorî îmaja xwe ya rastîn dijiyan. Weke nûnerên rastîn ên Îsayê Mesîh, ew bi rayedar kiribûn ku bawermendên nû ji neteweyên din qebûl bikin, wan bi hez bikin û bi wan re hevaltiyê bikin. Lêbelê gava ku dînamîk guherîn, Petrûs û Cihûyên din dest bi pêşandana îmajeke kirin ji bo ku mêvanan razî bikin. Encamên tevgerên wan, ew perwerde nedikirin, zirar dida wan.

Petrûs ezîzek e û ew li bihuştê ye. Lêbelê tevgera wî mînakeke ji niyet, gotin û kiryarên xerab an jî zirardar e ku dê li ser kursiya darizandinê lê bê lêkolînkirin. Eger em bi armanceke li hevkirî bijîn ku ev Îsa memnûn bike, em ê ji aliyê kesên din ve bê çawa li me dinêrin neyên bi rêvebirin; di şûna vê de em ê bi rastî bijîn. Ev yek, aliyeke girîng a pîroziya rastîn e. Vê bi baldarî bixwînin:

> “Peyva Xwedê jîndar û bi bandûr e. Ji her şûrê dudev hê tûjtir e. Û heta can û ruh, hem jî movik û mejî ji hev veqetîne, lê diçe; dîwana niyet û ramanên dil dike. Tu afirîn tune ku ji wî veşartî ye. Lê her tişt li ber çavê yê ku divê em hesab bidinê tazî û vekirî ye.” (Îbranî 4:12-13)

We ev gotin di dilê xwe de bi cîh kirin? Ji ber ku bi we nas tên, eger we çavek di ser wan re gerandibe, bi hêdîka dîsa bixwînin û li ser her hevokê bisekinin.

Bala xwe bidinê ku Gotina Xweda bi awayekî kûr dikeve nav raman û arezûyên me. Ew eşkere dike bê ka em bi rastî kî ne, ne li weke ku em xwe nîşan didin, dinêre. Eger em guh bidin Gotina Xweda û îteatê jê re bikin, ew me ji xapandina ramanên xerab û li dijî Xweda, weke ku Reb me nabîne, diparêze.

Guhdayîna bi baldarî ya li Gotina Xweda, tirsa Reb di dilê me de çalak dike. Ew dihêle ku em bi temamî di ferqa vê rastiyê de bin: “Tu afirîn tune ku ji wî veşartî ye. Lê her tişt li ber çavê yê ku divê em hesab bidinê tazî û vekirî ye” (Îbranî 4:13). Aniha em baştir fêhm dikin bê ji bo çi Giyanê Pîroz ev şîret li me kiriye:

> “Lawo, heke tu gotinên min qebûl bikî,
> Emrên min di dilê xwe de hilînî,
> Heke tu guhdariya şehrezayiyê bikî
> Û dilê xwe ber bi fêmdariyê ve meyildar bikî,
> Heke tu gazî têgihîştinê bikî
> Û dengê xwe ji bo fêmdariyê bilind bikî,
> Heke wekî zîv li wê bigerî
> Û wekî xezîneyê li pey wê bikevî,
> Wî çaxî tê tirsa Xudan fêm bikî
> Û zanîna Xwedê peyda bikî.”
> (Şîretên Silêman 2:1-5)

Rêya herî bi aqilmend ew e ku em Gotina Wî di hundurê xwe de bişopînin ku rêberiya daxwaz û niyetên me bike. Gava ku em Gotina Xweda weke xezîneya herî mezin a ku dikare were dîtin bibînin û guh

bidin tiştê ku ji me re hatiye eşkerekirin, wê demê em dikevin qadeke ewle. Weke ku ji vê mezintir xelatek tune be, gava ku em bi dilsozî hewl bidin ku rêyên Wî fêr bibin, em ê tirsa Reb fêhm bikin û ji pêşandana îmajeke xapînok û derewîn dûr bikevin. Niha em xwedî hêza jiyaneke bi durustî û rastiyê ne û em bi ewlehî li ser rêya pîroziyê ne.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Tenê Xudanê Karîndar pîroz bikin. Ji wî bitirsin, bila xofa we ew be. Wê bibe Pîrozgeh, Lê wê ji bo herdu malên Îsraêl, Bibe kevirekî terpilînê û latekî likumandinê. Ji bo şêniyên Orşelîmê, Wê bibe xefik û dafik.” (Îşaya 8:13-14)

**Ramana sereke:** Hûn ji wî kesê ku hûn jê ditirsin re koletiyê dikin! Eger hûn ji Xweda bitirsin, hûn ê îteatê ji Xweda re bikin. Eger hûn ji mirovan bitirsin, hûn ê di dawiya dawî de ji daxwazên mirovan re îteatê bikin. Eger hûn ji xwestekên kesên din re îteatê bikin, êdî hûn nikarin bibin xizmetkarekî rastîn yê Îsayê Mesîh.

**Ramana kûr:** Çima ez li şûna Xwedayê ku Wî bi awayekî fizîkî nabînim, ji bo dilê kesekî ku bi çavên serê xwe dibînim, nehêlim; bêtir hewl didim? Ez çima hezkirin, pejirandin û dostaniya ku ji mirovan tê, ji ya Xweda bêtir arezûya wê dikişînim? Ez çawa dikarim vê biguherînim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji bo wan demên ku min li şûna razîbûna Te, li razîbûna kesên din geriyam, ez lêborîna te dixwazim. Reb Îsa, ji ber ku li şûna razîbûna Te, ez di nav mirovan de li populerbûnê digeriyam, tobe dikim. Ji bo ku pîroz bibim, xwe ji bo Te vediqetînim. Ji vê gavê û pê ve, Tu ew kes î ku ez di dawiya dawî de dixwazim Te razî bikim. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez xizmetkarê Mesîh im. Ez ji razîbûna kesên din bêtir, li razîbûna Wî digerim.

LI HER CÎHÊ KU TIRSA XWEDA DI DIL DE DESTHILATDAR E, XÊRXWAZÎ Û OLDARÎ XWE RÛ DIDE Û YEK JI VAN JÎ NIKARE ME JI YA DIN DÛR BIXÎNE.

– MATTHEW HENRY


# MessengerX

***Sepana we ya rojane ya perwerdeya xwendekaran***

**Bi temamî belaş e!**

Tenê daxînin cîhaza xwe ya mobîlê û pêde herin!
An jî varyanta webê bi kar bînin:

MessengerX.com





## Bi 130+ zimanan û hîn jî berdewam e

- Bi 130 zimanan naverokê bibînin û daxînin.
- Çavkaniyan bi hevalên xwe re parve bikin an jî koma xebatê ava bikin.
- Her dem naveroka wê nû dibe.

# Temaşe bikin. Bixwînin. Guhdar bikin.

Ji bo hûn qurs, e-pirtûkan, pirtûkên bideng û kurte fîlman temaşe bikin, bixwînin û guhdar bikin; vê pirtûkxaneya dewlemend kifş bikin.









## Di mijarên herî girîng de bi pêş bikevin

Van mijaran kifş bikin: rehên malbatê, têkiliyên baş, nasîna hevjîna xwe, xelasiya ji pornografiyê, avakirina bîr û baweriyê, guhdariya Xweda û pêşengiya kar û bar û hîn pirtir!

## Rêwitiya we ya pêşketinê


**MessengerX** ji bo hûn gava xwe ya din biavêjin, heye. Ji ber vê wê alîkariya we bike ku hûn bi pêş bikevin. Ji ber vê jî me alavên bi hêz yên ku alîkariya xwendekaran bike û rê li ber wan veke, ava kirin.



## Taybetmendiyên bêhempa yên ku hûn ê pir ji wan hez bikin!

- Alavên rehet û hêsan yên ku wê bihêle hûn notan bigirin û hetta wê bihêle hûn komên xebatê ava bikin.
- Bi alîkariya AirPlayê re hûn dikarin li ser televîzyona xwe û Chromecastê bar bikin.
- Li ser hemû cîhazên xwe pêşketina xwe qeyd bikin. Ji bo ragihandineke xurt favoriyên xwe li pirtûkxaneya xwe qeyd bikin.
- Ji bo gava hûn ne onlayn bin jî hûn bikaribin daxînin cîhaza xwe.
- Tişta hûn lê digerin ji bo hûn bê kêmasî bibînin, lêgerîneke xurt û parzûneke bêqusûr.
- Pirtûkên bideng, beşên li dû hev tên yên Pirtûka Pîroz ya bideng û hetta hebandinan hûn dikarin bi awayekî otomatîk guhdar bikin!

# MessengerX, bi qasî sê (1-2-3) gavan hêsan e.




**1** Sepana MessengerXê ji App Store an jî ji Google Playê daxînin.

**2** Hesabekî li ser navê xwe vekin û zimanê wê biguherînin.

**3** Çavkaniyên xwe yên sereke kontrol bikin, bixwînin, temaşe bikin, guhdar bikin, daxînin û parve bikin.

## Weke xwendekaran xwe perwerde bikin û piştre xwedekaran jî perwerde bikin

Weke endamê **MessengerX**ê, hûn ê alîkariya xizmeta çavkaniyan ji hemû mirovên li her aliyê dinyayê re bikin.

***Ji ber ku mafê her kesî heye ku hîn bibe!***

MessengerX.com

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

</> Guncav e li ser hemû gerokên înternetê

# 16| ŞAŞITIYA ÎMTIYAZÊ

Nameya Galatiyan li dora sala 49an PZê hatiye nivîsandin, ji ber vê yekê em dikarin bigihîjin wê encamê ku rûbirûbûna Pawlos bi Petrûs û rêberên din ên Cihûyan re berî vê dîrokê qewimiye. Zêdetirî deh sal şûnde, li dora sala 63yan PZê, Petrûs nameya xwe ya yekem nivîsand. Ez bawer im ku ev bûyer, li seranserê dêra Galatiyan tê zanîn ku hîn jî di bîra wî de bû dema ku wî ev gotin nivîsandin:

> "Wek zarokên guhdar bin û li pey xwestekên xwe yên dema nezaniyê neçin. Eger hûn ji yê ku cihêtiyê naxe nav mirovan û her kesî li gor kirina wî dîwan dike re, dibêjin Bav, dema xwe ya xerîbiyê ya li ser dinyayê bi tirsa Xwedê derbas bikin." (Petrûs I,1:14, 17)

Zelal e ku Petrûs ji bawermendan re ango yên ku xwe înkar kiribûn, bi rêya çarmîxê ji bo cîhanê miribûn û bi temamî xwe dabûn şopandina Îsa, dinivîsand. Her cureya baweriya li derveyî vê bingehê ne rast e (Metta 16:24; Marqos 8:34; Lûqa 9:23; Galatî 6:14). Dema ku nûbûn çêdibe, xwezayeke xwedayî di hundurê me de derdikeve holê. Teslîmbûna li ber vê xwezayê me ji nîrê hestên me azad dike û Giyan û Gotina Xweda me

hêzdar dike ji bo ku em bikaribin vê bikin (Petrûs II, 1:4).

Şande, di mijara vegerê de me hişyar dike ji bo ku em nekevin nav arezûyên xwe yên kesayetî ku berê em kontrol dikirin. Yek ji arezûyên herî bihêz ku divê em înkar bikin û wan li çarmîxê xin, parastina kesayetiyê ye. Ev motîvasyona bingehîn a li pişt xwesteka nîşandana xwe bi awayekî ye ku ji hêla yên din ve bi awayekî erênî were fêhmkirin, bi gotineke din tirsa ji mirovan. Ev ne tenê hêza ajotinê ya li pişt tevgera xerab a Petrûs e, lê di heman demê de ya Hananya, Safira, Barnaba û yên din jî bû.

Petrûs me hişyar dike ku eger em teslîmî van arezûyan bibin, an li vê jiyanê an jî li jiyana piştî vê, wê darizandin di aleyhê me de be. Lêbelê ji bo ku em bi xwesteka Xweda ve girêdayîne, em ê bên xelatkirin. Di nava van talîmatan de, ew hişyariyeke cidî dide: Xweda tu kesî naheyirîne. Werin em bifikirin bê ka çi li pişt vê şîroveyê ye.

Îsa xizmeteke bi hêz da vî şandî. Ew yek ji rêberên pêşeng ên dêra destpêkê bû lêbelê çend sal berê li Antakyayê, ew û rêberên din ên Cihûyan ketibûn vê xefika tevgerên xweperest. Belkî jî şermezarkirina Pawlos ya rê li ber mirovan dixe, hişt ku bi awayekî rast niyet û kiryarên xwe binirxîne. Di bingehê xwe de, Petrûs neçar ma ku bi “sedem”a li pişt durûtiya ku wî nîşan da re, rû bi rû bimîne.

Dibe ku di dema vê rûbirûbûnê de, ew li ser tevgerên şaş yên rêberên din ên Pirtûka Pîroz, yên weke Qral Şawûl û Qral Dawid, fikirîbe. Şawûl, ji tirsa mirovan, ji bo ku têkeve çavê artêşa xwe, bêîteatî li fermana eşkere ya ku ji asîmanan hat, kir. Dawid zinê kir, piştre jî ji tirsa mirovan, mêrê jinikê da kuştin ji bo ku îtîbara xwe biparêze. Her du rêber jî bi gunehên xwe re rûbirû man û her du jî bi darizandinê re rûbirû man. Şawûl qraltiya xwe winda kir û şûr ji malbata Dawid qut nebû. Bi ketina nav xefika baweriya ku ew ji hêla Xweda ve hatine bijartin, her duyan jî sînorên kesane yên saxlem xistin xetereyê û di dawiya dawî de teslîmî neguhdariya li Xweda bûn.

Petrûs di wê ferqê de bû ku ev dikare pir bi hêsanî çêbibe. Wî hişyarî da me ku em xwe ji ramanên “îmtiyazê” yên weke “Ez bi xîret ji bo Xweda dixebitim” an jî “Min gelek tişt feda kirine ji bo avakirina Qraltiya Wî” an jî “Min salên xwe bi navbeynkarî û duakirinê derbas kirin” an jî

“Min weke rêberê dêrê gelek tişt bi dest xistine” dûr bisekinin ku dihêlin em bifikirin ku em ji darizandinê mûhaf in. Divê em qebûl bikin ku dawiya van ramanên şaş nayê lêbelê hemû tên wateya ji Min re “mafê rêyeke azad” didin ber min. Ev hişmendî xezîneya tirsa pîroz terk dike.

Petrûs, giraniya gotinên Îsa yên ku dibêje “De îcar hûn jî, çaxê we hemû tiştên ku li we hatine emirkirin anîn cih, bêjin: ‹Em xulamên bêkêr in; me ew karê ku li ser me deyn bû, kir.›”Lûqa 17:10) baştir fêhm kir. Di Grêkî de peyva “bênirx” weke “tişta ku pesindayîna taybet heq nake, ne layiqî pesindayîna taybet e” tê pênasekirin. Me çiqasî bi xîret ji Xweda re xizmet kiribe, bila be, divê em tu carî nekevin nava hewldaneke ku em xwedî îmtiyazê ne. Ev, hişmendiyeke xapînok e ku me hemûyan, bi taybetî jî rêberan bi awayekî pir hêsan dixe nava xefkê.

Petrûs îcar aniha nameyên xwe bi tecrubê û wehyê dinivîse. Ew dizane ku dermanê tirsa mirovan, jiyana di nav tirsa Xweda de ye. Careke din, rêz û heybeteke kûr tê îmakirin. Ew mifteya ku dihêle em ji aliyê Xweda ve bên xelatkirin, li şûna ku em bi darizandinê re rûbirû bimînin, dide me.

Gava ji vî alî ve lê bê nêrîn, eger em li doktrîna Îsa “deriyê teng û rêya dijwar” bikolin, wê rastiyeke ecêb derkeve holê ku gelek kesan ew ferq nekiriye.

> “Di deriyê teng re derbas bibin. Çimkî deriyê ku dibe helakê fireh e, riya ku diçe wê rihet e û yên ku pê ve diçin gelek in. Lê deriyê ku dibe jiyanê teng e, rê jî dijwar e û yên ku wê dibînin hindik in.” (Metta 7:13-14)

Îsa, li vir ketina jiyana bêdawî ji bo kesên ku baweriya xwe bi Wî tînin weke deriyê teng pênase dike. Bi vê yekê re, min kifş kir ku “rê”ya ku gelek kes behsa wê dikin, ji wan we ye ku ev rê kesên ne bawermend ber bi têkçûnê ve dibe. Lê eger hûn bi baldarî lê binêrin, hûn ê bibînin ku Îsa ne li ser rêya berî dîtina derî diaxive lê li ser rêya piştî derbasbûna ji derî ku lê meşiyaye, diaxive. Leon Morris wisa dinivîse: “Em ji destpêkê ve di derî re dikevin hundur (ango, em xwe didin şopandina Mesîh), piştre em li ser rêya ku li pêşiya me ye dimeşin.” Îsa li ser jiyana ku em piştî xelasbûnê di Wî de dijîn diaxive.

Ew îlan dike ku ew dijwar (an jî teng) e.

Doktrîna keremê(lutûf) ku di dêra me ya Rojavayî de pir populer e, ev rê fireh kiriye. Ew weke “Hemû gunehên me yên berê, aniha û pêşerojê, hatine bexşandin” îlan dike. Bêguman, ev îfade di çarçoveya guncav de rast e lêbelê ev îfade bi awayekî tê gotin ku nîşan dide ku em dikarin jiyaneke berfireh bijîn, weke cîhaneke windabûyî û dîsa jî bi Xweda re di hevpariyê de bin. Ev ne rast e, ji ber ku Petrûs di berdewamiya nivîsên xwe yên jorîn de wisa dibêje:

> “Wek zarokên guhdar bin û li pey xwestekên xwe yên dema nezaniyê neçin. Lê belê, çawa yê ku gazî we kiriye pîroz e, hûn jî di hemû rabûn û rûniştina xwe de pîroz bin. Ji ber ku hatiye nivîsîn: Pîroz bin, çimkî ez pîroz im.” (Petrûs I, 1:14-16)

Pîrozî ne pêşniyareke “hatiye tewsiye kirin” lêbelê fermaneke ku “divê bê kiri “ e. Mirov guhê xwe bide ya pêşî wê rewşeke bi zanayî be lêbelê paşguhkirina fermana Xweda bêaqilî ye. Wekî din, Petrûs ne behsa rewşa me ya di Mesîh de dike, ew behsa kiryarên me dike. Ji bo ku em bigihîjin vê şeweya jiyanê, divê em di “phóbos” (tirsa pîroz) de bijîn. Xweda ji bo ku me ji xendekên ku wê me li her du aliyên rêya teng asê bikin, dûr bixin; du hêzên mezin dan me. Xendeka yekem qanûn e, ya duyem jî bêqanûnî ye.

Gelek kesên di dêrê de berî çend salan ketibûn xendeka qanûniyê. Di wan rojan de pîrozî, li ser pêdiviyên şêwaza jiyana nexwaziyî bû ku li dijî Nivîsên Pîroz bûn. Wan mizgîniyeke xelasiyê ya derewîn a li ser bingeha karan belav dikir. Ew koletiyeke ecêb tirsnak bû û bû sedem ku gelek kes hêrs bibin û heta baweriyê jî terk bikin. Peyxameke mezin em ji vê xendeka berbat rizgar kirin: Xweda Xwedayekî baş e. Hezkirina Bavê me yê Asîmanî pêk hat û gelek kes ji vê koncala qanûniyê derxist.

Lê me ew şaşiya ku mirov pir caran dikin, kir -me biryar da ku em ewqasî ji xendeka qanûniyê dûr bikevin ku em çûn dawiya din û ketin hundurê xendeka bêqanûniyê. Ev xendek dihêle em jê bawer bikin ku em bi keremeke dijî Nivîsên Pîroz rizgar bûne ku dihêle em ji yên din cuda nejîn -ku em êdî dikarin li gorî daxwazên hestên xwe bijîn, ne li gorî jiyaneke xaçkirî li ser bingeha hêza Mesîh a di hundurê me de.

Ev; derewek e ku rê li ber gelek kesan digire ku hebûn, bereket û hêza Xweda tecrube bikin.

Pîrozî ne koletî ye, berevajî vê, ew azadiya rastî ye ya ku rê vedike ku mirov hem ji Xweda û hem jî ji vê jiyanê zewqê bistîne. Bang li me hat kirin ku em layiqî Kes'ê ku em xelas kirine, bijîn. Em di vê jiyanê de bi tirsa Reb dimeşin û em ê vê rastiyê di çend beşên pêş de ji hev derxînin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Wê li wir riyeke mezin hebe, Wê jê re "Riya Pîroz" bêjin. Wê zilamê nepak di wê derê re derbas nebe, Wê ya kesên riya Xudan be. Kesên di wê riyê re derbas dibin, Ehmeq bin jî, wê jê averê nebin." (Îşaya 35:8)

**Ramana sereke:** Hezkirina Xweda me ji xendeka qanûniyê diparêze. Ji aliyê din ve, tirsa Reb me ji xendeka bêqanûniyê diparêze. Tirsa pîroz min xurt dike ku ez li ser rêya rastîn a pîroz bimînim.

**Ramana kûr:** Di jiyana xwe de min di kîjan rêyan re tirsa pîroz paşguh kiriye û kîjan tevgerên ne xwedayî xweş dibînim? Xizmeta min a di desthilatdariyê de, çawa rê daye min ku ez fermana pîrozbûnê, weke ku Xweda pîroz e, paşguh bikim? Û kîjan hesta îmtiyazê bûye sedem ku ez xeletiyê bikim û bikevim koncala bêqanûniyê?

**Dua:** Xwedayê delal, ji ber ku min texmîn kir ku ez ji ber xizmeta xwe ya di Desthilatdariyê de ji darizandinê mûhaf im, min bibexşîne. Ez ji vê yekê tobe dikim û weke ku tu pîroz î, ez guh didim fermana te ya pîrozbûnê jî. Çawa ku min himbêzkirina hezkirina te ji bo xwe hilbijart, ez tirsa pîroz jî himbêz dikim û hildibijêrim. Eger gava ez herduyan hilbijêrim, Gotina Te sozê dide min ku ez ê li ser rêya ku ber bi jiyanê ve diçe bimînim. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Çawa ku Xweda pîroz e, ez jî pîroziyê hildibijêrim!

ZAROKNO, JI XWEDA BITIRSIN. BI GOTINEKE DIN, JI BO KU HÛN XWE JI XERABIYÊ BISITIRÎNIN Û JI BO KU HÛN HEBANDINA TIRSA PÎROZ Û RASTIYÊ BIKIN, BIBIN XWEDIYÊ HELWESTEKE HIŞK.

– WILLIAM PENN

# 17| JI XERABIYÊ DÛR BIKEVIN

Tirsa Reb, diyariyek e ku Bavê me yê Asîmanî yê dilovan, me diparêze û nahêle em ji Îsa dûr bikevin. Ew çavkaniya jiyana herheyî, hezkirin, şahî, aştî, qencî, hêvî û hemû tiştên bêhempa ye. Dûrketina ji Wî tê wateya çûna ber bi mirin, tariyê û di dawiyê de ber bi dojehê ve. Ev ji me re hatiye gotin: "Bi tirsa Xudan, mirov ji xerabiyê dûr dibin" (Şîretên Silêman 16:6).

Ez bûyereke ku min ev rastî tecrube kiriye bi we re parve bikim. Di dawiya salên 1980'î de, waîzekî populer yê televizyonê dizî û daleveriya wî nav û dengî bi xwe xist. Bû kesekî ku nav û dengê wî li hemû dinyayê belav bû lêbelê ji ber sedemên ne baş. Wan deman, xizmeta wî hem ji aliyê firehiyê ve û hem jî ji aliyê aboriyê ve di dinyayê de ya herî mezin bû lêbelê navûdengiya wî ya mezin ku hemû qanalên mezin yên nûçeyan; qeydên sûcên ku rojane dikirin, daweya ku bi van sûcan re çêbû, sûcdariya wî û herî dawî cezayê girtîgehê yê ku lê hat birîn, kirin nûçe û bi van hemûyan re navûdengiya wî mezintir bû.

Çil û pênc sal heps lê hatin birîn lêbelê piştre di dozeke venêrînê

de cezayê wî daxistin heta pênc salan. Di sala 1994'a de ango di sala çaran ya girtîgehê de, telefonek hat ji asîstanê min re ku ne li bendî vê telefonê bû. Ez wî nas nekim jî, hinekan pirtûka min ya pêşî ya bi navê "Xwedayê Min Tu li Kuderê yî" dabûyê. Li girtîgehê pirtûk xwendibû û pir di bandora wê de mabû. Ji asîstanê min xwestibû ku ez herim serdana wî bikin, ji ber vê xwestibû xwe bigihîne min.

Ez çûm serdana wî û ez ê wê serdanê tu carî ji bîr nekim. Bi kincên girtîgehê hat ket cîhê serdanê. Nêzîkî min bû, destên xwe vekirin û ji deqîqeyekê zêdetir ez himbêz kirim. Piştre bi milên min girtin, bi hêsiran li min nêrî û jidil ji min pirsî: "Te nivîsand an nivîskarekî bênav nivîsand?"

"Min nivîsand. Min êş kişandin lê dîsa jî nagihên êşên te kişandine."

Piştre wisa got: "Gelek tiştên em biaxivin hene û tenê nod deqîqe dema me heye."

Ez hinekî ditirsiyam ji ber ku cara pêşî bû ku min pê re hevdîtin dikir. Ev zilam ewqasî hatibû rexnekirin û reşkirin ku bi rastî, min nizanibû ez bi kê re diaxivim. Lê gava em rûniştin, bi gotina xwe ya pêşî re çekên min ji destên min derxistin. Li nava çavên min nêrî û got: "John, ev girtîgeh ne darizandina Xweda ya li ser jiyana min bû, ev dilovaniya Wî bû. Eger min li ser rêya ku min dabû ser berdewam bikira, ez ê heta hetayê di dojehê de bûma."

Bi van gotinan re hemû bala min kişand ser xwe. Wî behsa xerabiyên xwe yên bê çiqasî mezin in û behsa xelaskirina Xweda bê çiqasî mezin e, kir. Zêde dem negirt ku min ferq kir ku ez bi mirovekî Xweda yê dilsoz, şikestî û poşman re diaxivim. Wî berdewam û rave kir ku Xweda çawa di sala wî ya pêşî ya zindanê de ew ji tariyê rizgar kiriye.

Ez hîn bûm ku ew her roj hem şexsî û hem jî bi komî, bi saetan Pirtûka Pîroz dixwînin û duayan dikin. Bi coş li ser dêra girtîgehê û pastorê wê ku ew jî bi xwe girtî bû, diaxivî. Ji ber ku ez difikirîm ku ew di nav wan de yê herî jêhatî û zane ye, min jê pirsî bê çima ew ne pastor e. Wî rave kir ku ew naxwaze bibe beşek ji rêberiyê heya ku veguherîna wî temam bibe. Got: "John, ez manîpulatorekî pispor bûm û min nexwest ku şansekî din bidim ku ev yek ji nû ve derkeve holê."

Piştî salekê jidilbûna wî hat îspatkirin ji ber ku piştî ji girtîgehê

derket tevlî organîzasyona mîsyoneke li navenda bajarê Los Angeles’ê bû. Du salan li kolanan bi kesên ku bêmal in daket. Ji vê xizmetê hez kir ji ber ku di nava koma vê kêmara kesên bêmal de, derbarê wî de ramaneke wan tunebû.

Piştî ku min bîst deqîqeyan lê guhdar kir, bi qasî ku karibim pirsan jê bikim, min xwe rehet hîs kir. Bi pirsa herî mezin ya ku hat hişê min, min dest pê kir: “Hezkirina te ya li hemberî Îsa kengî qediya?”

Min ev pirs pirsî ji ber ku di qonaxên destpêkê yên xizmeta wî de, hezkirina wî ji bo Îsa bi awayekî zelal geş bû. Tîn û arezûya wî ji aliyê her kesî ve dihat fêhmkirin. Min dixwest bizanibim bê kengî hezkirina wî qediya û çi bûye sedema wê.

Li nava çavên min nêrî, bi awayekî jidil got: “Hezkirina min ya ji bo Îsa qet neqediya.”

Ez bi vê gotinê re şaş mam û hinekî jî hêrs bûm. Min got, çawa fedî nake û vê dibêje! Min di cîh de bersiv da: “Tu behsa çi dikî? Berî sextekariya te ya postayê ku tu ji ber wê ket zindanê, heft salan te zinê kiriye. Tu çawa dikarî ji min re bibêjî ku te di van heft salan de ji Îsa hez dikir?”

Bêyî ku çavên xwe ji yên min bide alî, bi awayekî aram got: “John, min her dem ji Îsa hez kir.”

Şaşmayina min diyar bû. Sekinî û dûra diyar kir: “Lê ez ji Xweda netirsiyam.” Dîsa sekinî, piştre bi awayekî hîn hûrgilîtir got: “Min ji Îsa hez dikir lê ez ji Xweda netirsiyam.”

Ez şaşomaşo mabûm û bi rastî ji ber giraniya gotinên wî ez sar sekinîm. Bêdengiyeke ku li dor panzdeh saniyan berdewam kir çêbû û hişê min di temamiya vê demê de dixebitî. Piştre wî şîroveyeke ku îro jî di dilê min de deng vedide kir: “John, bi mîlyonan Amerîkî hene weke min -ew ji Îsa hez dikin lê ji Xweda natirsin.”

Te digot qet Xweda bi devê wî diaxive. Bi vê şîroveya wî re, ji nişkê ve bersiva gelek pirsan hat dayîn. Ez matmayî mam û wî sedema bingehîn a ku ji bo çi gelê me bi girseyî baweriya xwe terk dikir, bi peyvan anî ziman. Û mixabin, vegera ji baweriyê ya ku wê demê berbelav bû, ji wê demê ve hîn bêrtir jî zêde bû.

Nivîsên Pîroz vê yekê bi awayekî zelal diyar dikin -xala destpêkê ya ji bo naskirina Xweda ya ji nêz ve, tirsa Reb e. Bêyî ev tunebe, em bi

Îsayekî derewîn re hevaltiyê dikin ku ne Rebbê rûmetê ye. Di rewşek wisa de, em baweriya xwe bi xelaskarekî ne rast tînin. Ez ê vê rastiyê di beşên pêş yên pirtûkê de bi kûrahî nîqaş bikim. Lê pêşî, ez dixwazim bi du mînakên kurt, delîlan pêşkêş bikim.

Di nivîsandina vê pirtûkê de, hîn vê hefteyê, min nûçeyeke ku dilê mirov diêşîne li ser jineke ciwan a ku ez wê ji zarokatiyê ve nas dikim, bihîst. Ew weke bawermendekê mezin bû û îlan kir ku dide dû şopa Îsa lêbelê di nava hevalên xwe yên mêr de weke “jinikeke sivik” deng da û kete nava pêlên jiyaneke kêfê. Ez xemgîn bûm dema min dît ku wê vê dawiyê li ser Instagramê nivîsandiye ku Îsa di dema kurtajê de destê wê girtiye. Gelo wê behsa kîjan Îsa’yî dikir?

Jineke din a ciwan ku bi zilamekî bawermend re zewicî bû, şîrove kir ku Îsa soz dabû wê ku eger ew biryar bide ku ji mêrê xwe veqete, ew ê li wê binêre. Wê dev ji mêrê xwe berda û li dû xwe xirbeyeke ji mêr, zarok, malbat û hevalên xwe hişt. Sedema veqetînê ne zinê bû, wê êdî ji mêrê xwe hez nedikir. Ne îstîsmar, ne bêexlaqî, ne jî pirsgirêkên aborî hebûn -ev hemû rasterast ji devê wê derketin. Ya rastî, wê ji min re got ku mêrê wê mêrekî nazik û bavekî dilovan û hevserekî baş bû. Gelo wê behsa kîjan Îsa’yî dikir?

Ev tenê du mînak in ji mînakên bêhejmar ku ez dikarim bidim derbarê kesên ku îdîa dikin ku bi Îsa re di têkiliyê de ne lê jiyanekê dijîn ku nakokî tê de heye. Ev herdu û yên din ên weke wan çawa dikarin ewqas werin xapandin? Ez bawer dikim ku sedema vê nebûna tirsa pîroz e.

> “Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lêbelê hê bêtir di dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin.” (Filîpî 2:12)

Pawlos, nabêje ku divê em di rizgariya xwe de bi hezkirin û dilovaniyê bigihêjin. Gelek kes wê bibêjin ku ev her du jin jî dilovan û dilxweş bûn. Wê bibêjin ku ew bi salan çûne dêrê û dilsoziya xwe ya bi Îsa re îspat kirine. Lê ew çawa dikarin serserkî xwe bavêjin nava tevgerên wisa bêqanûnî? Ew xwedî heman kêmasiya wî mizgînvanê

navdar in. Em ne bi hezkirina Xweda, bi tirsa Reb re ji xerabiyê dûr dikevin. Hezkirina Xweda me dibe ber bi Wî ve, tirsa Xweda me ji xerabiya ku dixwaze me tune bike diparêze.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Tirsa Xudan, nefreta ji xerabiyê ye. Loma ez ji quretî û pozbilindiyê, Ji riya xerab û gotinên şaş nefretê dikim." (Şîretên Silêman 8:13)

**Ramana sereke:** Tirsa Reb, diyariyeke ji Bavê me yê Asîmanî yê dilovan e ku me ji dûrketina ji Wî diparêze. Gava ku em li şûna nefretkirina ji gunehê, tehemûla xwe ji wî re bi pêş dixin, ew gav e ku em dest bi dûrketina ji Wî dikin.

**Ramana kûr:** Kirina gunehê di wê gavê de çênabe ku mirov xwe bi kesekî/ê li derveyî peymana zewacê re di nav nivînan de bibîne. Ew di wê gavê de dest pê nake gava ku mirov xwe dibîne ku pereyan ji cîhê karê xwe didize. Hîn pir zûtir, gava Îsa ji bo me azad bike ku jiyana xwe da me û me jî ev yek pir bi xweşî dît, dest pê kir. Ji bo ku ez azad bibim ku Îsa xwe di ber min de kuşt, îcar ez çi di vê rewşê de xweş dibînim?

**Dua:** Rebê min î delal, ji ber ku min guneh xweş dîtin, ne tenê di jiyana xwe de lê di heman demê de, di jiyana bawermendên din de ku min bi wan re têkilî daniye jî, ji te bexşandinê dixwazim. Ji bo ku di rêya xelet de berdewam nekin û ji ber ku ez bi dilekî nazik û dilovan re nêzî wan nebûm, min bibexşîne. Ez ji vê xweşdîtinê tobe dikim. Ez ji te re spas dikim ku te min bexşand. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê ji mirovan hez bikim ji ber ku Xweda ji mirovan hez dikî. Ez ê ji gunehên ku mirovên ji wan hez dikim, nebextewar dikin, nefret dikim.

“MIN BI GAVÊN ŞIDAYÎ DA SER RIYA TE, NEŞEMITÎN LINGÊN MIN.”

– ZEBÛR 17:5

# 18| MAYÎNDEBÛN

Du serpêhatiyên girîng di sala 1994'a de, ango konferanseke dêrê ku peyama min a li ser tirsa Xweda tê de hate sererastkirin û serdana min ya zindanê ya ji bo mizgînvanekî televîzyonê, di hundurê min de arezûyeke ji bo fêhmkirin û mezinbûna tirsa pîroz geş kirin. Her du bûyeran jî heman peyam di xwe de dihewand lêbelê bi du perspektîfên cuda.

Ew dêra ku ya herî mezin û ya herî bi bandor a herêmê, êdî tuneye. Û pastorê hîn dikir ku bawermendên Peymana Nû ne hewce ne ku ji Xweda bitirsin, êdî xizmetê nake. Mizgînvanê ku min di girtîgehê de ew nas kir, ew xizmeta xwe ya mezin winda kir lêbelê ji dema ku bi ser tirsa pîroz vebû û ew himbêz kir, li ser rêya xizmeta dilsoz ya Xweda û mirovan dimeşe. Ew aniha di rêxistineke xizmetê ya cuda de dixebite ku bandorê li gelek kesan dike.

Ev her du bûyerên ku bi awayekî ne têkildarî hev xuya dikin, girîngiya tirsa Reb nîşan didin ji bo dûrketina ji xefika xerabiyê ku wê dema me weke şandiyên bi bandor ên Mesîh derkevin holê. Em dikarin vê bi peyvekê kurt bikin: Mayînde. Di demên dawî de, pastorekî rêzdar bi min re sohbetek parve kir ku wî bi profesorekî Pirtûka Pîroz re kiriye ku lêkolînek berfireh li ser kesên ku Xweda di Pirtûka Pîroz de gazî wan kiriye û ew peywirdar kirine. Wî dît ku ji sedî 75ê xizmetkarên bijartî xwedî bandoreke kurtdem in û gelekan ji wan xizmeta xwe bi awayekî

baş bi dawî neaniye. Gava ku em trajediyên xizmeta xwe bi lêkolîna vî profesorî re dikin yek, eşkere dibe ku berdewamiya di xizmetê de mijarek e ku divê em hemû bi awayekî ciddîtir lê binêrin.

Di dawiya salên 1990'î de, girîngiya tirsa pîroz a bi mayîndetiyê ve girêdayî wê bi ezmûneke din a girîng û wehiyeke ji ber wê derketiye holê wê dîsa bihata îspatkirin. Min li bajarê Kuala Lumpur yê Malezya'yê xizmet dikir. Ev civîna dehemîn û ya dawî bû û ew bi bawermendên ji çar aliyên welêt tijî bû. Piştî ku min peyam qedand, gelek kesan bersiva banga hebandinê dan ji bo ku tevlî xizmetê bibin. Qelebalixeke mezin li ber dika fireh kom bibûn û li benda duayê bûn.

Ez ji derenceyên platformê daketim û ji nişkê ve hebûna Xweda bi awayekî şênber û bihêz di salonê de xwe nîşan da. Hezkirin û kêfxweşiya wî ku salon dagirt, bi zelalî diyar bûn. Yên li pêşiya min dest bi ken kirin û ev ken di demeke kurt de veguherî tîqetîqa wan. Kêfxweşî bi lez belav bû heta ku bandor li her kesê li pêşiya min kir. Li gorî ku xuya bû "Abba Baba" biryar dabû ku zarokên xwe taze bike. Min pir zû fêhm kir ku divê ez tiştekî nekim, ji ber vê yekê ez li qiraxa platformê rûniştim û min kêfa ku Xweda zarokên xwe bihêz û pîroz dike, derxist.

Piştî pênc heta heft deqeyan, hebûna Wî ya xweşik cîhê xwe da bêdengiyekê ku di hewayê de daliqandî mabû. Em hemû bêdeng man û me ji aramiya bêhempa ya li salonê kêf distend. Lêbelê di nav çend deqeyan de hebûna Xweda, bi awayekî cuda ji ya ku ji Brezîlyayê di bîra min de mabû, xwe nîşan da. Bi hêviya ku guhertinek çêbibe ez rabûm ser xwe. Ew her ku diçû xurtir û xurtir dibû, vê carê ba nedihat lê desthilatdarî û mezinahiya Wî bi zelalî dihat hîskirin. Yên ku çend deqeyan berê, bêyî rêberiya devkî, dikeniyan, hema hema di heman demê de dest bi girî û lavayan kirin, hin ji wan bi dengekî bilind û pir zêde digiriyan û diqîriyan.

Hebûna Xweda xurttir bû û girî zêdetir bû. Weke ku ev mirovên bêdeng ên Asyayî bi agirê giyanî yê Xweda re dihatin waftîzkirin. Careke din, ne gengaz e ku mirov ev tiştên xuyabûn rave bike û armanca parvekirina vê kêliya pîroz ne ev e lê ya girîng mezinbûna hebûna Wî ye. Ew gihîştiye xalekê ku min nedifikirî ku em êdî dikarin vê yekê tehemûl bikin.

Di vê hevdîtinê de, bi awayekî zelal haya min ji cudahiya di navbera can û giyanê min de, çêbû. Ji me re hatiye gotin ku gotina Xweda "can û giyan ji hev vediqetîne" (Îbranî 4:12). Hişê min (canê min) wisa difikirî: Ez

êdî nikarim vê yekê tehemûl bikim! Xwedayo, ev pir zêde ye! Ji aliyê din ve, dilê min (giyanê min) wisa diqîriya: Xwedayo, ji kerema xwe hebûna xwe ji holê raneke, ji kerema xwe raneweste!

Ez careke din heman tiştî fikirîm: "John Bevere, eger tu gaveke xelet bavêjî û eger tu peyveke xelet bibêjî, tu yê bimirî." Ez nikarim bi teqezî bibêjim ku ev ê bibe, weke li Brezîlyayê bû lê min dizanibû ku di vê atmosfera pîroz de bêrêzî nayê pejirandin.

Hebûna Wî ya bêhempa sê-çar deqeyan berdewam kir û piştre rabû çû. Bi çûyîna hebûna Xweda re, bêyî tu talîmatan, kesên li wir dîsa bêdeng man. Ez çend deqeyan di nava aramî û hizûra piştî wê demê de, bêdeng mam.

Dema ku ez ji avahiyê derketim, atmosfera salonê cidî, bêdeng û rêzdar bû. Ez rawestiyam ji bo ku bi zilamekî Hindî û jina wî re biaxivim, her du jî pir di bin bandora hebûna Xweda de mabûn. Me çend deqeyan bi matmayî û bêdengî li hev nêrî, piştre jinik bi dengekî nerm axivî: "John, weke ku nava min paqij bûye ez xwe hîs dikim." Mêrê wê jî piştgiriya wê dikir û serê xwe dihejand.

Dema wê ev gotin anîn ziman, dilê min kirî ji cîhê xwe derketa. Di dawiya dawî de, kesekê bi awayekî rast hestên min ên ku berê min li Brezîlyayê hîs kiribûn û aniha jî min li Malezyayê hîs dikirin, anîbûn ziman. Bi hesteke kontrolkirî re, min bersiv da: "Ez jî!" Em êdî zêdetir neaxivîn lê gotinên wê heta dawiya wê rojê jî di hişê min de deng vedan.

Sibeha din, li odeya xwe ya otêlê, min xwe amade dikir ku bi ciwanên dêrê û yên di kadroya xizmeta dibistana Pirtûka Pîroz de dixebitîn re bi basketbolê bilîzim. Ji nişkê ve min bihîst ku Giyanê Pîroz ji min re wisa got: "Kurê min, Zebûra 19. bixwîne."

Min rahişt Pirtûka Pîroz, min ew pasaj vekir û dest bi xwendinê kir. Gava ez gîham ayeta 9. min ev gotin xwendin:

> "Tirsa Xudan paqij e, her û her dimîne." (Zebûr 19:9)

Ez di odeya xwe de qêriyam: "Ha ev e! Ha vaye li vir e!" Ez matmayî mabûm, tişta ku berî rojekê wê jinikê ji min re gotibû, tam jî ev bû. Me di giyanên xwe de paqijiyeke ku mirov nikare bîne ziman û safbûneke kûr hîs kiribû. Piştre îfadeya "heta hetayê dimîne" ji rûpelê firiya derve. Giyanê Pîroz di cîh de ji dilê min re axivî:

> Kurê min; Lucifer li ber textê min hebiya, weke ku hatibû peywirdarkirin û hatibû mesîhkirin, rûbertiya artêşên ezmanî kir. Wî xwe avêt min, mezinahiya min dît lê ji min netirsiya ji ber vê li ber textê min heta hetayê nema. (Hezekiyêl 28:13-17)

Ji sisê bahran bahreke ferîşteyan mezinahiya min dîtin lê li cem Lucifer cîh girtin. Ji min netirsiyan û li ber huzûra min heta hetayê neman. (Peyxam 12:4, 7)

Adem û Hewa, di hênkahiya rojê de di hizûra mezinahiya min de meşiyan. Ji min netirsiyan û di bexçeyê Adenê de heta hetayê neman.

> Kurikê min, her hebûna hatiye afirandin ya ku heta hetayê li ber textê min e, wê azmûna pîroz ya tirsa Reb derbas bike. (Destpêk 3:8)

Çavên min ji vê rastiyê re vebûn. Min dest pê kir û li ser hemû pastorên ku çalakiyên wan ên xizmetê hatine qutkirin an jî nikarin baş biqedînin bifikirim. Gelekan bi dilgermî dest pê kirin, ji Îsa pir hez kirin, îteata wî kirin û ji bo xizmeta gelê Xweda xwe feda kirin lêbelê ew westiyan, bê eleqe bûn û gelekan ji wan dev ji xizmetê berda. Ew nebûn mayînde.

Yên din hîn jî xizmet dikirin lêbelê wan ew weke amûreke qezencê û ji bo armancên cûrbecûr ên berjewendiyên xwe bi kar dianîn. Hinekan ji wan meqamên xwe yên rêbertiyê bikar anîn ji bo ku jinên bêguneh bixin nav xefkên seksê; hin ji wan bûn şêwirmend û şopînerên xwe manîpule kirin ku peyamên xapînok ji xizmetkarên xwe re şandin ji bo ku hejmareke mezin ya pereyan bidin wan; yên din derbarê gotinên pêxemberî yên ku ji aliyê Xweda ve tên, derew kirin; rê dîtin ji bo ku agahiyên veşartî yên kesên ku qaşo xizmet dikirin bi dest bixin û piştre wê weke wehiya pîrozî îlan kirin. Lîsteya tevgerên dejênere bûne wisa berdewam dike.

Ev mirovên ku wisa pak û paqij dest bi xizmetê dikin, çawa ewqasî qirêj dibin? Çima çalakiyeke wan a mayînde tuneye? Sedema vê tunebûna tirsa pîroz e. Tişta ku Îsa jê xweş e, weke rewşa wî pastorê li Başûrê Rojhilatê Amerîkayê bû ku weke tiştekî sivik hat hesibandin, heta hat redkirin. Tişta ku weke “xezîneya” Xweda pênase dike, ji xwe

û yên din dûr dixînin. Lê guh bidin van gotinên Xweda yên li ser tirsa pîroz û berdewamiya di xizmetê de:

> "Xwezî bi wan ku ji Xudan ditirsin
> Rastdariya wî her û her bimîne.
> Yê rastdar her û her tê bibîranîn."
> (Zebûr 112:1, 3, 6)

Ji bo ku em kifş bikin bê tirsa pîroz çiqasî girîng e, ne hewce ye ku em trajediyan bijîn. Ji kerema xwe, ji bo mezinahiya Xweda û berdewamiya di xizmetê de, qedrê tirsa pîroz bigirin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Heskirina wî ya ji yên ku ji wî ditirsin re ewqas mezin e." (Zebûr 103:11)

**Ramana sereke:** Hemû afirîdeyên ku heta hetayê wê li ber textê Xweda bin, wê ew kes bin ku ji Wî bitirsin.

**Ramana kûr:** Yek ji hêmaneke ku mirov baş bijî, ew e ku mirov jiyana xwe baş bi dawî bike. Tirsa Reb heta hetayê dimîne. Ez çawa dikarim tirsa pîroz bikim bingeha jiyana xwe? Bi çi awayên pratîkî ez dikarim tirsa pîroz weke fîltereke di her tiştê ku ez dibêjim an jî dikim de bikar bînim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, Tu di Gotina Xwe de dibêjî ku Tu xwedî hêz î ku min ji ketinê biparêzî û min bêqusûr û bi şahiyeke mezin bigihînî hebûna Xwe ya bi rêzdar. Ez dizanim ku ev yek wê bi himbêzkirina tirsa pîroz a ku vê têkiliya ebedî ewle dike, ji bilî rizgariya ku ji hêla Rebê min Îsa ve hatî peyda kirin, pêk were. Ez dua dikim ku tirsa pîroz her gav di hundurê min de bimîne, ji bo ku ez heta hetayê di hizûra Te de bijîm. Ez vê yekê bi navê Îsa dixwazim, amîn.

**Daxuyanî:** Di nava tirsa pîroz de li mala Reb, di hizûra Wî de ez ê heta hetayê bimînim.

EGER HÛN JI RASTIYA BAVÊ XWE YA PÎROZ, PÎROZ Û PÎROZ ZEWQÊ NESTÎNIN, NAXWE WÊ DEMÊ HÛN JI ALIYÊ GIYANÎ VE MIRÎ NE. DIBE KU HÛN TEVLÎ DÊREKÊ BIBIN. DIBE KU HÛN DIÇIN DIBISTANEKE MESÎHIYAN. LÊ EGER HÛN DI GIYANÊ XWE DE JI PÎROZIYA XWEDA ZEWQÊ NESTÎNIN, HÛN XWEDA NAS NAKIN. HÛN JI XWEDA HEZ NAKIN. TÊKILIYA WE BI XWEDA RE TUNEYE. HÛN BIYANIYÊ KAREKTERÊ WÎ NE.

– R. C. SPROUL

# 19| XWE PAK Û PAQIJ BIKIN

“Tirsa Xudan paqij e, her û her dimîne” (Zebûr 19:9). Nivîskarê Zebûrê behsa du tirsên girîng ên pîroz dike ku divê neyên paşguhkirin an jî bi çavekî biçûk li wan neyê nêrîn: paqijî û mayîndetî. Niha em li ya yekem bikolin û em ê di beşeke pêş de bi berfirehî li ser ya duyem bisekinin. Pawlos wisa dinivîse:

> “Îcar hezkirîno, madem ku em xwediyê van sozan in, em xwe ji her cûreyê murdariya ruh û bedenê paqij bikin û bi tirsa Xwedê pîroziyê temam bikin.” (Korîntî II, 7:1)

Li vir, em heman rastiya ku ji hêla nivîskarê Zebûrê ve hatiye vegotin, dibînin lê bi kûrahiyeke mezintir. Berî her tiştî ez dixwazim vê diyar bikim ku pîrozî ne bi hezkirina Xweda lê bi tirsa Reb dikemile. Mizgînvanê populer bi bîr bînin ku jiyaneke ne layiqî Xweda jiyaye lê dîsa jî ji Îsa hez dikir. Piştî ku tirsa pîroz himbêz kir, wî xwe paqij kir û ji qirêjiyên xwe yên berê paqij bû. Vê yekê wî ber bi têkiliyeke pir rasttir

ve ya ku wî berê bi Îsa tecrube kiribû, bir. Em di Nivîsên Pîroz de dibînin bê ka ew bi awayekî tecrubekirî çi tiştan hîn bûye.

Weke ku me berê jî nîqaş kir, pîrozî van rojan ne mijareke populer e. Ji bo gelek kesan, çêja wê ne xweş e ji ber ku ne tiştekî kêfxweşiyê ye û di jiyanê de astengiyekê ava dike. Ew an weke koletiyeke qanûnî an jî weke fezîleteke hêja ku mirov nikare xwe bigihîne wê tê dîtin. C. S. Lewis derbarê vê nezaniyê de wisa dinivîse: “Ew kesên difikirin ku pîrozî tiştekî mirov jê aciz dibe, çiqasî bi kêm tiştan dizanin. Gava ku kesek li rastî pîroziya rastîn tê... mirov nikare xwe li ber wê bigire.” Ji ber vê yekê, aniha gava ku hûn dikevin nava mijarê, xwe ji bo tiştên ku mirov nikare xwe li ber wan bigire, amade bikin.

Weke ku min berê jî diyar kir, pênaseya sereke ya pîroziyê “veqetîna ji bo Xweda” ye û ev bê guman paqijiyê jî di xwe de dihewîne. Li bûkekê bifikirin. Ew xwe ji bo mêrê xwe vediqetîne ango ew arezûya bi evîndarên din re an jî têkiliya bi wan re deyne, red dike. Ev yek, aliyê paqijiyê yê pîroziyê temsîl dike. Lêbelê Pawlos ji me re dibêje ku em xwe paqij bikin. Ew nabêje “Xwîna Îsa wê me paqij bike.” Lêbelê destûrê bidin ez vê xalê derxînim holê: Xwîna Îsa bi rastî jî me ji hemû gunehan paqij dike lêbelê gava em karê paqijiyê û karê pîrozkirinê ji hev dernexin, wê serê me tevlihev bibe.

Gava em tobe dikin û Îsa Mesîh weke Rebê xwe dipejirînin, gunehên me tên bexşandin û em bi temamî paqij dibin. Xweda gunehên me di deryaya jibîrkirinê de fetisandin. Wan nayîne bîra xwe! Ev kar bêkêmasî ye, tekûz e û hîn bêtir nikare bê bi pêş xistin. Me tiştek nekir ku em vê rastiya ecêb heq bikin; ew diyariyeke ji Xweda bû. Ev karê paqijiyê ye.

Lê ji kêliya ku em paqij bûne ve, karê pîrozbûnê (pîroziyê) dest pê kir. Ev pêvajoya aktîfkirinê ye ya tiştên ku di hundurê me de têne kirin; xwezaya me ya nû, bi şêwaza jiyana me re, dibe rastiyeke derveyî. Pawlos bi tam jî vê yekê destnîşan dike gava ku ew van tiştan dinivîse:

> “... bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin. Çimkî Xwedê ye yê ku di dilê we de dixebite, da ku hem daxwaz û hem jî kirina we li wî xweş bê.” (Filîpî 2:12-13)

Ya rastî, ev hîn jî meseleya xweşiya Xweda ye lêbelê divê em bi hêza ku ew dide me re hevkariyê bikin ji bo ku em hem bixwazin û hem jî bikin. Çawa ku rêz û tirs, kesên li Brezîlyayê teşwîq dikin ku bikevin hebûna Xweda û jê bistînin, tirs û rêzdariya pîroz jî me teşwîq dike û dihêle ku em bi rêya xweşiya Wî hêza guhdarîkirinê bibînin.

Xeletiyeke hevpar a gelek mamosteyên dêra Rojavayî ew e ku îlan dikin ku karê pîroziyê weke karê paqijkirinê ye. Bi gotineke din, ne hewce ye ku em tiştekî bikin; Îsa her tişt kir. Ango arguman ev e ku her çiqasî em ji dinyayê cuda nebin, ji hêla arezûyên xwe yên cûrbecûr ve werin kontrol kirin jî, em pîroz in ji ber ku Îsa pîroziya me ye. Tiştê ku vê yekê hîn dijwartir dike ev e ku bi rastî jî di Peymana Nû de ayetin hene ku van îdîayan weke ku piştrast dikin. Ya din jî, şaşiya wan ji tevlihevkirina pîroziya me ya pozîsyonê bi pîroziya me ya tevgerî derdikeve holê. Destûrê bidin ez rave bikim.

Pîroziya pozîsyonê tenê ji ber karê ku Îsa ji bo me kiriye, çêdibe û behsa pozîsyona me ya di Mesîh de dike; ev, yek ji bereketa Mesîh e ku paqijkirinê avakiriye: "Wî em ji beriya damezrandina dinyayê bi Mesîh bijartin, da ku em li ber wî di hezkirinê de pîroz û bêleke bin" (Efesî 1:4). Me ev pozîsyon tu carî bi tena serê xwe bi dest nedixist. Pawlos dîsa wisa dinivîse: "Bi saya Xwedê hûn bi Mesîh Îsa re ne, yê ku ji aliyê Xwedê ve ji bo me bû şehrezayî, rastdarî, pîrozî û rizgarî" (Korîntî I, 1:30).

Di 2'yê Cotmeha 1982'ya de, min û Lisa Toscano peymaneke zewacê bi hev re çêkir û ew bû Lisa Bevere. Wê rojê ew bû jina min. Îro roj, ew ne ji wê roja ku ez pê re zewicîm bêtir jina min e û piştî çil salên din jî wê ne bêtir jina min be. Ji aliyê pozîsyonê ve, ew tam di wê roja dawetê de bû jina min, kar temam bû. Bi heman awayî, em di roja xelasiyê de di Mesîh de pîroz û paqij bûn û em ê tu carî pîroztir nebin.

Lêbelê gava Lisa bû jina min, tevgerên wê li gorî rewş û pozîsyona wê guherîn. Berî ku ew bibe jina min, wê bi mêrên din re hevdîtin dikirin, jimara telefona xwe dida wan, li pey arezûyên xwe diçû û tiştên din ên ku jinên bi tena serê xwe dikirin, dikir. Lê wê dev ji wan tiştan berda. Tevgerên wê li gorî peymana ku me bi hev re çêkiribû. Ev tevgerên wê, weke ku me bi hev re peyman îmze kiribû, di dema

zewaca me de bêtir bi pêş ketin û hîn bêtir gihîştin. Li tiştên ku Petrûsê şandî nivîsandine guhdar bikin:

> "Wek zarokên guhdar bin û li pey xwestekên xwe yên dema nezaniyê neçin. Lê belê, çawa yê ku gazî we kiriye pîroz e, hûn jî di hemû rabûn û rûniştina xwe de pîroz bin. Ji ber ku hatiye nivîsîn: Pîroz bin, çimkî ez pîroz im." (Petrûs I, 1:14-16)

Bala xwe bidinê ku Petrûs behsa pîroziya pozîsyona ku em xwediyê wê ne nake; li şûna vê, ew behsa pîroziya tevgerî dike ku Pawlos behsa wê dike dema ku dibêje divê em xwe ji her qirêjiyê paqij bikin. Ev yek, pêvajoya pîrozkirinê ye, ne diyariya pozîsyonê ye ku bi rastdarkirina bê şert û merc tê.

Di Peymana Nû de, gelo hin pasajên din hene ku behsa pîroziya me ya tevgerî dikin? Erê. Bi qasî ku em nikarin bikin lîsteyek pir in lê ez yeka din li vir bidim:

> "Çimkî daxwaza Xwedê ev e: Ku hûn pîroz bibin, yanî hûn xwe ji fuhûşê bidin paş; ne wek miletên ku Xwedê nas nakin di xwestekên şehwetê de, lê bila her yek ji we bizane ku di paqijî û şîrhelaliyê de li bedena xwe bibe xweyî." (Selanîkî I, 4:3-5)

Berî aniha bi çendakî, piştî duakirina roja Yekşemê zilamek hat ba min û wisa got: "Ez Xirîstiyanekî bi tena serê xwe me. Ez bi jinan re radizêm ji ber ku jiyaneke bi tena serê xwe ne gengaz e. Ez çend mehan tenê dimînim lê dû re ez vedigerim û dîsa bi jinan re radizêm. Lê ev ne meseleya sereke ye ku ez dixwazim li ser nîqaş bikim. Pirsa min a bingehîn ev e; çima ez di karê xwe de ewqasî pirsgirêkan dikişînim?" Min ji tiştên ku digotin nikarîbû bawer bikim. Gelo peyamên me yên nehevseng ên kerema mirovan gihandine wê baweriyê ku ew dikarin di hebûn û bereketên Xweda de bimînin dema ku di gunehê eşkere de dijîn? Di rûniştina pirs-bersivan de di dawiya konferansa jinan a dêrekê de, jinekê ji jina min ev pirs pirsî: "Ez bi rastî ji mêrê xwe hez dikim lê ew pir rêwîtiyê dike û ez bi hin mêrên din re radizêm. Divê ez çi bikim? Divê ez jê re bêjim?"

Ev herdu bi rastî bawer dikin ku ew bi Îsa re di nav têkiliyê de ne

-lê gelo ew ji Îsayê li milê rastê yê Xweda bawer dikin an jî ji Îsayekî sexte bawer dikin? Ev mînak tenê serê çiyayê ji qeşayê ne; min gelek hevdîtinên bi vî rengî bi kesên din re jî kirine. Gelo banga ji bo jiyaneke pîroz, ewqasî bûye sedem ku wîjdan bêdeng bimîne? Dîsa, Pawlos wisa dinivîsîne: “Îcar yê ku vê yekê red dike, ew ne mirov red dike, lê ew wî Xwedayê ku Ruhê xwe yê Pîroz dide we, red dike.” (Selanîkî I, 4:8).

Ji bîr mekin, aliyekî pîroziyê heye ku mirov nikare xwe bide ber û em ê vê yekê bi zelalî bibînin dema ku em berdewam dikin ku li dû wê biçin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Yê ku bêje: «Ez wî nas dikim», lê emrên wî neyne cih, derewkar e û li ba wî rastî tune.” (Yûhenna I, 2:4)

**Ramana sereke:** Pîrozî, pêvajoya aktîfkirina tiştên ku di nava me de têne kirin; xwezaya me ya nû, bi şêwaza jiyana me re dibe rastiyeke derveyî.

**Ramana kûr:** Pîrozî berhemeke xweşikbûna Xweda ye lêbelê divê ez bi hêza ku wî daye min re hevkariyê bikim ji bo ku hem daxwaza wî bikim û hem jî îradeya Wî pêk bînim. Gelo ez ji vê yekê bawer dikim? Ji ber ku min pîroziya pozîsyonê bi pîroziya tevgerî re tevlihev kir, ma gelo min ev rastî û fermana Wî ya ji bo jiyaneke pîroz paşguh kir? An min hişt ku têkçûnên min ên berê baweriya min bi hêza Xweda di hundurê min de bitepisînin? Ez çawa dikarim vegerim ser baweriya bi vê yekê ji bo ku ew di jiyana min de bibe rastiyek?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez dixwazim tu di hundurê min de bixebitî, ji bo ku tiştê bi Te xweş tê, hem ez bikim û hem jî bixwazim. Tiştê ku te halîhazir di hundurê min de kiriye, ez dixwazim weke tiştekî derveyî di jiyanê de bi cîh bikim. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez xelasiya xwe bi rêz û tirsê aktîf dikim û pêk tînim.

JI BO LINGÊN XWE RÊYÊN RAST ÇÊBIKIN... HEWL BIDIN KU HÛN PÎROZ BIN.

– İBRANİLER 12:13-14

# 20| HEWLDANA ME

Pîrozî bi tena serê ne armancek e û ji vê zêdetir, neqebek e ku diçe ber bi ya girîng ve. Îcar aniha em li ayeta xwe ya destpêkê bikolin û em vegerin aliyê wê yê ku mirov nikare xwe li ber bigire:

> “Bikevin pey wê yeka ku hûn bi hemûyan re di aştiyê de bin û li pey jiyana pîroz a ku bê wê tu kes Xudan nabîne, herin.” (Îbranî 12:14)

Gotina “hewldan”ê wergera peyva Grekî “diΓ́kō” ye ku weke “bi hewildaneke dijwar û armanceke diyar an jî bi hedefekê re çûna li dû tiştekî” tê pênasekirin. Li gorî pênaseya peyvê, guman tune ku ev gotin behsa şopandina bi dilgermî ya pîroz bi armanca girtina wê dike.

Li ser vê yekê pirsa me ya yekem divê ev be: Gelo li vir behsa pîroziya pozîsyonê tê kirin an jî ya pîroziya tevgerî tê kirin? Werin em vegerin ser mînaka Lisa û zewaca min. Lisa ku ji hevaleka xwe ya nêzîk re gotiye: “Ez pir hewl didim ku bibim jina John!” Hûn dikarin vê xeyal bikin?

Wê hevalê wê pê bikeniya û wisa bigota: “Tu jixwe wisa yî! Roja ku tu zewicî, tu bûyî jina wî.”

Jinek jixwe nade dû statuya “hevjîn”a ku xwediyê wê ye. Lêbelê jinek, hewl dide ku bi awayekî li gorî hevjînekê tevbigere. Ev yek ji bo

pîroziyê jî derbasdar e: Jixwe em nakevin pey statuyeke ku em xwediyê wê ne lêbelê em hewl didin ku bi awayekî “layîqî Reb” tevbigerin (Kolosî 1:10).

Bi awayekî eşkere û teqez tê gotin ku encama paşguhkirina vê fermanê ew e ku mirov Reb nebîne. Ev ramaneke wisa ye ku mirov ji hev dixîne! Bêguman ew heta hetayê bandorê li me dike lêbelê niha ne mijara nîqaşa me ye. Ya girîng ji bo mijara heyî ew e ku ew çawa li vir û niha bandorê li me dike.

Weke hemwelatiyekî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ez dikarim bibêjim ku “têkiliyeke” min bi serok re heye. Weke 332 milyon hemwelatiyên Amerîkî, ez di bin desthilatdariya rêveberiya wî de me û bandora biryarên wî li min dibe. Lêbelê, her çiqasî têkiliyeke min a wisa bi serok re hebe jî, qet destûr nehatiye dayîn ku ez bi wî re hevdîtineke taybet bikim. Bi kurtasî eger bê gotin, min qet bi tu serokên me yên Amerîkî re hevdîtin nekiriye an jî rûbirû pê re neaxivîme.

Ji aliyekî din ve, hin Amerîkiyên din hene ku bi rêkûpêkî serok dibînin; ev hevalên wî ne an jî ji nêz ve pê re dixebitin. Di her du rewşan de jî, ew zilamê ku li Qesra Spî rûniştiye ji min çêtir nas dikin. Ew wî ji nêz ve nas dikin, lê ez wî tenê weke rêberê neteweya me nas dikim.

Bi heman awayî, bi mîlyonan bawermend di bin rêberiya Îsa Mesîh de ne. Ew wan diparêze, ji wan hez dike, pêdiviyên wan peyda dike û bersiva daxwazên wan dide. Lê pirs ev e ku gelo ew Wî dibînin? Bi gotineke din, gelo ew hebûna Wî ya xuyakirî tecrube dikin?

Bi hezaran bawermend li Brezîlyayê bê tevger bûn ku wan bigihîne hebûna Reb. Piştî tobekirinê, wan mafê hevdîtina bi Qral re bi dest xistin. Ev maf rojane û heta ji bo demekê jî derbasdar e. Eger tirsa me ji Xweda tune be, em ê ji bo tevgerên pîroz ên ku destûrê didin em hebûna Wî ya xuyakirî biceribînin, hewl nedin. Îsa wisa dibêje: “Kî bi fermanên min zanibe û wan bîne cih ... ez ê xwe nîşanî wî bidim” (Yûhenna 14:21).

Hêjayî dubarekirinê ye: pîroziya tevgerî tunebe, dîtina Reb jî tuneye. Ev rewş çima evqasî krîtîk e? Pêşî, eger em Wî nebînin, eger hebûna Wî ya xuyakirî li cem me tune be, em nikarin Wî ji nêz ve nas bikin. Wê

tenê zanîna me ya derbarê Wî de hebe ango ji têkiliya min ya bi serokên Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê ne cuda be. An jî ya xerabtir, em xwe bi afirandina Îsayekî xeyalî, dixapînin. Ev xeyal pir xeternak e ji ber ku em bawer dikin ku em kesekî ku em nas nakin, nas dikin. Yaqûb ji me re wisa dibêje: "Xwe nexapînin û nebin yên ku tenê peyvê dibihîzin, lê peyvê bînin cih." (Aqûb 1:22). Kesê ku hatiye xapandin bawer dike ku ew kesekî an tiştekî nas dike lêbelê di rastiyê de, ew wî tiştî û kesî nas nakin.

Sedema duyem jî di heman astê de girîng e. Bêyî ku Wî bibînin, bêyî ku em di hebûna Wî de bin, em nikarin xwe biguherînin û xwe bişibînin Wî. Pawlos behsa wan kesên ku Reb dîtine dike: "em ji rûmetê ber bi rûmetê ve li eynî sûretî tên guhertin" (Korîntî II, 3:18). Ev veguherîn di hundurê me de dest pê dike û dûv re digihîje cîhê ku ji hêla yên din ve tê dîtin.

Paqijiya me nabe weke Ferîsiyan. Îsa ji wan re gotibû: "Bi vî awayî hûn jî ji derve wek ên rast li mirovan xuya dibin, lê ji hundur ve hûn tije durûtî û neheqî ne" (Metta 23:28). Niyet û armancên wan qirêj bûn. Ji tirsa Reb mehrûm bûn û ji ber vê yekê li ser îmaja xwe ya pêşandanê disekinîn, li dû rastdariyeke li ser bingeha tevgera derveyî diçûn. Vê yekê rê li ber veguherîna hundurîn a ku wê kiryarên wan ên derveyî çêbikirina, girt. Wan bawer dikir ku ew Xweda nas dikin lêbelê rastî ev e ku ew Afirînerê xwe yê ku li ber wan radiweste nas nakin û di encamê de, ew ji îradeya Wî dûr ketin. Wan xwe xapandin.

Îro jî, pîroziya ku em bi xîret li dû wê ne, divê ji dilê me angi ji raman, armanc û niyetên me xwe bide der û derkeve. Ev yek wê di dawiya dawî de rêberiya tevgerên me yên derve bi rê ve bibe. Sedema ku Îsa vê yekê dibêje ev e: "Xwezî bi wan ên ku dilpak in, Çimkî ewê Xwedê bibînin" (Metta 5:8). Em Wî nebînin, em ê ji veguherîna hundurîn -pîroziya rastîn- bêpar bibînin û di dawiyê de em ê nikaribin Wî bibînin. Ev pêvajoyeke ku li dora xwe çerx dibe.

Tenê hebûna xuyangeke xwedayî ya derveyî têrê nake û hêza veguherîna arezûyên me yên hundurîn înkar dike. Divê em di hebûna xwe ya hundurîn de (armanc û niyet) li rastiyê bigerin, divê em ji bo vê yekê hewl bidin. Şande Yaqûb bi tundî li dijî bawermendên ku pîroziyê sivik dibînin derdikeve. Ew wisa dinivîse:

> “Hûn dixwazin û nastînin, çimkî hûn bi niyeta xerab dixwazin, da ku hûn ji bo kêfên xwe bimezêxin. Hey zînakarno! Ma hûn nizanin ku dostaniya bi dinyayê re, dijminahiya bi Xwedê re ye? Loma kî ku bixwaze bibe dostê dinyayê, xwe dike dijminê Xwedê.” (Aqûb 4:3-4)

Yaqûb, di vê ayetê de bi peyva “zinêkaran” behsa wan kesên ku peymana zewaca xwe dişkînin dike. Xweda gelek caran sêwirandinên zewacê bikar tîne ji bo ku peymana me ya bi Wî re tekez bike; Îsa weke Zava tê binavkirin û em bûkên Wî ne. Pawlos rave dike ku têkiliya zewacê ya di navbera mêr û jinê de mînakek yekîtiya di navbera Îsa Mesîh û dêrê de ye (Efesî 5:31-32).

Dinya ji bo destkeftiyên xweperest an jî destkeftiyên pesnê dijî û ji ber vê yekê balê xwe dide îmaja pêşedan û ya têgihiştî. Eger em xwe li şûna ku ji bo pîroziyê hewl bidin, bi arezûyên dinyayî re li hev bikin, ev bêwefatî ye. Ev yek, heqareteke ewqasî mezin e ji bo Mêrê me ku em bi rastî xwe vediguherînin dijminên Wî. Ji ber vê yekê Yaqûb wisa berdewam dike: “Gunehkarno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin” (Aqûb 4:8). Em tenê dikarin dilên xwe paqij bikin bi himbêzkirina tirsa Reb re ku ev jî wê me ber bi pîroziya rastîn ve bibe!

Ez zêdetirî çil salan e bi Lisa re zewicî me û sedemên min ên xurt hene ku ez bêwefayê pê re nekim. Ya pêşî û ya herî girîng, ez ji Xweda ditirsim. Berteka wê û tevgera wê çi dibe bila bibe, min bi Xweda re peymanek çêkir ku ez ji Lisa hez bikim û wê biparêzim.

Sedema duyem jî ew e ku ez naxwazim samîmiyeta xwe bi vê jina bêhempa re winda bikim. Ez hez dikim ku ew baweriya xwe bi min tîne û ew razên xwe yên herî kûr û xwestekên dilê xwe bi min re parve dike. Ya rastî, ez hez dikim ku em nêzîkî hev in.

Rewş bi Îsa re jî ne cuda ye. Sedema ku ez bi dilgermî ji îxaneta ku lê bikim dûr dikevim ew e ku ez naxwazim nêzîkbûna ku em bi hev re parve dikin winda bikim. Ez ji nêzîkbûna hebûna Wî û sohbetên samîmî yên ku em bi hev re dikin, hez dikim. Ez hez dikim ku Ew razên ku min berê qet nizanibû bi min re parve dike. Ji ber vê yekê wisa tê gotin:

“Sira Xudan ji bo wan e ku ji wî ditirsin,
Ew wan haydar dike ji peymana xwe.”
(Zebûr 25:14)

Aniha em dest bi kifşkirina lêkolîna aliyê bêhempa yê pîroziyê dikin. Di beşa bê de, em ê berdewam bikin ku bedewiya wê eşkere bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Kesê ji dilê pak hez dike û bi lêvên keremdar dibêje, Wê ji padîşah re bibe heval.” (Şîretên Silêman 22:11)

**Ramana sereke:** Em nikarin bêyî ku tevger weke rêbazeke têgihîştinê bişopînin bikevin huzûra Reb. Mijar ne ew e ku em kengî digihîjin pîroziya bêkêmasî lê ew e ku em kengî wê dikin lêgerîna dilê xwe.

**Ramana kûr:** Xweda dizane gelo ez li pey tevgerên pîroz diçim an jî ez bi berdewamî meyla xwe an tehemûla xwe ya li hemberî xwestekên dinyayî û serbilindiya ku bi serkeftinê re tê, dipejirînim. Her tişt ji niyeta di dil de dest pê dike. Gelo ez ê bi baldarî li pey paqijiya dil û hişê xwe biçim ji bo ku kiryarên min biguherin? Gelo ez ê vê yekê bikim her çend kesên nêzîkî min neguherin jî?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji ber ku min hewl neda ku xwe pîroz bikim, min bibexşîne. Min girîngiya wê paşguh kir lê niha ez dibînim ku divê ew lêgerîna min be, ji ber ku ew deriyê hebûna Te ye. Ji kerema xwe tevger û lêgerînên min ên dinyayê bibexşîne û bi xwîna Îsa min paqij bike. Ez ji helwesta xwe ya bêxem a li hemberî pîroziyê tobe dikim, bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez li pey wî diçim ji bo ku pîroziyê fêhm bikim. Armanca min ew e ku ez xwe pîroz bikim, weke ku çawa Xweda pîroz e.

“RIYA RASTAN RASTÎ YE,
YA YÊ RAST, RIYA RASTAN
RAST DIKÎ.”

– ÎŞAYA 26:7

# 21| AREZÛ Û HÊZ

Dibe ku di vê gavê de, hûn xemgîn in ji ber ku hûn hewl didin jiyaneke pîroz bijîn lêbelê bi rastî, hûn ji serkeftinê bêtir têk diçin. Hûn hesreta nêzîkbûna bi Xweda re dikişînin lê hûn di mijara îteat de zehmetiyan dikişînin. Ji kerema xwe vê yekê ji pêşî ve bizanibin: Ew ji we bêtir bêriya we dike. Şa bibin ji ber ku Xweda li aliyê we ye! Bila ev rastî tengezariya we şa û sivik bike.

Pir pêkan e ku pirsgirêk di wê rastiyê de be ku we ji bo vê hewl daye. Qanûna Mûsa îspat kir ku em nikarin fermanên Xweda bi cîh bînin; em hewceyê alîkariya Xweda ne. Ev alîkariya pêwîst ji bilî kerema Xweda ne tiştekî din e. Piraniya bawermendan dizanin ku kerema Îsayê Mesîh me ji pêwistiyên qanûnê rizgar dike lêbelê tiştê ku gelek kes nizanin ev e ku ew gavek din diçe bi pêş ve: Ew xwezayek nû dide me ku potansiyela jiyana ji gunehê azad dide me (Romayî 6:6-7).

Berî fermana Pawlos a paqijkirina ku me ji her tiştê ku beden û giyan qirêj dike, bi piranî gotinek heye ku gelek caran nayê dîtin. Berî vê bi çenf paragrafan, ew wisa dinivîse:

> “Em ên ku hevparên Xwedê yên xebatê ne, em ji we lava dikin ku hûn kerema wî badîhewa qebûl nekin. Çimkî Xwedê dibêje:

> «Min di dema minasib de tu bihîstî, Û di roja xilasiyê de min alîkariya te kir.» Va ye, dema meqbûl niha ye; va ye, roja xilasiyê niha ye." (Korîntî II, 6:1-2)

Dema guncav hatiye, bi alîkariya Wî em dikarin jiyaneke pîroz bijîn. Mixabin, kerema Xweda ji potansiyela xwe pir kêmtir hatiye danasîn. Ew wekî xelasiya herheyî, bexşandina gunehan, rizgarbûna ji cezayê gunehan û diyariyeke nehêja hatiye hînkirin. Her çiqasî ev rastî bi temamî rast bin jî, aliyê ku ewqasî berfireh nayê hînkirin hêza wê ye. Xweda wisa bang Pawlosê Şandî dike: "Kerema min têra te dike. Çimkî hêza min di bêhêziyê de temam dibe" (Korîntî II, 12:9). Eger bi kurtasî bê gotin: "Pawlos, tiştê ku tu bi tena serê xwe nikarîbû bikî, tu niha dikarî bi hêza min, ku jê re kerem tê gotin, bikî."

Petrûs vê rastiyê piştrast dike: "Di naskirina Xwedê û Xudanê me Îsa de kerem û aştî bi firehî li ser we be. Bi naskirina wî yê ku bi rûmet û qenciya xwe gazî me kiriye, hêza wî ya xwedayî, her tiştê ku ji bo jiyan û xwedênasiyê pêwist e, da me" (Petrûs II, 1:2-3). Di vê ayetê de bi saya kerema Xweda, ji bo em jiyaneke pîroz bijîn, dibêje ku min her tiştê pêwîst daye. Kerem ji bo em pîroz bijîn, me bi hêz dike!

Ev rastî çima ewqasî girîng e? Xirîstiyanî jiyaneke baweriyê ye. Ji temamiya peyamê re "gotina baweriyê" tê gotin (Romayî 10:8). Bi gotineke din, em nikarin tiştekî ji Xweda bistînin heya ku em bawer nekin û em nikarin bawer bikin bi tiştê ku em nizanin. Ji ber vê yekê, eger em ji hêza kerema Xweda bêxeber bin, em ê hewl bidin ku bi şiyanên xwe Xweda razî bikin. Û ev yek wê bibe sedema jiyaneke bêber û bêbext.

Em li ser mînaka "zayîna jinûve" bisekinin. Gelek kesên nerizgarkirî hene, îtîraf dikin ku Xweda dikare wan û baweriya wan rizgar bike. Lêbelê heya ku ew tobe nekin û baweriya xwe bi Mizgîniyê neynin, ew ji kerema rizgariyê bêpar dimînin. Heman tişt ji bo lêgerîna me ya ji bo pîroziyê jî derbasdar e. Gelek Xirîstiyan hene bawer dikin ku Xweda dikare şiyana jiyana pîroz bide wan lê ew nikarin jê sûd werbigirin heya ku ew baweriya ji dil nebin ku kerema Xweda wê wan hêzdar bike.

Pawlos ji bawermendên Korîntî rîca dike ku "kerema Xweda bi derewan nepejirînin" (Korîntî II, 6:1). Pejirandina tiştekî vala tê çi

wateyê? Ev tişt tê wê wateyê ku bi potansiyela xwe ya tam bi kar nayîne. Eger tov û alavên çandiniyê bidin cotkarekî, ew dikare ji bo xwarin û debarê berheman biçîne. Lê eger ew tiştê ku hene bikar neyne, ew nikare bijî û wê ji birçîna bimire. Piştî mirina wî wê cîranên wî çi bibêjin? "Wî tov û alavên çandiniyê bi bi derewan pejirandin."

Ev ew tişt bû ku Pawlos behsa wê dikir. Xweda kerem daye we ji bo ku alîkariya we bike ku bi awayekî hûn karibin bijîn ji ber ku hûn ne bi hêza xwe dijîn. Ew hêzê dide we ku hûn bidin dû jiyaneke pîroz. Ji ber bêbaweriyê ji sûda vê hêzê nemînin û paşguh nekin.

Eger kerema Xweda tenê xelasî, bexşandin û bilêtek ji bo bihuştê bûya, weke ku bi gelemperî di çanda Rojavayî de tê hînkirin, wê demê çawa kesekî dikarîbû keremê bi derewan bipejirîne? Naxwe wisa be, wê potansiyela wê ya ji bo îsrafê tune bûya û gotina Pawlos wê nehata tu wateyê.

Eger em rêza ramanên şandiyan bişopînin, her tişt li hev tê. Dêra Korîntî cîhanî bû; lêgerîna wê ya pîroziyê kêm bû. Pawlos ji bo vê xalê diyar bike, di heman nameyê de wisa dinivîse: "… ji bo gelekên ku berê guneh kirine û ji pîsîtî, fuhûşî û şehweta xwe tobe nekirine, şînê bigirim" (Korîntî II, 12:21). Di beşa 6an de, Pawlos bi teşwîqkirina van bawermendan dest pê dike ku kerema Xweda bê fêde qebûl nekin, dû re ew hezkirina xwe ji bo wan diyar dike û dipirse; bê çima hezkirina wî nayê beramberiyê nabîne. Piştre ew vedigere xala sereke ku ew ji ber mirovên bêxwedayî yên ku bandorê li wan dikin, kerema Xweda paşguh dikin:

> "Bi yên bêbawer re nekevin bin eynî nîrî. Ma çi hevkariya rastdariyê bi neheqiyê re heye? An çi danûstandina tariyê bi ronahiyê re heye?" (Korîntî II, 6:14)

Divê em ji bîr nekin ku ferqek heye di navbera derketina ji dinyayê ji bo gihîştina bêbaweran û bandorkirina lihevhatina ne guncav ya bi wan re. Ev tenê wê bibe sedema tevgerên ku dikarin me ji rêya jiyanê dûr bixin. Ev weke bêwefatiya giyanî an jî zinê tê pênasekirin.

Piştre Pawlos ji bawermendên ku li gorî şexsiyetê diçin, tîne bîra wan ku ew perestgeha Xweda ne û van gotinên hişyariyê yên Xweda bi bîra wan tîne: "Ma di navbera Perestgeha Xwedê û pûtan de çi

lihevkirin heye? Çimkî em Perestgeha Xwedayê jîndar in. Wek ku Xwedê gotiye: Ezê di nav wan de rûnim Û di nav wan de bigerim; Ezê bibim Xwedayê wan Û ew jî wê bibin gelê min. Xudan dibêje: Loma ji nav wan derkevin û veqetin, Dest nedin tiştê murdar. Hingê ezê we qebûl bikim" (Korîntî II, 6:16-17).

Dîsa, em di asteke hîn mezintir de dibînin ku Xweda soza hebûna xwe ya xuyakirî dide. Ew ne behsa ku bi awayekî periyodîk serdana me dike, ew behsa jiyana di nav me de û bi me re dike! Careke din em dibînin ku soza dîtina Xweda (hebûna Wî ya xuyakirî) bi şertan ve girêdayiye. Eger em xwe ji xwestekên xweperest û serbilind ên ku cîhan pê ve girêdayî ye dûr bigirin, soza cîhekî mayînde wê li hizûra Qral ji me re bê dayîn -"Ez ê jî we qebûl bikim." Berevajî vê jî rast e: Eger em xwe bi qirêjiya cîhanê qirêj bikin, mafê sekinandina li hizûra Wî ji me re nayê dayîn. Pawlos bi îfadeyeke teqez dawî li axaftina xwe tîne:

> "Îcar hezkirîno, madem ku em xwediyê van sozan in, em xwe ji her cûreyê murdariya ruh û bedenê paqij bikin û bi tirsa Xwedê pîroziyê temam bikin." (Korîntî II, 7:1)

Îcar aniha em dikarin van gotinên ku Pawlos ji Dêra Filîpî re gotin, baştir fêhm bikin: "Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lê belê hê bêtir di dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê xelasiya xwe pêk bînin. Çimkî Xwedê ye yê ku di dilê we de dixebite, da ku hem daxwaz û hem jî kirina we li wî xweş bê" (Filîpî 2:12-13). Tirsa Reb, me teşwîq dike ku em bixwazin û kerema Rebbê me Îsayê Mesîh hêzê dide me ku em bikin.

Eger em gavekê din herin bi pêş ve, li cîhê ku dilnexwestî lê hebe (ji ber nebûna tirsa pîroz), hêzdayîkirin wê nebe tiştekî sereke û ji ber vê yekê wê neyê bikaranîn; wê bi derewan bê pejirandin! Ji ber vê yekê tirsa pîroz, ji bo bandor û xwezaya domdar a xizmeta me ewqasî pir girîng e.

Hêvîdarim, hatiye fêhmkirin ku paqijî hêmaneke mezin a pîroziyê ye lê ne pênaseya wê ya tam e. Dîsa, pênaseya bingehîn a pîroziyê ew e ku mirov ji Wî re dilsoz be, bi tamamî ya Wî be. Destûrê bidin em wateya

bingehîn a pîroziyê bi berfirehîtir rave bikin: Dema ku bûk bi zava re dizewice, ew xwe bi temamî dide wî. Di vê dilsoziyê de paqijiyek heye, hem di meqam û hem jî di tevgerê de. Armanca dawîn ne paqijî ye lê ew e ku mirov bibe bûkeke dilsozê zavayê xwe û ev armanc paqijiyê dihewîne.

Ji ber vê yekê, pîroziya rastîn paqijiyeke fedakar û bilind e ku deriyê nêzîkbûneke kûr bi Xweda re vedike. Ev ew bêberxwedan e ku em ê berî ku ev pirtûk biqede nîqaş bikin. Lê pêşî, divê em axaftina xwe li ser wê yekê bidomînin ku di pratîkê de jiyana bi dilsozî ji bo Zavayê me çawa xuya dike. Bersiv di peyvekê de ye: îteat.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Îcar kurê min, tu bi wê kerema ku bi Mesîh Îsa ye, bi hêz bibe.” (Tîmotêyos II, 2:1)

**Ramana sereke:** Eger em ji hêza ku kerema Xweda dide bê agahî bin, em ê hewl bidin ku bi şiyanên xwe Xweda razî bikin û em ê kerema Xweda bi derewan bijerînin.

**Ramana kûr:** Gelo ji bo ku jiyaneke pîroz bijîm û bi ser bikevim bêtir min jiyaneke ne serkeftî bi dest xist? Gelo min bi şiyanên xwe hewl da? An jî min baweriya xwe bi kerema Xweda anî ji bo ku hêza jiyaneke pîroz bide min? Eger min bawerî pê neanîbe, ez çawa dikarim vê yekê biguherînim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez fêhm dikim ku tenê bi hêza kerema Te ez dikarim jiyaneke xwedayî bijîm ku min ji hebûna Te ya bi heybet re vedike. Bibore ku min bi şiyanên xwe hewl da ku vê yekê bikim. Ji vê gavê û şûn ve, ez ê bi kerema Te xurt bibim ji bo ku jiyaneke fedakar û rûmetdar bijîm û Îsa bi rûmet bikim. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Ji bo ku ez bidim dû pîroziyê, ez bi tirsa pîroz motîve dibim û ez ê bi hêza kerema Xweda bi ser bikevim.

# BERSIVA ME YA JI BO GOTINA XWEDA

**HEFTEYA ÇARAN**

“RÊBERIYA MIN BIKE LI GOR EMRÊN XWE, ÇIMKÎ EZ JI WAN ZEWQÊ DISTÎNIM.”

– ZEBÛR 119:35

# 22| LERIZANDINA JI BER GOTINA XWEDA

Di beşa me ya yekem de, hate destnîşankirin ku tirsa ji Reb dikare li du pênaseyên kategorîk bê dabeşkirin: Lerizandina li hizûra Xweda û lerizîna li ber Gotina Xweda. Her çiqasî ne giştî be jî, me behsa hebûna bi heybet a Xweda kir ji ber ku em ê di tevahiya bêdawîtiyê de bi berdewamî ji Wî xofê hîs bikin. Di vê beşê de, em ê bala xwe bidin ser bê ka em çawa bersiva Gotina Wî didin.

Berî her tiştî, em li demekê bifikirin ku gelê Xweda xwe ji têkiliyeke rastîn ya bi Wî re dûr xistibû û li şûna wê tenê bi awayekî fermî kar kiribû. Xweda, ji bo ku bala wan ji nû ve bikşîne wisa dipirse: “Ezman textê min, Erd pêgeha min e. Hûnê maleke çawa ji min re ava bikin? Dera ku ez bêhna xwe lê vedim li ku ye?” (Îşaya 66:1).

Eger em pênc ayetên pêşîn ên vê beşê di çarçoveyekê de bixwînin, em dibînin ku Xwedayê Mezin bi kesên ku hewl didin bi şert û mercên xwe bi Wî re têkiliyeke bi pêş ve bibin û biparêzin re diaxive. Ew bi awayekî nîvco li gorî rêyên Wî tevdigerin, bi texmîna ku ev yek wê Wî razî bike. Xweda eşkere dibêje ku rêya wan hilbijartiye heqaret li Xweda

dike lêbelê di cîh de rave dike bê ka ji bo ketina têkiliyeke rastîn bi Wî re çi hewce ye:

> "Ez li vî kesê dinêrim, Li kesê bindest, ruhşikestî
> Û ji ber peyva min dilerize."
> (Îşaya 66:2)

Gotina "Ez qedir û qîmetê didim" li vir ji lêkera Îbranî "nabat"ê hatiye girtin ku tê wateya "nêrîn, temaşekirin, pîrozkirin"ê. Ew tê wateya ku mirov bi baldarî li tiştekî binêre. Di bingehê de, Xweda dibêje: "Ev ew kes e ku ez ê bi baldarî pê re eleqedar bibim." Li vir sê dilpakî hatine rêzkirin: dilnizmî, giyanekî pelçiqî û di vê beşê de balê dikişîne ser "yên ku ji gotina min ditirsin."

Kesekî ku ji Gotina Xweda ditirse, her tim gotinên Wî di ser her tiştî re dinîne û bilind dike. Tiştek ji vê girîngtir tuneye. Ev delîla rastîn a tirsa pîroz e. Ev kes, ew kes e ku Xweda qedir û qîmetê dide wî. Di heman ronahiyê de, Pawlos wisa dinivîse:

> "Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lê belê hê bêtir di dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin." (Filîpî 2:12)

Vê gotinê ne weke nameyekê ku Pawlos ji bawermendên li Filîpyayê re nivîsandiye lê weke tiştekî ku Xweda rasterast ji me re dibêje, bifikirin. Li ser hevoka "çawa ku we hergav bi ya min kiribe" bisekinin; li vir rewşeke bê şert û merc heye. Hûn hebûna Xweda hîs bikin jî û hîs nekin jî, hûn bibînin ku Ew ji bo we dixebite an naxebite jî, duayên we di çarçoveya dema ku hûn hêvî dikin de bên bersivandin an jî neyên bersivandin jî, ev tê wê wateyê ku hûn guh didin Wî û bi ya Wî dikin.

Di derdora konferansekê de ku mirov ji hev re dilovan in û hebûna Xweda lê xurt e, guhdarkirina gotina Xweda hêsan e. Baş e lê eger endamekî tîmê yê ku hûn pêbawer in li ser navê we derewan bike û hûn ji ber vê yekê ji kar werin avêtin, wê çi bibe? Li gorî Gotina Xweda,

hûn ê wî kesî bibexşînin an jî ji bo tolhildanê hûn ê tola xwe hilînin?

An jî hûn di gereke kar de xwe tenê hîs bikin û rexneyên hevjîna we bên bîra we, wê çi bibe? Hevkareka li hevhatî pesnê we bide û we biecibîne, pêdiviyên we pêk bîne û dû re bi awayekî ku we ji rê derxe, teklîf bike ku hûn êvarê bi hev re di odeya otêlê de derbas bikin. Wê kes jî pê nehise. Hûn ê ji wir birevin an hûn ê pêşniyarê qebûl bikin?

An jî hûn heta derengê şevê li ser kompîturê dixebitin û dema ku hûn li înternetê digerin, hûn rastî malpereke pornoyê bên, hûn ê çi bikin? Hûn ê lê temaşe bikin?

Ev hemû, ew bûyer in weke ku hebûna Xweda tuneye. Eger hûn ji Gotina Wî bilerizin, şert û merc çi dibin bila bibin, hûn ê ji Wî re îteatê bikin ji ber ku tiştekî mezintir ya ku berî vê tê, tuneye. Ev helwest nîşan dide ku hûn di nava tirsa pîroz de dimeşin ji ber ku "tirsa REB mirov ji nebaşiyê dûr dixîne" (Şîretên Silêman 16.6).

Nivîskarê Zebûrê wisa dinivîsîne:

> "Xwezî bi wan ku ji Xudan ditirsin, Bi emrên wî gellek dilşa dibin!" (Zebûr 112:1)

Jin an jî mêrekî ku ji Xweda ditirse ne tenê guhdarî lê dike, di heman demê de ji vê yekê kêfxweşiyeke mezin jî distîne. Îteat ne barek e lê zewqek e. Kesekî wisa xwedî têgihîştinek bingehîn e ku Xweda Afirînerê me ye û ji ber vê yekê dizane çi ji bo me baş e û çi xerab e.

Ez wan demên ku hîn her çar kurên me pir biçûk bûn, tînim bîra xwe. Roja Noelê ya rastî rojeke kar bû. Piraniya bavên ku zarokên wan yên biçûk hene wê fêhm bikin bê ez çi dibêjim. Piştî ku hemû diyarî vedibûn, îcar pêlîstokên ku divê perçeyên wan li hev kevin derdiketin. Ez bavekî ji rêzê û klasîk bûm, min qutî vedikir, perçe hemû dirijandin erdê, min qutî û rêbernameya lihevxistinê diavêt aliyekî û dest bi kar dikir. Bi gelemperî, piştî hema bêje saetekê min perçe li hev dixisitin û kar diqedand lê wê hingê ez matmayî dimam ku min didît ku hîn jî deh perçe an jî zêdetir li erdê mane. Min bişkoka "vekirinê" dizîvirand lê tiştek jî nedibû. Îcar min çi dikir? Min radihişt rêbernameya lihevxistinê,

perçeyên pêlîstokê ji hev dixistin û li gorî rêbernameya çêker ji nû ve ava dikir. Û ha wisa, pêlîstok dixebitî!

Kesê ji Xweda ditirse her dem îteatê dike. Ev kes, di esasê xwe de ji rastiyên bingehîn yên li jêr, tu carî dernakeve:

1. Tişta ji bo min baş Xweda pê dizane.
2. Xweda hezkirina pak e û di nava hezkirina Wî de ez heme.
3. Xweda tu carî ji min re nabêje ku ez tiştekî bi zerar bikim. Tişta dibêje, zû an jî dereng, ji bo min ya herî baş e.
4. Ji ber vê çi dibêje bila bibêje, ez ê hilbijêrim ku bi kêfxweşî îteatê jê re bikim.

Îsraîliyan her tim gilî û gazin dikirin. Ew ji rêberên xwe û ji awayê jiyana xwe nerazî bûn. Wan ji bo hemû nerehetî, kêmasî û nerazîbûna xwe Xweda sûcdar dikirin. Ew ji tirsa pîroz bêpar bûn û ji Gotina Wî neditirsiyan. Xweda wisa got:

> "Ji ber ku te ji bo zêdebûna her tiştî bi kêf û şahî xulamiya Xwedayê xwe Xudan nekir, tê ji dijminên ku Xudan bi ser te şandin re, bi tîbûnê, birçîbûnê, tazîbûnê û bi nebûna her tiştî xulamiyê bikî. Heta ew te helak bike, wê nîrê hesin li ser stûyê te be." (Dubarekirina Şerîetê 28:47-48)

Lerizîna ji ber Gotina Wî şahî û kêfxweşiyê di nava me de çêdike. Eger ev tune be, tenê meseleya demê ye berî ku şert û merc nebûna kêfxweşiyê eşkere bikin. Ez ê qet ji bîr nekim wê dema ku min pênc gunehên ku rê li ber Îsraîlê girtin ku çarenûsa xwe pêk bîne, kifş kirin: mirov bêriya tiştên xerab bike, pûtperestî, zinê, ceribandina Xweda û gilî û gazin (Korîntî I, 10:6-10). Dema ku min gotina "gilî û gazin" xwend, hema bêje ez kirî li biguhê zikê xênî biketima! Min kir hawar, "Çi? Gilî û gazin! Çawa gilî û gazin dikare di heman lîsteyê de bi van gunehên mezin re be?"

Min bihîst ku Giyanê Pîroz wisa got: "Kurê min, gilî û gazin di çavê min de gunehekî mezin e." Wî nîşanî min da ku gilî û gazin protestoya vê ye: "Xwedêyo, tiştê ku te di jiyana min de kirine ne xweş in û eger ez

di şûna te de bûma, min ê bi awayekî din bikirana.”

Piştre wisa got: “Ev heqareteke li kesayetiya min e, serhildaneke li dijî îradeya min e û bi giştî, kêmasiyeke mezin ya tirsa pîroz e.”

Min ev yek bi Lîsa re parve kir û me biryar da ku em zarokên xwe bi têgihîştina ku gilî û gazin serhildan e, mezin bikin. Min bi awayekî cidî li vê nêrî. Ez ji hemû gilî û gazinan dûr ketim û min piştrast kir ku qet peyvek gilî û gazin ji devê min dernakeve. Lêbelê piştre, gava di dema rojiya çar rojan de bûm, min bihîst ku Giyanê Pîroz bi min re kire pistepist: “Kurê min, ez gilî û gazinên di dilê te de dibihîzim.”

Min di cîh de çok vedan û tobe kir. Piştî vê Xweda nîşanî min da ku min bi kêfxweşiyeke ji dil xizmeta Reb nekiriye û ji ber vê yekê dijminên min li hemberî min serkeftin bi dest xistine. Werin em dîsa li gotinên Pawlos binêrin:

> “Ji ber vê yekê, hezkirîno, çawa ku we hergav bi ya min kiribe, niha jî, ne tenê di dema ku ez li ba we me, lê belê hê bêtir di dema ku ez ne di nav we de me jî, bi ya min bikin; bi tirs û lerizînê xilasiya xwe pêk bînin. Çimkî Xwedê ye yê ku di dilê we de dixebite, da ku hem daxwaz û hem jî kirina we li wî xweş bê. Her tiştî bê pitepitkirin û bê devjenî bikin” (Filîpî 2:12-14)

Piştî çar rojên rojîgirtinê ne bi gelekî, min kûrahiya tiştên ku di vê ayetê de hatine gotin kifş kir. Wê çavên min ji bo vê rastiyê vekir ku gilî û gazin berevajî tirsa pîroz e, ew ne lerizîna li ber Gotina Wî ye. Gava ku em di bin helwesteke nerazîbûnê de difikirin an jî diaxivin, em Xweda û Gotina Wî biçûk dixin.

Ew kesên ku ji Xweda ditirsin, teqez bawer dikin ku tiştek ji îteatê girîngtir an jî jê bi fêdetir tuneye. Ew bi her awayî îteatê dikin û Gotina Xweda bi perspektîfa çand an jî li gorî meylên civaka roja me naparzûnînin. Wekî din, ew îteata xwe ya ji bo Gotina Xweda li gorî reftarên bawermendên din ava nakin, ew tenê îteatê dikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Heke hûn dilxwaz û guhdar bin, Hûnê berê herî baş ê welêt bixwin.” (Îşaya 1:19)

**Ramana sereke:** Îspata tirsa pîroz, şert û merc çi dibin bila bibin, îteata ku divê hem xwedî helwesteke rast be û hem jî xwedî tevgerekê be.

**Ramana kûr:** Ma ez tenê gava şert û merc guncaw bin îteatê dikim? Ma gava kar û bar baş naçin, ez meyla gilî û gazinan dikim? Ez çawa dikarim her dem helwesteke kêfxweş û spasdar biparêzim? Ez çawa dikarim biryardariya xwe ya îteatê xurttir bikim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji ber ku ez ji Gotina Te natirsim, li min bibore. Îteata min li gorî şert û mercan bû û helwesteke min ya bi kêfxweşî û minet tunebû. Ez tobe dikim û ji Te bexşandina xwe dixwazim. Ez tirsa pîroz himbêz dikim. Ji kerema xwe, fêrî min bike ku ez her gav bi helwesteke şad îteatê bikim û hêza vê yekê bide min. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ji Xweda ditirsim û ji ber vê yekê Ew di nava min de dixebite ku ez hem tiştên ku Wî razî dikin bixwazim û hem jî bikim.

LERIZÎNA JI BER GOTINA
XWEDA Û XWETEWANDINA
LI BER MEZINAHIYA BÊDAWÎ
YA HEZKIRINA PÎROZ;
JI HETA KU DENG BIKEVE
MIROV DUAYAN BIKE,
HÎN BAŞTIR E.

– C. H. SPURGEON

# 23| YA PÊŞÎ (BERÎ HER TIŞTÎ)

Taybetmendiya herî girîng a tirsa Xweda, îteata bê şert û merc ya ji bo Gotina Wî ye û em fêdeyên wê yên ecêb di jiyana xwe de dibînin. Pênc aliyên cuda yên lerizîna ji Gotina Xweda hene û em ê di pênc rojên pêşiya xwe de li wana yek bi yek binêrin. Ya yekem ev e:

**1. Berî her tiştî guh bidin îteata Xweda.**

Îteat, ji bo kesên ku ji Xweda ditirsin nîmetek e. Ew berjewendiyên xwe yên şexsî li pêş bicîhanîna gotina Xweda nagirin. Tirsa pîroz; *tişta ji bo Xweda girîng e ji bo min jî berî her tiştî tê,* vê fikrê di dilê me de diçîne.

Di Pirtûka Pîroz de gelek ayet hene ku em dikarin ji wan sûd bigirin lêbelê ji bo ku em mînakekê ava bikin, em ê li du gotinên Îsa binêrin:

> "Loma, gava ku tu li ser gorîgehê diyariya xwe pêşkêş dikî, eger bê bîra te ku dilê birayê te ji te maye, diyariya xwe li wir, li ber gorîgehê bihêle. Pêşî here bi birayê xwe re li hev were û hingê vegere, diyariya xwe pêşkêş bike." (Metta 5:23-24)

Bala xwe bidin peyva “pêşî.” Careke din, weke di Îşaya 66an de, Îsa diyar dike û li ser disekine ku divê em dest bi “kirina tiştan ji bo Xweda” nekin bi paşguhkirina guhdana tiştên ku Wî berê gotiye. Îsa bi taybetî behsa rewşa gilî û gazinan dike lêbelê prensîba giştî ji bo hemû rewşan derbas dibe.

Wî zilamê ku çerxa xwe ya dubare ya zinê bi min re parve kir, bînin bîra xwe; bi ser halan de ew matmayî dima ku duayên wî nedihatin bersivandin û meraq dikir bê çima tişt li gorî hêviya wî nediçûn serî. Werin em li vê rawestin û li ser vê yekê bifikirin. Eger îteata ji bo Gotina Xweda ji bo dûrketina ji bêexlaqiya zayendî ne pêşîniya wî be, çima wî hêvî dikir ku pêşîniya Xweda bereketkirina karê wî ye?

Du kurên Serkahînê mezin ê Îsraîlê Elî hebûn ku wan jî di bin serokatiya Elî de kahîntî dikirin lê ev kurên wî nebaş bûn. Wan zinê kir û qurbanên ku di ber Reb de hatibûn dayîn, bi zorê dest danîn ser wan. Elî, ji bedêla ku xerabiyên wan bi awayekî baş çareser bike, xwe dereng hişt. REB, li himberî îhmalkariya Elî bersiv da û wisa got: “Tu ji bo çi ji min bêtir rûmetê didin zarokên xwe?” (Samûêl I, 2:29).

Ji bo armanc an jî kesekî gava ku em di îteata Xweda de kêm dimînin an jî îhmal dikin, em wî kesî an jî armancê ji Xweda bêtir dihesibînin. Ev kêmbûna tirsa pîroz e. Xweda piştre wisa dibêje:

> “Kesê ku min rûmetdar bike, ezê jî rûmetdar bikim. Lê kesê ku min nehesibîne, wê biçûk bê xistin.” (Samûêl I, 2:30)

Ev gotinên hişyariyê ne. Dema ku em îteata li Gotina Xweda dereng dixin an jî îhmal dikin, em hesabê Xweda nakin. Di esasê xwe de, em vê dibêjin: Ew ne pêşîniya me ye. Xweda dibêje yên ku wê hesabê Wî nekin, wê wan biçûk bike. Gotina “biçûkkirinê” ne wergera herî baş a gotina Îbranî ye. Peyva orîjînal “qalal” weke (sivik bê dîtin, bi tiştekî nehesibandin) tê pênase kirin. Rêyek din a şîrovekirina vê gotinê ew e ku Xweda tiştê kesên ku bêrêziyê li Gotina Wî dikin girîng dibînin, bêwate dibîne. Tu kesekî aqilmend senaryoyeke wisa naxwaze. Eger wî karsazî qedir û qiymet bidaya fermana Xweda ya paqijiya zayendî, wê Xweda li karê wî girîn binêriya. Li şûna vê, weke meseleyeke ne girîng tê dîtin.

Pasajeke din ya ku girîngiya îteata berî her tiştî diyar dike jî gotinên ku Îsa ji dêra Efesiyan re dibêje:

> "Îcar bîne bîra xwe ku tu ji ku derê ketiyî; tobe bike û karên pêşî bike. An ku tu tobe nekî, ezê bêm te û ezê şamdanka te ji cihê wê rakim." (Peyxam 2:5)

Tobekirin tê wateya guhertina awayê fikirîna xwe û ji ber vê yekê tevgeriya xwe, ji bo ku hûn li gorî Gotina Xweda bin. Eger ev îteata dêrê dereng bixîne, ew ê derfeta mayîndeya pîroz ji dest bide. Îsa wê di cîh de bihata û bandora wan wê ji holê rakira. Careke din, em bi hişyariyeke bihêz re rûbirû ne.

Di Mizgîniya Lûqa de şibandineke ku taswîra derfetên ji ber dem û pêşîniyan ji dest çûne, nîşan dide heye. Îsa wisa got: "Mirovekî şîveke mezin çêkir û gelek xelk vexwendin. Û çaxê şîvê xulamê xwe şand, da ku gazî yên vexwendî bike û ji wan re bêje: De werin, her tişt amade ye" (Lûqa 14:16-17). Qet guman tê de tuneye ku ev Gotina Reb e: Şahî amade ye! Dem ji aliyê navedê ve hatiye diyarkirin.

Em li bersivên kesên hatine vexwendin binêrin: "Û her yekî ji wan dest pê kir û lêbihûrtin ji xwe re xwest" (Lûqa 14:18). Ji bo tevlî nebin, li gorî tê xuyakirin sedemên wan yên saxlem hene. Yekî erdek kirîbû, divê kesek bi kar û barê wî daketa û yê din jî jineke wî ya ku li bendî pê dakeve, hebû. Hincetan; zinê, dizî, kuştin an jî tiştekî din ê ku em ê weke gunehan bihesibînin, tê de nebûn. Lêbelê eger tiştekî ku ne guneh e berî Gotina Reb were, wê demê ew dibe guneh.

Dema ku xulam vegeriya û behsa mêvanan kir, efendiyê wî "hêrs bû" (ayeta 21ê). Ew ne xemgîn bû lê hêrs bû. Çima? Ji ber ku girîngî nedane vexwendina wî, ew ji bo wan ne pêşîniyek bû.

Efendî çi dike? Kesên ku di destpêkê de nehatine vexwendin, vedixwîne. Îsa gotinên xwe wisa bi dawî dike: "Ez ji we re vê bibêjim, yek ji wan ên ku di destpêkê de hatine vexwendin, wê tama xwarina min nekin" (ayeta 24an). Van zilaman derfeta xwe ji dest dan. Hincetên wan bêzerar xuya dikirin lêbelê girîng e ku em ji bîr nekin ku tiştên bêzerar jî dikarin me ji kirina îradeya Xweda asteng bikin. Ev rewş bi hêsanî derdikeve holê dema ku tirsa Reb di dilê me de tune be.

Di Nivîsên Pîroz de, gelek derfetên ji destçûyî yên di encama îtaeta derengmayî de hatine qeydkirin -ya rastî, ewqasî zêde ne ku mirov nikare wan di lîsteyekê de bide ser hev- lê ez ê yeka din hilbijêrim ku vê xalê bêtir ronî bike. Di Lûqayê beşa 9an de, Îsa ji du zilamên cuda re got: “Bidin dû min.” Ev çi vexwendineke mezin e gidî, Rebbê hemû afirandinê we vedixwîne ku hûn bi Wî re bimeşin! Zilamê yekem pejirand lê bi şertekî: “Destûrê bide ez pêşî herim bavê xwe veşêri” (ayeta 59an).

Zilam pejirand ku li dû Îsa were lê berjewendiyên xwe yên şexsî da pêşiyê û ev yek dereng xist. Pispor dibêjin ku dema kurê mezin bavê xwe yê mirî vedişêre, ew du qat mîratê distîne lê kurên din parek distînin. Lêbelê eger ew vê erkê bi cîh neyne, kurê ku piştî yê pêşî hatiye dinyê wê mîrata du qat li wî bikeve. Mahneya wî meşrû dihat xuyakirin û derengketin nediket kategoriya gunehê. Lêbelê li dawiyê hat hiştin. Mixabin, ew fersendeke ji destçûyî bû.

Li zilamê din jî heman bang hat kirin û bersiva wî jî ev bû: “Ez ê li pey te werim lê destûrê bide ez pêşî xatirê ji malbata xwe bixwazim” (ayeta 61ê). Dîsa, em îfadeya “pêşî” dibihîzin û careke din, sedema derengketinê nikarîbû weke gunehê bihata hesibandin. Lêbelê wî derfeta ku nêzîkî Afirînerê erd û ezman bibe ji dest da.

Di beşa piştî vê de em wisa dixwînin: “Piştî vê yekê Xudan heftê şagirtên din jî hilbijartin û ew dido dido li pêşiya xwe şandin her bajar û her cihê ku ew bi xwe wê biçûyayê” (Lûqa 10:1). Ev her du zilam bêguman wê tevlî wan heftê kesî bihatana kirin lêbelê ji ber kêmasiyên wan yên tirsa Xweda, ji ber ku îteatên xwe dereng xistin, fersend ji kîsî wan çû.

Wan salên ku min ji civata Xweda re xizmet dikir, gotina bawermendekî ku bi awayekî bêendîşe got “Ev çend meh in Xweda bi min re qayişê dikişîne,” ez matmayî (bi awayekî neyênî) hiştim. Ew dikenin û carinan jî pê dikenin weke ku tiştek balkêş be. Ez nafikirim ku ew ê ewqasî sivik bigirin eger ew fêm bikin ku ew bi nebûna tirsa xwe ya pîroz pesnê xwe didin.

An gelo eger Mûsa ji bo dîtina dîmena ecêb a deviyê dişewite dereng ketiba û keriyên xwe terk nekiriba (Derketin 3)?

An jî Nûh çêkirina keştiyê li derengî bixista?

An jî Brahîm çûyîna xwe ya welatê Kenan bihişta heta dîrokeke din, wê çi bibûya? Bavê wî wisa kir ji ber ku kesê pêşî yê ku ew vexwendin

welata Kenan ew bû. Lê fersenda ku bavê wî dereng ma û ji destê wî çû, Brahîm bi kar anî. (Destpêk: 11:31).

An jî Nehemya, teklîfa Sanballat û Geşem bipejirandaya û karê lêkirina dîwar li paş bixistaya, wê çi bibûya gelo? Lêbelê Nehemya ji Xweda ditirsiya. Bersiva wî ji wan re ev bû: “Ez karekî mezin dikim, nikarim bêm. Çima ez dev ji kar berdim, bêm ba we û di vê navberê de kar bisekine?” (Nehemya 6:3).

Mînak gelik in. Encam ev e: Gava em ji Gotina Wî bilerizin, berî her tiştî em ji Xweda re îteatê bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Ji bo ku ez emrên te bigirim, Min lezand û ez derengî nemam.” (Zebûr 119:60)

**Ramana sereke:** Eger em ji ber hincetên şexsî îteata Gotina Xweda dereng bixin, em diyar dikin ku îradeya Wî di rêza duyemîn de ye.

**Ramana kûr:** Tiştên ku bê zirar xuya dikin, dikarin me ji kirina îradeya Xweda dûr bixînin. Tiştekî ku ne guneh be, gava ku berî Gotina Reb tê, dibe guneh. Gelo min hişt ku berjewendiyên min ên şexsî bala min xera bukin û ji ber vê yekê îteat dereng bixînim? Ev çawa dikare were guhertin?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji bo wan demên ku min Gotina Te weke karekî vebijarkî dît an jî min ew berî her tiştî nedît û girîngiya herî bilind nedayê, min bibexşîne. Ez fêhm dikim, dema ku min ev kir, min bi nezanî tiştê ku Tu girîng dibînî bêwate dît. Ez tobe dikim û ji Te bexşandina xwe dixwazim. Ez ê girîngiya herî bilind bidim tiştê ku Tu dixwazî. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Gava ku min xwesteka Xweda fêhm kir, ez ê berî her tiştî jê re îteatê bikim.

EM NE LI GORÎ TÊGIHIŞTINA
ÎNSAN HATINE DINYAYÊ.
TEKANE TIŞTA GIRÎNG EW
E KU EM ÎTEATÊ JI GOTIN
XWEDA RE Û JI RÊVEBERIYA
WÎ YA DI JIYANA ME DE YE,
BIKIN. GAVA EM DI YA WÎ
DE MAN, EM Ê LI CÎHÊ HERÎ
EWLE YÊ DINYAYÊ BIN.

– YUN KARDEŞ

# 24| QET NAKEVE SERÊ MIROV

Di paşerojê de, gelo Giyanê Pîroz qet we ber bi tiştekî ku bêmantiq bû ve biriye? Piraniya kesên ku demeke dirêj nêzîkî Xweda bûne, wê bersiva xwe erê bidin. Lê destûrê bidin ez pirseke din bipirsim: Piştî we îtaet kir - carinan yekser, carinan jî piştî demekê - gelo ji we re bimantiq hat? Hema hema bêje her gav, bersiv erê ye. (Ez dibêjim "hema hema her gav" ji ber ku hin rewşên kêm hene ku dibe ku heya hûn bigihîjin kursiya darizandinê bêmantiq e.) Dema ku em lêkolîna lerizandina ji ber Gotina Xweda dikin bê tê çi wateyê, kesekî ku bi rastî bi tirsa pîroz dijî wê van tiştan bike:

1. Berî her tiştî ji Xweda re îteatê bikin.
2. **Bi we bêmantiq bê jî ji Xweda re îteatê bikin.**

Ne tiştekî asayî ye ku Xweda ji me bixwaze ku em tiştekî bikin ku ji bo têgihîştina me ne maqûl be. Lê tiştên wisa diqewimin. Werin em pirsan bipirsin.

Ji ber tifkirina erdê û heriya ku ji vê çêbibe li çavên mirovekî kor bike

û piştre miroj jê re bêje here bişo, ma ev tiştekî bimantiq dibû? Na, ne wisa bû lê vê gotinê (aqilmendiyê) çavên kor vegerandin.

Ma dema ku di nîvê dawetê de şeraba zêdetir hewce bû, gelo rijandina avê nav firaxên şerabê maqûl bû? Na, ne maqûl bû lê vê gotinê (aqilmendiyê) şeraba herî baş a dawetê çêkir.

Ma bimantiq bû ku mirov ji deryavanên xwedî tecrube re bibêje, li dijî hest û ezmûna wan ku dema qeyika rizgarkirinê amade be, keştiyeke binavbûyî bernedin? Na, ne wisa bû lê wê şîretê (aqilmendiyê) jiyana 276 kesên li ser keştiyê xilas kir, jîyana kesekî jî winda nebû (Karên Şandiyan 27: 27-36).

Ma bi mantiq bû ku mirovek ji tevgereke şiyarbûna giyanî ya li seranserê bajêr ku ji hêla Xweda ve hatibû destpêkirin, derkeve û biçe navenda çolê? Na, ne wisa bû lê vê peyvê (aqilmendî) ji wezîrekî Etiyopyayî re xelasî anî.

Ma maqûl bû ku şeş rojan bêdeng li ser sûrên bilind û bi hêz ên bajarekî mezin geriyan û di roja heftemîn de heman tişt heft caran dubare kirin û di dawiyê de bi boriyan lê dan û qîr û hawar kirin? Na, ne wisa bû lê ev peyv (aqilmendî) bû sedema hilweşîna sûrên dijmin.

Ma bi mantiq bû ku meriv hinek ard bavêje nav beroşek şorbeya jehrî û ji hemû pêxemberan re bêje bixwin? Na, ne wisa bû lê vê peyvê (aqilmendî) her kes têr kir û kes nexweş neket.

Ma maqûl e ku mirov wan kesên ku tu, malbata te an jî kesekî nêzîkî te êşandine, bibexşîne? Gelo tiştên kirine divê ji wan re bimîne?

Ma bi mantiq e ku hûn ji wan kesên ku ji we nefret dikin, hez bikin? Ma ne divê tu li hemberî wan sar û bêxem bimînî?

Ma bi mantiq e ew kesên zilmê li we dikin, hûn qenciyê bi wan bikin? Ma ne divê hên hesabê xwe bi wan re safî bikî?

Ma maqûl e ku mirov rêzê li rêveberên ku xerab tevdigerin, bigire? Ma ne hewce ye em li ber wan rabin û serî hildin?

Ma bi mantiq e ew kesên ku we biçûk dibînin hûn rêzê li wan kesan bigirin? Ma ne hewce ye ku hûn heqê wan bidin wan?

Di perçeyê mayî yê vê bêşê de û dibe ku di tevahiya pirtûkê de, bi parvekirina fermanên di Nivîsên Pîroz de ku ji me re bêmantiq xuya dikin, ez dikarim berdewam bikim lê gava em li encamên wan dinêrin, her yek ji wan zanebûna Xweda ye ku ev hatiye îspatkirin. Mirov an ji fermanên

Xweda dilerizîn ku îteat kirin û pîroz hatin hesibandin an jî ji ber ku tirsa Xweda bi wan re tunebû, îhmal kirin an jî îteat nekirin û ji ber vê jî bi encamên wê qayîl bûn. Ez hêvî dikim ku hûn niha zelaltir dibînin ku tirsa Reb bi rastî bingeha şehrezayiyê ye (Zebûr 111:10). Ji me re wisa tê gotin:

> "Bi hemû dilê xwe ewle be bi Xudan,
> Xwe nespêre fêmdariya xwe.
> Di hemû riyên te de bila ew di bîra te de be
> Ku rêçikên te rast bike."
> (Şîretên Silêman 3:5-6)

Zanebûna Reb ji ya me pir zêdetir e; ji ber vê yekê, divê em baweriya xwe bi zanebûna xwe neynin. Dema ku ji me tê xwestin ku em tiştekî bimantiq bikin, em dikarin bi hêsanî ji îteata ku wê bereketeke mezin ji me re bîne, dûr bikevin. Kesekî ku ji Xweda ditirse, guh dide gotina Wî, her çiqasî ew bê mantiq xuya bike jî.

Çend sal berê, min milyarderek nas kir. Wî ji min re got ku di destpêka qariyera xwe de çiqasî zehmetî kişandine ku di cîhana karsaziyê de bi ser bikeve. Wî pirtûkên herî zêde ku dihatin firotin li ser avakirina karsaziyeke serketî xwendibûn û her tiştê ku fêr bûbû bi kar anîbû. Lê wî dîsa jî carina delka dida xwe.

Rojekê, dema ku li dêrê rûniştibû û waza pastor guhdar dikir, ramanek hat bîra wî: Ev zilam ji bo belavkirina Mizgîniyê hatiye gazîkirin û ew ji bo bicîhanîna mîsyona jiyana xwe pişta xwe dide Giyanê Pîroz. Ez jî ji bo bi cîhana karsaziyê hatime gazîkirin ji ber vê yekê çima ez ji bo kirina karê ku ez hatime gazîkirin pişta xwe nadim Giyanê Pîroz?

Dema ku her sibeh şiyar dibû, biryar dabû ku ji Reb rêberiya wê rojê bixwaze. Wî lênûskek ji bo notan girt û her tiştê ku jê re hatibû gotin ji bo bike, tê de dinivîsand. Her wiha wî serrast dikir ku her gav bi guhekî li bandorên ku Giyanê Pîroz di tevahiya rojê de dida wî, heta di civînên kar de jî, guhdarî lê bike.

Wî hin hûrgilî bi min re parve kirin. Rojekê civîneke kirînê hebû. Wê sibehê, wî hîs kir ku Giyanê Pîroz jê re dibêje ku tiştekî ku pir bêwate xuya dike, bike. Qet ne bimantiq nedihat lê ew bi biryar bû ku wê bike.

Giyanê Pîroz jê re got ku kiryareke diyarkirî dubare û dubare bike.

Ew her li ser wê bûyerê difikirî ku tê de Pêxember Elîşa ji qral re got ku bi tîran li erdê bixe. Dema ku qral sê caran li erdê xist û careke din lê nexist, pêxember ew şermezar kir (Padîşahan II, 13:14-19). Ji ber vê yekê zilamê karsaz ev kiryar bîst caran pêk anî. Piştre ji min re got: "Wê rojê, şîrketa min bîst nexweşxane li Vîetnamê kirîn."

Piştre wî parve kir bê çawa yek ji mezintirîn bankayên cîhanê ya li Ewropayê bi dest xistiye. Ev pêvajo ji kirînên nexweşxaneyan hîn ecêbtir bû. Ez matmayî mam. Bi kurtasî, vî karsazî hilbijart ku di her tiştê ku bi duayan ji wî re hatiye dayîn de, çi bi mantiq xuya bike an jî çi neke, îteat ji Xweda re kiriye. Berhem eşkere bû -ew êdî di danûstandinên xwe yên karsaziyê de bediawiqî!

Dema ku yek ji kurên me di dawiya kamilbûna xwe de bû, min jê xwest ku ew tiştekî bike ku ev tişt bêmantiq be. Wî nerazîbûn nîşan da û got ku ev tişta ez jê dixwazim bêmantiq e lê min israr kir. Di dawiyê de bi hêrs wî got: "Bavo, ez ji nifşê Y'yê me û berî ku em tiştekî bikin divê em fêhm bikin bê ka çima em wî tiştî dikin!"

Min jê re wisa got: "Baş e, ez ê bi te re peymanekê çêbikim. Ez ê çîrokeke rast ji te re bêjim. Xweda ji pêxemberekî ciwan î ji Cihûdayê re got ku biçe Beytelê, ji qralê Îsraîlê re pêxemberîtiyê bike û dû re di heman rêya ku tê re çûye divê venegere Cihûdayê û her weha di tevahiya rêwîtiyê de divê tiştekî nexwe û venexwe. Pêxemberê ciwan guh neda fermanên Giyanê Pîroz û di encamê de berî ku rêwîtî biqede, ji aliyê şêrekî ve hate kuştin (Qral I 13:16, 23-26). Kurê min, ev peymana min bi te re ye. Eger tu sedema van fermanên taybetî yên ku ji pêxemberê ciwan re hatine dayîn ji min re rave bikî, ez ê sedema van fermanên ku min dane te ji te re bibêjim."

Wî heta îro sedemek ji min re negotiye. Ya rastî, ev yek min matmayî dihêle. Carinan Xweda ji me re dibêje ku em tiştên bêmantiq bikin. Lê şehrezayiya Wî her dem bi rêya encamên wê tê eşkerekirin. Wateya gotina Îsa ev e: "Lê şehrezayî bi kirinan rewa dibe" (Metta 11:19).

Em hemû, weke Petrûs bin ku piştî di seran serê şevê de li deryayê bi derewan li ber xwe da û piştre guh da fermana Îsa ku here nav ava kûr û careke din torên xwe bavêje deryayê. Ev ferman wê ji wan re hewce bike ku hîn bêtir bixebitin ji ber ku ew jixwe westiyabûn. Lê

bersiva Petrûs çiqas bêhempa ye, ne wisa? “Ya Hosta! Tevahiya şevê me kir û nekir, me tu tiştek negirt. Lê li ser gotina te, ezê toran bavêjim” (Lûqa 5:5). Encam du qeyik tijî masî bûn.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Kesê bi xwe ewle ye bêaqil e, Lê kesê dide ser riya şehrezayiyê rizgar dibe.” (Şîretên Silêman 28:26)

**Ramana sereke:** Zanebûna Reb ji ya me pir zêdetir e, ji ber vê yekê divê em baweriya xwe bi zanebûna xwe neynin. Dema ku ji me tê xwestin ku tiştekî ku ne bimantiq xuya dike em bikin, em dikarin bi hêsanî ji îteata ku bi rastî wê bereketeke mezin ji me re bîne, dûr bikevin. Mirovekî ku ji Xweda ditirse, her çiqasî ne bimantiq be jî îteatê ji gotina Wî re dike.

**Ramana kûr:** Gelo ez di baweriya bi şehrezayiya Xweda de zehmetiyê dikişînim? Di demên berê de, gelo min şîreta Wî red kir û vegeriyam ser tiştê ku bi min bimantiq dihat? Ev çawa çêbû? Eger ji bo rêya xwe bibînim li Xweda binêriya û baweriya xwe pê bianiya, wê çi bibûya? Gelo ez dikarim xwe li ber vê pêvajoyê bigirim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji ber ku ez ji ya Te bêtir baweriya xwe bi şehrezayiya xwe tînim, li min bibore. Ez ji bo wergirtina şehrezayiya Te baweriyê dixwazim dema ku ez Gotina Te dixwînim, dema ku ez duayan dikim û dema ku ez guh didim peyamên xwedayî ji bawermendên dilsoz ên ku ji Te ditirsin. Hêza bide min ku ez bawer bikim û îteatê ji Gotina Te re vikim, her çiqasî ew bi min bimantiq xuya neke jî. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez hildibijêrim ku îteatê ji şehrezayiya Xweda re bikim, ne ji dengê wan kesên ku li şûna Xweda, baweriya xwe bi hiş û şiyanên xwe yên mirovî tînin.

HÊVIYA XELATÊ AN JÎ TIRSA CEZAKIRINÊ TUNEBE JÎ, HEZKIRINA XWEDA Û TIRSA JI WÎ PEYWIRA MIROV E.

– MAIMONIDES

# 25| LI GORÎ TÊ XUYAKIRIN TU FÊDEYA WÊ TUNE

Dibe ku we bihîstibe, dêûbav gazinan dikin ku ew tenê dema ku zarokên wan ên zanîngehê hewceya wan bi pereyan hebe, wan dibihîzin. Di vê senaryoya tîpîk de, dibe ku zarok di dema têlefonê de bi dê an bavê xwe re eleqedar xuya bike ku bi wan re sohbetê bikin lêbelê sedema bingehîn sûdwergirtina ji çavkaniya pêwîst e. Tirsa pîroz me ji kirina heman tiştî ya bi Bavê me yê Asîmanî diparêze û aliyê din ê lerizîna ji Gotina Xweda destnîşan dike. Werin em wê ji nû ve binirxînin dema ku em nîşana xwe ya herî nû lê zêde dikin:

1. Berî her tiştî ji Xweda re îteatê bike.
2. Bi te bi mantiq neyê jî ji Xweda re îteatê bike.
3. **Berjewendiyeke we ya şexsî nîn be jî ji Xweda re îteatê bike.**

Di zêdetirî çil salên xizmeta xwe de, ez li rastiyeke xemgîn rast hatim, bi taybetî di dêrên Rojava de. Gelek caran, ji bo ku bawermend bi îteat re eleqedar bibin, pêdivî ye ku mirov li ser fêdeyan bisekine. Li ser vê yekê bifikirin. Ji bo ku em peyameke li ser pîroziyê di kursiyê rêza pêşî de bibihîzin, ma gelo em ê sîh deqîqeyan zû bihatana rûniştana? Ma pirtûkên li ser îteat di nav pirtûkên herî zêde tên firotan de cîh digirin gelo? Gelo rêbertî, ji bo ku li gorî vê meylê tevbigere, ji rastiyên berbiçav dûr ketiye? Bi gotineke din, gelo mizgînvan li şûna ku gazî civata Xweda bikin ku bi înkarkirina xwe Îsa bişopînin, teslîmî zextê bûne ji bo ku guhên ku ji hêla çîrokên îlhamê ve bêzar bûne têr bikin?

Çi dike ku ev meyl bibe rastiyeke ewqasî xemgîn? Bi dûrketina ji şehrezayiya Xweda re ya rastî em zirarê didin xwe. Ferman, şîret û şehrezayiya Wî di dawiyê de hem di vê jiyanê de û hem jî di ya din de bereketên herî mezin dide. Di Gotina Xweda de tê gotin ku “xelata wan ên ku lê guhdar dikin mezin e” (Zebûr 19:11). Tu carî hûn nikarin di dayînê de Xweda derbas bikin; fêdeyên wê ji her tiştê ku hûn dikarin ji bo Wî bikin pir mezintir in.

Ji aliyekî din ve, motîvebûn bi teşwîqan xeternak e. Çima? Dema ku fêdeya jê ne diyar be, gelo em ê xwedî heman biryardariyê ya ji bo îteata Gotina Xweda bin? Bi îhtîmaleke mezin ji aliyê berjewendiyên xwe ve wê bên daqurtandin. Ji ber vê yekê tirsa Reb pir girîng e, xelat xuya be û ne xuya be jî ew îteatê teşwîq dike.

Di serdema Împeratoriya mezin a Persan de, vê qraltiya bihêz miletên din xistibûn bin desthilatdariya xwe û serokê wan Qral Ahaşveroş, zilamê herî bi hêz ê cîhanê bû. Ew bi jineke Cihû ya bi navê Ester re zewicî.

Piştî qral, rêvebirê herî payebilind zilamekî bi navê Haman bû. Mordekay pismamê an jî mixaletiyê Esterê bû û hêrsa Haman li hemberî wî çêbû. Bi hêrseke mezin, Haman biryar da ku ne tenê Mordekay lê hemû gelê Cihû ceza bike. Ew û gelekên din jî haya wan jê tunebû ku Şahbanû Ester Cihû ye.

Haman dest bi belavkirina buxtanên hovane li dijî gelê Cihû kir û ji qral re pêşniyar kir ku tevahiya miletê Cihû di rojekê de bê tunekirin.

Komploya wî bi ser ket. Qral ev fikir qebûl kir, fermanek derxist û bi mohra xwe mohr kir.

Mordekay çawa ev ferman bihîst, qasidek şand ba dotmama xwe Şahbanû Ester û jê xwest ku here ba qral û ji bo jiyana gelê Cihûyan ji qral lava bike.

Esterê bersiv da: “Hemû xulamên padîşah û miletên ku li herêmên wî rûdinin dizanin ku bêyî ku hatibe gazîkirin ji bo her kesê ku dikeve hewşa hundur a qesrê û nêzîkî padîşah dibe tenê rêzikek heye: Heta ku padîşah gopalê xwe yê zêrîn dirêj neke û canên wan nebexişîne, ew kes tên kuştin. Ev sî roj in ku ez jî, ji bo hizûra padîşah nehatime gazîkirin” (Ester 4:11). Her çiqasî ew jina Ahaşveroş bû jî, Ester wê bi îhtîmaleke mezin bihata îdamkirin eger ew bêyî vexwendinê nêzîkî odeya text bibûya.

Werin em li vê yekê bi baldarî bifikirin: Ester şahbanûyek e, jiyana wê pir xweş e -bi rastî, her tiştê ku dilê wê dixwaze heye. Ew bi xetera ketina odeya text ji bo gelê Xweda tiştekî bi dest naxe lê gelek tişt winda dike, herî zêde jîyana xwe. Lêbelê bala xwe bidin bersiva wê ya ji Mordekay re:

> “Here û tevahiya Cihûyên li Sûsayê bicivîne, ji bo min rojiyê bigirin. Sê şev û sê rojan ne bixwin, ne jî vexwin. Ez û xizmetkarên xwe jî, emê rojî bigirin. Paşê tevî ku ne li gorî qanûnê ye jî, ezê herim ba padîşah. Ez bimirim jî, ne xem e.” (Ester 4:16)

Tirsa pîroz, hişt ku ew Desthilatdariya Xweda li pêş berjewendiya xwe deyne. Rehetî, ewlehî, dewlemendî û meqamê wê ji ber îtaeta wê ketibûn xetereyê. Wê ji vê yekê tu sûdeke taybet bi dest nedixist lê tiştê ku ji bo Xweda girîng bû, bê îstîsna, ji bo wê serdest bû. Ew ji Gotina Wî ditirsiya, ew ji Xweda ditirsiya.

Di sala 2015an de, ez û Lisa li Êrîvanê ango li bajarê Ermenistanê bûn û di konferansekê de me ji bo 3500 rêberan xizmet dikir. Gelek pastor ji seranserê Ewropaya Rojhilat û Rojhilata Navîn li wir bûn û gelek ji wan ji Îranê hatibûn (Erîvan, tenê pêncî kîlometreyan ji sînorê Îranê dûr e). Wê demê, destûr hebû ku welatiyên Îranê bikevin

Ermenistanê, ji ber vê yekê gelek rêberên ji dêra veşartî bi me re bûn. Civîn pir xweş bûn.

Piştî hevdîtina dawî, min û Lisa biryar da ku em li kolana sereke ya Êrîvanê bigerin ji bo ku em hinekî bêhna xwe vedin. Du jinên ciwan ên ku temenê wan di nava bîst û sîhî de bûn, ji xwaringehekê derketin û ber bi me ve bazdan ji bo ku silavê li me bikin. Em hîn bûn ku ew du rêberên ji Îranê ne. Ew her du jin pir ecêb xweşik bûn û ji jiyanê pir hez dikirin. Divê ez li xwe mikur bêm ku ez kêliyekê ji wan kêliyan fikirîm ku van her du jinên xweşik bi qîjan kurê xwe yê ku her sê jî ne zewicî bûn, bidim nasîn.

Ez û Lisa nêzîkî bîst deqeyan bi wan re axivîn. Em hîn bû ku polîsên olî li dû wan in, di dema konferansê de, rayedarên Îranî ji bo cîhê wan telefon dikirin. Yekê ji wan ji me re got ku peyameke ku endîşeyê dide wan, di telefona wê de heye.

Di wê gavê de, min yek ji gotinên herî bêaqil ên ku min di çil salên xizmeta xwe de kiriye, kir. Min jê pirsî: “Çima tu vedigerî? Çima tu daxwaza penaberiyê nakî?”

Bi dilsozî, nermî û bi biryardarî li min nihêrî û bersiv da: “Eger em venegerin wê kî ji gelê Faris re behsa Îsa Mesîh bike?”

Ez ji bersiva wê matmayî mam. Me dît ku van jinan hestên xwe yên parastina xwe ya şexsî danîne aliyekî, ew ji aliyê hewesa wan a berfirehkirina Desthilatdariya Xweda li ser axa xwe ve hatibû veşartin. Ew di nava tirsa pîroz de dijiyan, weke Ester. Wan îteat ji Xweda re dikir, her çiqasî tu berjewendiya wan ya şexsî tê de tunebû jî û bêguman wan jiyana xwe dixistin xetereyê. Min ji vê bûyerê hem ders û hem jî cesareteke mezin girt.

Ev biryardarî, weke ku di jinên ciwan de tê dîtin, ne tenê bi kiryareke yekane ya îteatê ve hatiye îzolekirin. Ew helwestek jidil e ku tê pêşxistin û di pratîkê de tê sepandin. Jixwe ew di biryarên bêwate yên ku em gav bi gav didin de jî ew standart e. Em di mijarên biçûk de jî, em hildibijêrin ku îteatê ji rêliberxistina Gotina Xweda û Giyanê Pîroz re bikin. Dibe ku bernameyeke me ya pir mijûl hebe lê ji nişkê ve ji me tê xwestin ku em li kesekî bigerin. Sedem tune, sûdek eşkere tune lê em ji ber vê ve ne motîve ne. Em lê digerin û bi gelemperî em “sedema” vê piştre dibînin.

Yan jî dibe ku em hîn bibin ku kesekî bêbextî li me kiriye. Li gorî tê xuyakirin tu fêde ji bexşandin, lihevhatin û pîrozkirina wî kesî çênabe lê em vê yekê dikin ji bo ku em îteatê ji fermanên Xweda re bikin: "Li hev bibexşînin, çawa ku Xweda di Mesîh de hûn bexşandine" û "wan kesên ku nifir li we kirine pîroz bikin" (Efesî 4:32; Lûqa 6:28).

Dibe ku ji aliyê kesekî ku ji me nefret dikir, xerabî li me hatibe kirin. Çi fêdeya berbiçav heye di îteata fermana Îsa de ya ku dibêje "ji dijminên xwe hez bikin û ji bo yên ku zilmê li we dikin duayan bikin" (Metta 5:44)? An jî li vê yekê bifikirin: Bawermendên ku zilm li wan hatiye kirin; çi fêdeyê ji wan kesên ku zilmê li wan dikin, yên ku wan îşkence dikin û heta yên ku ji ber baweriya xwe hezkiriyên xwe dikujin û wan bi bereket dikin, dibînin? Lê dîsa jî ez û Lisa, em bi pastorên li welatên ku ev bûyer li wan qewimî re rûniştin û me şahidiya şahiya wan a mezin û jiyana wan kir.

Çi fêdeya duakirina bi dilgermî ji bo neteweyên din heye? An jî alîkariya madî ji bawermendên belengaz ên li welatên din re peyda kirin ku qet nikarin berdêla we bidin? Lîste bêdawî ye. Pirs ev e, gelo hûn ê bi berdewamî guh bidin Xweda di bersiva tirsa pîroz a ku di dilê we de dişewite de an jî hûn ê li bendê bimînin heya ku hûn sûdeke şexsî jê bibînin?

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Çimkî kî ku bixwaze jiyana xwe xilas bike, ewê wê winda bike; lê kî ku jiyana xwe di ber min de winda bike, ewê wê bibîne." (Metta 16:25)

**Ramana sereke:** Gelek caran, em ji ber dûrketina ji şehrezayiya Xweda ku ji bo me sûdmend xuya nake, bereketên herî mezin ji dest didin. Di esasê xwe de, em ji bo dema dirêj zirarê didin xwe. Em tu carî nikarin di dayînê de Xweda derbas bikin.

**Ramana kûr:** Dema ku Îsa dibêje "canê xwe xelas bike" mebesta wî çi ye? Gelo min tenê di ronahiya rewşên awarte ên weke şehadetê de li vê nivîsê nihêrî? Gelo min ev prensîb li ser biryarên xwe yên biçûk û rojane bicîh anî? Eger min ev bikira wê çi bibûya? Vê yekê wê çawa şêwaza jiyana min biguheranda?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji bo sînordarkirina arezû û îteata min bi şehrezayiya ku ez difikirîm ku ji bo min sûdmend e, li min bibexşîne. Ez ji vê hişmendiyê tobe dikim û ji Te bexşandina xwe dixwazim. Ji vê gavê û pê ve, êdî ez hildibijêrim ku xwe bi canê xwe ve negirim lê ji bo Îsa ez ê dev ji canê xwe berdim. Ji ber vê yekê, ez ê li arezû û hesreta şehrezayiya Te bigerim, her çiqasî xuya bike ku tu fêdeyê nade min jî. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez hildibijêrim ku di her kêliyê de jiyana xwe ji bo îrade û şehrezayiya Rebê xwe Îsayê Mesîh bidim.

BÊYÎ ÎTEATÊ XELASÎ ÇÊNABE,
JI BER KU TÊGEHA XELASIYA
BÊYÎ ÎTEATÊ NAKOKIYEK E
KU BI XWE RE LI HEV NAKE.

– W. TOZER

# 26| ÊŞEKE RAST

Jineke ku zarokekê tîne dinyayê ji bo wê ne tecrubeyeke xweş e, zor û dijwar e û heta pir bi êş e. Lêbelê di dawiyê de endameke nû yê malbatê yê ku tê xwestin li malbatê zêde dibe. Eger zor û dijwariya ducanî û zayînê tunebûya, ev jiyana nû û ya xweşik nedihat holê. Ev şibandin nêrîneke li ser aliyê din ê lerizînê ji Gotina Xweda pêşkêş dike. Li gel ya herî nû, sê nîşaneyên pêşîn ev in:

1. Berî her tiştî ji Xweda re îteatê bikin.
2. Bi we bimantiq neyê jî ji Xweda re îteatê bikin.
3. Tu fêdeya we tê de tunebe be jî ji Xweda re îteatê bikin.
4. **Êşê bide we jî ji Xweda re îteatê bikin.**

Filîpî 2:12-13, yek ji ayetên bingehîn ên Nivîsên Pîroz e ku gava em lê vedigerin tîne bîra me ku divê em xelasiya xwe bi rêya rêzgirtin û tirsê çalak bikin. Hema berî van gotinên ku banga îteat li me dikin, Pawlos nîşanî me dide ku Îsa mînakek e ji bo me. Rebbê me dev ji îmtiyazên xwe yên xwedayî berdan û "Wî xwe nizim kir, îtaet kir û çû mirinê, Heta çû mirina li ser xaçê" (Filîpî 2:8). Îsa, her çiqasî gelek êşên mezin kişandibin û pêdivî pê hebû jî bi dilxwazî îteat ji daxwaza Bav re kir.

Şeva berî xaçkirinê, li bexçeyê Getsemanî, Îsa bi xemgîniyeke mezin

wisa qêriya: “Bavê min, eger bibe bila ev kasa tehl ji min derbas bibe. Lê bila ne wek ez dixwazim, lê wek ku tu dixwazî be” (Metta 26:39). Nakokiya di navbera îtaet û parastina xwe de ewqas dijwar bû ku xwêdana Îsa weke dilopên mezin ên xwînê li erdê diherikî. Ji bîr nekin ku Ew “bi her awayî mîna me hat ceribandin lê wî guneh nekir” (Îbranî 4:15). Wî êşa tirsnak a ku li benda wî bû ji berê ve dît û xwest rêyeke alternatîf ji bo pêkanîna daxwaza Bav bibîne lê ev ne mimkun bû. Tişta ku îtaeteke evqasî mezin motîve dike çi ye?

> “Îsa di jiyana xwe ya li ser erdê de bi gazî û hawar, bi hêstirên çavan dua û lavan pêşkêşî wî kir, ku dikarî ew ji mirinê xilas bikira û ji ber xwedêtirsiya xwe hatibû bihîstin.” (Îbranî 5:7)

Tirsa Xweda hêz da wî ku li hemberî tiştên ku xwezaya mirovan jê direve û tehemûl bike, rûbirû bibe. Bi heman awayî ji me re jî wisa tê gotin:

> “Îcar çawa ku Mesîh di bedenê de cefa kişand, hûn jî bi eynî armancê xwe çekdar bikin. Çimkî yê ku di bedenê de cefa kişandiye, dev ji guneh berdaye.” (Petrûs I, 4:1)

Berî ku em bêtir herin bi pêş ve, destûrê bidin ez li ser xaleke girîng bisekinim. Ola sexte armanc dike ku êşê bide ji bo ku xwedayê ku xizmetê jê re dike razî bike. Xirîstiyaniya rastîn armanc dike ku îtaeta Xweda teşwîq bike. Di vê pêvajoyê de, ew rastî berxwedana dinyaya ketî tê û ev berxwedan pir caran dibe sedema êşê. Tiştê ku Xweda razî dike ne êşa me ye lê îtaeta me ye ji Wî re ye. Êş dikare bi awayekî fizîkî an jî derûnî xwe nîşan bide, êşa herduyan jî pir rast e.

Petrûs ji me re dibêje ku xwe bi çekdar bikin. Hûn dikarin xeyal bikin ku artêşek bêçek, bê balafir, bê keştî, bê tank, bê çek, bê gule an jî kêr here şer bike? Tenê ev raman weke pêkenokê tê. Wisa xuya dike. Bi heman awayî, ji bo bawermendekî jî dînîtî ye ku ji bo êşê ne amade be lê gelek kes wisa ne. Bawermendekî bêçek dikare bi hêsanî li ser navê parastina xwe ji zehmetiyan derbas bibe. Tirsa Reb e ku me bi çekdar dike, kîjan êş be bila be, ew di îradeya me de biryardariyeke kûr dide ku em îteatê ji Xweda re bikin.

Ewqas çîrokên min ên li ser êşê hene ku ez parve bikim wê têra pirtûkekê bikin. Yek ji wan di destpêka salên 1990’î de di sefereke xizmetê de qewimî. Lisa, zarokên me û ez; li dêreke li bajarekî

gundewarî yê biçûk me xizmeta dêrê dikir ku vê dawiyê pastorê xwe winda kiribû, wî ew terk kiribû ji bo ku here li dêreke mezintir bixebite.

Çend civînên pêşîn dijwar derbas bûn; beşeke mezin ji civatê bêxem bûn û ciwan li paş rûdiniştin, henek bi hev re dikirin û bi hev dikeniyan. Lêbelê di civîna sêyemîn de nûbûneke giyanî çêbû. Bandora wê pir kûr bû, heta ciwan jî zû hatin ji bo ku kursiyên rêza pêşîn bi dest bixin. Beşdarbûn zêde bû û civîn çend hefteyan dirêj ajotin. Em her êvarê di avahiya dêrê ya biçûk a tijî de diciviyan, gelekan ji wan baweriya xwe pê anîn û gelekan şiyarbûna giyanî jiyan. Piştî gelek duayan, me pêşniyar kir ku em çend mehan li wir bimînin heta ku pastorek nû were dêrê û xizmetê bike. Lêbelê rêveberiya saziyê, ji ber ku jiyana wan a plansazkirî û kontrola wan a li ser rêça bûyeran hate qutkirin, kêfxweş nebû. Bi awayekî ecêb, yek ji gilî û gazinên wan ew bû ku wan hez nedikir ku ciwan li rêzên pêşîn rûnên. Hin gilî û gazinin din jî hebûn lê tiştekî din girîng di nava wan de tunebû. Bi kurtasî, wan bi yekdengî biryar dan ku pêşniyara me red bikin û me ji bajêr derxînin.

Wê êvarê, dema ku wan deng dan, min ji dêrê re ragihand ku civîna me ya dawî wê şeveke din be. Ji piraniya mirovan dengekî dilşikestinê bilind bû, ew kêlî kêliyeke dijwar, stresdar û nearam bû.

Roja din, zilamekî hêrsbûyî ku jina wî beşdarî civînan dibû, telefonî dêrê kir û di civîna me ya dawî de gef dixwar ku wê avahiya dêrê biteqîne. Ez pê keniyam heta ku polîsekî telefonî min kir û debarê bûyerê de ez hişyar kirim.

Min bi awayekî bêbawer îtîraz kir û got: “Bêguman ew ê tiştekî wisa neke.”

Memûr wisa bersiv da: “Birêz, ez vî zilamî nas dikim. Ew bazirganekî tiryakê yê payebilind e û guman li ser wî heye û ez ê matmayî nemînim eger ew piştî çend şûşeyên vexwarinê vê yekê bike.”

Min bifikar jê pirsî: “Hûn nikarin parastinê ji me re bikin?”

Min nikarîbû baweriya xwe bi bersiva wî bînim: “Qereqola me şêst kîlometre dûrî wî bajarî ye. Ez êvarî saet 6an de diçim û kesek din nikare were wir ji ber ku karmendên me kêm in.”

Min ji tiştên ku ji min re gotin bawer nekir û telefon girt lê ya girîngtir, ez bi endîşe bûm. Aqlê min ji min re digot, di cîh de xwe bidin hev û ji bajêr derkevin. Em di karavana endamekî dêrê de dijiyan ku

li nav zeviyekî vekirî parkkirî bû û em li hemberî êrîşan bê parastin bûn. Me xwe bê parastin û weke hatine terikandin hîs dikir. Ma çima em ê beşdarî civîna wê êvarê bibin? Rêveberiyê jixwe bera me dabû, diviyabû em kêlî berî kêliyekê ji bajêr derketina!

Min dizanibû ku ramanên min li gorî berjewendiyên xwe bûn, di dema xizmeta me de ku çend hefteyan berdewam dikir, me bandor li gelek kesan kiribû û eger me ji ber gefxwarinê dev ji wan berda, wê careke din matmayî bimana ji ber redkirina ku wê rêberekî din jî dev ji wa berdaya. Min dizanibû ku eger em birevin, em ê mînakeke lihevhatinê nîşan bidin ku dikare bandorê li ser jiyana me ya mayî bike. Min nikarîbû li van gotinên Îsa nefikirim: “Yê ku bi peran hatiye girtin û ne şivan e, kesê ku ne xwediyê miyan e, dema ku dibîne gur tê, miyan dihêle û direve.” (Yûhenna 10:12)

Me bi saetan dua kirin. Car bi car, min ayeta li ser kesên ku li ber Reb radiwestin bi bîr anî: “Bi xesara xwe sond xwaribe jî, venagere ji sondê” (Zebûr 15:4). Di dawiyê de aştî di dilê me de serdest bû û me xwe ewle hîs kir. Me wê êvarê bi awayekî ecêb xizmet kir. Bombe neteqiya û me bi awayekî li gorî dilê xwe ji civatê xatir xwest.

Em di cîhaneke gunehkar de ku li dijî rêyên Xweda ye dijîn û heta dibe dijminê Wî. Ji ber vê yekê “ne tenê îmtiyaza baweriya bi Mesîh lê di heman demê de îmtiyaza êş kişandina ji bo Mesîh” ji me re hatiye dayîn (Filîpî 1:29). Ne tenê Pawlos, lê Petrûs jî wisa dinivîse:

> “Erê, ji bo vê yekê hûn hatin gazîkirin. Çimkî Mesîh jî ji bo we cefa kişand û mînak ji we re hişt, da ku hûn li ser şopa wî herin. «Wî qet guneh nekir Û peyveke bi hîle ji devê wî derneket.» Çaxê ku dihat nizimkirin, wî bi nizimkirinê bersîv neda. Çaxê ku êş dikişand wî li kesî gef nexwar; lê wî xwe spart wî yê ku bi dadperwerî dîwanê dike.” (Petrûs I, 2:21-23)

Em ê mîsîllemeyê nekin; li şûna vê, divê em her neheqiyeke ku em pê re rûbirû dimînin, bi destên Xweda ve berdin. Divê em vê paşguh nekin lê bi duakirinê divê em Wî radestî Wî bikin. Xweda wê tola me hilîne lê bi awayê xwe û di dema xwe de.

Lehengên desthilatdariyê bi rêya baweriya xwe serkeftinên mezin bi

dest xistin lêbelê hin ji wan ji ber îtaeta xwe ya ji Xweda re; henekên xwe bi wan kirin, hatin zincîrkirin, hatin îşkencekirin, hinekan êş kişandin, hatin girtin, li çolan hatin gerendin, di şikeftan de jiyan û bi êşên bêhejmar re rûbirû man. Çima? Ji ber ku ew di cîhaneke ketî ya ku dijminiya Desrhilatdariya Xweda dikin de, dijiyan (Îbranî 11:36-39). Tiştê ku di hemûyan de hevpar e ev e: ji ber tirsa xwe ya pîroz, her çiqasî êşê bikişînin jî wan red kir ku dev ji îteat berdin. Lê wan baweriya xwe bi vê sozê dianî: "Yên ku bi hêsirên çavan çandin, Wê bi şahî bidirûn; Yê ku bi girî çû tovê xwe biçîne, Helbet wê rake qevda berê xwe û bi şahî bîne" (Zebûr 126:5-6).

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Kesê ji Xudan ditirse di ewlehiya qewîn de ye, Wê sitargeha kurên wî be." (Şîretên Silêman 14:26)

**Ramana sereke:** Tirsa Reb, me bi biryardariya îteata ji bo Xweda di bin zor û zehmetiyan de jî, bi çek dike.

**Ramana kûr:** Gelo min ji bo parastina xwe min îteat ji Gotina Xweda re paşguh kiriye? Gelo ez dixwazim ku tobe bikim û tirsa Reb bijerinim? Gelo ez ê hez bikim û guh bidim, her çiqasî ku berdêleke aborî, civakî an jî ya fîzîkî bidim?

**Dua:** Rebê min î delal, ji bo parastina xwe ku ez ji îteata Gotina Te reviyam û min ev ji xwe re kir adet, min bibexşîne. Min hilbijartineke bêaqil kir -parastina ku Tu ava dikî bêqusûr û mayînde ye; parastina min î ku ez xwe diparêzim jî tenê demkî ye. Ji vê gavê pê ve ez tirsa Reb hildibijêrim, bedêla wê her çi dibe bila bibe ji bo ez îteatê ji Te re bikim, biryardariyeke bide min. Ez bi navê Îsa ji bo vê hêzê spas dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Her çiqasî di vê pêvajoyê de ez êşê bikşînim jî, ez xwe bi tirsa pîroz bi çek dikim ji bo ku ji Xweda re îteatê bikim. Ez canê xwe bi edaletê re radestî Xwedayê didarizîne dikim.

“RIYA LINGÊ XWE RAST BIKE KU HEMÛ RIYÊN TE EWLE BIN.”

– ŞÎRETÊN SILÊMAN 4:26

# 27| HAT TEMAMKIRIN

Ji bo ez dest bi vê beşê bikim destûrê bidin ez bi pirsekê dest pê bikim: Bêyî temamkirina projeyekê, gelo gengaz e ku mirov bigihîje potansiyela wê ya temamkirî? Eşkere ye ku bersiv na ye. Projeyeke mezin ya Rebê me heye ku li ser avakirina qraltoyekê disekine. Wî berpirsiyariya projeyên biçûk daye her yekî ji me ku dema temam bibin, wê karê qraltiya Wî ya bi heybet biqedînin.

Gava hûn ji Gotina Xweda ber bi hêmana dawî ya lerizînê ve diçin, vê rastiyê di hişê xwe de bigirin. Ha vaye li vir ew e, digel çarên pêşîn:

1. Berî her tiştî ji Xweda re îteatê bikin.
2. Bi we bimantiq neyê jî ji Xweda re îteatê bikin.
3. Tu fêdeya we tê de tunebe be jî ji Xweda re îteatê bikin.
4. Êşê bide we jî ji Xweda re îteatê bikin.
5. **Heta ku temam bibe, îteatê ji Xweda re bikin.**

Şawûl; qralê yekem ê Îsraîlê, mînakek klasîk a kesekî ye ku ji Gotina Xweda neleriziye. Gava ku bi wî bimantiq nedihat, fêdeya wî têde tunebû an jî dema ku ji armancên wî re xizmet nedikir, ew bi hêsanî ji îteatê dûr diket. Ji ber ku ji tirsa pîroz bêpar bû gelek caran êş an jî zerar dida kesên din û ev cureyên reftaran her dem wisa ne.

Lê Şawûl serê pêşî ne wisa bû. Berî ku bibe qral û tacê têxe serê xwe, ew xortekî dilnizm û xwedaparêz bû; ev herdu dilpakî bi hev re diçin serî. Gava ku Samûêl, pêxemberê Îsraîlê, li wî geriya, wisa got: "Ma ez ne ji eşîrên Îsraîlê ya herî biçûk im, ya bi navê Binyamîn im? Ma ew ne ji hemû eşîrên di nav eşîra te de ya herî biçûk e ku ew jî girêdayî êşîra Binyamîn e? Çima tu tiştên wisa ji min re dibêjî?" (Samûêl I, 9:21, şîroveya nivîskar). Piştre hemû Îsraêlî civiyan ji bo ku bizanin qralê wan ê yekem kî ye. Piştî pêvajoyeke dirêj, hilbijartina Xweda Şawûl bû lêbelê gava rêberan gazî wî kirin, ew nehat dîtin; wî xwe li cîhekî tarî veşartibû. Daxwazeke wî ya ku bê naskirin tunebû (Samûêl I, 10: 20-24).

Lêbelê tirsa pîroz nebû xezîneya wî. Weke di doza Silêman de, piştî ku bereketên serkeftin, navdarî û serokatiyê ceriband, wî tirsa Xweda terikand. Weke Qral Saul û gelekên din, nîşanên yekem ên windakirina tirsa pîroz hem diyar in û hem jî ne diyar in. Ew bi paşguhkirina baweriya wijdanî di mijarên biçûk de dest pê dike û bi bêhestiyariya zêde ya wijdanên me digihîje lûtkeyê. Di dawiyê de, gava ku em bi mijarên girîngtir re rûbirû dimînin, haya em ji adetên me yên bêîteatiyê yên pêşketî çênabe.

Ev yek ji bo Qral Şawûl jî derbadar bû. Nîşanên windakirina tirsa pîroz serav bibûn û derketibûn holê (Samûêl I, 13: 5-14) lê tiştê ku meseleyê hîn dijwartir dikir ev bû ku ew di heman demê de serkeftinên mezin bi dest dixistin (Samûêl I, 14:47).

Piştî demekê, Xweda ji qral re wisa ferman kir: "Rabe here li Emalêq bixe û her tiştê wan bi tevahî tune bike. Li ber wan nekeve. Ji mêr, jin û zarokan bigire heta zarokên berşîr, ga, pez, deve heta bi kerên wan hemûyan bikuje" (Samûêl I, 15:3). Reb amade bû ku tola xerabiyên li vî gelî hatine kirin, hilîne.

Şawûl ji bo vê êrîşê 210.000 leşker seferber kirin. Wî û zilamên xwe, ji bilî qralê Amalekiyan Agak û heywan herî baş, her kes û hemû heywan kuştin (Samûêl I, 15:7-9). Werin em bi baldarî li ser vê yekê bifikirin. Li gorî ku Şawûl artêşeke ewqas mezin daye hev, em dikarin bibêjin ku hejmara Amalekîyan herî kêm 250 hezar in. Em dikarin wisa texmîn bikin û ji ber vê yekê wan hema hema 249.999 kes kuştin. Qral ji sedî 99.99ê tiştê ku jê re hatibû ferman kirin pêk anî lêbelê bala xwe bidin bersiva Xweda ya ji bo îtaeta wî ya hema bêje temam:

> “Ez poşman bûm ku min Şawûl kir padîşah.
> Çimkî êdî ji pey min vegeriya û gotinên min bi cih neanî.”
> (Samûêl I, 15:11)

Samûêl vê peyamê ji qral re radigihîne û kiryarên wî bi eşkereyî weke kiryareke serhildanê bi nav dike (Samûêl I, 15:23 ). Guman têde tune ye ku Şawûl guneh kiriye. Werin em rawestin û li ser gunehê nîqaşê bikin. Yûhennayê şandî dibêje ku guneh binpêkirina qanûnê ye (Yûhenna I, 3:4). Pênasîna wî ya gunehê mirov dikare wisa bîne ziman: Guneh, neguhdariya rayedariya Xweda ye. Bi vî awayî li bûyerê bifikirin: Adem li baxçe bi fahîşeyekê re raneza, bankeyek ne şeland an jî kesek nekuşt. Wî tenê guh neda gotina Xweda. Bi heman awayî Şawûl jî hilbijart ku bi temamî îteatê ji fermana Xweda re neke.

Werin em bi awayekî kûrtir lê binêrin. Dema ku fermana çûna şer ji Şawûl hat xwestin, wî lingê xwe li erdê nexist û negot: “Na! Ez vê yekê nakim!” Piraniya mirovan tevgereke wisa weke serhildanê bi nav dikin. Wî ferman paşguh nekir û bi karûbarên din xwe yên şexsî re mijûl nebû. Eger wisa bibûya, wê piraniya mirovan bigihîjin vê encamê: “Wî xeletiyeke ku îteatê nake karê pêşî û berî her tiştî, kir.” Lê pir kêm kesan peyva “serhildan”ê bi kar dianîn.

Bi heman awayî, gelek mirov dibêjin ku Şawûl ji %99.99ê fermanê bi cîh anî û karekî baş kir lêbelê hindik kes jî kiryarên wî weke serhildanê bi nav dikin. Eger em di şûna Şawûl de bûna û ev şermezarî li me bihata kirin, wê çend kesan ji me wisa îtîraz bikira: “De here lo, bimantiq tev bigere! Çima tu ewqasî li ser vî tiştê biçûk ê ku min nekiriye disekinî û hemû tiştên din ên ku min bi dest xistine tu paşguh dikî?” Di ronahiya vê de, gihîştina vê yekê mirov nikare jê bireve: îteateke bê kêmasî, hema bêje ne îteat e.

Werin em lêkolîn bikin bê ka çima gotinên ewqas bihêz hatine bikaranîn. Pêşî, di wan rojan de, eger hûn qralekî ku neteweyeke din fetih kiribe, saxhiştina qralê wan weke kûpayeke şampiyoniyê ya zindî ku di qesra we de bû. Ev ne tenê ji bo egoya we bû lê di heman demê de bîranînek domdar bû ku hûn çiqasî rêberekî mezin bûn ji bo her kesê ku diket qesra we. Ya duyemîn, çima wî heywanên herî baş hiştin? Berî ku em bersiva vê yekê bidin, werin em kar hîn bêtir tevlihev bikin. Şawûl destûr da ku heywanên herî baş ji bo qurbanîkirina Reb bên hiştin. Bala xwe bidin parastina ku Wî da pêxember: “Gel ew ji Emalêqiyan standin

ku ji Xwedayê te Xudan re bikin qurban. Wan dil neda pez û dewarên herî baş bikujin. Lê me yên mayîn bi temamî kuştin" (Samûêl I, 15:15). Dibe ku wî ev ji ber çi kiribe? Gelo dibe ku ji bo bidestxistina dilovaniya gelê xwe ev kiribe? Îsraîlî gelekî wisa bûn ku baweriya xwe bi Reb Xweda dianîn. Li nêrîna leşker, kahîn û mirovan bifikirin, ew ê bi îhtîmaleke mezin ji hev re bigotana, "Çi qralekî me yê xwedayî heye! Ew her gav Reb dixe rêza pêşî û ya herî baş pêşkêşî Xweda dike." Mirovan nizanibûn ku fermana ku ji Şawûl re hatibû dayîn tam ew bû ku her tiştî hilweşîne. Di esasê xwe de, Şawûl navûdengê xwe bi xwe ewle dikir. Motîvasyona li pişt kiryarên wî tirsa ji mirovan bû. Şawûl ji ewlehiyê mehrûm bû.

Di cîhana me ya îroyîn de, gelek kes bi kesên ku ne ewle re hevdilîniyê nîşan didin. Lêbelê li pişt neewlehiyê, ku em îteata xwe jî ji dest bidin, arezûya me ya qebûlkirin, hezkirin an jî rêzgirtinê heye. Haya me jê nîne bê em ji hêla Afirînerê xwe ve çiqasî jidil tên qebûlkirin û tên hezkirin. Neewlehî dive weke ku bi rastî çi be bê pênasekirin: Dafikeke bi talûke ye.

Şawûl; ne ji ber ku tirsa pîroz pê re tunebû, ferman bi cîh neanî. Werin em vegerin ser mînaka Îsa. Ew bi redkirin, şerm, nefret, berxwedana bêzar, êşa laşî û cezayê tirsnak ê xaçê re rûbirû mabû. Gava ku cerdevanên perestgehê hatin ku wî bigirin, xwendekarên wî hewl dan ku wan rawestînin û Îsa biparêzin lêbelê bersiva Wî ev bû:

> "Ma tu dibêjî qey ez nikarim ji Bavê xwe bixwazim û ew jî di cih de ji diwanzdeh lejyonan zêdetir milyaketan bigihîne min? Lê hingê Nivîsarên Pîroz ên ku dibêjin divê weha bibe, wê çawa bên cih?" (Metta 26:53-54)

Heta temamkirinê îteat ji bo Îsa pir girîng bû.

Ez li lîseyê ne bawermend bûm lê di odeya cilguhertina me de posterek hebû ku bala min dikişand. Her roj piştî nîvro û piştî antremanên basketbolê, min ew poster didît. Li ser wî posterî werzîşvanekî ku serê xwe xwar kiribû û rûniştibû, hebû ku li bin wî wisa hatibû nivîsandin: "Min dev jê berda." Û li bin wî posterî jî, resmekî Îsa yê li çarmîxê daliqandî, hebû ku li bin wî jî wisa hatibû nivîsandin: "Min dev jê berneda."

Vê yekê li ser kesekî weke min ne bawermend şopeke bêhempa hişt. Dema min fêhm kir ku Îsa, her çiqasî dikaribû ji muameleyeke

tirsnak û mirineke hovane bireve jî, li şûna vê hilbijart ku îteatê bike heta ku di dawiya dawî de got: “Hat temamkirin.” Vê yekê di jiyana min de giraniyeke pir mezintir ava kir. Ji bo em her karê ku Xweda spartiye me temam bikin, ji bo em bi temamî îteatê bikin Îsa ji me re bû mînak.

Aniha em dikarin talîmatên ku wî dan xwendekarên xwe dema ku wan ji bo zêdekirina baweriya xwe lava kirin, çêtir fêhm bikin:

> “De îcar hûn jî, çaxê we hemû tiştên ku li we hatine emirkirin anîn cih, bêjin: ‹Em xulamên bêkêr in; me ew karê ku li ser me deyn bû, kir.” (Lûqa 17:10)

Îfadeya “hemû ferman” wateyeke bi temamî nû distîne. Her dem heta dawiyê em îteat bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Em çavên xwe bidin ser pêşeng û temamkarê baweriya xwe Îsa. Wî ji bo şahiya ku li ber wî bû, xaç ragirt ser xwe û şermî bi tiştekî hesab nekir û li milê Xwedê yê rastê rûnişt. Îcar li ser wî bifikirin ê ku dijraberiya mezin a gunehkaran ragirtiye, da ku hûn newestin û di dilê xwe de sist nebin.” (Îbranî 12:2-3)

**Ramana sereke:** Îteateke bê kêmasî, hema bêje ne îteateke bi rastî ye. Ji bo em her karê ku Xweda spartiye me temam bikin, ji bo em bi temamî îteatê bikin Îsa ji me re bû mînak.

**Ramana kûr:** Piştî ku min îteat ji Gotina Xweda re kir û şûnde, min destûr da ku baldariya tevlihev, zewq, hewldan, nerazîbûna yên din an jî pirsgirêkeke din bihêle ku min bisekinîne gelo? Ev çawa dikare bê guhertin?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ji kerema xwe min bibexşîne ji ber ku min tiştê ku te ji min re gotibû temam nekir, her çiqasî min dest bi îteata wê kir an jî bi paşguhkirina wê an jî bi guhertina fikra xwe ji ber ku ne di berjewendiya min de bû. Ez ji vê nebûna tirsa pîroz tobe dikim û ji te bexşandinê dixwazim. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Heta ku Gotina Xweda temam bibe ez îteatê hildibijêrim.

GAVA MIROV JI XWEDA ÊDÎ NATIRSIN, EW BÊYÎ DUDUILIYÊ QANÛNÊN WÎ BINPÊ DIKIN. GAVA TIRSA XWEDA WINDA DIBE, KES JI ENCAMÊN VÊ SAWÊ NAGIRE.

– A.W. TOZER

# 28| WÎJDAN ÇAWA DISOJE?

Weke ku di beşa berê de hate diyarkirin, nîşaneyên yekem ên windakirina tirsa pîroz nezelal in -bi rastî, ewqasî nezelal in ku divê em hinekî bêtir balê bikişînin û li ser vê xala girîng hûr bibin. Gelo we qet hişyariyeke xwerû dîtiye dema ku derfetek ji bo kirina tiştekî gumanbar hatibe pêşkêşkirin? Piraniya mirovan fêhm dikin ku wîjdanê me, me diparêze lêbelê tiştê ku gelek kes ferq nakin ev e ku zelalî û hêza wîjdanê me dibe ku biguhere.

Wîjdanê me, diyariyeke ji Xweda ye ku divê mirov qet wî biçûk nebîne. Ew beşeke girîng a dilê me ye, hesasiyeta wî bi tirsa pîroz xurt dibe û bi nebûna wê kor dibe. Em tên hişyarkirin: “Ji her tiştî bêtir, dilê xwe biparêze, Çimkî kaniyên jiyanê jê diherikin” (Şîretên Silêman 4:23).

Gava ez hîn di serê salên xwe yên sîhî de bûm, pastorekî navdar ez vexwend firavînê. Di ser firavînê de wî ji min pirsî: “John, berevajî gelek rêberên din ez çawa dikarim xwe ji ketinê dûr bixînim?”

Gepa di devê min de hema bêje kirî di qirika min de bimaya. Wî

çima pirseke wisa ji min kir gelo? Ez ciwan bûm û ew ji xelasiya min dirêjtir di xizmetê de bû. Lê li şûna ku ez jê birevim, min li dilê xwe nêrî û bi awayekî bêdeng min jê pirsî, Giyanê Pîroz, ez çi bersivê bidim wî?

Û min yekser bihîst: "Jê re bêje bila wîjdanê xwe weke milkê xwe yê herî hêja biparêze."

Min ew tiştên ku min bihîstin gotin û dûre ji nişkê ve ev rêz ji giyanê min derketin: "Wê derfetên mezin ji we re werin pêşkêş kirin lê di kûrahiya dilê xwe de hûn ê bizanin ku ew rastgoyî binpê dike, ne rast e, gumanbar e an jî dikare zirarê bide yên din. Guh bidin dengê wîjdanê xwe, hişyariya wî paşguh nekin. Eger hûn vê paşguh bikin, hûn ê hesasiyeta xwe ya ji bo Xweda winda bikin."

Di rojên piştî wê de, min keşf kir ku têgeha "wîjdan" di Nivîsên Pîroz de pir caran derbas dibe ku heta wê demê min tiştekî wisa ferq nekiribû. Tenê di Peymana Nû de bi qasî sîh caran derbas dibe. Pawlos, ji Tîmotêyos re wisa dinivîse:

> "baweriyê û wijdana qenc biparêzî. Hinekan guh nedan dengê wijdanê, di aliyê baweriyê de xewirîn û çûn." (Tîmotêyos I, 1:19)

Baweriyeke têkçûyî bi tu awayî jî ne meseleyeke bêwate ye.

Firavîna ku min bi xizmetkarê pîr re xwar, hişt ku ez giraniya îfadeya Pawlos fêhm bikim bê çiqasî girîng e. Piştrast kir bê ji ber çi gelek kes nikarin bi awayekî baş biqedînin.

Hişyariya Nivîsên Pîroz a ji bo paqijkirina wijdanê me, tê vê wateyê ku wîjdanê me di destpêkê de di rewşeke baş de bû. Xwîna Îsa wijdanê me paqij û safî dike (Tîmotêyos I, 3:9; Îbranî 9:9, 14). Ev yek, jinûveçêbûna bereketên herî mezin e. Pêxember Yerêmya derbarê wîjdanê me diyariyeke wî heye ku pir caran şaş tê fêhmkirin. Ew wisa dibêje: "Dil ji her tiştî bêtir xapînok e; ew rehet nabe, kî dikare wî fêhm bike?" (17:9 ). Pêxember li vir di şibandina Îsa de ji nû ve hatiye afirandin, ew ne behsa kesên ku bi xwezayeke nû ku ji nû ve hatine afirandin, dike. Bawermendên Peymana Kevin ne xwedî dilê nû bûn. Lê Xweda wisa got û soz da wan: "Ezê dilekî nû bidim we û ruhekî nû

bixim nava we. Ezê dilê ji kevir ji bedena we derînim û dilê ji goşt bidim we" (Hezekiyêl 36:26). Ev nûbûn wê pêk were dema ku Îsa xwezaya me rizgar bike û Giyanê xwe bide me.

Bi saya mûcîzeya veguherîna ku mirovek bi temamî di Mesîh de ji nû ve çêbibe, em xwediyê wîjdanekî pêbawer in. Li vir zehmetî ew e ku em wê paqij bihêlin. Ji ber vê yekê, divê em niha bipirsin, em çawa wê qirêj dikin? Dejenerebûyîn bi temamî di carekê de çênabe; berevajî vê, ew pirî caran bi tiştên biçûk dest pê dike û eger kes pê danekeve, di dawiyê de wê weke keştiyeke noqî avê bibe. Yaqûb wisa dinivîse:

> "Xwe nexapînin û nebin yên ku tenê peyvê dibihîzin, lê peyvê bînin cih." (Aqûb 1:22)

Em careke din bi têgeha îteat re rû bi rû dimînin. Me bi berfirehî li ser delîlên ku tirsa pîroz îtaeta di cîh de ye û temam e, nîqaş kirin -her çiqasî ew bêmantiq be jî, tu sûdeke eşkere nîşan nede an jî bibe sedema êşê jî. Kesekî ku bi vî rengî tevdigere xwe naxapîne.

Werin em li ser rawestin û piştrast bin ku em girîngiya wê ji dest nedin. Bêguman xapandina nasan, heta ya hevalên nêz û malbatê jî mimkun e lêbelê xapandina ku mirov bixapîne meseleyeke din e. Di bingeh de, dema ku em îteatê nakin, em xwe dixapînin. Em parastina rastiyê qels dikin û hesta xwe ya rêberiya exlaqî dixin xetereyê. Em kêmtir hay ji wê yekê dibin ku em li ser rêyeke xeternak in.

Em mînaka vê pêvajoya ku dibe hebe, bidin û binirxînin. Ma gelo we qet tiştekî ku bêbextiyê li kesekî bike, gotiye? Gava we ev kir, dibe ku we hîs kiribe ku kêr li zikê we ketiye, ev dengê wîjdanê we ye. Bi hêvî me ku we guhdarî lê kiriye, hûn poşman bûne û wê di cîh de gotina xwe rast kiriye. Lêbelê tişta ku pirî caran diqewime ev e ku em tevgerên xwe rewa dikin. Ramana ku piştî vê tê, dibe ku bişibe vê: Tiştê ku min got rast bû! Mixabin, argumana me ya şaş bi ser dikeve û em hişyariya hundurîn paşguh dikin û bi tiştê ku me gotiye ve girêdayî ne. Bi vî rengî, pêvajoya qirêjbûnê dest pê dike, hesasiyeta wîjdanê me qels dibe.

Careke din ku em li ser navê kesekî din derewan bikin, vê carê ne weke ku kêr li zikê me ketiye em ê hîs bikin, îcar em ê di nava xwe de

tengbûneke tûj hîs bikin. Wîjdanê me dîsa diaxive lê vê carê bi dengekî kêmtir tê naskirin. Aniha nakokiya navxweyî ewqasî ne dijwar e; paşguhkirina hişyariyê û em gotinên xwe mafdar derxînin, êdî hinekî din hêsan e. Lêbelê em dilê xwe bêtir qirêj dikin û hesasiyeta wîjdanê me hîn bêtir kêm dibe.

Dema ku em dîsa derewan li kesekî dikin, vê carê em tengijîneke tûj û teng hîs nakin, aniha tenê hesteke tevizandî heye ku bi zorê tê naskirin. Hewce nake ku em xwe bi aqilmendî îkna bikin, ji ber ku dengê wîjdanê me pir nerm e. Mafdarkirina tevgerên me hêsantir e. Hestiyariya wîjdanê me careke din qels dibe.

Di dawiyê de, em ji her tiştî bêhîs dibin. Wîjdanê me disoje. Em kor dibin û hemû hestên xwe yên têgihîştinê winda dikin. Êdî tu rêgezek me ya exlaqî tune ye û keştiya baweriya me li ber noqbûnê ye. Di bingeh de, me xwe xapandiye û me xwe ji rê derxistiye.

Ev hemû bi tobekirina sade, bi guhertineke temam ya hiş û dil, dikaribû rê li ber wan bihata girtin. Ev dem ew dem e ku em valahiya şehrezayiya xwe qebûl dikin û bi tundî şehrezayiya Xweda dipejirînin. “Kesê neheqiyên xwe vedişêre, bi ser nakeve, Lê kesê li wan mikur tê û dev ji wan berdide, wê rehmê bibîne” (Şîretên Silêman 28:13).

Dilovanî û nûjenbûn dikare di her qonaxa pêvajoyê de çêbibe lê nebûna tirsa pîroz bersiva me dereng dixe. Em bi qumarê dilîzin ji ber ku dilê me ji wîjdanê me re her ku diçe bêhesas dibe. Kesê zana û aqilmend her gav bi lez û bez bi tobekirinê bersiva hişyariyên wîjdanê xwe dide, ew dizane ku derengketin xeternak e.

Hem di Nivîsên Pîroz de û hem jî di dema me de, gelek kes hene ku guhdana dengê wîjdanê xwe li derengî dixin. Mirov dikare vê bişibîne lîstina rûleta Rûsan. Hûn dikarin ji noqbûnê xwe dûr bixin lê hûn ê çawa bizanin ku hûn kengî bi temamî bêhest bûne? Hişyariyeke dengî tune ku bibêje: “Eger tu careke din min dîsa paşguh bike, ez ê bêdeng bibim.” Ji ber vê yekê Pawlos şînê girê dide:

> “Ruh bi eşkereyî dibêje ku di demên paşê de, hinek wê ji baweriyê bikevin û guh bidin ruhên xapînok û hînkirinên cinan.

> Ew hînkirin ji wan ên ku wijdana wan bi durûtiya derewkaran hatiye daxdan, derdikeve." (Tîmotêyos I, 4:1-2)

Dema ku çermê mirov bi hesinekî sotî tê daxdan, ew hemû hîsa xwe winda dike. Ev yek ji bo wîjdanê me jî derbasdar e. Êdî tu baweriya me ya exlaqî tune ye, di şûna vê de, em berevajî tiştê rastiya xwe, nîşan didin. Tişta ku bi serê Hananya, Safîra, Qral Saul û gelekên din hat, ev bû.

Bandoreke din a daxdanê ew e ku her tiştî di hundurê xwe de digire. Eger hûn goşt bisojin, hûn nahêlin ku ava di goşt de derkeve. Pawlos wisa dinivîse: "… ez derewan nakim û wijdana min jî bi Ruhê Pîroz vê yekê ji min re erê dike" (Romayî 9:1). Eger wîjdanê bawermendekî hatibe daxdan, ew êdî nikare bi Giyanê Pîroz re têkiliyê deyne. Eynî çawa ku av nikare ji goşt derkeve, şahidiya Giyan nikare xwe bigihîne giyanê me. Ew êdî ji pergala navîgasyona jiyanê bêpar in. Rêya wan rêya wêrankirinê ye.

Di dawiyê de, ji nav gelek gotinên Pawlos em guh bidin du heban: "Gelî birayan! Ez heta îro li ber Xwedê bi wijdaneke paqij jiyam" (Karên Şandiyan 23:1) Dîsa, "Ji ber vê yekê heta ku ji destê min bê, ez dixebitim ku hem li ber Xwedê û hem li ber mirovan hergav wijdaneke min a paqij hebe" (Karên Şandiyan 24:16). Di encamê de, em hewl bidin ku dilê xwe biparêzin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Em bi dilê ku bi xwînreşandinê ji wijdana xerab paqij bûyî û bi bedena ku bi ava paqij hatî şuştin, bi piştrastiya temam a baweriyê, bi dilekî rastîn nêzîkî Xwedê bibin." (Îbranî 10:22)

**Ramana sereke:** Zelalbûn û hêza wîjdanê me dibe ku biguhere. Hestiyariya me ji hêla tirsa pîroz ve tê xurt kirin û berevajî vê, ji ber nebûna wê dibe ku bêhest bibe.

**Ramana kûr:** Wîjdanê me bi xwîna Îsayê Mesîh hatiye paqijkirin. Ji bo ku ez wîjdanê xwe paqij bihêlim, gelo ez dikarim kîjan disîplîna giyanî bi kar bînim?

**Dua:** Rêzdar Bavê Asîmanî, ez ji bo hemû carên ku min wîjdanê xwe paşguh kir û li dijî wîjdanê xwe derketim lêborîna xwe ji te dixwazim. Ji ber ku min wîjdanê xwe bi baldarî neparast ez lêborînê dixwazim. Ez tobe dikim û lêborîna xwe ji Te dixwazim. Ji kerema xwe bi xwîna Îsa min paqij bike. Wîjdanekî paqij di hundurê min de ji nû ve biafirîne û bila wijdanê min ji deng û rêberiya Te re hesas û bersivkar be. Bila ez di her şert û mercî de zû îteatê ji Te re bikim. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê hewl bidim ku dilê xwe biparêzim û li hember rêberî û dengê wîjdanê xwe hestiyar bim.

# NÊZÎKAHIYA
# LI XWEDA

## HEFTEYA PÊNCAN

JI BEDÊLA KU EZ MECBÛR BIMÎNIM KU DENGÊ XWEDA JI HIN KESÊN DIN BIBIHÎZIM, JI BO EZ WÎ BI ŞEXSÎ BIBIHÎZIM, ŞERT Û MERC ÇIQASÎ ZOR BIN BILA ZOR BIN, EZ AMADE ME KU BEDÊLA VÊ BIDIM.

– JOY DAWSON

# 29| NÊZÎKAHÎ LI KUDERÊ DEST PÊ DIKE?

Her ku tirsa pîroz di hundurê me de bi têgihiştina mezinahiya Xweda re geş dibe, ajoyên me pak û paqij dike, me ji tirsa mirovan azad dike û di jiyana me de pîroziyeke rast diafirîne. Nîşaneya tirsa pîroz, îteata bêdawî û yekser a ji bo Xweda ye; bêyî ku em lê binêrin bê ka berjewendiyek tê de heye an na, an jî ew tişt çiqasî bi êş e û êşê dide me.

Bi vê agahiyê re, em dikarin niha bala xwe bidin ser fêdeyên vê diyariya bêhempa û di vê beşê de, bêguman em ê li ser fêdeyên herî mezin bisekinin: Nêzîkahiya ango samîmiyeta bi Xweda re.

Peyva "nêzîkahî" ji du peyvên Latînî pêk tê: "intus" ku tê wateya "di hundur de" û "intimus" ku tê wateya "pir veşartî." Gava ku em van her du peyvan digihînin hev, wateya "razên di hundur de" derkeve holê. Ev wate resmekî pir xweş ê nêzîkahiyê nîşanî me dide, ev îfadeyek e ku ji bo pênasekirina bendeke hezkirinê ya di navbera du dostên dilsoz de tê bikaranîn ku li gorî naskirineke ji dûr ve, digihîje astên pir kûrtir.

Nêzîkbûn rêyeke du alî ye, divê her du alî jî daxwaz û ramanên hev ên herî kûr bizanibin. Derbarê nêzîkahiya bi Xweda re, nexwe em hem ji perspektîfa Wî hem jî ji ya xwe lê binêrin. Ka em pêşî bi nêrîna Wî

dest pê bikin. Dawid wisa dinivîse:

> “Ya Xudan, te ez sihêtî kirim û bi min zanî.” (Zebûr 139:1)

Lêkera “ceribandin”ê ya di vê ayetê de peyva Îbranî “φāqar” e ku weke “kifşkirin, lêgerîn ve lêkolîn” tê pênasekirin. Ev îfade bi rengekî bêhempa nîşan dide bê ka ji bo têkiliyeke nêzîk çi hewce ye. Ji bo kifşkirina raman û rêyên hundurîn ên kesê din, demeke bê zehmet û bi kêf û hewildanek tê xerckirin.

Di zewaca xwe ya bi Lisa’yê re, min ji kirina vê yekê kêf stend. Gava em nû zewicîn min daxwaz, kêf, tiştên ku jê hez dikir, yên jê hez nedikir û heta yên ku jê nefret dikir jî nizanîbûn. Ji bo naskirina raman û rêyên di dilê wê de, min di nava demê de lêkolînek kir û ev pêvajo pir li gorî dilê min meşiya. Bi kurtasî, nêzîkbûna bi hevjîna xwe re; hewildaneke hişî, hestyarî û fîzîkî ya baldar dixwaze.

Di ayeta jorîn de îfadeyeke baldar a din “naskirin” e, bi Îbranî “yāoa” ye. Di Peymana Kevin de bi gelemperî ji bo ragihandina nêzîkahiyê tê bikaranîn. Di Destpêkirin 4:1’ê de û di hevoka “Adem bi jina xwe Hewayê re raza [yāoa]. Hewa ducanî ma” de tê bikaranîn. Giyanê Pîroz, ji bo pênasekirina têkiliya herî nêzîk a ku du mirov dikarin di vê jiyanê de ava bikin, “yāoa”yê bi kar tîne. Di esasê xwe de, Dawid wisa dibêje: “Xwedayê min, Tu min ji kûr ve nas dikî.”

Dawid, ji bo nîşandana resmekî balkêş ê lêkolîna daxwaz û rêyên herî hundurîn ên kesên ku Xweda dixwaze bi wan re nêzîk bibe, peyvên “φāqar” û “yāoa”yê ango her duyan bi hev re bi kar tîne. Dîsa, gava ez li têkiliya xwe û Lisa’yê dinêrim, piştî salên dirêj ên bi hev re, ez niha derbarê wê de bi gelekî tiştan dizanim. Weke ku li jor hatî gotin, ne tenê arezûyên wê yên hundurîn lê di heman demê de adetên wê, wê di bin hin şert û mercan de çawa bertekê nîşan bide, di dema xwe ya vala de ji çi hez dike, li ser çi dixebite û lîste wisa dirêj dibe. Bi heman awayî, Dawid wisa berdewam dike:

> “Tu bi rabûn û rûniştina min dizanî, Ji dûrî ve fêhm dikî fikrên min. Tu li riya ku ez diçimê û dera ku lê dimînim dinêrî, Tu bi hemû riyên min baş dizanî. Hê ku peyv nehatiye ser zarê min, Tu wê bi tevahî dizanî, ya Xudan.” (Zebûr 139:2-4)

Xweda bi hûrguliyên me yên nêzîk, ji têgihiştina me wêdetir dizane. Xweda ji bo keşfkirin, lêkolîn û lêgerîna Dawid hewl da û ji bo her yekî ji me heman tiştî dike -weke tiştên ku min di van çil salên dawî de ji bo Lisa'yê kiriye lêbelê di asteke pir mezintir de. Di rastiyê de, tenê çend ayet şûnda, em rastî îfadeyeke pir ecêb tên ku dibêje ramanên Xweda yên ji bo kes û şexsan, ji hebên qûmê bêtir in (ayeta 18an). Eger min di van çil salên derbas bûn de her duwazdeh saniyan carekê li ser tiştên ku Lisa jê hez dike, helwestên wê, tiştên bêriyan dike û tiştên ji wan hez nake bifikiriyama û ji bo her yekê ji wan min libek qûmê bidaya hev, belkî ji qedeheke çayê kêmtir çêbibûya! Ramanên Xweda yên ji bo her yek ji me, ji hemû libên qûmê yên li ser gerstêrkê bêtir in û Ew qet zêde nake, ji ber ku ew ê bibe derew û ne gengaz e ku Xweda derewan bike. Ev rewş aqilê mirov disekinîne! Ma hûn dest pê dikin ku hûn hewesa Wî ya ji bo zanîna her tiştî ya derbarê me de fêhm bikin?

Ew bi kûrahî dixwaze bi her yek ji me re nêzîk tevbigere. Dîsa jî destûrê bidin ez dubare bikim, nêzîkahiya rastîn ne tenê ji aliyekî ve lê ji naskirina her du aliyan hev çêdibe. Çawa ku Ew li ser ramanên me yên herî kûr dikole, divê em jî bi hewes hewl bidin ku nêzîkahiyeke rastîn bi Wî re ava bikin. Mûsa bi qîrîn daxwaza asteke nêzîkahiyê ya bi vî awayî kir:

> "Mûsa ji Xudan re got: Tu ji min re dibêjî ku gel derîne, lê te ji min re negot ku tê kê bi min re bişînî. Te ji bo min got: 'Ez te bi navê te nas dikim û dilê min bi te xweş e.' Heke dilê bi min xweş be, ji kerema xwe riyên xwe nîşanî min bide ku ez te çêtir nas bikim û dilê te bi min xweş bimîne. Herwiha ji bîr neke, ev milet gelê te ye." (Derketin 33:12-13)

Xweda me tenê weke ser hejmareke di nav girseya mirovan de nabîne; Ew me bi awayekî şexsî, bi navê me nas dike. Di ayeta jor de em dibînin ku Mûsa dixwaze bersivekê ji vê re bibîne; ew jidil daxwaz ku di naskirina Xweda de bi pêş bikeve. Ew têkiliyeke nêzîk dixwaze ku ne tenê Xweda wî ji kûr ve nas dike, lê Mûsa jî Xweda ji kûr ve nas dike. Baş e îcar em? Ji me re wisa hatiye gotin: "Nêzîkî Xweda bibin, Ew ê jî nêzî we bibe" (Aqûb 4:8).

Li gorî tiştên ku berî niha em axivîn, ez bawer dikim ku hûn niha bangekê -na, qîrînekê- ji dilê Xweda dibihîzin. Her kêliya ku diçe tîrtir

dibe. “Ji bedêla ku tu dikarî bi min re nêzîk bibî, tu çima dûr disekinî?” Di esasê xwe de, em tên agahdarkirin ku yên asta nêzîkahiya me ya bi Xweda re diyar dikin, em in. Bi îfadeyeke hêsantir ez bibêjim: Hûn bi xwe diyar dikin bê hûn çiqasî nêzî Xweda ne, ne Xweda diyar dike! Baş e tirsa Xweda di vê yekê de çi tevdigere? Wisa dinivîse:

> “Tirsa Xudan destpêka zanînê ye.” (Şîretên Silêman 1:7)

Zanîna çi? Ma nivîskar behsa zanîna bijîşkî, zanistî, dîrokî yan jî behsa zanisteke din dike? Piraniya zanîngehên me bi van agahiyan tijî ne lêbelê li wan zanîngeha tirsa Xweda hema bibêje tune ye. Ma gelo agahiya civakî an jî polîtîk weke referansê nîşan dide? Na, rêyên dinyayê ji bo Xweda ne rêyên aqilane ne. An jî zanîna Pirtûka Pîroz? Na ew jî na ji ber ku Ferîsî her çiqasî di Nivîsên Pîroz de pispor bûn jî, ji Xweda neditirsiyan û wan Ew razî nedikirin. Bersiva me di van gotinan de ye:

> “Wî çaxî tê tirsa Xudan fêhm bikî
> Û zanîna Xwedê peyda bikî.” (Şîretên Silêman 2:5)

Peyva “zanîn”ê ji aliyê Ferhenga Zimanên Pirtûka Pîroz ve weke “agahdariya li ser kesekî ku pêwendiyeke bihêz bi wî kesî re îma dike” tê pênasekirin. Ferhenga Şîrovekirina Tam a Vine’yê ji me re dibêje ku ev peyv îmaya “xwedîbûna zanîneke tecrubekirî ya ji nêzîk ve ya derbarê Wî [Xweda] de” dike. Eger em tiştên li vir soza wan ji me re hatiye dayîn, bi rengekî hêsan rave bikin: Tirsa Xweda, destpêka naskirina ji nêzîk ve ya Xweda ye.

Rastî ev e heta ku em ji Wî netirsin, em nikarin dest bi naskirina nêzîk a bi Xweda re bikin -ev cîhê destpêkê ye. Eger hûn tiştekî ji derveyî cîhê destpêkê bidin destpêkirin, hûn nikarin wê biqedînin. Eger ez di bazdana 100 metreyî de, 50 metre berî xala destpêkê dest pê bikim, ez nikarim beşdarî pêşbaziyê bibim an jî wê biqedînim. Têkiliya me ya bi Xweda re jî rewş ji vê ne cuda ye- bêyî tirsa pîroz, naskirina nêzîk a bi Wî re ne mimkun e. Spas ji bo Wî ku ji bo em Wî ji nêz ve nas bikin rêyeke nîşanî me kiriye lê gelo em ê vê bipejirînin?

Em ji bîr nekin ku bi tirsa Xweda re em ji xerabî an jî ji nenaskirina qanûnê dûr dikevin. Bînin bîra xwe ku Îsa behsa girseyeke pir mezin dikir

ku wê di roja darizandinê de matmayî bimana. Van jin û mêran jê re Reb digotin lê ew ê van gotinên Îsa bibihîzin: “Min hûn qet nas nekirin! Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!” (Metta 7:23). Peyva “naskirin”ê ya li vir “giniskō” ye, Grekî’ya “yāoa”yê ye. Îsa wê ji kesên ku ne xwediyê tirsa pîroz in re bibêje: “Min tu carî hûn ji nêz ve nas nekirin.” Ev, pirsgirêkeke mezin derdixîne holê ku em ê di beşa din de li ser bisekinin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Ya Xudan, te got, «Li rûyê min bigerin» Dilê min ji te re got, «Ez li rûyê te digerim.»” (Zebûr 27:8)

**Ramana Sereke:** Nêzîkahiya rast û jidil, ne tenê ji aliyekî ve lê ji hevdu naskirina ji her du aliyan ve çêdibe.

**Ramana Kûr:** Li kesê ku hûn herî pir dixwazin bi hev re bin, bifikirin. Bêyî ku peyvek di navbera we de derbas bibe, hûn çiqasî baş dizanin bê ew çi difikire an jî çi hîs dike gelo? Hûn çiqasî dikarin bertekên wan ên di rewşên cuda de baş texmîn bikin? Ma hûn ji nişka ve hatin vê astê an jî dem û wextê we girt gelo lêkolîn û lêfikirîna rêyên heval û dostên we? Niha lê bifikire ku ramanên Xweda yên derbarê we de bêhejmar in. Ev çi ji we re dibêje? Eger hûn ji yê dostê xwe yê herî nêzîk bêtir li ser dil û rêyên Xweda bikolin û lê bifikirin, wê çi bibe?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, ez niha ferq dikim ku min ev banga herî mezin a ku heta niha ji min re hatiye kirin îhmal kiriye: Nêzîkahiya bi Te re. Min hişt ku gelek tişt bikevin ber dema ku min ê ji bo pêşxistina vê nêzîkahiyê veqetanda. Ez bi kêfxweşî hildibijêrim ku guhertinekê bikim. Ji bo ku bixwînim, dua bikim û bifikirim gava ez Pirtûka Pîroz vedikim, ez dixwazim bikaribim Te di asteke kûr û nêzîk de nas bikim. Ez vê bi navê Îsa dixwazim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez hildibijêrim ku Îsa, bi qasî Ew hildibijêre ku min nas bike, ez jî wisa ji kûr ve dixwazim nas bikim.

“RÊ HEYE LI BER MIROVAN RAST XUYA DIKE, LÊ DAWIYA WÊ DIBE MIRINÊ.”

– ŞÎRETÊN SILÊMAN 16:25

# 30| ÎSAYEKÎ CUDA

Gelek caran, ji bo em mijarekê çêtir fêhm bikin, nêrîna li antîteza tiştê ku em dixwazin bizanibin, dibe alîkar. Ji ber vê yekê, berî ku em bêtir li ser nêzîkahiya bi Xweda re biaxivin, werin em li ser berevajiya wê ya ku di vê çîroka jêrîn de hatiye nîşandan bisekinin.

Ez nû gîhabûm Hawaii'yê ji bo ku di konferanseke rêbertiyê de biaxivim. Ji ber ku odeya min a otelê hîn ne amade bû, ez li ber hawiz di bin şemsiyeyekê de li cîhekî bêhnvedanê rûniştim. Di wê navberê de, karsazeke jin a ku beşdarî konferanseke cuda dibû jî li benda odeya xwe bû. Me dest bi axaftinê kir û gava hîn bû ku ez nivîskar û pastorekî Mesîhî me, dest bi axaftina li ser têkiliya xwe ya bi Îsa re kir.

Di çend deqiqeyan de min fêhm kir ku ew Îsa nas nake. Bi awayekî ji xwe bawer, behsa baweriya xwe dikir û berdewam dikir lêbelê kêm tiştên ku behsa wan dikir, bi prensîbên ku Nivîsên Pîroz nîşan didin re li hev dikirin. Min di dilê xwe de ji Giyanê Pîroz şehrezayî xwest û di nava çend saniyan de Giyanê Pîroz ji min re diyar kir ku ez ê çi bibêjim.

Gava jinikê axaftina xwe bi dawî kir, min jê pirsî: "Tu wî zilamê ku li hemberî hawiz rûniştiye dibînî?"

Bi rûyekî matmayî (belkî ji ber ku min mijar ji nişka ve guhert), bersiv da: "Te çima pirsî? Erê."

Min bi kêfxweşî wisa got: “Navê wî Jim e. Ji Fresno, Kaliforniya’yê hatiye. Bi parêzeke vegan a tund dijî. Xeyala wî ya herî mezin ew e ku di tîma gogavê ya Olîmpiyatên ya DYAyê de bilîze. Rojê sê saetan hem di hawiz de hem jî di salona werzîşê de antrenmanan dike. Hobiyên wî tenîs, paraşût û xêzkirina resîman e. Jim bi wê jinika ku li cem jakuziyê ye re zewicî ye, navê wê Beth e û ji Jim deh salan biçûktir e.”

Jinika ku aniha êdî meraq dikir bê ka ez çawa wî wisa baş nas dikim, ji min pirsî: “Gelo ew ê bi te re beşdarî konferansê bibe?”

Min di cîh de bersiv dayê: “Na xanimê.”

Meraqa wê bêtir zêde bû. “Baş e, naxwe tu Jim çawa wisa baş nas dikî?”

Piştre ez li wê zîvirîm û min li çavên wê nêrî û got: “Min tu carî ew neditiye.”

Rûyê wê guherî û aniha bi baldar, heta belkî bi fikar li min dinêrî. Belkî jî di dilê xwe de digot, qey ez weke rontgeran an jî dedektîfekî taybet an jî ajan im.

Min hişt ku ew hinekî bifikire, paşê min bi dengekî ji xwe bawer got: “Tiştê ku ez jê bawer dikim ev e.”

Deng jê derneket.

Min berdewam kir: “Te berî niha bi baweriyeke mezin behsa baweriya xwe ya derbarê Îsa de kir lê hema bêje tiştên ku te derbarê Wî de got yek jî ne rast e, ew ne li gorî hînkirinên Pirtûka Pîroz in. Ez bi vê dizanim ji ber ku ez Wî nas dikim.” Bi vî awayî axaftina me bi daxwaza wê bi dawî bû lê diyar bû ku ew pir di bandorê de mabû.

Pawlosê Şandî ji dêreke ku pir jê hez dikir re daxuyaniyeke ecêb dike: “Eger yek bê û Îsayekî din ê ku me nedaye bihîstin bide bihîstin, an eger hûn ruhekî din ê ku we nestandiye, an Mizgîniyeke din a ku we qebûl nekiriye bistînin, hûn qenc vê radigirin” (Korîntî II, 11:4). Ew ne behsa xwedayekî cuda, behsa Îsayekî cuda dike. Diyar e ku ew ji Îsa bawer dikin lê di rastiyê de wan Ew nas nedikir. Çima? Ji ber ku wan ji her tiştê ku li gorî dilê wan bû bawer dikir û di encamê de ji Îsayê rast dûr ketibûn. Kirina vê yekê ne zor e, Reb bi çavan nayê dîtin ji ber vê hûn dikarin li gorî dilê xwe xwezaya Wî di hişê xwe de biguherînin.

Îsraîliyan jî tiştekî wisa kiribûn. Derketina ji Misrê, mînakeke xelasiya ji dinyayê ye. Em wisa dixwînin: “hemûyan eynî vexwarina ruhanî vexwar. Çimkî ji lata ruhanî ya ku li pey wan dihat vedixwarin. Û ev lat Mesîh bû. Lê

belê Xwedê ji pirraniya wan razî nebû” (Korîntî I, 10:4-5). Gelek sedemên ku Xweda ji wan nerazîbû hene lêbelê hemû li cîhekî digihêjin hev: Bêîteatiya wan a li hemberî Gotina Xweda, ango kêmasiya tirsa pîroz.

Gava ku Mûsa çil rojî li çiyê ma, bi destê Harûn ê ku wê demê li ser serê Îsraîliyan bû golikekî zêrîn da çêkirin. Em li vê bûyerê dinêrin û diqîrin û dibêjin, “Putperestî!” Ev rast e lêbelê tiştê ku pir kes pê nizane ev e ku Harun û gelê mayî ew golik weke “elōhiym” bi nav kirin. Ev peyv di Peymana Kevn de 2.606 caran derbas dibe. Dikare îlanên sexte qest bike lêbelê ji dehan neh carî ji bo pênasekirina Xwedayê rastîn ê yekta, Yahwe (REB) tê bikaranîn. Weke mînak, di beşa yekem a Destpêkê de sîh û du caran xuya dike. Ayeta yekem a Pirtûka Pîroz wisa ye: “Di destpêkê de elōhiym erd û ezman afirand.”

Em dikarin bi hêsanî fêhm bikin bê ka wan golik weke Xwedayê Mezin “elōhiym” pênase kiriye an weke xwedayê sexte elōhiym. Îspata vê yekê ev e ku Harûn weke REB behsa golik dike (Derketin 32:5). Ev, navê pîroz ê Xwedayê me yê yekta ye û di tu derê Pirtûka Pîroz de ji bo xwedayekî sexte nayê bikaranîn. Harun û gelê Îsraîl navê *osiris*, *baal*, baal, isis an jî bi navê xwedayekî din ê sexte li wî golikî nekirin. Ew îlan dikin û dibêjin: “Îlahê te yê ku tu ji welatê Misrê deranî ev e” (Derketin 32:4).

Çawa ewqasî xelet tevgeriyan? Çima Xwedayê zindî yê ku weke Mûsa dijiya, nas nekirin? Wan mucîzeyên Wî dîtin, wan ewrên Wî û stûna agirê Wî şopandin. Bersiv ne tevlihev e. Berî bi mehan, gava Xweda ji bo xwe bide naskirin ji çiyê hat, ew bi paş ve vekişiyan û ji Mûsa re wisa gotin: “Tu nêzîk bibe û hemû tiştên ku Xwedayê me Xudan bêje, guhdarî bike. Paşê her tiştê ku Xwedayê me Xudan wê ji te re bêje, ji me re bêje û emê guh bidin û pêk bînin” (Dubarekirina Şerîetê 5:27).

Ez tenê dikarim hêvîşkestina Mûsa xeyal bikim û bînim ber çavên xwe. Ew nikare fêhm bike bê ka çima ew naxwazin di hizûra Xweda de bin. Ev çawa pêkan dibe? Mûsa vê endîşeya xwe ji Reb re dibêje û li bendê dimîne ku bersivan bibîne lêbelê Xweda bersiveke ecêb dide Mûsa: “Min dengê gotinên vî gelî ji te re gotiye, bihîst. Her tiştê hat gotin rast e” (Dubarekirina Şerîetê 5:28).

Mûsa sar disekind. Bi gumaneke mezin di dilê xwe de wisa gotiye: “Bise deqîqeyekê! Ma tiştê ku dibêje rast e? Carekê be jî ev gel bi rastî mafdar e!” Ez xeyal dikim ku bersiva wî daye Xweda dibe ku tiştekî wisa

be: “Çima nayên hizûra Te û weke min Te ji nêz ve nas nakin?” Xweda bersivê dide lê vê carê bersiva Wî dilê mirov dişewitîne:

> “Xwezî dilekî wisa bi wan re hebûya ku ji min bitirsiyana û hergav hemû emrên min pêk bianiyana!” (Dubarekirina Şerîetê 5:29)

Xweda şînê girê dide, eger tenê di nav tirsa pîroz de bimeşiyana, wê bikaribûna werin hizûra Wî û têkiliyeke nêzîk pê re danîbûna. Bi vî awayî ji bo îteatê ji Wî re bikin wê hêz bi dest bixistana û her dem wê hem qencî ji wan re û hem ji zarokên wan re ava bibûya. Piştre Xweda ev talîmat da Mûsa:

> “Here ji wan re bêje: Bizivirin konên xwe. Lê tu li vir li ba min bisekine. Ezê hemû emir, qanûn û rêbazên ku tê hînî wan bikî, ji te re bibêjim ku li wî welatê ezê bi milkî bidim wan, pêk bînin.” (Dubarekirina Şerîetê 5:30-31)

Ev îfadeyek e ku hem dilê mirov dişewitîne û hem jî kelecanê dide mirov. Berî her tiştî dilşewatî. Saeta herî tarî ya Îsraîl ne dema çêkirina golikê zêrîn bû û ne jî gava wan rapora xerab da û neçûn welatê ku ji wan re soza wî hatibû dayîn. Na, ya rastî saeta wan a herî tarî ev bû. Xweda ji bo wan bîne ser hişê wan ew ji Misrê (dinyayê) derxistin, bi vî awayî wê wan Ew ji nêz ve nas bikirina. Lêbelê ji ber ku tirsa pîroz di wan de tune bû, ev fersend ji dest dan. Çi trajediyek!

Ji aliyê din ve, ji bo Mûsa ev rewşeke kelecanî bû ji ber ku ew hatibû vexwendin ku li cem Xweda bisekine û gotinên Wî rasterast ji devê Wî bibihîze. Gava gel vedigeriya çadirên xwe, ew ber bi têkiliyeke nêzîk a bi Xweda re hat vexwendin.

Jina ku ez li ber hawiz pê re axivîm behsa Îsayekî cuda kir, Korîntiyan xizmeta Îsayekî cuda kirin û Îsraîlî li da dû Xwedayekî Mezin ê cuda çûn. Em li vir çerxeke ku li hev dizîvire dibînin gelo? Gengaz e ku em xwedayekî ku em navê wî Îsa ye biafirînin û dîsa jî Îsayê rastîn ê ku li aliyê rastê yê Xweda rûniştiye nas nekin. Û tiştê ku dihêle ev yek me aciz bike ew e ku hem gelê Îsraîl hem jî Dêra Korîntê, di berdêla duayên xwe de hêz û mucîzeyên Reb bi eşkereyî tecrube dike.

Naxwe aniha, em vegerin ser wê girseya mezin a ku di Roja Darizandinê de wê Îsa Reb îlan bikin lêbelê bi awayekî trajîk çawa ku Xweda ji Îsraîliyan re gotina “Ji min dûr bikevin” em vegerin wê qelebalixiya ku ev gotin bihîstin. Divê em gotinên pêxembertiyê yên Îsa yên derbarê bê ka wê bi rastî çi bê serê vê qelebalixiyê, hîn ji nêz ve lê bikolin. Weke ku di destpêka vê beşê de hatiye diyarkirin, ev ê alîkariya me bike ku em girîngiya tirsa pîroz a di mijara nêzîkahiya bi Reb û Efendiyê me re çêtir fêhm bikin. Em ê vê yekê di beşa pêş de bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Eger hûn wê Mizgîniya ku min daye we hişk bigirin, hûnê bi wê rizgar jî bibin; an na, we badîhewa bawer kiriye.” (Korîntî I, 15:2)

**Ramana Sereke:** Mimkun e ku mirov bi hemû dilê xwe baweriya xwe bi yekî ne rast an jî bi tiştekî ne rast bîne.

**Ramana Kûr:** Ez çawa dikarim piştrast bim ku ez ne ji Îsayekî sexte lê ji Îsayê rastîn bawer dikim? Ma dibe ji ber ku rêberên min Ew hînî min kirine ez dikarim bi vê zanibim? Lê ka lê bifikirin, ma Harûn jî hînî Îsraîliyan nekir û rêbertiya wan nekir? Ji ber ku min Pirtûka Pîroz xwendiye, dibe ku ez jê piştrast bim? Lê ka bifikirin, ma Ferîsiyan jî heman tişt nekir? Ez çawa dikarim bi vê zanibim?

**Dua:** Bavo, bi navê Îsa, ez ne tenê dixwazim rastiyê bizanibim lê ez dixwazim ji rastiyê jî hez bikim. Ez hildibijêrim ku Gotina Te ya zindî weke rayedariya herî bilind qebûl bikim û ez fêhm bikim an jî fêhm nekim jî, ez ê îteatê jê re bikim. Gava ez vê bikim, ez xwedî soza Te me ku ez ê tu carî neyêm xapandin. Çawa ku ez Gotina Te dixwînim û îteatê jê re dikim, bila ew jî min bixwîne; bila nîşanî min bide bê ez kî me û Rebê min Îsa kî ye. Ez vê bi navê Îsa dixwazim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez fêhm bikim jî û fêhm nekim jî, ez hildibijêrim ku baweriya xwe bi Gotina Xweda bînim.

“MIN TEVAHIYA ROJÊ DESTÊ XWE JI GELEKÎ SERHILDÊR RE DIRÊJ KIR KU DI RIYA NEQENC DE DIMEŞE Û DIDE PEY FIKRÊN XWE.”

– ÎŞAYA 65:2

# 31| MIN HÛN NAS NEKIRIN

Eger em lêkolîna li ser berevajiya wê berdewam bikin, em ê nêzîkahiya bi Xweda re hem hîn çêtir fêhm bikin û hem jî bêtir qîmetê bidinê. Weke di vê beşê de, mijara me ya di beşa dawî de jî dermanekî zor e ku dadiqurtandina wî dijwar e. Lêbelê hişyariyên Pirtûka Pîroz ên di nav nîqaşa me de, di rastiyê de diyarî ne ku ji bo hezkirin û parastina me ya ji aliyê Bavê me ve ji me re hatine şandin. Gotinên ku Îsa dibêje, wê tirseke pîroz di dilê me de ava bikin ku heta dawiyê wê me nêzî "Jiyanbexş" bihêle.

Nivîsên Pîroz bi eşkereyî hişyar dikin ku di rojên dawî de wê mizgîniyeke xelasî ya sexte ku ji Reb dûr e were ragihandin û ev ê ji aliyê girseyeke mezin ve were pejirandin. Bi îfadeyeke hêsan, li gorî vê mizgîniya sexte, têkiliya bi Îsa re xwefedakirina wisa naxwaze ku mirov bê şert û merc îteata Gotina Wî bike. Ev antîteza tirsa pîroz e û Îsayekî xeyalî diafirîne ku ji yê ku Korîntiyan pejirandiye ne cuda ye.

Pawlos, piştî ku bi van "bawermendên" Grek re ku li pey Îsayekî cuda diçûn rûbirû ma, rewşa dilê wan a ku xelaskerekî xeyalî afirandibû li ser sekinî. Wisa dinivîse: "Ez ditirsim ku gava ez dîsa bêm ba we, Xwedayê

min, min li ber we bide şermê û ez ji bo gelekên ku berê guneh kirine û ji pîsîtî, fuhûşî û şehweta xwe tobe nekirine, şînê bigirim" (Korîntî II, 12:21). Ew Îsayê Mesîh bi bîr tînin dikin lê li dijî Gotina Wî dijîn.

Ev di dêra pêşîn de bûyereke wisa bû ku kêm dihat dîtin lê di dêra me ya modern a Rojava de pir belav e. Encama vê hînkirinê, li şûna ku ew bibe meqama rêberiyê di jiyana mirovan de îfadeya "Reb" tenê dadixe asteke navûdengbûnê. Îsa wisa pêxembertiyê dike:

> "«Ne ku her kesên ji min re dibêjin: ‹Ya Xudan, ya Xudan› wê bikevin Padîşahiya Ezmanan! Bi tenê yên ku daxwaza Bavê min ê li ezmanan dikin, wê bikevinê."(Metta 7:21)

Îsayê Mesîh li vir ne behsa kesên ku bawerî bi Joseph Smith, Buddha, Hare Krishna an Konfîçyus an jî pêxemberên din ên sexte anîne dike, Ew behsa kesên ku Wî weke "Reb" îlan kirine, dike. Bala xwe bidinê, îfadeya "Reb" di vê ayetê de du caran li pey hev tê gotin. Dîsa, di Nivîsên Pîroz de dubarekirina peyvekê an hevokekê ne tiştekî tesadufî ye. Nivîskar li vir giraniyê dide ser wê peyvê an jî hevokê. Lêbelê, di rewşên wisa de, ne tenê kirpandin lê kûrahiya hestiyariyê jî heye. Weke mînak, gava nûçeya kuştina kurê wî ku ji aliyê Yoav ve gihîşt Qral Dawid, bersiva ku wî da bi hestan tije bû: "Padîşah serê xwe xist nav herdu destên xwe û bi dengekî bilind kir qîrîn û gazî: Lawo Avşalom! Avşalom lawo, ax kuro lawo!" (Samûêl II, 19:4). Di esasê xwe de dibe ku du caran negotibe "kurê min" lê hewara wî ewqasî xemgîn bû ku nivîskar gotinên wî dubare kirin.

Bi heman awayî, Reb jî hestên xurt ên mirovan ên ji bo Wî ne radigihîne. Ew ne tenê qebûl dikin ku Îsayê Mesîh Kurê Xweda ye, di heman demê de hatineke hestiyarî li baweriya xwe dikin û bi arezû ne. Em behsa kesên ku ji ber "Xirîstiyanîbûnê" kelecanî dibin, belkî dema behsa baweriya xwe dikin hestên xwe nîşan didin û heta di dema xizmeta xwe ya baweriyê de digirîn, dikin.

Ew ne tenê doza Mesîh jidil û ji kûr ve hîs dikin, di heman demê de di xizmeta Wî de jî cîh digirin:

> "Wê rojê gelek wê ji min re bêjin: Ya Xudan, ya Xudan! Ma bi navê te me pêxemberîtî nekir? Bi navê te me cin dernexistin? Ma bi navê te me gelek keramet nekirin?" (Metta 7:22)

Di ayetê de bi eşkereyî tê gotin ku ev kes ne ew kes in ku li qiraxekê sekinîne. Ev kes rasterast di xizmetên dêrê de cîh digirin an jî piştgiriyê didin dêrê. Her wiha baweriya xwe ya bi Mizgîniyê re bi eşkereyî tînin ziman: “Ma me pêxembertî nekir?” Di esasê xwe de, ew perçeyek ji karê guhartina jiyana mirovan a ber bi qenciyê ve bûn.

Li vir beramberî peyva Grekî “polus” îfadeya “gelek kesan” derbas dibe. Ev peyv weke “hejmar û mîktarek zêde” tê pênasekirin û bi gelemperî di wateya “bi piranî” de tê bikaranîn. Di her rewşê de, Îsa ne behsa komeke biçûk, behsa komeke mezin û fireh a ku ji hînkirinên Mizgîniyê bawer dikin, dike. Jê re dibêjin Reb, bi hestyarî pê ve tên girêdan, bersivê didin peyama Wî û di xizmeta Xirîstiyaninê de aktîf in. Em dikarin wan bi hêsanî weke Xirîstiyaniyên rastîn pênase bikin. Baş e naxwe faktora ku wan ji hev vediqetîne çi ye? Ew çawa ji bawermendên rastîn tên veqetandin? Îsa wisa ji me re dibêje:

> “Hingê ezê bi eşkereyî ji wan re bêjim: Min hûn qet nas nekirin!
> Ji min dûr kevin, hûn ên ku neheqiyê dikin!” (Metta 7:23)

Îfadeya sereke “yên xerabiyê dikin” e. Dîsa, reftara xerab nikare di bin rayedariya Gotina Xweda de bimîne. Ev jin û mêr car caran naterpilin, berevajî vê yekê, gava li hesabê wan tê, hîn bûne ku Gotina Xweda ji nedîtî ve bibînin, îhmal bikin an jî bûîteatiyê jê re bikin - ji tirsa pîroz bêpar in.

Balkêş e ku Îsa dibêje “Min tu carî hûn nas nekirin.” Weke ku di beşa berê de hatibû diyarkirin, peyva “naskirin”ê bi Grekî “ginΐskō” ye û weke peyva Îbranî “yâoa” ye: Nasîna yekî ji nêz ve. Wan tu carî têkiliyeke nêzîk a rastîn bi Wî re ava nekirine. Her çiqasî jê re bibêjin Efendî û Reb jî, ev ji bo wan tenê unvanek e ji ber ku wan îteat ji fermanên Wî re nekirine. Yûhenna wisa dinivîse:

> “Bi vê yekê em dizanin ku em wî nas dikin; eger em emrên wî bînin cih. Yê ku bêje: «Ez wî nas dikim», lê emrên wî neyne cih, derewkar e û li ba wî rastî tune.” (Yûhenna I, 2:3-4)

Ev bi gotina Îsa re di nav ahengeke bêhempa de ye: “Hûn ê mirovan ji kirinên wan nas bikin” (Meta 7:20). Kirin; ne xizmeta Xirîstiyaniyê,

ne parvekirina mizgîniyê an jî tevlîbûna dêrê ye ji ber yên ku wê bên redkirin jî wê xwediyê van taybetmendiyan bin.

Ez wisa bibêjim: Di bawermendekî rastîn de hûn ê van taybetmendiyan teqez bibînin, bi rastî bêyî van taybetmendiyan kesek nabe bawermendekî rastîn. Lêbelê xwedîbûna van taybetmendiyan tenê têra nake ku ew kes bibe zarokekî rastîn ê Xweda. Faktora diyarker ev e: Ma ew îteatê ji gotinên Wî re dikin?

Ev nîqaş, mijara girtinê ya "Waza li ser Çiyê" ya navdar a Îsa ye. Gava gotinên xwe yên bi heybet ku bi dawî dike, wisa diqedîne:

> "Îcar her kesê ku van peyvên min dibihîze û tîne cih, mîna wî mirovê aqilmend e ku xaniyê xwe li ser latê ava kiriye. Baran dibare, bahoz radibe, lehî tên û li wî xaniyî dixin, lê ew hilnaweşe, çimkî li ser latê hatiye avakirin. Û her kesê ku van peyvên min dibihîze û nake, mîna wî mirovê bêaqil e ku xaniyê xwe li ser seylakê ava kiriye. Baran dibare, bahoz radibe, lehî tê û li wî xaniyî dixin û xanî hildiweşe. Û bi hilweşîneke mezin dikeve" (Metta 7:24-27).

Eger hûn li ser her du koman bikolin, hûn ê bibînin ku her tişt tê xwe li ser ferqeke hêsan bi cîh dike. Her du kom jî gotinên Wî dibîhîzin, lê koma yekem diyar dike ku wan tîne cîh, koma duyem jî diyar dike ku nayîne cîh. An jî em dikarin bibêjin ku koma yekem li ber Gotina Xweda dilerize (ji Xweda ditirse), koma duyem li ber Gotina Xweda nalerize (ji Xweda natirse).

Îsa bi eşkereyî diyar dike ku ev her du kom pir dişibin hev. Baweriya kesên di koma bêbingeh de ya li ser doktrînên Xirîstiyaniyê, bi awayekî jidil gazîkirina wan a "Reb" û xizmetên wan ên Xirîstiyaniyê yên aktîf, nîşan dide bê wan xaniyê xwe, ango jiyana xwe, çawa ava kirine. Di koma xwedîbingeh de jî heman taybetmendî hebûn lêbelê ferqa wan a tenê ev bû: Wan îteata ji gotinên Wî re dikir weke ku ew vîna wan bi xwe be. Her du mal jî ji heman keresteyan, ji heman doktrînan hatine çêkirin. Her du jî di warê hebandin û xizmetê de weke hev xuya dikin. Ferqa di navbera wan de bingehîn e -ango ya ku nayê dîtin. Komek bi awayekî taybet nêzîkahiya bi Xweda re tecrube dike, koma din tecrube nake.

Ji bo kesên ku di nav tirsa pîroz de bimeşin, soza nêzîkahiya bi

Xweda re ji wan re tê dayîn. Di çend beşên li pêşiya me de, em ê vê îmtiyaza mezin a ku ez û hûn hatine vexwendin, bibînin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Di naskirina Xwedê û Xudanê me Îsa de kerem û aştî bi firehî li ser we be. Bi naskirina wî yê ku bi rûmet û qenciya xwe gazî me kiriye, hêza wî ya xwedayî, her tiştê ku ji bo jiyan û xwedênasiyê pêwist e, da me. Bi van tiştan wî sozên giranbiha û gelek mezin dane me, da ku hûn bi wan bibin hevparên tebîeta xwedayî û ji wê xerabûnê birevin, ku ji xwestekên dinyayê tê.” (Petrûs II, 1:2-4)

**Ramana Sereke:** Îspata ku kesek bi Îsa re di têkiliyê de ye, ew e ku ew xwedî hêzeke li derveyî jêhatiyên xwe ye ji bo ku Gotina Wî bîne cîh. Ev hêzdarî weke “xweşiya Wî” tê pênasekirin.

**Ramana Kûr:** Ma ez bi hêza xwe hewl didim ku îteata ji gotinên Îsa re bikim an ez baweriya xwe bi xweşî, soz û cewherê Wî yê îlahî tînim? Ji bilî qabîliyetên xwe, ez çawa dikarim bêtir baweriya xwe bi qabîliyeta Wî bînim?

**Dua:** Bavo, min bibexşîne ji ber ku min bi hêza xwe hewl da ku îteatê ji Gotina Te re bikim. Ji niha û pê de ez Îsa weke Rebê herî bilind ê jiyana xwe îlan dikim. Gotina Te çi bibêje, di jiyana min de desthilatdariya dawî ew e. Ji bo ku ez di rêyên Te de bimeşim, ez ê tenê baweriya xwe bi xweşiya Te ya hêzdar û xwezaya xwedayî ya ku Te daye me, bînim. Tenê bi vî rengî em dikarin di têkiliyeke nêzîk de bi hev re bimeşin. Ez pir spasdar im ku Te ez vexwendime vê jiyana heybet. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê bi baweriya qabîliyeta Wî re bimeşim. Êdî ez ê baweriya xwe bi hêza xwe neynim lê ez ê bi hêza Wî re hevkariyê bikim.

TIŞTÊN KU JI RAMANÊN
BI XWE TÊN, TU CARÎ ME
RONÎ NAKIN AN JÎ ME
MATMAYÎ NAKIN. LÊ GAVA
XWEDA DIAXIVE, HER DEM
REWŞEKE MATMAYÎNÊ Û
TIRSEKE BI SAW HEYE.

– JOY DAWSON

# 32| RAZA REB

Du beşên dawî dijwar, gefxwar û balkêş bûn. Zanîna ku gelek kesên li benda bihîstina gotina Îsa ya ku dibêje “Tevlî kêfxweşiya Xweda bibin” îcar wê li şûna wê vê “Ji min dûr bikevin” bibihîzin ku ev hem ecêb e û hem jî dilşewat e. Di rastiyê de, xapandineke ji vê mezintir tune ye ku mirov bifikire bi Xweda re di têkiliyê de ye lê rewş berevajî vê ye. Ev jin û mêr, li şûna ku “bi Xweda re bibin yek” bi eşkerebûna tirsonek a bêaqiliya xwe ya ku bi “bikaranîna Xweda” re kirine, wê di cîh de li hev rast bên. Li şûna ku ew hezkirina bêhempa ya ku di dema îteata Gotina Wî de derkeve holê biceribînin, wan Gotina Wî ji bo berjewendiyên xwe bi kar aniye. Îsa bi hezkirineke mezin, ji bo me ji rewşeke sersar an jî ya xapandî biparêze, vê bûyera tirsonek ji berê ve radigihîne.

Aniha li gorî ku me di berevajiya nêzîkahiyê fêhm kiriye, werin em bi kêfxweşî dest bi nîqaşa xwe ya li ser xweşikiya nêzîkahiya rastîn a bi Afirînerê xwe re bikin. Em ê bi lêkolîna senaryoyekê ku di çend beşên pêşiya me de bi hûrgulî li ser bisekinin, dest pê bikin.

Destûrê bidin ez pirseke ji bo amadekariyê bipirsim: Mirov bibe endamekî desthilatdariyê (gotina “Ji min dûr bisekinin” nebihîse) lê dîsa jî fersenda nêzîkahiya bi Xweda re ji dest bide, gelo mumkun e?

Bersiva kurt û kurmancî “erê” ye. Lê werin em vê di Nivîsên Pîroz de bikolin û bi parvekirina yek ji ayetên xwe yên herî bijare dest pê bikin:

> “Sira Xudan ji bo wan e ku ji wî ditirsin, Ew wan haydar dike ji peymana xwe.” (Zebûr 25:14)

Li vir peyva Îbranî ya ku weke “raz” hatiye wergerandin, “sôd” e û weke “şîret”ê tê pênasekirin. Di ferhenga Grekî de jî ev tê gotin: “Di bingeha vê peyvê de veşartîbûn heye.” Ango di bingeha xwe de, nivîskarê zebûrê ne behsa razeke tenê, behsa şîretên veşartî yên Xweda dike an jî li gorî armanca me, em ê ji van re bibêjin “raz” (bi awayekî pirjimar). Bi vî awayî, ev ayet dikare wisa jî bê xwendin: “REB, razên xwe bi yên ku jê ditirsin re parve dike.”

Îcar aniha vê pirsê ji xwe bipirsin: Hûn razên xwe bi kê re parve dikin, bi nasên xwe re an bi dostên xwe yên nêzîk re? Ez bawer im ku we bersiva “dostên nêzîk” daye. Xweda jî ji vê ne cuda ye, Ew razên xwe bi dostên xwe yên samîmî û nêzîk re parve dike û dostên Wî yên nêzîk ew in ku tirsa pîroz dipejirînin. Di wergereke din a Pirtûka Pîroz de wisa dinivîse: “Dostaniya Reb ji bo yên ku jê ditirsin e.”

Xweda ne dostê her kesî ye. Ez vê bi awayekî zelaltir bînim zimam: Xweda ne dostê her kesên li dêrê ye. Ji bo em vê berfireh bikin, werin em ji Peymana Kevn dest pê bikin. Du kesên ku weke dostên Xweda têne pênasekirin hene: Brahîm û Mûsa. Ma hinek din hene? Bêguman! Nûh, Daniyêl, Ester, Ûsiv, Dawid, Eyûb, Hanok, Îşaya û gelekên din bi awayekî nêzîk bi Xweda re meşiyane. Lêbelê bi taybetî jiyana van her du mêran, mînaka wê rêyê ye ku mirov dibe dostê Reb.

Werin em bi Brahîm dest pê bikin. Çima jê re dostê Xweda tê gotin? Gava ew heftê û pênc salî bû, Xweda soza daxwaza herî mezin a dilê wî dayê, ango soz dayê ku wê kurekî jê re çêbike. Lê ev yek di cîh pêk nehat. Ew bîst û pênc salên din li bendê ma heta ku jina wî Sarayê bi awayekî mucîzewî Îshaq bîne dinyayê. Ma hûn dikarin qîmeteka ewqasî kûr û şîrîniya mezin a bendewariya ewqasî dirêj xeyal bikin?

Ez jê bawer im ku têkiliya bav û kur her sala diçû hîn bi hêztir dibû. Dewlemendiya wî ya mezin, li cem şahiya kurê wî ne tiştek bû. Ji bo

Brahîm tu tişt ji kurê wî ne girîngtir bû, heta jiyana wî bi xwe jî.

Lê rojekê, bêyî ku hişyariyek ji berê ve hebe, Xweda fermanê wisa dide Brahîm: “Xwedê got: Kurê xwe yê yekta Îshaqê jê hez dikî bibe herêma Moriyayê. Li wir, li serê çiyayekî ku ezê ji te re bêjim, bike qurbana şewitandinê” (Destpêk 22:2).

Çi?! Kesek an jî tiştekî herî girîng a di jiyana we de, tenê ji ber ku Xweda tu sedem û hincet nîşan nedaye û ji te tê xwestin ku tu wî kesî bikuje? Ma hûn cidî ne! Ma hûn dikarin xeyal bikin gava ku Brahîm ev gotin bihîstine bê çawa matmayî maye? Wî tu carî xeyal nedikir ku Xweda wê tiştekî wisa zor û dijwar jê bixwaze. Xweda ji canê Brahîm bêtir tişt xwestibû -Xweda dilê wî jê xwestibû. Ev qet ne bimantiq bû.

Bihêlin ez vê xala girîng lê zêde bikim: Em dizanin ku ev ceribandinek e. Ya rast, Nivîsên Pîroz bi eşkereyî vê dibêjin: “Piştî van tiştan Xweda Brahîm ceriband” (ayeta 1.). Lêbelê kêmasiya xwendina bûyereke dîrokî ya qewimî li vir e -em bi encamê dizanin, piraniya bawermendan ev yek çend caran bihîstine an jî xwendine. Lê em ji bîr dikin ku Brahîm nizanîbû ku ev ceribandin e! Heta ku em derbasî aliyê din nebin, em tu carî nizanin bê Xweda kengî me diceribîne. Di azmûneke lîseyê de mimkun e ku mirov kopyayê bikişîne lê di azmûnên Xweda de tu kes nikare kopyayê bikişîne. Eger me ji bo pîrozkirina dilê xwe, sparteka xwe ya mayîna di Gotina Wî de nekiribe, em çiqas aqilmend bin jî, wê derbaskirina ji azmûnê ewqasî dijwar be!

Eger neviyên Brahîm bi ceribandinên ku Xweda di beyebanê de anîn serê wan fêhm bikirana, wê bi rengekî cuda bersiv bidana. Lê di meseleya Brahîm de tiştekî cuda hebû, tiştekî ku di neviyên wî de kêm bû: Tirsa pîroz.

Ez ji bersiva Brahîm a ji bo fermana Xweda ya pir zor û dijwar hez dikim: “Îbrahîm serê sibê zû rabû” (Destpêk 22:3). Di cîh de dest bi kar kir! Ew çend roj an jî hefteyan nefikirî, ji bo şîretekê lê bikin bang li dostên xwe nekir. Fermana Xweda paşguh nekir an jî li ber wê derneket. Ew û Îshaq û du xizmetkarên wî serê sibeha din zû ji xew rabûn, alavên xwe dan hev û ketin rê.

Şeva berê piştî ku dengê Xweda, bihîst, eger rabibûya ser xwe û

tevbigeriya dibe ku karê wî hinekî hêsantir bû lê gelo piştî ku du roj û nîv derbas bûn, gava Brahîm di wê navberê de ji ezmanan tu peyv nebihîst û bi wî çiyayî re rûbirû ma ku wê kesê herî girîng ê di jiyana xwe de qurban bikira, îcar wê çawa bikira?

Brahîm ber bi quntara çiyê ve diçe û ji xizmetkarên xwe dixwaze ku li benda wî bimînin. Îshaq derdixe ser serê çiyê û gorîgehê ava dike. Di vê navberê de, hestên xwe yên tevlihev û hêsirên çavên xwe vedişêre. Ji bo ku tiştên ji bo qurban hewce ne bîne cîh, wî her perçeya hêza vîn û hişê xwe bi kar aniye. Ew kêliya krîtîk tê, weke ku hemû hêviyên ku dibe Xweda ramana xwe biguherîne winda bûne. Di nav êşeke mezin de Îshaq girê dide, kêrê hildide û amade ye ku kurê xwe serjê bike, ev hemû ji ber ku Xweda xwestine dibe û tu sedem nehatiye nîşandan.

Ji nişka ve ferîşteya REB xuya dibe û wisa diqîre: “Dest nede kurik! Tiştekî pê neke. Niha ez dizanim tu ji Xwedê ditirsî. Te kurê xwe yê yekta jî, ji min texsîr nekir” (Destpêk 22:12).

Ferîşte ji kuderê zanîbû ku Brahîm ji Xweda ditirse? Ji ber ku gava pê bimantiq nedihat, gava tu berjewendî jê nedidît û gava canê wî diêşiya, wî di cîh îteat jê re kir û ji bo vê temam bike heta dawiyê çû.

Piştre Brahîm kêra xwe datîne, şerîta Îshaq vedike, serê xwe radike û beranekî ku sturehên wî di nav deviyan de asê maye dibîne. Ji devê wî ev gotin derkevin: “Îbrahîm navê wê derê “Yahwe-Yîre” ango “Xweda dikare bike” (Destpêk 22:14). Berî niha çi qewimî? Di wê kêliyê de Xweda, aliyekî karakterê xwe ku berê tu kesî nedizanî, ji Brahîm re eşkere kir. Çima? Ji ber ku ew dostê Xweda ye.

Bihêlin ez diyar bikim. Hûn hemû kesên ku vê pirtûkê dixwînin, min weke nivîskar John Bevere nas dikin. Yên ku li konferansan an jî li dêran guhdariya min kirine, min weke axaftvan John Bevere nas dikin. Lêbelê, kesên ku min weke bav John Bevere, bapîr John Bevere, dostê herî nêzîk John Bevere, mêrê xwe John Bevere nas dikin jî hene. Van aliyên kesayetiya min pir kêm kes dizanin, tenê yên ku herî nêzî min in. Ya dawî jî tenê Lisa dizane.

Brahîm wê rojê bû dostekî herî nêzîk ê Xweda û di beşa bê de, em ê dînamîkên awarte yên di navbera van her du dostan de bê ka em çawa dikarin xwedî têkiliyeke wisa bin, kifş bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Sira Xudan ji bo wan e ku ji wî ditirsin, Ew wan haydar dike ji peymana xwe.” (Zebûr 25:14)

**Ramana Sereke:** Xweda razên xwe bi dostên xwe yên nêzîk re parve dike û dostên Wî yên nêzîk jî ew in ku tirsa pîroz dipejirînin.

**Ramana Kûr:** Dost çi ye? Dost çawa bi hev re zewqê ji jiyanê digirin? Tişta ku dostaniyê kûr dike çi ye? Gelo ez dixwazim bibim dostê Xweda? Ez li ser vê yekê difikirim bê ka Ew di dostekî de li çi digere? Ez ji bo Wî bûm dostekî baş gelo? Eger ez nebibim, divê ez çi biguherînim? Arezûyên min çi ne ji bo bibim dostê Wî?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, ez dixwazim ku bibim yek ji dostên Te yên herî samîmî. Ez dizanim ku Tu jî vê dixwazî. Gava ez li ser wateya dostê nêzîk bê çi ye difikirîm, min ferq kir ku ez ne dostekî Te yê dilsoz im. Ji ber ku min daxwazên Te di ser her tiştî re negirtin û di jiyana xwe de min têkiliya xwe û Te neparast, ez ji te rîca dikim ku Tu min bibexşîne. Ji bo ku ez heta hetayê bibim dostê Te, ez kerema Te dixwazim. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez ê hewl bidim ku bibim dostê Xweda û ez ê hilbijêrim ku tu tiştekî din ji xwe re nekim pêşiya vê yekê û ez ê li gorî wê tevbigerim.

TIRSA XWEDA GIYAN RONÎ DIKE, XERABIYÊ TUNE DIKE, AREZÛYAN LAWAZ DIKE, TARÎTIYÊ JI GIYANÊ MIROV DERDIXÎNE Û WÊ PAQIJ DIKE. TIRSA XWEDA LÛTKEYA HIKMETÊ YE. LI KU DERÊ EW TUNE BE, LI WIR TIŞTEKÎ QENC TUNEYE. TIRSA XWEDA BI KÊ RE TUNE BE, EW JI RAMANÊN ŞEYTANÎ RE VEKIRÎ YE.

– EFRÊMÊ SÛRYANÎ

# 33| NAVEROKA BÛYERÊ

Em li ser bê ka dostaniya di navbera Xweda û Brahîm de çawa ava bû, sekinîn. Ev mînakek e ji wan mînakan e bê ka em çawa dikarin bikevin têkiliyeke nêzîk a wekhev ya bi Xweda re. Lê berî ku em werin ser wê, em bi Brahîm re berdewam bikin. Em wisa dixwînin:

> "Ma bavê me Birahîm, gava ku kurê xwe Îshaq li ser gorîgehê pêşkêş kir, ne bi kirinên xwe rastdar derket? … Birahîm ji Xwedê bawer kir û ev jê re rastdarî hat hesabkirin û jê re dostê Xwedê hat gotin." (Aqûb 2:21, 23)

Yaqûbê Şandî behsa dostaniya wan dike û ne tesaduf e ku gotinên Yaqûb û yên ferîşteyê li hev dikin. Tiştê ku ev nêzîkahî xwedî dikir, tirsa pîroz a Brahîm bû û ev bi îteata wî ya di cîh de û kamil re diyar bû. Gava ferman ne bimantiq bû, gava ku tu fêdeya wê tune bû û gava bicîhanîna fermanê bi êş bû jî, ew li ber Gotina Xweda lerizî. Tirsa xwedayî me motîve dike ku em hem tiştê ku Xweda ji me dixwaze em bikin û hem jî di xwestinê de kirina vê me dîsa motîve dike. Ew deriyê nêzîkahiya bi Wî re vedike.

Rojekê gava Xweda li daristana berûyan a Mamre'yê serdana Brahîm dikir, ev pirs ji her du ferîşteyên bi xwe re kir: "Ma tiştê ku ezê bikim, ezê ji Îbrahîm veşêrim?" (Destpêk 18:17).

REB piştre berê xwe da Brahîm ji bo ku niyeta xwe jê re bibêje û her du ferîşte çûn bajarên Sodom û Gomorayê. Tiştê ku piştî vê qewimî, ji bo ku bê fêhmkirin ez ê bi şirovekirinê re bibêjim lê di bingehê de REB wisa got: "Brahîm, plana min ew e ku ez van her du bajaran tune bikim ji ber ku gunehên wan pir mezin in. Tu çi difikirî?"

Hûn dikarin xeyal bikin ku hûn van gotinan ji Afirîner bibihîzin? Brahîm bi awayekî matmayî jê dipirse: "Sodom?!"

REB wisa bersiv dide: "Erê û Gomora jî. Tu di vê mijarê de çi difikirî?"

Dest û lingên Brahîm li hev dikevin û di dilê xwe de wisa dibêje: Bifikire, Brahîm, bifikire. Biraziyê min Lût li wir e, ji ber vê divê ez hem ji bo wî hem jî ji bo mirovên din ên bêguneh bibim navbeynkar. Fikrek tê hişê Brahîm:

> "Piştre Îbrahîm nêzîkî Xudan bû û got: Ma tê yên rast, bi xeraban re tune bikî? Lê ku di nav bajêr de pêncî kesên rast hebin? Ma tê bajêr nedî ber xatirê wan pêncî kesên rast ku tê de ne? Dûrî te be ku tu wiha bikî û tu kesê rast jî bi kesê xerab re bikujî û kesên rast bibin wekî kesên xerab! Ma dadgerê tevahiya dinyayê ya rast nake?" (Destpêk 18:23-25)

Hûn xeyal dikin bê Xweda çiqas şa û razîbûye gava ku bersiva mirovê ku pê re peyman çêkiriye bihîstiye? Bi îhtîmaleke mezin wisa bersiv daye: "Xaleke pir baş e! Temam, eger li wir pêncî kesên pak û rast hebin, ez ê her du bajaran hilneweşînim. Ji ber ku ez bi dostê xwe Brahîm re axivîm kêfxweş im."

Lê Brahîm tatmîn nabe -ya ku pêncî kes tune bin? Ji ber vê mijarê dubare dike lê hejmarê dadixe çil û pênc kesan. REB wisa bersiv dide: "Xaleke din a xweş! Temam, eger çil û pênc kesên pak û rast hebin ez bajaran hilnaweşînim. Ez kêfxweş im ku min ev nîqaş bi dostê xwe Brahîm re kir."

Brahîm nasekine, ji çil û pêncan dadixe çilan, piştre sîh, piştre bîst û herî dawî dadixe deh kesên pak û rast û zorê li mijarê dike. Di dilê xwe

de dibêje, divê deh kes hebin. Biraziyê min Lût kesek e, tenê man neh kesên din.

Tenê dostek dikare bi qralê ku xwedî hêza darizandinê ye, bi vî rengî biaxive. Xizmetkarekî an jî koleyekî daxwazeke wisa bikira, wê ev bibûya bêhurmetî. REB her daxwaz pejirand û piştre em vê dixwînin: “Piştî ku Xudan peyivîna xwe bi Îbrahîm re xilas kir, ji wir çû û Îbrahîm jî vegeriya cihê xwe.” (Destpêk 18:33).

Ji bîr nekin, tirsa ji Xweda tê wateya hezkirina ji tiştên Ew jê hez dike û nefretkirina ji tiştên Ew jê nefret dike. Rojekê, piştî ku ez bi hezkirin nêzî kesekî ku bi min re xerab tevgeriyabû, bûm û gotinên qenc min jê re gotin, Xweda bi min re wisa axivî: “Kurê min, gava tu girîngiyê bidî tiştên ku ez girîngiyê didimê -mirovan- ez ê planên xwe bi te re parve bikim.” Tirsa pîroz di rastiyê de dihêle ku em ne tenê ji Xweda, lê ji mirovan jî bi awayekî rasttir û kûrtir hez bikin.

Nivîsên Pîroz ji bo mirovên li Sodom û Gomorayê dibêje: “Mirovan dixwar, vedixwarin, dikirrîn, difirotin, diçandin û ava dikirin” (Lûqa 17:28). Werin em vê bi zimanekî hêsantir bînin zimam: “Jiyan xweş e, aborî bi lez geş dibe û eger Xwedayek hebe jî ew şêwaza jiyana me ji xwe re nake kar.” Ji bîst û çar saetan kêmtir mabû ku ev her du bajar tune bibin û haya mirovan ji tu tiştî tune bû. Lê rastiya herî bi endîşe ne ev e.

Rastiya herî ku mirov pê ecêb dimîne ev e: Lût ê ku Pirtûka Pîroz wî weke “zilamekî rast” (Petrûs II, 2:7) pênase dike jî, haya wî jî bi qasî wan ji tiştên ku wê biqewimin tunebû -di vê mijarê de ew ji wan mirovên bê Xweda ne cuda bû! Ji bo derxistina wî û malbata wî ji wir, du ferîşteyên dilovan hewce bûn ji ber ku Brahîm ji bo wî dua kiribûn (Destpêk 19:29).

Ji bo ku ev çîrok bêtir bi wate bibe, weke ku di dema me de derbas bibe em lê bifikirin. Bila du zilamên me yên rast û qenc hebin; her du jî xelas bûne û ji nû ve çêbûne ango bûne Xrîstiyan. Yek ji van zilamên rast, ji berê ve dizane bê wê Xweda çi bike û di biryardana Xweda de ya li ser çawaniya kirina vê yekê jî roleke girîng dilîze. Zilamê rast ê din jî, weke xerabkaran, haya wî ji darizandina ku nêzîk dibe tuneye. Çima? Zilamê rast ê yekem ji Xweda ditirse, ji ber vê ew dostê Xweda ye ku bi

razên Xweda dizane. Zilamê rast ê duyem ji Xweda natirse ji ber vê ew ne dostê Xweda ye û ji ber vê yekê bi razên Xweda nizane.

Ji Lût re digot kesekî rast û qenc lê ew dinyewî bû. Weke gelek kesên di dêra me ya Korîntê û ya Rojava de, ew wan bawermendan temsîl dike ku gava dikevin tengasiyê, berî her tiştî hewl didin xizmeta berjewendiyên xwe bikin. Têkiliya van mirovên “rast û qenc” a bi Xweda re, ji têkiliya min a bi serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re ne pir cuda ye. Ez dikarim ji biryar û rêberiya wî sûd werbigirim lê ez planên wî, hestên wî yên kesane, biryarên wî ango ez ê naveroka bûyeran ji berê ve nizanibim.

Karakterê Lût, ji cîhê ku wî hilbijartibû lê bijî, ji jina ku hilbijartibû û zarokên wî yên ku ji têkiliyeke ensestê çêbibûn -Moavî û Amonî- bi eşkereyî diyar dike. Lût di destpêkê de tiştê ku ji bo wî herî baş xuya dikir, hilbijart. Dema ku rêyên xwe ji hev veqetandin, Brahîm fersenda hilbijartina pêşî ya welatê ku dixwest wê lê bijî dabû wî û pejirandibû ku biçe aliyê berevajî wî ve. Nivîsên Pîroz wisa dibêjin: “Lût serê xwe rakir û dît ku tevahiya Deşta Şerîayê heta Soarê avî ye, wekî Bexçeyê Xudan û welatê Misrê ye. Beriya ku Xudan Sodom û Gomorayê wêran bike, deşt wiha bû” (Destpêk 13:10). Çima li derdora xwe nêrî? Wî dizanibû ku bajarên li ser wan deştan avabûne çiqasî xerab in. Bi îhtîmaleke mezin wî hewl dida ku diyar bike bê ka ew dikare çawa ji xêr û bereketa pergala dinyayê sûd werbigire lê çawa xwe bi destê wê ve bernede û li ber neçe. Planek ji xwe rw çêkir. Ji navenda xerabiyê dûr û li cîhekî ewle di navbera bajaran de bi cîh bû (Destpêk 13:12) lê tawîzên ku ji dest dan bi kêrî wî nehatin. Di encamê de wî xwe bi malbata xwe re li pişt deriyên bajêr dît, herî dawî kete nav bajêr.

Gava em ji tirsa pîroz mehrûm bin, em bi neçarî bêyî ku bikevin nava dinyayê, bi qasî ku mimkun e em hewl didin ku nêzî wê bibin. Lêbelê eger armanca me ev be, ew tenê mijara demê ye ku dinya me bikşîne nava xwe. Divê em ji bîr nekin ku em ji bo xelaskirina windahiyan bang li me hatiye kirin ku em bên dinyayê, ne ji bo ku em bibin perçeyek ji wan.

Jiyana Lût ji bo her yekî ji me hişyariyek e. Eger navbeynkariya Brahîm tune bûya, roja darizandinê wê weke dizan bihata ser serê

Lût. Encamên ecêb yên dinyewîbûna wî hebûn. Weke hat diyarkirin, zarokên Lût pir bê Xweda bûn. Jina wî ewqasî bi Sodomê ve girêdayî bû ku fermana ferîşteyan a ku “li pey xwe nenêrin” guhdar nekir û ji ber vê yekê rastî darizandinê hat -di cîh de bû stûneke ji xwêyê. Îsa bi hezkirin me hişyar dike û dibêje: “Jina Lût bînin bîra xwe!” (Lûqa 17:32).

Aniha ku em vê pirsê bipirsin wê aqilmendî be: Gelo ev şertê dostaniyê ji bo me zarokên Xweda jî derbasdar e? Em ê bîsteke din li ser vê mijarê bisekinin lê pêşî werin em li dostê din ê meşhûr ê Xweda yê ku di Peymana Kevn de ye, binêrin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Nêzîkî Xwedê bibin, ew jî wê nêzîkî we bibe. Gunehkarno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin.” (Aqûb 4:8)

**Ramana sereke:** Xweda planên xwe bi kesên ku jê ditirsin re parve dike. Lê yên ku dilsoziya wan di navbera Xweda û dinyayê de perçe bûye, Xweda planên xwe ji wan vedişêre.

**Ramana kûr:** Îsa wisa dibêje: “Lê dema ku ew Ruhê Rastiyê bê, ewê we ber bi hemû rastiyê ve bibe” (Yûhenna 16:13). Gelo çi têkiliya vê û dostaniya di navbera Xweda û Birahîm de, bi hev re heye? Gelo ji bo ku Xweda planên xwe bi min re parve bike, ez vê dixwazim?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, ez dixwazim şîretên Te yên veşartî bibihîzim. Ez ferq dikim ku ez weke Lût nêzîkî dinyayê dibim. Ya rastî ez bi vî awayî ez ji şîretên Te yên kûr dûr ketim. Ez ji bo vê yekê tobe dikim. Ez ji Te lava dikim ku Tu min bi xwîna Îsayê Mesîh bi temamî paqij bikî. Ji kerema xwe min weke kesekî ku Tu şîretên xwe pê re parve dikî bipejirîne. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Ez li şûna dinyayê Xweda hildibijêrim.

TENÊ DI HIZÛRA XWEDA DE GAVA KU EM DI NAV HESTEKE MEZIN A RÛMET Û RÊZÊ DE DIMÎNIN, WÊ DEMÊ EM DI GIYAN Û RASTIYÊ DE DEST BI HEBANDINA XWEDA DIKIN.

– ALISTAIR BEGG

# 34| RÛBIRÛ

Aniha em li kesê din ê ku di Peymana Kevin de, di têkiliya xwe ya bi Xweda re weke “dost” tê binavkirin, binêrin.

> “Xudan bi Mûsa re, wekî zilamekî ku bi hevalê xwe re dipeyive, dipeyivî.” (Derketin 33:11)

Gava ku Nivîsên Pîroz ji bo pênasekirina dostaniya Xweda û Mûsa îfadeya “rûbirû” bi kar tînin, tiştekî hema bêje nayê fêhmkirin. Ji bîr nekin, kesê ku behsa wî tê kirin ne yekî ji dera hanê ye an jî kesekî navdar e, Ew Xwedayê ku Hêza Wî Têra Her Tiştî Dike. Hûn mezinahiya vê îfadeyê dikarin hîs bikin gelo? Bi ser de jî, ev îfadeya nêzîkahiyê ne tenê carekê derbas dibe, gava REB ji Harûn û Miryamê re ku Mûsa rexne dikirin hêrs dibe, cara duyem tê bikaranîn. REB bi awayekî hişk wisa dibêje:

> “Lê xulamê min Mûsa ne wisa ye,
> Di tevahiya mala min de dilsoz e.
> Ezê ne bi remzan, pê re vekirî,
> Rû bi rû pê re bipeyivim.
> Ew sûretê Xudan dibîne.
> Nexwe hûn çawa ji rexnekirina xulamê min Mûsa netirsiyan?”
> (Hejmartin 12:7-8)

Gotina Xweda ya ya ku dibêje, “Di tevahiya mala min de dilsoz e.” pesnê herî mezin e ku mirov di jiyana xwe de dikare bi dest bixe. Ev îfade ronahiyeke mezintir dide ser mijara dostaniya bi Xweda re: Bingeha pêbaweriyê. Tiştê ku dihêle em baweriya Xweda bi dest bixin çi ye?

**Îteata bêşert:** Her dem tiştê ji me tê xwestin ku em bikin.

**Durustbûna tam:** Her dem bicîhanîna gotina xwe.

**Tişta pêşî ya hilnaweşe:** Hilgirtina ku her dem daxwazên Xweda di rêza yekem de be.

**Naskirina dilê Xweda:** Dem ku mirov biryarê dide, her dem xwesteka Xweda hildibijêre.

Di her çar qadan de jî îstîkrar pir girîng e. Eger qadek were binpêkirin, tobeyeke bilez û jidil, wê dîsa we têxe ser rêya bidestxistina baweriyê. Tirsa pîroz di van her çar kategoriyan de jî motîvasyona pêbaweriyê dide û Mûsa di van qadan de di asteke bilind de bû. Di vê beşê de em ê li ser kategoriya sêyem û çarem hûr bibin -ango her dem naskirin û hilbijartina dilê Xweda. Li jiyana Mûsa bifikirin; çil salên wî yên pêşî bi dewlemendiyeke mezin, xwarin û vexwarinên herî xweş, kincên xweşik, derfetên madî yên herî baş û her cure kêfên ku dilê wî dixwest derbas bû. Di maleke bêhempa de dijiya li ser rûyê erdê tu kes bi qasî dapîrê wî fîrewn ne dewlemend û ne bihêz bû. Lê dîsa jî em wisa dixwînin:

> “Ji dêla ku ew demekê kêfa guneh bike, wî bi gelê Xwedê re cefakişandin bijart û şermezariya di ber Mesîh de ji xezîneyên Misrê dewlemendiyeke mezintir hesab kir. Çimkî wî li xelata ku wê bistanda dinêrî.” (Îbranî 11:25-26)

Mûsa hilbijart ku ji her tiştî dûr bikeve. Wî dikaribû di qesrê de hewl bide xizmeta Xweda bike lê ew li xelatekê digeriya ku mayîna li Misirê nikarîbû ev xelat bidaya wî. Ma ev xelat erd û welatê sozdayî bû? Nedibû ku ev be ji ber ku welatê ku şîr û hingiv jê diherikî, dikaribû çi bide wî ku ma ne jixwe ne xwediyê wê bû?

Ji bo em kifş bikin bê ew herî zêde li çi digeriya, werin em li jiyana wî ya piştî qesrê bifikirin. Ma devjêberdana ji her tiştî hilbijartineke bi aqilmendî bû? Ma şertên jiyanê ji prensbûnekî ku li Misirê bû, çêtir bûn? Ji bo çil

salan li çolê şivantiya pez bike, wî dev ji rêveberiya mirovan berda! Ji bo şivantiyê demeke pir dirêj e! Piştre ji bo gelê Xweda ji destê fîrewn xelas bike, di pêvajoyeke bi stres û dirêj re derbas bû. Weke ku ev hemû ne zêdî serê wî bin, îcara aniha jî wî xwe di çadirê de, di nav beyebaneke hişk û bi zehmetiyên mezin de dît. Bi ser de jî, gelê ku rêberiya wan dikir, gelekî serhişk û ne li hev hatî bû ku tu carî ji rêberiya wî razî nedibûn.

Di nava van hemûyan de Xweda teklîfeke wisa dide Mûsa ku wê stres û alozîyê bi awayekî mezin kêm bike. Ji Mûsa re dibêje ku gel bide hev û bibe welatê ku soza wî jê re hatiye dayîn. Ji bo rêberiya wan bike û neteweyên dijmin ji wan dûr bixe, ferîşteyeke bijarte peywirdar dike. REB tîne bîra Mûsa ku cihê ew ê biçinê wê welatekî dewlemend û berdar be lê di dawiyê de wisa dibêje: “Ez ê bi we re neyêm” (Derketin 33:3).

Bisekinin û aniha li tiştên ku Mûsa û gel her roj dijiyan, bifikirin. Ew ne xwediyê tu cureyên jiyanê bûn; li derdora wan ne geliyên xweş, ne çem, ne daristan, ne axa berdar, ne bexçeyê fêkiyan û ne jî merg hebûn ji bo çêrandina heywanan. Demeke dirêj tu kesî ji wan serê xwe bi aveke germ neşûştibû, di nav nivînekî rehet de ranezabû, kincên paqij li xwe nekiribûn û kêfa kirîna tiştekî ji bazarê nekiribûn. Menuya wan pir ji rêzê bû: Fêkî û sebzeyên taze nebûn, goştê masî û dewaran tunebû, şîranî tunebû; tenê nanê “man” hebû yê ku her sibê li erdê xuya dibû ku li ser vî nanî ecîna fistiqan, rîçal an jî hûrikên din tunebûn.

Koletiya li Misirê xedar bû lê gera li beyebana hişk jî ji vê ne çêtir bû, her du şert û merc jî bi awayên cuda pir dijwar bûn. Lêbelê li beyebanê hêviyeke Îsraîliyan hebû: Welatekî dewlemend, berdar û xweş ê ku ew xwediyê wî ne. Çend nifş in ku li benda pêkhatina vê bûn!

Hûn xeyal dikin ku hûn gotinên Xweda yên bêhempa dibihîzin gelo? Bêguman Mûsa wê bipejirîne, bi lez wê ji çiyê dakeve û vê nûçeya mezin bide mezin û rîhspiyên gel. Gel wê vê yekê pîroz bike, wê careke din weke rêberê mezin pesnê wî bidin û her kes bi kêfxweşî wê ber bi welatê sozdayî ve bikeve rê. Lêbelê guhdariya bersiva Mûsa ya ji bo teklîfa Xweda bikin:

> “Heke hizûra te neyê, me ji vir dernexe!” (Derketin 33:15)

Weke bi bîrxistinekê, cîhê ku wî digot “ji vir” kuderê bû? Cîhê

tengavî, stres û zehmetiyan bû. Mûsa; ji bo kesên ronî nebûne, bersiveke ecêb û heta bêje bi aqil mirov tênagihije da wan. Di esasê xwe de wî got: "Eger ku pêwîst be ez di navbera hizûra Te û bereketên Te de hilbijartinekê bikim, ez hizûra Te hildibijêrim!" Çima? Gava kesek li holê tunebe hûn dikarin derbarê wî de bibin xwedî agahî lê hûn nikarin pê re nêzîk û samîmî bin. Xelata ku Mûsa dixwest ev bû.

Hûn dikarin bipirsin bê çima Xweda ji vê gotina ku Mûsa kir, razî bû. Mûsa bi dilê Xweda dizanibû. Li vê bifikirin: Gelo we tu carî ji kesekî ku hûn jê hez dikin re derfeteke wisa pêşniyar kir ku tenê ji bo wî/wê bi kêr tê an jî kêfê jê bistîne lê wî an jî wê hişt ku hûn matmayî bimînin û wisa bersiv da û got: "Na, li şûna ku ez bêyî te kêfê jê bistînim, ez dixwazim bi te re bim" Bersiveke wisa kêm e, bi bandor e û heybet e.

Mûsa ji Xweda ditirsiya ji ber vê tiştê ji bo Xweda girîng bû, her tim ji bo wî jî berî her tiştî bû. Ew xwediyê dilê Xweda û lewma xwediyê pêbaweriya Wî bû. Lê gelê ku rêberiya wan dikir, xwedî dilekî cuda bû. Em wisa dixwînin:

> "Wî riyên xwe bi Mûsa,
> Karên xwe bi kurên Îsraêlê da zanîn." (Zebûr 103:7)

Xweda weke ku ji Brahîm re kir, kesayetiya xwe ji Mûsa re jî eşkere kir. Di "Wergera Nûçeya Xweş" a Pirtûka Pîroz de tê gotin ku Xweda planên xwe ji Mûsa re eşkere kirine. Bi gotineke din, razên Wî yên taybet ji Mûsa re hatine gotin lê ji Îsraîliyan re nehatin gotin. Îsraîliyan Xweda tenê li gorî bersivdana duayên wan, ango bi kirinên Wî nas kirin.

Îro çend bawermend Xweda tenê bi duayên xwe yên hatine bersivandin nas dikin? Têkiliya wan a bi Wî re ne jidil û nêzîk e, bêtir ji bo bi *kêrbûnê* ye. Bi gotinên Wî dizanin lê bi dilê Wî nizanin. Ji bo wan Nivîsên Pîroz tenê weke qaîdeyan û çîrokên dîrokî xuya dikin an jî ji bo çavkaniya îlhamê bi kar tînin. Ya hîn xerabtir, li şûna ku rastiyên guhêrbar ên jiyanê yên ku dilê Wî nas bikin û derdixînin holê, gotinê ji bo destûrdana reftarên neqanûnî xwar û maro dikin.

Hem Mûsa hem jî Îsraîlî rast bûn, ji Brahîm û Lût ne cuda bûn. Lêbelê tenê yên ku ji Xweda ditirsin xwedî maf in ku dilê Wî -karakterê

Wî, raz û planên Wî- bizanibin. Xweda çima ne li gelê xwe lê baweriya xwe li Mûsa anî? Ji ber ku Xweda dizanibû ku Mûsa wê her dem li şûna rêya ku li ber çavê wî herî baş xuya dibe, wê bide dû dilê Xweda û Wî hilbijêre -ev tirsa pîroz e.

Gava Îsraîlî ji Misrê derketin û golikê zêrîn çêkirin, Xweda bi hêrs wisa got:

> "Niha bihêle, bila hêrsa min li dijî wan rabe ku ez wan biqedînim. Paşê ezê te bikim miletekî mezin." (Derketin 32:10)

Careke din, ji bo ku Mûsa bike neteweyekî mezin pêşniyareke bêhempa lê tê kirin. Tiştekî mirov jê bawer nake, ecêb e! Mûsa çawa bersiv da vê? Careke din ne ji bo xwe ji bo tiştê ku ji bo Xweda herî baş bû hilbijart. Wî bi wêrekiyeke mezin ev pêşniyar red kir û rûmeta Xweda ya li ser Misrê û hemû dinyayê bi bîra Wî xist; dikarîbû bigota ku wê yên din bibêjin ku Xweda li hemberî gelê xwe ne dilsoz bû. Axaftin ewqasî germ bibû ku Mûsa bi eşkereyî got: "Fikra xwe biguhere û wê xerabiyê bi gelê xwe neke" (Derketin 32:12). Gava Xweda bi hêrs bû, wêrekiya Mûsa hebû ku jê re bibêje ramana xwe biguherîne! Heta ku hûn ji Xweda netirsin û bi vî awayî dilê Wî nas nekin û qenciya Wî nexwazin, ev tişt pêk nayê.

Ji ber vê yekê Xweda ji Mûsa bawer kir lê çawa ku her yek ji wan xelas kiribû jî, ji gelê xwe bawer nekir. Gelê xwe ji pençeyên bihêz ên Misrê bi awayekî bihêz xelas kir lê dilê xwe bi wan re parve nekir. Gelo ev şertê dostaniyê ji bo zarokên Xweda yên di serdema Peymana Nû de jî derbasdar e? Em ê di beşa bê de bibînin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Her tişt ji aliyê Bavê min ve ji min re hat dayîn. Ji bilî Bav tu kes Kur nas nake û ji bilî Kur û yên ku Kur dixwaze Bav bi wan bide eşkerekirin, tu kes jî Bav nas nake." (Metta 11:27)

**Ramana sereke:** Xweda bibêje "ez ji te bawer dikim" ev pesnê herî mezin e ku mirov ji Xweda bibihîze. Avakirina bingeha baweriyê ji bo mirov dostaniyê bi Xweda re çêbike, mecbûrî ye. Ev bi kesên ku ji Reb ditirsin re peyda dibe.

**Ramana kûr:** Mûsa ji Xweda ditirsiya, dilê Wî nas dikir û Xweda jê bawer dikir. Îsa ji tirsa Reb zewq distend, Wî dilê Bavê xwe nas dikir û her tişt emanetî destê Wî kiribûn. Têkiliya di navbera van de çi ye? Gava em ji tirsa pîroz zewqê bistînin wê çi bibe?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, ez dixwazim ku Tu ji min bawer bikî. Ji bo wan demên ku min îteata Te nekir, min soza xwe negirt û ji ber ku min daxwazên Te û tişta ji bo Te baş min di ser daxwazên xwe re negirtin, ez ji Te rîca dikim min bibexşîne. Ez hildibijêrim ku vê biguherînim û ji bo ku ez karibim di jiyana xwe de vê guhertinê bikim, ez dixwazim Tu dilê min bi tirsa pîroz tije bikî. Bi navê Îsa ez dixwazim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez hildibijêrim, bibim yekî ku Rebê min Îsayê Mesîh karibe pê bawer be.

“ÇAXÊ KU EW DI RÊ DE BI ME RE DIPEYIVÎ Û NIVÎSARÊN PÎROZ JI ME RE ŞÎROVE DIKIRIN, MA GOTINÊN WÎ AGIR BI DILÊ ME NEDIXISTIN?”

– LÛQA 24:32

# 35| HÛN DOSTÊN MIN IN

Jiyana Brahîm û Mûsa mînak in, bê ka ji bo mirov têkeve nav têkiliyeke dostaniyê ya bi Xweda re çi hewce ye. REB ji bo Mûsa got: "Di tevahiya mala min de dilsoz e" (Hejmartin 12:7). Xweda îlan kir ku di nav wî nifşî de û di nav gelê xwe de tu kesê din tune ye ku bêtir jê bawer bike. Çi îfadeyeke ecêb e!

Îsa ev pîvan guhert gelo? Gelo bi her kesê ku jê bawer dikir re têkiliyeke dostaniyê ava kir? Bersiva kurt "na" ye lêbelê werin em vê mijarê bi îfadeyeke Yûhenna ya di destpêka xizmeta Îsa de li ser bisekinin:

> "Îcar dema ku Îsa di Cejna Derbasbûnê de li Orşelîmê bû, gelekan ew nîşanên ku wî dikirin dîtin û bawerî bi navê wî anîn. Lê Îsa bawerî li wan nedianî. Çimkî wî bi xwe bi hemû mirovan dizanibû." (Yûhenna 2:23-24)

Peyva Grekî ya ji bo "bawerî"yê peyveke balkêş e û weke "di asta

bawerî û ewlebûneke tam de ya baweriyê- pê ewlebûn, jê bawerkirinê de" tê pênasekirin. Balkêş e ku vê baweriyê ji aliyê Îsa ve bersiv nedîtiye. Her çiqasî mirovan di asta bawerî û ewlebûneke tam de ji Wî bawer kiribin jî, Wî baweriya xwe bi wan nedianî. Wî dizanibû ku gelek mirov ne ewledar in. Wî ji wan hez kir û xizmeta wan kir lê ew di asta dostaniyê de negirtin. Ew baweriya ku Xweda dabû Mûsa, ji aliyê Îsa (Xwedayê ku di bedenê de xuya bûye) ve ji bo kesên ku ji Wî bawer dikirin, nehat dayîn.

Em ber bi Şîva Dawî ve herin. Di xizmeta Wî ya sê salên perî vê de, piraniya kesên ku jê bawer dikirin ne ewledar bûn; gelek kesan bi dizî, ji dûr ve an jî tenê gava ji bo wan bi kêr dihat, Ew dişopandin. Gelek xwendekaran terka Wî kir û Yehûda îxanet li Wî kir. Ev, li ser mijara bê çima Îsa bersiv nedaye ewlebûnê, hîn bêtir fikir nade gelo?

Li ser şîvê, Îsa aniha bi kesên ku herî pir nêzî Wî ne, rûniştiye. Bi sipasdarî û hezkirinê wisa dibêje: "Hûn ew in, yên ku di ceribandinên min de bi min re ragirtine" (Lûqa 22:28). Di esasê xwe de bawerî bi wan hatibû. Petrûs wê êvarê wê pirsgirêkeke mezin bijiya lê wê tobe bikira û bi dilekî dilsoztir vegeriya û haya Îsa ji vê hebû.

Yehûda ji bo îxaneta xwe pêk bîne veqetiyabû û Îsa ji bo yanzdeh kesên mayî dibêje: "Êdî ez ji we re nabêjim ‹xulam›" (Yûhenna 15:15). Gotina ku Îsa dibêje "êdî" tê wateya ku ev zilam demekê weke xulam dihatin dîtin. Ev ne wehyek e, tenê jêfêhmkirineke hêsan e. Pawlos vê prensîbê wisa diyar dike:

> "Lê ez vê jî dibêjim: Her çiqas ku wêris xwediyê her tiştî be jî, heta ku zarok e ferqa wî ji yê xulam tune." (Galatî 4:1)

Her çiqasî ku em mîrasdarên qraltiya Xweda ne jî, divê em bipirsin bê çima Xweda me di asta xulamekî de dibîne. Bersiv: Ji bo parastina me! Ew naxwaze tiştên hatin serê Hananya û Safîrayê bên serê me jî, Ew tu carî ji vê zewqê nastîne.

Di salên 1980'yî de ez û Lisa, em di nava du xizmetên gerdûnî de xebitîn ku yek xwedî 450 û ya din xwedî 150 xebatkaran bû. Di her duyan de jî em bûn şahidê pirsgirêkên rêberiyê ku ne li gorî dilê me bû ev rewş û gava me xizmeta xwe ava kir, di mijara rêberiya xebatkaran

de me berê çerxê da aliyê din. Hin raman baş bûn lê hinek jê jî ne baş bûn. Yek ji paradîgmayên ku me da destpêkirin ev bû: “Ez ê bibim hevalê herî baş ê her xebatkarî.” Jixwe we ferq kiriye ku ev raman çiqasî ramaneke eletewş e.

Xebatkarê me yê pêşî ciwanekî bi navê Justin bû. Min ew kir hevalê xwe yê herî baş, me bi hev re bi basketbolê lîst, me vîdyo temaşe kirin, me gelek caran bi hev re xwarin xwar û me hemû çalakiyên din yên ku hevalên herî baş bi hev re dikin, me kirin. Di destpêkê de her tişt bêhempa bû. Lêbelê piştî salekê ez mecbûr mam ku hinek serrastkirinên biçûk di wî de bikim. Li hemberî maseya min rûnişt û ez bi awayekî nerm û xweş pê re wisa peyivîm: “Justin, gava tu bi min re di rêwîtiyê de yî, divê tu bi kesên ku tên ser maseya me ya çavkaniyan re nerm bî. Ji kerema xwe re bi wan re bibişire û bi wan re têkiliyê deyne ji ber ku ew li cem Xweda pir bi qîmet in.”

Tiştên piştî vê qewimîn ez matmayî hiştim. Tiliya xwe li min rakir û ez bi her cure reftarên xelet sûcdar kirim. Tiştên ku qaşo min xelet kirine yek bi yek rêz kirin. Min di dilê xwe de got: “Na yaw, ma ez van tiştan dikim?” Lê piştî çend deqîqeyan min fêhm kir ku ew bi çavên rexnegir li min dinêre. Ez sekinîm û min ji Giyanê Pîroz pirsî bê divê ez çi bikim. Bi dengekî nerm got: “Wî ji xizmetê derxîne.”

Min hişt ku Justin her tiştê di dilê xwe de bibêje, piştre min got: “Justin, divê ez te ji nav tîma me derxînim.”

Ew pir hêrs bû û bi xezeb ji mala me derket. Di cîh de çavên min tije hêsir bûn, ji ber ku min qîmet dida wî. Ji nişka ve Giyanê Pîroz wisa bi min re kire pistepist: “Ew ê vegere û ji berê bêtir wê dilsoztir bibe.”

Sê meh şûnde Justin telefonî min kir. Ji min re wisa got: “Xweda bi eşkereyî bi min re axivî û erza min şkerand. Ez ji bo lêborînê li te digerim. Min ji bîr kir bê Xweda ez di jiyana te û Lisayê de li kuderê bi cîh kirime û hûn her du jî di jiyana min de li kuderê bi cîh kirine, min di ber çavan re derbas kir. Ez bi we re weke kesên jirêzê tevgeriyam -ne weke rêberan ez nêzî we bûm. Ez pir lêborîna xwe dixwazim.”

Min jî di cîh de bersiv dayê: “Justin, ez te dibexşînim.” Piştî axaftinên lihevhatî, min jê pirsî bê ew ê vegere ser karê xwe bi me re dîsa bixebite yan na. Bi kêfxweşî qebûl kir û di vê mijarê de careke din tu pirsgirêka me çênebû.

Ez aniha xwedî hişmendiyeke cuda me. Ez razên di dilê xwe de bi tu xebatkarî re parve nakim heta ku ez piştrast nebim ku ew di meqamê xizmetkarîyê de bi cîh bûne. Ez vê ne ji bo ku ji endamên tîma xwe dûr bim an jî ne ji bo ku li hemberî wan bêhest im, dikim; ez ji bo parastina wan dikim. Ez naxwazim tiştê hat serê Justin, bê serê wan jî. Lêbelê gava ez dibînim ku xebatkarek di pozîsyona me de baş bi cîh bûye û şûnde, ez wî weke hevalekî nêzî xwe dikim. Hin endamên tîma me, hevalên min yên herî nêz in.

Di esasê xwe de Reb ji me re wisa dibêje: “Heta ku di jiyana we de tirsa Reb baş bi cîh nebe, ji bo hûn zanibin bê Ez kî me, her çiqasî hûn mîrasdar, kur an jî qîza qraltiya min bin jî, ez mecbûr im we di asta xizmetkarîyê de bihêlim. Ev ji bo parastina we ye, ji bo ku hûn bi darizandina weke ya Hananya û Safîrayê re rûbirû nemînin.”

Îsa ji van zilaman re dibêje:

> “Êdî ez ji we re nabêjim ‹xulam›; çimkî xulam nizane ku axayê wî çi dike. Ez ji we re dibêjim ‹dostên min›; çimkî her tiştên ku min ji Bavê xwe bihîstin, min bi we dan zanîn.” (Yûhenna 15:15)

Di rastiya xwe de Îsa wisa dibêje: “Heta niha min agahiyên nixumandî nedan we -planên min, şîretên min ên veşartî an jî cîhên taybet yên dilê xwe, min bi we re parve nekirin. Lê aniha weke Mûsa û Brahîm, ez dikarim ji we jî bawer bikim.” Ji ber vê yekê Îsa ji me hemûyan re wisa dibêje:

> “Eger hûn tiştên ku min li we emir kirin bînin cih, hûn dostên min in.” (Yûhenna 15:14)

Em îlahiyan dibêjin, wazan dikin û weke tiştekî jirêzê behsa dostaniya xwe û Îsa dikin, heta hinek wisa pê re diaxivin tu dibêjî qey Ew hevalê wan e. Lêbelê em kêm caran gotina Wî bi tamî fêhm dikin. Îfadeya “eger hûn bikin” şertek e, her çiqasî em jê bawer bikin jî, ev ne tiştekî otomatîk e. Naxwe şertê dostaniyê çi ye?

“Eger hûn tiştên ku min li we emir kirin bînin cîh, hûn dostên min in.”

Ha şert ev e: Tirsa Reb -lerizîna li ber Gotina Wî, her çiqasî bimantiq

neyê jî, hûn jê fêdeyê nebînin jî an jî bi êş be jî, îteata bilez û bêkêmasî ya fermanên Wî. Çawa ku Brahîm û Mûsa ji ber heyranî û hurmeta xwe ya li hemberî Xweda, weke dostên "Xwedayê ku Hêza Wî Têra Her Tiştî Dike" hatin pejirandin, aniha ji bo me jî rewş ne cuda ye. Gava ku dil û xwesteka Reb bibe pêşengiya me ya yekem, Ew jî dikare bi me bawer bibe û me bipejirîne nav têkiliyeke xwe ya dostaniyê. Çi rûmeteke mezin e ku mirov bibe dostê Afirînerê Gerdûnê, çi taybetmendiyeke mezin û çi rewşeke bi kelecan.

Berî ku ez gotinên xwe bi dawî bikim, destûrê bidin ez pirseke ku di aqlê min de çerx dibe bibersivînim: Ma Îsa fermanan dide me? Erê, tenê di Peymana Nû de ji pêncsed fermanî zêdetir ferman hene. Lê ev ne fermanên ji bo xelasiyê ne ji ber ku xelasî diyariyeke beramberiya wê tuneye. Ev bêtir ew ferman in ku Xweda mezin dikin û ji bo em bi tirsa pîroz re wan bînin cîh, ew ferman in ku em bi wan bihêz bibin. Gotinên dawî yên Îsa, yên berî çûna Wî wisa bûn: "Loma herin û hemû miletan bikin şagirtên min. …hemû tiştên ku min li we emir kirine, hînî wan bikin" (Metta 28:19-20).

Fêdeya herî mezin a tirsa pîroz, qebûlkirina nav têkiliya dostaniya bi Îsa re ye. Di beşa bê de em ê li ser fêdeyên din yên tirsa pîroz bisekinin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Eger hûn tiştên ku min li we emir kirin bînin cih, hûn dostên min in." (Yûhenna 15:14)

**Ramana sereke:** Em nikarin baweriya Îsa tenê bi bawerîpêanîna ji Wî bi dest bixin. Dostaniya Wî, ji bo kesên ku ji Reb ditirsin hatiye veqetandin.

**Ramana kûr:** Her çiqasî bimantiq neyê jî, her çiqasî xuya bike ku tu berjewendiyeke wê ya kesane tune ye û bi êş be jî, gelo hêja ye ku mirov bilez û bi temamî îteatê ji Îsa re bike? Ma fêdeya dostaniya Wî hêjayî vê yekê ye?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, ez ji her tiştî bêtir dixwazim ku bibim yek ji dostên Te yê herî nêzîk. Ez naxwazim Te ji dûr ve nas bikim, ez dixwazim nêzî Te bim. Ez tirsa Reb hildibijêrim. Ez dixwazim bêşert û merc îteata Te bikim, bi hemû dil, giyan, beden û hêza xwe ji Te hez bikim û weke Te, ji mirovan bi rastî hez bikim. Ez vê bi navê Îsa dixwazim, amîn.

**Daxuyanî:** Ez hildibijêrim ku bibim dostê Îsa! Ji her tiştê ku Ew li min ferman dike, ez ê îteatê jê re bikim.

# FÊDEYÊN XEZÎNEYÊ

**HEFTEYA ŞEŞAN**

“RIYA LINGÊ XWE

RAST BIKE KU HEMÛ RIYÊN

TE EWLE BIN.”

– ŞÎRETÊN SILÊMAN 4:26

# 36| BICÎHANÎNA SOZÊN WÎ

Niha werin em bala xwe bidin ser fêdeyên bêhejmar ên tirsa pîroz. Jixwe em li ser hinekan ji wan sekinîn ku ya herî mezin nêzîkahîya bi Xweda re ye. Ji bo çareseriyê em berdewam bikin: “Tu wê vedişêrî ji bo yên ku ji te ditirsin, Li pêş çavê her kesî, Li yên ku xwe dispêrin te, tu dikî qenciyan” (Zebûr 31:19).

Berî ku em dest bi vê nîqaşa bi kelecan bikin, girîng e ku em xeletfêhmkirinekê eşkere bikin. Gelek caran mirov li şûna ku bihêlin Nivîsên Pîroz şikil bide tecrubeyên wan, ew Nivîsên Pîroz di nav tecrubeyên xwe û yên kesên din de şirove dikin. Di esasê xwe de, sozên Xweda weke senaryoyên “lêxe an jî pê ve xijiqî” tên dîtin û ev raman serdest e: “Eger Xweda ji bo min vê bixwaze, ev bêbempa ye. Lê eger nexwaze, Ew serdest e û divê ez vê qebûl bikim.” Ev raman Xweda wisa nîşan dide ku mirov dibêje qey Ew di navbera zarokên xwe de li aliyekî disekine ku ev ne rast e. Ev rewş dikare di dilê mirov de bibe sedema kîneke veşartî û ya ku mirov nayîne ziman li hemberî Reb.

Lê çîroka rast cuda ye, gelek caran divê em ji bo tiştên ku Xweda

dibêje li ber xwe bidin. Ji bo ravekirina vê rastiyê em ê serî li Nivîsên Pîroz bidin. Werin em li sozeke Pirtûka Pîroz binêrin ku pir kes wê weke tiştekî otomatîk qebûl dikin. Xweda ji Brahîm re wisa got: "Wê ziriyeta te bi Îshaq bê naskirin" (Destpêk 21:12). Ev gotina Xweda, bi sozên din re, soza xwedayî zelal kir: Brahîm wê bibe bavê neteweyekê û Mesîhê ku di pêşerojê wê bê, wê ji nifşê Îshaq derkeve.

Em vê yekê di hişê xwe de bigirin û em ji keçika ku pê re zewiciye bê çawa Xweda ew hilbijartiye dest pê bikin û werin em bibînin bê nifşê Îshaq çawa dest pê kiriye. Xizmetkarê Brahîm, ji bo ji Îshaq re jinekê bibîne diçe welatê efendiyê xwe. Piştî rêwîtiyeke dirêj, li ser bîra ku jin avê jê dikişînin disekine û dua dike ku Xweda nîşanekê pêş wî bike: Keçika ku bêyî jê bê pirsîn avê dide deh deweyên wî, ew keçik e ya ku Xweda "ji bo Îshaq hilbijartiye" (Destpêk 24:14). Li vir bisekinin, deveyek piştî meşa bêyebanî dikare di nava panzdeh deqîqeyan de 120 heta 200 lître av vexwe. Îcar li deh deveyan bifikirin, ev av ji ava ku wê keçikek bi dilê xwe bikişîne pir zêdetir e. Divê duaya wî bi awayekî mucîzewî bihata bersivandin û Rebekayê daxwaza wî bi awayekî bêhempa dianî cîh! Tu guman têxe tune bû ku ew ji aliyê xwedayî ve hatibû hilbijartin ku bibe jina Îshaq.

Piştî ku xizmetkar bi Rebekayê re vedigere malê, Îshaq û Rebeka dizewicin. Lê li ber pêkhatina sozê astengek mezin heye: Zarok ji Rebekayê re çênabin! Gelo Xweda xeletiyek kiriye? Ma Wî nizanîbû ku ew bi hemil nabe? Soz wê çawa bihata cîh? Xweda çima ew hilbijart? Divê Îshaq û Rebeka çi bikin? Divê ew li benda roja ku malzaroka Rebekayê bi awayekî mucîzewî şîn bibe, bisekinin?

Dema em li bersiva xwe bigerin, ji bo nîşaneya pêşî werin em li Brahîm binihêrin. Ew zilamekî mêr yên duayan e. Ew kes e ku li hemberî Xweda sekinî û ji bo xatirê deh kesên rastdar daxwaz kir ku Sodom û Gomora neyê hilweşandin. Em ji Nivîsên Pîroz dizanin ku wî kurê xwe jî hîn kiribû ku heman tiştî bike (Destpêk 18:19). Bi vê zanînê em wisa dixwînin:

> "Ew li Beriya Paranê rûnişt û diya wî ji welatê Misrê jinek jê re anî." (Destpêk 21:21)

Dîsa, eger sozeke Xweda hebûya ku bêyî tu mudaxaleya mirovan wê

teqez pêk bihata, wê ev ew tişt bûya ku şiyana Rebekayê zarok bianiya. Lê rewş ne wisa bû. Ji bo pêkhatina soza Xweda, divê Îshaq çalakiyek pir taybet bikira. Divê li ber Xweda bigeriya û jê lava bikira. Ferhenga Îbranî dibêje: “Wateya bingehîn a vê peyvê lavakirina li ber Reb e.” Ango ev ne duayeke jirêzê bû, daxwazeke bi eşq bû ku bersiva “na”yê nedipejirand. Duayeke wisa bû ku Xweda pê razî dibû. Wisa tê gotin:

“Duaya yê rast, hêzdar û bi bandûr e.” (Aqûb 5:16)

Yaqûbê Şandî diyar dike ku ev dua duayeke bi bandor an jî ya jidil û can e. Mînaka Îlyas dide ya ji bo baranê dua kiribû. Îlyas heft caran serê xwe xistiye nav çokên xwe û bi arezû dua kirine û herft caran xizmetkarê xwe şandiye ji bo çavdêriya ewrên baranê bê hatine an na. Baweriya wî red kir û heta soza Xweda li ser rûyê erdê pêk nehat, dev jê berneda (Padîşah I, 18:41-45). Îshaq bi xwesteka Xweda dizanibû û ji bo ku ev li ser rûyê erdê pêk were, bi dil û can qîriya. Heman tişt ji bo hemû bawermendan jî derbasdar e gelo? Ji me re wisa tê gotin:

“Peyva te, ya Xudan, Her û her dimîne li ezman.” (Zebûr 119:89)

Gotina Xweda li ezmanan disekine. Ne tesaduf e ku behsa erdê nayê kirin, tenê behsa ezmanan tê kirin. Çima? Nivîskarê Zebûrê wisa dibêje: “Ezman, ezmanên Xudan in, Belê wî erd dane mirovan” (Zebûr 115:16). Reb xwediyê erd û ezmana ye (Korîntî I, 10:26) lê ser rûyê erdê ji bo demekê bi “kirê” daye mirovahiyê.

Gava em nû zewicîbûn, min û Lisa me daîreyek bi kirê girtibû. Em ne xwediyê wê bûn lê ji bo ku em tê de bijîn û bikin mala xwe, di bin kontrola me de bû. Xwediyên malê, ji bo dest bidin mobîlyayên me bê em ê çawa bi cîh bikin, em ê wan çawa dekore bikin an jî ji bo ku ji xwe re bikin kar bê em ê çawa bijîn û çawa bikin, nedihatin nav daîreyê. Lêbelê gava me alîkarî dixwest, me ji xwediyê malê re digot û alîkariya me dikir.

Ramana ku Xweda xwediyê dinyayê ye lê ew bi kirê daye mirovan jî nîzameke wisa ye. Ev yek, rave dike bê çima Xweda nehat nav baxçeyê û fêkî ji destê Adem negirt. Wî desthilatdariya li ser rûyê erdê daye mirovahiyê (Destpêk 1:26-28). Bi vê têgihiştinê re, divê em bipirsin bê

Gotina Wî li ser rûyê erdê çawa bi cîh dibe. Ya ji me re tê gotin ev e: Her gotin “divê bi şahidiya du an jî sê şahidan bê piştrastkirin” (Korîntî II, 13:1). Û di Îşaya de Xweda wisa radigihîne:

> “Wê peyva ji devê min derdikeve jî wisa be.
> Wê vala nezivire ba min,
> Lê wê daxwaza min pêk bîne
> Û di karê ku min dayê de bi ser bikeve.” (Îşaya 55:11)

Balkêş e ku di her du ayetan de jî têgeha “dev û axaftin”ê derdikeve pêş. Devê Xweda xwesteka Wî tîne ziman, lêbelê ji bo pêkanîna vê ya li ser rûyê erdê, divê mirovekî ku li ser rûyê erdê rayedarî jê re hatibe dayîn, vê bi devê xwe bibêje. Di esasê xwe de em dixwazin ku Ew were ser rûyê erdê û alîkariyê bike. Bi vî awayî soza Wî weke ezmanan, li ser rûyê erdê jî bi cîh dibe. Eger bi hêsanî mirov bibêje, heta ku em nexwazin xwesteka Wî bê cîh, Ew ê bi zorê nekeve nav “dinyaya me ya bi kirê.”

Xweda soza xwe ji Brahîm re got. Hûn dikarin bînin ber çavên xwe ku Îshaq wisa lava dike: “Waa Xwedayê Bavê min, Te soz da ku wê ji min neteweyek derkeve û wê qewmê min bê pîrozkirin. Ez ji Te dixwazim ku Tu malzaroka jina min şîn bike ji bo ku zarokan bîne. Amîn.” Encam: Xwesteka Xweda pêk hat. Niha werin em li mînaka xwe ya herî mezin li Îsa binêrin:

> “Îsa di jiyana xwe ya li ser erdê de bi gazî û hawar, bi hêstirên çavan dua û lavan pêşkêşî wî kir, ku dikarî ew ji mirinê xilas bikira û ji ber xwedêtirsiya xwe hatibû bihîstin.” (Îbranî 5:7)

Dîsa em rastî peyva “lavan” tên lê vê carê bi îfadeya “tirsa Xweda” re dibe yek. Mifteyeke din jî tê dayîn. Ji bilî baweriyeke ku heta soza Xweda li ser rûyê erdê xuya bibe diaxive, ji bo pêkanîna sozên Xweda yên ku ji gelê xwe re daye, tirsa Reb jî hewce ye. Bala xwe bidinê ku Xweda duayên Îsa “bihîstine.” Duakirin tiştek e lê bihîstin tiştekî din e. Duayên ku nayên bihîstin hene gelo? Belê teqez hene. Yaqûb wisa dinivîse: “Hûn dixwazin û nastînin, çimkî hûn bi niyeta xerab dixwazin, da ku hûn ji bo kêfên xwe bimezêxin” (Aqûb 4:3). Dîsa, divê

em li armancên xwe binêrin û tirsa Reb armanc û arezûyên me di bin kontrolê de dihêle.

Gava em ji Xweda bitirsin, em dikarin bi wêrekiyê dua bikin û îlan bikin ku sozên Xweda weke li ezmanan wê li ser rûyê erdê jî pêk werin. Gelo sedema ku Pawlosê Şandî di dawiya jiyana xwe de gotiye "Têkoşîna mezin a di riya îmanê de bidomîne" (Tîmotêyos I, 6:12) dibe ku ev be? Ev têkoşînek e û em bi îmanê bi bereketa jiyana herheyî ve dizeliqin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Ew, daxwaza yên ku jê ditirsin tîne cih, Feryada wan dibihîze û wan rizgar dike." (Zebûr 145:19)

**Ramana sereke:** Gelek caran mirov li şûna ku bihêlin Nivîsên Pîroz şikil bide tecrubeyên wan, ew Nivîsên Pîroz di nav tecrubeyên xwe û yên kesên din de şirove dikin.

**Ramana kûr:** Gelo min destûr da ku ji ber tecrubeyên min an jî yên kesên din, baweriyên min ji tiştên di Nivîsên Pîroz de hatine ragihandin dûr bikevin? Di jiyana min de, di malbata min de û di derdora min de sozên ku hîn pêk nehatine hene? Gelo ez razî bûm ku li derveyî van sozên xwedayî bijîm? Gelo ez dixwazim bi lava û qêrînan tê bikoşim ji bo ku ev soz li ser dinyayê pêk werin?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, bi navê Îsa; ji ber zexeliya min a giyanî, ji ber ku ez bi sozên pêknehatî razî bûm û ji ber ku ez ji bo tiştên di Gotina Te de hatine ragihandin tênekoşiyam, min bibexşîne. Li şûna ku ez ji bo pêkhatina xwesteka Te tê bikoşim, ji bo rêya xwe diyar bikim min li tecrubeyên xwe nêrî. Ez tobe dikim û hildibijêrim ku bi baweriyê têkoşîna mezin bidomînim; weke li ezmanan, ez dua dikim ku li ser vê dinyayê jî xwesteka Te pêk were. Amîn.

**Daxuyanî:** Ez hildibijêrim ku têkoşîna mezin a baweriyê bidomînim, xwe bi peyva jiyana herheyî ve bigirim û bibînim ku di qada bandora min de xwesteka Xweda pêk tê.

KESÊN KU JI XWEDA DITIRSIN, BÊTIRS BI JIYANÊ RE DIKEVIN RÛYÊ HEV. LÊ YÊN KU JI XWEDA NATIRSIN, DIKEVIN WÊ REWŞÊ KU JI HER TIŞTÎ DITIRSIN.

– RICHARD HALVERSON

# 37| TIRSA KU HEMÛ TIRSAN TUNE DIKE

Em di dinyayeke tije êş û tirs de dijîn. Ya rastî, Îsa ji me re dibêje ku ev rewş wê hîn xerabtir bibe. Daxuyaniya Wî ya derbarê tiştên ku wê li pêşerojê bibin pir bi heybet e: “Ew mirovên ku li benda wan tiştên ku bên serê dinyayê disekinin, ji tirsan dilê wan wê bibihûre” (Lûqa 21:26). Ev tirs û fikar; hêvî, rehetî û hizûrê ji cîhê wan radikin û li şûna wan tenê bêhizûrî, dilgiranî û ezabeke ku her dem berdewam dike li dû xwe dihêlin. Nexwe panzehîr çi ye?

> “Gava destê wî bi hêzdarî li ser min bû, Xudan ji min re wiha got. Wî ez hişyar kirim ku ez di riya vî gelî de nemeşim û got: “Her tiştê ku ev gel jê re dibêje fen û fût e, Hûn nebêjin fen û fût e. Ji ya ku ew jê ditirsin netirsin Û jê nebizdin. “Tenê Xudanê Karîndar pîroz bikin. Ji wî bitirsin, bila xofa we ew be. Wê bibe Pîrozgeh, Lê wê ji bo herdu malên Îsraêl, Bibe kevirekî terpilînê û latekî likumandinê. Ji bo şêniyên Orşelîmê, Wê bibe xefik û dafik.” (Îşaya 8:11-14)

Tirsa pîroz hemû tirs û fikarên din ji holê radike ji ber ku ew bi soza Xweda ya ji bo ewlehiyê tên parastin. Ji bo kêliyekê bisekinin û li ser vê rastiyê bifikirin. Bifikirin ku hemû hêzên çekdar ên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji bo parastina we hatine peywirdarkirin. Her general ji leşkerên di bin xwe re radigihîne ku hûn pêşengiya yekem ya ewlehiyê ne û ferman dide ku ji bo ewlehiya we her tişt bê kirin. Hemû çekên pêşketî, hûn li kuderê bimînin ferq nake û hûn herin kuderê dîsa ferq nake, tenê ji bo parastina we hatine veqetandin. Ev tiştekî wisa ye ku mirov hema bêje nikare xeyal jî bike lê eger hûn wisa bijiyana, ez bawer im we yê xwe di ewlehiyê de hîs bikira. Dîsa jî ev rewşa xeyalî, li cem gotina Xwedayê Mezin ku dibêje ya “Ez ê we biparêzim” pir kêm û qels dimîne. Dive em şaş nemînin ji ber tiştên ji me re hatine gotin:

> “Çi mezin e qenciya te ya Xudan, Tu wê vedişêrî ji bo yên ku ji te ditirsin, Li pêş çavê her kesî, Li yên ku xwe dispêrin te, tu dikî qenciyan. Li hember fenên mirovan, Bi aştiya xwe ya parastinê, tu wan dinixêmî; Li hember zimandirêjiyan, Tu wan vedişêrî li holikê.” (Zebûr 31:19-20)

Xwespartina hizûra Xweda û sozên comerd ên li dijî kesên dixwazin zerarê bidin me, ne ji bo her kesî ne, tenê ji bo kesên ji Xweda ditirsin in. Ez û Lisa bi salan li ber derew, îftira, sûcdarî û gefên li dijî me hatin kirin, me sebir kir. Min bi dostên xwe re henek dikir û digot: “Di Google’ê de li navên negerin, hûn ê di nav meqaleyên sûcdarkirinê de bifetisin.” Lêbelê me ji xwe re kir armanc ku em bêdeng bimînin û xwe neparêzin. Li şûna vê, me ev êrîş sipartin “Ew” ê ku em bi rastî jî jê ditirsin û em bûn şahid ku Wî her tim em parastin. Helbet ev ne hêsan bû, ew demên ku carinan ji bo nîşana ku min sûcdarî an jî gefxwarin sipartine Xweda, min destên xwe ber bi Xweda ve radikirin, çêbûn. Ez diqîriyam: “Bavo, ez vê dispêrim destên Te, ez rîca dikim ji Te me biparêze.” Wî tu carî em bi tenê nehiştin.

Em bûn şahid ku tirsa pîroz gelek kesên em wan nas dikin parastiye. Berî çend salan min li welatê xwe ji bo 1500 kesî axaftinek kir. Di dema xizmetê de gelek kesan tirsên xwe bi tirsa Reb re guherand. Êvara din, dayikek û keça xwe ku di nav kesên ji tirsên xwe azad bûne de cîh

digirtin, gava piştî kirîn û firotinê vegeriyan malê, sê mêrên bi kêr û çekan ketin pêşiya wan. Mêran bi tundî ferman da wan ku zû bikin û têkevin hundur. Bi îhtîmaleke mezin niyeta wan dizî, tecawiz û belkî jî kuştina her du jinan bû.

Dayikê piştre ev tişt gotin: "Eger ne ji şeva berê bûya, ez ê ji tirsan li wê derê sar bisekiniyama, zimanê min wê bihata girêdan û min ê daxwazên wan bi cîh bianiyana. Lêbelê, min bi ya fermana wan nekir em neketin hundur û min di cîh de bi dengekî bilind dua kirin ji bo Îsa me xelas bike. Her ku ez diqîriyam; bawerî, hêz û hizûra min zêde dibû. Zilam lerizîn û bi dengekî teqez ferman dan min ku ez dev ji duayan berdim û bisekinim. Herî dawî sebra wan qediya û bi hêrs qîriyan: 'bisekin, bes e, dev ji wê duayê berde!'" Ew her sê mêr ne li bendê bûn ku wê bi jinên wisa li xwe bawer re, rast bên. Serê êrîşkaran tevlihev bibû û gava wan bala xwe dabû dayikê, keçik fersendê lê tîne û dikeve hundur ji bo alîkariyê bixwaze. Gava mêran fêhm kir ku keçik winda bûye, di cîh de reviyan.

Heman salê li Houston, Teksasê, gava min xizmet dida jineke din a ciwan tirsên xwe bi tirsa pîroz re guhertin. Hefteyek piştî xizmetê, gava ji navendeke kirîn û firotinê derket û li erebeya xwe siwar bû, bi mêrekî ku xwe li qoltixê paş veşartibû û kêr di destê wî de bû, rast hat. Mêr bi awayek tund jê re got ku erebeyê bajo. Jinik li şûna ku bikeve nav tirsê, ji Îsa lava kirin û nesekinî. Bi saetan erebe ajotin, mêrik jê xwest ku bêdeng bibe lê wê red kir. Mêrik herî dawî got: "Erebeyê bikişîne qiraxa rê!" Gava jinikê erebe sekinand, mêrik deriyê paş vekir û reviya.

Demekê qralê Aramê, ji Pêxember Elîşa hêrs bûbû û ji bo wî bigirin leşker şandibûn. Pêşî xizmetkarê Elîşa; leşker, hesp û erebeyên şer dîtin û ji tirsa nema zanîbû wê çi bike.

> "Wî got: "Netirse, çimkî yên me, ji yên wan zêdetir in." Êlîşa lava kir û got: "Ya Xudan, lava dikim, çavên wî veke ku bibîne." Gava Xudan çavên xulam vekirin, wî dît ku çiyayên derdora Êlîşa ji hespên agirî û erebeyên agirî dagirtî bûye." (Padîşah II, 6:16-17)

Îsa gelek caran bi girseyên ku dixwestin Wî biricimînin re rast hat. Dîsa carekê girseyê hewl da ku Wî di zinarekî de werbikin lê di her bûyera ku jiyana Wî dixist xetereyê de, Îsa bêyî ku zerarê bibîne ji wir

xelas dibû (Binêrin: Lûqa 4:29, Yûhenna 8:59; 10:39).

Dema ku Xweda destûrê dide ku kesekî jê ditirse êşê bikişîne, tenê ew dem e ku gava mezinbûna Xweda ji ezmanan de tê xwarê ev pêk tê. Lêbelê di van rewşan de jî ewledariyek heye ku tirsa pîroz ava dike û pê re tirsa mirovan ji holê radike. Li sê ciwanên Îbranî bifikirin ku birin hizûra Qralê Babîlê Nebûkadnessar, qralê li dinyayê herî bi hêz. Qral pûtekî mezin çêkiribû û ferman dabû ku her gava dengê muzîkê bê, divê her kes li ber wî pûtî serî daxe.

Ev her sê ciwan ji Xweda ditirsiyan û red kirin ku îteata fermana qral bikin û têkevin gunehan. Ew birin hizûra Nebûxadnessar hêrsbûyî ku dikarîbû di cîh de wan biavêje nav firina sorkirî. Gelo ev ciwan tirsiyabûn? Ez bersivê ji we re dihêlim, ji ber ku bala xwe bidin bê wan ji qralê hêrsbûyî re çi gotine: "Me bavêjin tenûra sincirî jî, Xwedayê ku em jê re xizmetê dikin dikare me ji wê tenûrê rizgar bike. Ya padîşah! Wê me ji destê te jî rizgar bike. Ew me rizgar neke jî, tu bizanibe ku ya padîşah, emê ji îlahên te re xulamiyê nekin û neperizin peykerê zêrîn ê ku te daniye" (Daniyêl 3:17-18).

Çi baweriyeke mezin! Her çiqasî Nivîsên Pîroz bibêjin ku "Nebûxadnessar gelek li Şadrak, Mêşak û Eved-Nego hêrs bû û mirûzê wî tirş bû" (Daniyêl 3:19), ew sakîn û bêtirs sekinîn. Ev zilam ji Xweda ditirsiyan û wan dizanibûn ku Xweda wê wan an bi mirinê an jî bi jiyanê xelas bike. Ew avêtin firnê lê bêyî ku zerarê bibînin, heta bêhna tixanê jî neket wan û derketin derve. Encam mirin be jî ew bêtirs man.

Pawlosê Şandî jî, ku mirovekî pir ji Xweda ditirsiya, xwedî heman helwestê bû. Gava bi îhtîmala îdamê re rû bi rû ma, wisa gotibû: "Hêvî û bendewariya min ev e ku ez di tu tiştî de neyêm şermkirin, lê bi cesareteke temam, eger bi mirina min an jî bi jiyana min be, wek hergav niha jî Mesîh wê bi bedena min bê bilindkirin. Çimkî ji bo min jiyan Mesîh e û mirin jî qezenc e" (Filîpî 1:20-21). Mirina ji bo mezinkirina Mesîh çima "qezenc" e an jî weke ku tê gotin çima "hîn baştir e?" Ji ber ku tirsa Xweda, ku destpêka zanyariyê ye, me derbarê vê jiyanê û jiyana bê de bi nêrîneke rast ronî dike. Ji ber vê Îsa wisa dibêje: "Ji wan ên ku bedenê dikujin, lê nikarin can bikujin netirsin. Hê bêtir ji wî bitirsin ê ku dikare hem can û hem bedenê di dojehê de

helak bike” (Metta 10:28).

Berî bi salan, gava min weke waîzekî gerok xizmet dikir, di kêliyeke ku ez ji bo zarokên xwe ditirsiyam de Xweda bi min re axivî. Ji min re wisa got: “John, her tirsa ku di jiyana te de ye, tenê tiştê ku te nexistiye bin çarmîxê pênase dike; ew qada jiyana te hîn di destê te de ye.” Wê êvarê min tobe kir, min kurên xwe bi temamî sipartin Xweda û min careke din ji bo ewlehiya wan endîşe nekir. Tirsa Reb, me ber bi Îsa ve dibe ku em her tiştî bispêrin Wî. Gava em vê bikin, em wî tiştê ku her kes pir dixwaze lê nikare xwe bigihîne wî tiştî, bi dest dixin: Xweşî, bawerî û azadiya ji tirsê.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Tirsa Xudan jiyanê tîne, Pê mirov şevê têr diborîne, xerabî jî nayê serê wî.” (Şîretên Silêman 19:23)

**Ramana sereke:** Her tirsa bêfêde ya ku di jiyana we de ye, tenê tişta ku we nexistiye bin çarmîxê pênase dike; ew qada jiyanê hîn jî di destê we de ye.

**Ramana kûr:** Di kîjan qadên jiyana xwe de ez bi tirsê re dikoşim? Tenduristiya min, rewşa min a madî, zewaca min, zarokên min, karê min, dibistana min, redkirin, zilma ji ber baweriya xwe an jî aliyekî din ê jiyana min gelo? Min ev qada jiyana xwe bi temamî sipart desthilatdariya Îsa gelo, an ez hîn wê di destê xwe de digirim?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, ji ber ku min (kîjan be diyar bikin) nespart Te, min bibexşîne. Gava ez difikirim, eşkere ye ku ez lê xwedî derketime. Bêbaweriya min, kêmasiya tirsa pîroz a di vê qada jiyana min de derxist holê. Ez tobe dikim û her qada jiyana xwe dispêrim desthilatdariya Îsa. Amîn.

**Daxuyanî:** Îsa Rebê min e. Ez xwedîderketina li hemû qadên jiyana xwe didim Wî. Bila her tiştê di jiyana min de li gorî dilê Wî be.

“DI ZAROKATIYÊ DE RIYA RAST HÎN BIKE, GAVA PÎR BIBE EW JÊ AVERÊ NABE.”

– ŞÎRETÊN SILÊMAN 22:6

# 38| MÎRAS

Fêdeyeke din a mezin a tirsa pîroz heye: Mîrasa xwedayî. Destûrê bidin ez hinek pirsan ji we bipirsim. Gava hûn li Benedict Arnold difikirin, çi tê bîra we? Tişta pêşî tê bîra we “xayîn” e? Baş e ma Rahîbe Teresa? Gelo “Mîsyonerên Xêrxwaziyê” tên bîra we? Naxwe Adolf Hitler? Hûn weke “dîktatorê zalim ê ku bi mîlyonan mirov kuştine” lê difikirin? Îcar Albert Einstein? Ew kesê ku “teoriya îzafiyetê” kifş kiriye tê bîra we?

Ramanên ku tên bîra we, bi îhtîmaleke mezin mîrasên van kesên navdar in. Rastî ev e ku em hemû mîrasan ava dikin. Nexwe pirsa ku divê em ji xwe bipirsin ev e: Wê bi qencî behsa mîrasa min bikin an bi nebaşî? Lê pirsa mezintir ev e ku wê mîrasa me li ezmanan çawa bê xuyakirin. Wê ji bo avakirina qraltiya herheyî ya Xweda weke tiştekî bikêr wê bê dîtin an jî wê weke tiştekî bizarar bê dîtin?

Li gorî ferhenga Merriam-Webster, pênaseyeke mîrasê wisa ye: “Tiştekî ku ji aliyê kal û bavan ve ji mirov re dimîne an jî ji wan tê girtin.” Gelo tirsa Xweda bandoreke çawa li nifşên me yên pêşerojê dike? Ji bo destpêkê em vegerin bavê baweriyê Brahîm. Li çiyê, gava ku ferîşte nehişt Brahîm kurê xwe Îshaq bike qurban, REB ji wî re wisa got:

> "Ezê te gelekî pîroz û bereket bikim. Ezê ziriyeta te bi qasî stêrên ezmanan, sêlaka ber deryayê zêde bikim. Wê ziriyeta te bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin milk." (Destpêk 22:17)

Min ev gotin bi salan dixwendin û min meraq dikir bê çima "pîrozkirin û zêdebûn" li dû hev tên. Di dawiyê de min nema xwe girt û min xwe gîhand xaxemekî jê pirsî û wî jî wisa bersiv da: "Li gorî baweriya Cihûyan, di pîrozkirinê de meseleya bingehîn zêdebûn e. Xweda gava Brahîm pîroz dike, soz dide ku Ew ê ziriyeta wî zêde bike. Bi gotineke din, dibêje ku Ew ê pîrozkirina Brahîm bi rêya zarokên wî berdewam bike."

Tirsa pîroz fêdeyê dide ziriyeta me: "Ew ê bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin mal û milk." Ev tiştekî bêhempa û bîstek din em ê nîqaş bikiny lê pêşî rastiyeke din a di daxuyaniya haham de heye ku divê em li ser bisekinin. Tirsa pîroz bi rêya ziriyeta me, pîrozkirina me berdewam dike û ev rewş ne tenê di vê jiyanê de, heta hetayê derbasdar e.

Jiyana me ya ebedî, di bin bandora ziriyeta me ya xwedî nirxa mezin û bibandor ku hem di paşeroja me de û hem jî di jiyana me ya dinyaye din de, dimîne. Ji bo zelalkirinê ez mînakekê bidim. Archie Manning, 10 sezonan li ser hev di Lîga Futbolê ya Neteweyî ya New Orleans Saints'ê de weke futbolîstekî avakarê lîstikê cîh girt. Tîma di bin rêberiya wî de tenê salekê ji nav koma xwe derket asta din, di neh sezonên din de têk çûn. Dibe ku ew ji aliyê girseyan ve weke lîstikvanekî hatibe ji bîrkirin jî lêbelê her du kurên wî, Peyton û Eli, bi giştî çar şampiyonî bi dest xistin û bûn "Super Bowl û MVP'yên" (lîstikvanên herî hêja) lîgê. Aniha bi saya kurên wî, bêtir kes "Archie" nas dikin û ji ber vê jî di cîhana werzîşê de xwedî rûmet û bandoreke mezintir e. Di herheyînê de gelek kes, wê bi saya îteata kesên ji ziriyeta xwe ya di avakirina qraltiyê de, xwedî rûmet û bandoreke mezintir bin. Brahîm mînakeke bêhempa ye; bandora wî ya ebedî bi saya zarokên wî -Ûsiv, Samûêl, Dawid, Daniyêl, Îşaya û bêguman Îsa- wê zêde bibe. Hîn aniha jî mîrasa wî berdewam dike. Ev bereket ji bo her kesê ku ji Xweda ditirse derbasdar e; ew ê "heta hetayê werin bi bîranîn" û "hêz û hirmeta wan wê zêde bibe" (Zebûr 112:6, 9). Gelek kes difikirin ku li ezmanan wê her tişt ji nû ve dest pê bike. Lêbelê ev ne rast e. Weke bawermendan me jixwe dest bi şikildana dîroka herheyî kiriye ji ber ku "rastdariya me heta hetayê ye" (Zebûr 112:9).

Îcar aniha werin em vegerin ser soza Xweda ya ku dibêje wê ziriyeta me bi ser bikeve: “Ew ê bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin mal û milk.” Eger em bi zimanekî moderntir bibêjin, ziriyeta me wê ji aliyê kesên ku Xweda biçûk dibînin ve neyê binpêkirin; berevajî vê, wê bibin rêberên serketî û kesên xwedî bandor (Dubarekirina Şerîetê 28:13). Dibe hûn bifikirin ku ev tenê ji bo Brahîm û ziriyeta wî derbasdar e. Lê ji me re wisa tê gotin: “… da ku bi Mesîh Îsa pîrozbûniya Birahîm bê ser miletan…” (Galatî 3:14). Ev nûçeyeke bêhempa ye!

> “Pesnê Xudan bidin! Xwezî bi wan ku ji Xudan ditirsin, Bi emrên wî gellek dilşa dibin! Wê nîjada wan li rûyê erdê hêzdar be, Wê nîjada rastan pîroz be.” (Zebûr 112:1-2)

Peyva “nifş” (di ayetê de weke nîjad derbas dibe) tê wateya “demeke dirêj” û nifşên me yên pêşerojê îfade dike. Meryem bi gotina “Û rehma wî nifş bi nifş li ser wan e, Yên ku ji wî ditirsin” (Lûqa 1:50) pesnê Reb daye. Wê ne tenê zarokên yên ji me bi serketî bin, ev soz wê hemû nifşên me jî di nava xwe de bihewîne. Mînaka vê ya bêhempa ya vê yekê, di jiyana du mêran de tê dîtin ku her du jî di destpêka sedsala hîjdehan de ji dayik bûne.

Yê yekem Max Jukes e. Di sala 1874’an de sosyologekî bi navê Richard Dugdale li eyaleta New Yorkê serdana sêzdeh girtîgehên li navçeyan dike. Wî şeş kes kifş kirin ku di bin çar paşnavên cuda de, girêdana wan a xwînê hebû. Pir meraq kir û vê rewşê hişt ku xwe nema bigire û wî dest bi lêkolîneke kûr a nifşê vê malbatê kir. Lêkolîna wî ew bir ber bi niştecîhekî Hollandî ve yê bi navê Max Jukes ku di navbera salên 1720 û 1740’î de ji dayik bibû. Piştî lêkolîneke hûr a bi salan, Dugdale 540 neviyên Jukes tespît kirin. Di nav wan de 76 sûcdarên mehkûmbûyî, 18 heb ji wan xwediyên malên fihûşê, 120 fahîşe û zêdetirî 200 kesên ku alîkariya dewletê distandin, hebûn. Bi kurtasî, zincîreke gunehan hebû ku di nav nifşan de belav bûbû û hiştibû ku tevgerên eletewş bikin û vê yekê bi nirxê pereyên îro bi mîlyonan dolar zirar dabû dewletê.

Îcar aniha werin em wî bi Jonathan Edwards re bidin ber hev ku di heman demê de ji dayik bûye. Ew rêberê hişyariyeke giyanî bû ku gelek pirtûk nivîsandibûn û ji bo Mizgîniyê bigihîne neteweyan îlham dabû gelek kesan. Di sala 1727’an de bi Sarah Pierpont re zewicî. Ev jin û mêr pir ji

Xweda ditirsiyan. Her şev berî razanê bi hev re Pirtûka Pîroz dixwendin û dua dikirin. Yazdeh zarokên wan çêbûn û Jonathan her roj ji bo her zarokekî xwe duaya pîrozkirinê dikir. Wî gotibû: "Divê her mal bibe dêreke biçûk."

1394 neviyên Jonathan û Sarah yên ku tên zanîn, soza ku Xweda daye kesên jê ditirsin nîşan didin -ew ê bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin mal û milk û zarokên wan wê li her derê bi ser bikevin. Di nav ziriyeta wan de; 13 rektorên kolej an jî zanîngehan, 65 profesorên kolej an jî zanîngehan, 3 senatorên Dewletên Yekbûyî, 30 dadger, 100 parêzer, 60 doktor, 75 efserên artêşê û deryayî, 100 wezîr û mîsyoner, 60 nivîskarên girîng û alîkarek serokê Dewletên Yekbûyî (Aaron Burr) hene. Yên ji ziriyeta wan derketine, qurişek jî zirar neda dewletê.

Gava çar kurên me biçûk bûn, tirsên ku di serê min de diçûn û dihatin li derdora van bûn: mirina wan ya zû, ji ber ku bavê wan ji bo salê zêdetirî 200 wazan bide di rêyan de ye gelo wê ji ber vê hêrs bibin an na, an jî ji bo ku Xweda ji bo vê xizmetê bang li min kiriye gelo wê ji Xweda bixeyidin an na. Êvarekê, li konferanseke pir dûrî mala xwe gava piştî min waz da, di cîh de min fêhm kir ku kêmasiya tirsa pîroz rê li ber min digire ku ez xwedî derketina li jiyana wan bispêrim Îsa. Min bi duayan lava kir: "Bavo, ev her çar kur êdî ne yên min in; ew êdî yên Îsa ne. Tu çi dixwazî Tu dikarî bi wan bikî lê Şeytan; tu nikarî dest wan bidî, tu carî!" Ji wê rojê ve ez tu carî ji bo jiyana wan netirsiyam.

Piştî demeke kurt, Xweda bi rêya Gotina xwe rastiyeke girîng ji min re eşkere kir. Pinehas, neviyê Harûnê Kahîn bû. Ew ji bo Xweda û gelê Îsraîl bi arezû bû. Tirsa wî ya pîroz a bi hêz, ew ber bi tiştê ku bawermendên din jê ditirsiyan ve bir; wî tişta rast bi wêrekî parast. Gava wî ev kir, Xweda wisa got: "Va ye ezê peymana xwe ya aştiyê bidim wî. Wê ji wî û ziriyeta wî re bibe peymana herheyî ya kahintiyê" (Hejmartin 25:12-13). Di esasê xwe de, ji ber tirsa pîroz a ku wî nîşan dabû, ji kesên ziriyeta wî re, soza têkiliyeke nêzîktir a bi Xweda re bû. Giyanê Pîroz, nîşanî min da ku parastina kurên me, bi îteata min û Lisayê ya bi dil û can a ji bo xwesteka Wî ve girêdayî ye.

Niha, piştî bi salan, ji her çar kurên me her yek jê herî kêm neh salan di "Messenger International" de xebitî. Dudu jê nivîskar in, hemû rêber in û ya herî girîng, hemû di nav tirsa pîroz a Xweda de dijîn. Mirov her tim ji me dipirsin bê me ji bo mezinkirina zarokên Xwedanas çi kiriye. Eger mirov

bi rastî bibêje, tu têkiliya vê bi zanebûna me re tune bû û gelek xeletiyên me yên ku weke dêûbav me kirin, bi cîldan pirtûk ji wan derdikevin. Lêbelê tişta ku me rast kir, jiyîna di nav asteke bilind a tirsa pîroz de bû.

Gava kurên me di dema xortaniya xwe de ji bo demeke kin ji rê derketin, ez û Lisa li ber Reb geriyan ji bo ku soza Wî di kurên me de pêk were û me di nav tirsa pîroz de jiyana xwe berdewam kir. Me baweriya xwe tu carî winda nekir û divê hûn jî winda nekin. Soza Xweda ya ji bo kesên weke we ku ji Reb ditirsin ev e; zarokên we wê "li ser rûyê erdê bibin xwedî hêz" (Zebûr 112:2).

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Zarokên te, wê wek şaxên zeytûnê li dora sifrê bicivin. Va ye, zilamê ku ditirse ji Xudan, Bi vî awayî tê pîrozkirin." (Zebûr 128:3-4)

**Ramana sereke:** Gava hûn di nav tirsa pîroz de bimînin, tiştekî girîng ji kesên ji ziriyeta we re tê ragihandin. Ew ê ne tenê bibin kesên bi bandor, di heman demê de hûn ê bi rêya wan pîrozkirina xwe berdewam bikin.

**Ramana kûr:** Ez zarokên xwe (an jî zarokên xwe yên peşerojê) çawa dibînim? Ji bo pêşeroja wan endîşe bi min re çêdibe gelo? Min ew bi temamî sipartin desthilatdariya Îsa? Ez li ber çavên wan di nava tirsa pîroz de dimeşim gelo? Gelo ez li gorî reftarên wan ên heyî an ez li gorî sozên ku Gotina Xweda dane; fêhm dikim, duayan dikim û diaxivim?

**Dua:** Xwedayê min ê delal, Tu di Gotina xwe de diyar dikî ku bi meşa di nav tirsa pîroz de, ez ê mîraseke mayînde mîsoger bikim. Ez baweriya xwe bi soza Te tînim ku wê zarokên min li ser rûyê erdê bi hêz bin, bi bandor bin û serketî bin û ez bawer dikim ku wê navê min û yê Te bi rûmet bikin. Ji bo pêkhatina van sozan, ez ê bi wêrekî duayên xwe berdewam bikim. Ez vê bi navê Îsa dixwazim, amîn.

**Daxuyanî:** Zarokên min li ser rûyê erdê bi hêz in, herin kuderê wê bi ser bikevin û wê bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin mal û milk.

DI PÊNASEKIRINA WAN HÊMANÊN KU ŞAREZAYIYA RASTÎN A MIROVAN PÊK TÎNIN DE GOTINÊN KU EM DIKARIN HERÎ BI RIHETÎ BIKAR BÎNIN EW IN KU TIRSA JI XWEDA BI EŞKEREYÎ TÎNIN ZIMAN IN.

– AUGUSTÎNÊ HÎPPOYÎ

# 39| TIŞTA HERÎ GIRÎNG

Mijara di vê beşê de ewqasî berfireh e ku mirov dikare tenê li ser vê mijarê pirtûkekê binivîse. Lê dîsa jî xwejêvedana ji vê, wê bike ku ev peyam kêm bimîne. Ji ber vê weke destpêkekê nêzî vê beşê bibin, ango nêzî vî aliyê girîng ê tirsa pîroz bibin.

Guh bidin van gotinên ku ji dilê Afirînerê me tên; gotinên jiyanê, gotinên heqîqetê, gotinên parastinê, gotinên ku wê ji roj, heyv û stêrkan wêdetir bimînin, gotinên ku ji vê axa ku em pê lê dikin qewîtir in:

“Xwezî bi wî mirovê ku şehrezahiyê dîbîne
Û fêmdariyê bidest dixe.
Ew ji cewheran hêjatir e,
Hemû tiştên tu dixwazî, weke wî nabin.”
(Şîretên Silêman 3:13, 15)

Di vê cîhanê de tiştekî ku bi qasî şarezayiya Xwedayî hêja be tune ye. Çiqasî tiştekî derasayî tuneye! Ji ber vê yekê ji me re, “Destpêka

şehrezayiyê ev e: Şehrezayiyê bi dest bixe! Her tiştê te jî here, fêmdariyê bi dest bixe" (Şîretên Silêman 4:7) û gava carekê bê dîtin, "Riyên wê riyên keremê ne, Hemû rêçikên wê yên aştiyê ne" (Şîretên Silêman 3:17) hatiye gotin.

Di her birbiryara ku em didin de divê em li şarezayiya Xweda bigerin. Ji ber ku ji me re wisa hatiye gotin: "Wê li ser serê xwe bigerîne, çimkî wê te bilind bike" (Şîretên Silêman 4:8). Çi sozek bêhempa ye. Di Îbranî de lêkera "serfirazkirin"ê weke "serbilindkirin, biqedrkirin û rûmetdarî" tê pênasekirin. Dema Xweda yekî serfiraz bike, tu kes û tu rewş nikare wî bêqîmet bike! Ji ber vê yekê, şarezayî rêya serfiraziya mayînde ye.

Şarezayî divê bê keşfkirin, veşartî ye lê ne dûrîdest e. Gava carekê hat dîtin, fêdeyên wê pir zêde ne. Îcar, em ê wê çawa bibînin?

> Bingeha şehrezayiyê tirsa REB e.
> (Zebûr 111:10; Şîretên Silêman 9:10)

Grîng e ku em li ser peyva Îbranî ya ji bo bingehê tê bikaranîn lêkolînê bikin. Heman peyv di ayeta ewil a Pirtûka Pîroz de derbas dibe: "Di serî de Xweda erd û ezman afirand." Ev peyv tê wateya "xala destpêkê." Tirsa pîroz xala destpêkê ya şarezayiyê ye. Li vê wisa bifikirin: Depoyekê bînin ber çavên xwe ku tijî ew zanyarî ne ku ji bo serkeftineke mayînde hewcedariya we pê heye. Lêbelê tenê deriyek û mifteyek vê depoyê heye: Tirsa pîroz. Îşaya wisa dinivîse: "Ew ewlehiya serdemên te ye, Rizgarî, şehrezayî û zanîn wê zêde bibe. Tirsa Xudan xezîneya gel e" (Îşaya 33:6).

Ya rast, ji xeynî tirsa ji Reb şarezayiyek mayînde tune ye. Tirsa pîroz çavkaniya şarezayiya mayînde ye lê fêdeya wê ji xala destpêkê wêdetir jî berdewam dike:

> "Tirsa Xudan kaniya jiyanê ye,
> Mirovan ji dafikên mirinê dûr dixe."
> (Şîretên Silêman 14:27)

Ez dixwazim bala we bikişînim ser du peyvên sereke: Kanî û dafik.

Di Îbranî de peyva “kanî” tê wateya “herikîn” an jî kaniyeke ku her tim diherike. Jiyana baş ne ji biryarên baş ên car bi car e; ew ji herikîna domdar a wan biryarên bi şarezayî têne dayîn ku fêkiyên mayînde didin, dertê holê.

Peyva duyemîn “dafik” e, tê wateya kemîn an jî xapê. Wateya herî rast a vê peyva Îbranî, xapa ku di xefika nêçîrvan de tê danîn e. Her nêçîrvanek baş dizane ku ji bo serkeftina xefikekê pêdiviya wî bi du tiştan heye. Divê xwe wisa veşêre ku heywan li wî nehese û xapek wisa hebe ku bikaribe heywanî ber bi diranên mirinê yên xefikê ve bikişine. Piştî ku peyvên sereke baş hatin fêhmkirin, li beşeke din a ku rastiyê hîn zelaltir dike binêrin:

> Tirsa REB şehrezayiyê fêr dike. (Şîretên Silêman 15:33)

Dema em rastiyên di van her du beşan de bigihînin hev, em dibînin ku tirsa pîroz kaniyek her tim herikbar e ku şarezayiya Xwedayi hîn dike. Ew şêwirmendek e ku qet ranazê an jî di xew re naçe lê di jiyanê de ji bo ku em biryarên şarezayî bidin her tim şîretan li me dike.

Dîroka mirovahiyê ya bi hezaran salan îspat kiriye ku dema em dûrî şarezayiya Xweda û bi serê xwe bimînin, em difikirin ku biryarên baş didin lê taliyê biryarên bi zirar didin. Sedema vê çi ye? Rêyên mirin û wêrankirinê bi heman awayê xefika nêçîrvanî veşartî û bi xap e. Tiştên ku baş, bi şarezayî, bikêr û bizewq xuya dikin, bi gelemperî bi xap in ku mirov ber bi tiştên xerab, dûrî şarezayiyê, bi zirar û xembar ve dikişînin. Tirsa Reb me bi dilsozî ji van xefikan dûr dixe û diparêze.

Eger hûn li civaka îroyîn binêrin, hûn ê mirovên navdar û jîr bibînin ku biryarên wan, ew kesên bandor lê kirine ber bi wêrankirinê ve birine. Di heman demê de yên din jî li hemberî bêaqiliya wan kor in e. Nivîsên Pîroz ji bo wan kesên ku tirsa pîroz red dikin dibêje ku “fikirîna wan bû pûçîtî û dilê wan ê fêmkor tarî bû. Wan digot: «Em zana ne», lê bêaqil derketin” (Romayî 1:21-22). Dema dil tarî dibe, dîtin jî tarî dibe; mimkin e ku mirov ji nişkê ve bikeve xefikên mirinê ên veşartî û bi xap.

Lêbelê berevajiyê vê jî rast e. Dema em tirsa pîroz bi dilsozî himbêz dikin, em dibin xwediyê şêwirmendekî şarezayiyê ê domdar; ev

şêwirmend şiyana biryarên mayînde û bikêr dide me. Haya me ji wan xefikên mirinê ku li benda me ne nebe jî, ev kanî me her tim ji ketina wan xefikan diparêze.

Em bi saya jiyana zilamekî ku peymana wî bi Xweda re tune ye lê ji Wî ditirse bi hûrbînî li vê rêgezê binêrin: Ev kes Qralê Gerarê Avîmelek bû. Wî jina Îbrahîm, Sara xistibû harema xwe. Piştî demekê kurt, Xweda şevêkê hat û ji wî re got: "Ji ber ku te ev jinik anî, tê bimirî. Çimkî ev jinik bi mêr e" (Destpêk 20:3).

Avîmelek wisa diqîre: "Ya Reb, Min ev bi dilekî pak û destên paqij kir" (Destpêk 20:4-5). Li vir peyva REB bi awayekî rasterast tê wateya Rebê min. Tirsa wî ya ji Xweda hem ji şêwaza bangkirina wî a Xweda û hem jî di bersiva ku dide de eşkere ye. Niha guh bidin ya ku Xweda jê re gotiye:

> "Xwedê di xewnê de jê re got: "Erê, ez dizanim te ev bi dilekî pak kir, loma jî min tu parastî ku tu li dijî min guneh nekî. Ji ber vê yekê min nehişt ku tu destê xwe bidî wê." (Destpêk 20:6)

Tirsa Reb şêwirmendekî veşartî bû ku haya Avîmelek jê tune bû û ew ji xefika mirinê diparast. Xefik veşartî bû ji ber Sara weke xwişka Îbrahîm hatibû pêşkêşkirin lê dîsa jî tirsa pîroz ew parast. Ev qralê pûtperest ku ne peyveke nivîskî ya Xweda di destê wî de hebû û ne jî peymaneke wî ya diyar bi Xweda re hebû, çawa bû ku ji ramana standina jina mêrekî din tirsiya û ricifî? Em bersiva vê di nivîsên Pawlos de dibînin: "Çimkî miletên ku Şerîeta wan tune, gava ji ber xwe tiştên ku Şerîet dixwaze dikin, bi ser ku Şerîeta wan tune jî, ew bi xwe ji bo xwe şerîet in. Ew nîşan didin ku daxwaza Şerîetê di dilê wan de nivîsî ye. Wijdana wan jî ji wan re şahidiyê dike, çimkî fikrên wan, an wan sûcdar dikin, an jî carna wan diparêzin" (Romayî 2:14-15).

Ji xeynî vê, ev qralê ne Cihû dema ji ramana standina jina zilamekî din ditirse û diricife, çawa dibe ku pastorekî bi tecrûbe an jî bawermendekî bi salan e di dêrê de ye, weke ku em her ku diçe bêtir şahidiyê dikin, bi jina zilamekî din re zînayê bike? Ev ne zanista rokêtê ye. Rêber an endamekî wisa yê dêrê, her çiqasî bi devê xwe îtîraf bike ku yê Îsa ye jî, di hundurê wî de tirsa ji Xweda nîne. Ji me re wisa tê gotin:

"Jina xerab ji mirinê tehltir e.
Ew jin ku dilê wê dafik,
Destên wê zincîr in.
Zilamê ku bi dilê Xwedê ye,
Ji wê direve û rizgar dibe,
Lê kesê gunehkar dikeve destê wê."
(Waiz 7:26)

Nivîsên Pîroz nabêjin ku tenê wê kesêm xerab bikevin xefikê, dibêjin yên ku ji ber kêmasiya tirsa pîroz nikaribin bi serkeftî bigihîjin armancê ango yên gunehkar wê bikevin xefikê. Ev kes dikare bibe yekî ku îdîa dike ew bixwe Xirîstiyan e. Yaqûb ji bo wan ên li baweriyê xwedî derketî wisa dinivîse: "Gunehkarno, destên xwe paqij bikin. Dudilîno, dilê xwe safî bikin" (Aqûb 4:8).

Doktrîna Mizgîniyê ya ku li Rojava serdest e, xweşiyeke sexte nîşanî me dide; ev xweşî me ji şarezayiya Xwedê cuda perwerde dike û bi awayekî sîstematîk tirsa ji Xweda ji dilê me radike. Ev doktrîn, çavkaniyeke şîretan a nexweş û xerab diafirîne ku wê hêza sînordar a me ji gunehan diparêze, ji holê radike. Lêbelê xweşiya rastîn bi tirsa pîroz re nîqaşan nake.

"Çimkî kerema Xwedê ya ku ji hemû mirovan re xilasiyê tîne, xuya bû û me perwerde dike ku em nepakiyê û xwestekên dinyayê red bikin û rast, sergiran û bi tirsa Xwedê li vê dinyayê bijîn" (Tîtos 2:11-12)

Em nikarin xweşiya rastîn a Xweda ji tirsa pîroz a Xweda cuda bikin. Her du jî di nav yekîtiyê de ne û her du jî her tim şîretê li me dikin ku em ji xefika mirinê dûr bisekinin.

Ev şewba ku tevgereke bê Xweda di nav wan mirovên îdîa dikin ku ew bi peymanê ve girêdayîne, ne tiştekî nû ye. Me di dîroka Îsraîl û dêrê de heman helwest dîtine lêbelê di van rojên dawî de ev weke ku Îsa gotibû "xapandin wê mohra xwe li vê demê bixe" zêdetir bûye. Windakirina tirsa pîroz dil û giyanê mirovan ji şîretên xerab re

diguncîne û her çiqasî weke rast xuya bikin jî, di esasê xwe de bêyî ku mirov pê bihesin wan ber bi guneh û mirinê ve dibe.

Hêza bêqanûniyê di civaka me de bi lez zêde dibe. Weke xêzikeke ku her diçe bi rengekî dijwar bilind dibe. Eger xweşiya sexte ya ku bi gelemperî tê qebûlkirin berdewam bike û tirsa pîroz ji dilê bawermendan derxîne, gelek kesên ku dibêjin em Xirîstiyan in wê li pey xapandina bêqanûnîyê winda bibin. Pêdiviya me bi vejîna tirsa pîroz heye, ji ber ku ev wê biberdewamî me biparêze ku em neyên xapandin. Her çiqasî mirov bi piranî hatibin xapandin jî, dilê me bi rastiyê re di heman astê de digire

Weke xezîneya xwe ya mezin li tirsa pîroz xwedî derkevin. Wê bi baldarî ji mîlyonan dolarên xwe, ji zêr û zîvên xwe yên herî giranbiha an jî ji mala xwe ya herî xweş zêdetir biparêzin. Em van mal û milkên xwe yên bi qîmet di bankayên di bin garantiya dewletê de, di kasayên kilîtkirî de an jî bi pergalên alarmê diparêzin lêbelê xezîneya me ya herî mezin tirsa ji Xweda ye. Ji ber vê yekê ji me re wisa hatiye gotin: “Ji her tiştî bêtir, dilê xwe biparêze, Çimkî kaniyên jiyanê jê diherikin” (Şîretên Silêman 4:23).

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Ma şehrezayî gazî nake? Ma fêmdarî dengê xwe bilind nake? Çimkî kesê min dibîne, jiyanê dibîne Û Xudan jê razî dibe. Lê kesê xwe ji min dûr dixe, Zorê li canê xwe dike. Hemû kesên ji min nefretê dikin, Ji mirinê hez dikin” (Şîretên Silêman 8:1, 35-36).

**Ramana sereke:** Weke şopînerê Mesîh, bi dest xistina şarezayiyê tişta herî girîng e ku em dikarin bikin. Tirsa Xweda çavkaniya şarezayiyê ye, me ji xefikên mirinê diparêze.

**Ramanên kûr:** Min xeta xwe ya sor kişandiye gelo? Ma min biryara xwe daye ku ez bi wê şarezayiya civakî ya li dijî Gotina Xweda ve

girêdayî nemînim? Ma ez amade me ku ji ber bawerî û guhdariya xwe ya ji bo Gotina Wî, zilmê bibînim? Di biryarên xwe yên rojane de ez ê çawa bi baldartir li şarezayiya Îsa bigerim?

**Dua:** Bavê me yê delal, bi navê Îsa, ez ji bo şarezayî û têgihiştina Te lava dikim. Ji kerema xwe guh û çavên min ji bo têgihîştina wan veke. Ez naxwazim wisa bêaqil bim ku bi ramanên xwe forsa şarezayiyê bikim. Ez ê şarezayiya Xwedanê xwe Îsayê Mesîh di ser her tiştê ku ev cîhan pêşkêş dike re bigirim û pê bawer bim. Eger ji ber bawerî an jî îteata xwe rastî zilmê werim jî ez îteatê hildibijêrim. Amîn.

**Daxuyanî:** Ez bi biryar im ku di her biryara ku didim de, li şarezayiya Rebê xwe Îsa bigerim.

# TIRSA XWEDA TAYBETMENDÎYA KESÊN NEFSBIÇÛK E

– AUGUSTÎN Ê JÎ HÎPPO

# 40| JIYANA SERFIRAZ

Di kûrahiya şarezayiya pirtûka Şîretên Silêman de du dilpakî hene ku ez ji wan re dibêjim “cêwiyên hêzê.” Ev her du dilpakî di Nivîsên Pîroz de dest bi dest dimeşin û piraniyê hevdu temam dikin. Di ayeta jêrîn de hatine pênasekirin:

“Xelata nefsbiçûkî û tirsa Xudan,
Jiyan, rûmet û dewlemendî ye.” (Şîretên Silêman 22:4)

Nefsbiçûkî û tirsa pîroz bi hev ve girêdayî ne. Çawa ku tu carî mirov nikare yekî bibîne ku ji Xweda bitirse lê ne nefsbiçûk be; her wisa kesê ku bi rastî nefsbiçûk be jî ne pêkan e ji Xweda netirse. Peyva “rastî” girîng e ji ber ku gelek şêweyên nefsbiçûkiya sexte hene. Em ê di beşa din de bi hûrgilî li ser vê bisekinin. Werin em bi kurtasî li sê sozên ku hatine rêzkirin binêrin: Dewlemendî, rûmet û jiyan. Peyva Îbranî ya ji bo “dewlemendiyê” “ōšer” e û weke “halxweşî, serwet” tê pênasekirin. Ev her cure dewlemendiya ku ji ax, mal û milk, heywan û ya ji malbatê tê, pênase dike. Wateya wê zelal e û ne sozeke yekcarî ye ku bi tirsa pîroz re girêdayiye. Nivîskarê Zebûrê jî wisa dinivîse:

“Pesnê Xudan bidin! Xwezî bi wan ku ji Xudan ditirsin,
Bi emrên wî gellek dilşa dibin!

> Wê mala wî di firehî û dewlemendiyê de be,
> Rastdariya wî her û her bimîne." (Zebûr 112:1, 3)

Li vir peyva dewlemendiyê dîsa di Îbranî de "ōšer" e. Ev rewş dibe sedema nîqaşekê. Li gor hizra hin kesan dewlemendî û xwedîbûna mal û milkan li dijî oldariyê ye. Li gel vê yekê, eger em ji bo xatirê kevneşopiyên xwe, rastiyên eşkere yên Nivîsên Pîroz ji holê rakin, ma ev bixwe nabe nîşana quretiyê? Ku ev quretî dijberê tirsa pîroz e.

Beriya salan, ez mecbûr mam ku bi vê rastiyê re rûbirû bimînim. Di salên pêşî yên xizmeta me de, ez û Lisa bûn şahidê hinek xizmetkarên wisa ku bi hînkirina mizgîniya xweşhaliyê berê mirovan didan dewlemendiya pûç û beredayî. Fêkiyên vê hişmendiyê wêranker bû û gelek mirov ber bi çavbirçîtiyê ve birin ku ev bixwe pûtperestî bû. Gelek kes ji bîr û baweriya rastîn dûr ketin û bi êşê re rûbirû man. Dema me ev encamên xemgîn dîtin, me weke bertek şaqûl ber bi aliyê din ve berda. Me her doktrîna ku behsa dewlemendî, mal û milk an jî xweşhaliyê dike, biçûk kir. Lê ev nêrîna me ya negihîştî, di dawiyê de bi destê Giyanê Pîroz hat serarast kirin. Em bi vê rastiyê re rûbirû man; kesê ku bi rastî ji Xweda ditirse, wê dewlemendiyê bi awayekî rast bi kar bîne û nakeve xefika çavbirçîtiyê.

Armanca sermiyan û dewlemendiyê çi ye? Ew amûrek e ji bo pîrozkirina kesên din. Dema ku ev nivîs hat nivîsandin, xizmeta me ji pastor û rêberên li 130 welatan re, bi 118 zimanan zêdetirî 53 mîlyon çavkanî (pirtûk û ders) pêşkêş kirine. Herhiwa, me bi navê MessengerX sepanek ava kir ku bi 122 zimanan li 230 welatan dikare bê daxistin; me ji bo bikaranîna wê tu pere nexwest. Mesrefa van projeyan bi dehan mîlyon dolar girt. Eger ew jin û mêrên ku piştgirî didin van xebatan, wisa bawer bikirana ku oldarî tê wateya "tunebûn an hejariyê" wê çi bibûya? Eger ew wisa bifikiriyana, me nikarîbû bi mîlyonan mirovên ku em gihîştine wan, di nav Xweda de bi hêz bikin.

Di navbera çavbirçîtiyê û xwedîbûna wê dewlemendiya ku bandorê li jiyanê dike de cudabûneke mezin heye. Kesên ku bi rastî ji Xweda ditirsin, vê cudabûnê dizanin û ji çavbirçîtiyê dûr dikevin. Di Peymana Nû de, piştî ku Îsa li çarmîxê hat xistin, em wisa dixwînin:

> "Gava ku bû êvar, mirovekî dewlemend ê ji Arîmetyayê hat. Navê

> wî Ûsiv bû û ew bi xwe jî şagirtê Îsa bû. Çû ba Pîlatos û cesedê Îsa jê xwest. Pîlatos jî emir kir ku bidin wî.” (Metta 27:57-58)

Yûsif dewlemend bû û Nivîsên Pîroz weke xwendekarê Îsa behsa wî dikin. Lêbelê îronî berdewam dike -piraniya şopînerên Îsa reviyabûn û xwe veşartibûn. Dîsa jî ev zilamê dewlemend, bi wê wêrekiya bi saya tirsa pîroz, xwe ji çavtirsandina rêberên Cihû û hêza Romayê neda paş, nêzî Pîlatos bû û termê Îsa xwest. Çi zilamekî wêrek bû!

Ji kerema xwe şaş fêhm nekin. Ma eger kesek hejar be, ev tê wê wateyê ku tirsa Xweda di dilê wî de nîne? Na! Di Nivîsên Pîroz de behsa gelek jin û mêrên ku dewlemendiya wan a madî tuneye tê kirin. Ma bi vê yekê oldariya wan kêmtir dibû? Bêguman na! Dewlemendiya rastîn ne bi pere an jî mal û milkan, bi şiyana me ya alîkarîkirina kesên din, tê pîvandin. Va ye, soza ku ji me re hatî dayîn ev e:

> “Ji Xudan bitirsin, ey hûn pîrozên wî,
> Çimkî kêmahiya wî çênabe, yê ku ditirse ji wî.
> Birçî û muhtac dibin, şêrên ciwan,
> Belê tu qencî, ji yên ku li Xudan digerin nayê dirixan.”
> (Zebûr 34:9-10)

Çi bi dua, çi bi xwarin, çi bi çavkaniyên darayî, çi bi hînkirin, çi bi perwerdekirina xwendekaran, çi bi mêvanperwerî an jî xizmetê be; ji bo qraltiyê daxwazeke Xwedayî ye bandorkirina li ser kesên din. Baş e ku gelek çavkaniyên me hebin ji bo ku em her tiştê ku ji bo mîsyona me ya Xwedayî hewce ye pêk bînin. Mirovên ku ji Xweda ditirsin vê dikin armanc û di vê pêvajoyê de dibînin ku ew bixwe jî hatine pîrozandin. Kesên qure, olperest û çavnebar, enerjiya xwe bi nîqaşkirina “çima divê bawermend xizan bin” û bi beralîkirina mirovan a ber bi baweriyên bêbingeh ên di Nivîsên Pîroz de xerc dikin.

Qral Silêman tirsa Xweda hînî gelê xwe kir û rêberî ji gelê xwe re kir. Di vê serdemê de em wisa dixwînin: “Di tevahiya jiyana Silêman de, ji Danê heta Beêr-Şevayê, Cihûda û Îsraêl li bin mêw û darhejîrên xwe, di ewlehiyê de rûniştin” (Padîşah I, 4:25). Ji xeynî vê em dixwînin ku hemû gel “dixwarin, vedixwarin û di nav şahiyê de bûn” (Padîşah I, 4:20). Bisekinin û li ser gotina “li bin mêw û darhejîrên xwe” bifikirin.

Li seranserê welêt tu kes ne di tengasiyê de bû, bêkarî an jî hejarî tune bû; her kes di nav firehiyê de bû! Tirsa Xweda, şarezayiyekê dide ku fêdeyên wê digihîje her kesê di bin bandora wê de; di vê rewşê de mijar hemû netewe ye. Eger di dilê hemû rêberên me de tirsa Xweda hebûya û li gorî vê bimeşiyana, wê çi bibûya?

Weke noteke dawî, ev soz ne sozek wisa ye ku em bi duayan ji bo bi dest xistina wê têbikoşin, weke Îshaq ji bo şînkirina malzaroka Rebekayê têkoşiyayî. Îsa vê sozê dide me: "Lê hûn berî her tiştî li Padîşahiya Xwedê û li rastdariya wî bigerin û ev hemû tişt jî wê ji we re bên dayîn" (Metta 6:33).

Werin em li soza din, ango li ser "rûmetê" bisekinin. Di ayeta me ya di destpêkê de peyva Îbranî ya ku ji bo "rûmetê" hatî bikaranîn "kābôd" e; weke "rûmet, mezinahî, îhtîşam û heyîn"ê tê pênasekirin. Me di beşeke berê de dîtibû ku gava Mûsa dixwest mezinahiya Xweda bibîne, ev peyv bi kar anîbû. Ev ne ji unvan an jî ji meqamekê tê, bêtir giraniyek û desthilatdariyeke ku bi karekter ve girêdayî ye. Bi vî awayî, em fêdeyeke din a balkêş a tirsa pîroz kifş dikin: Rêzdarî. We vediguherîne mirovekî biheysiyet û birûmet. Şîretên Silêman ne pirtûka tenê ye ku behsa vê fêdeyê dike; nivîskarê Zebûrê jî ji bo kesên ku ji Xweda ditirsin heman peyva Îbranî bi kar tîne: "Hêz û rêzdariya Wî zêde dibe" (Zebûr 112:9).

Li wê jinika dilpak a ku di pirtûka Şîretên Silêman de behsa wê dibe, bihizirin. Xwedî taybetmendiyên bêhempa ne. Pêbawer e, şareza ye, bi xîret e, jêhatî ye, bihêz e, biberekêt e, dewlemend e, dilovan e, alîkariya hewcedaran dike û bêçareyan diparêze. Taybetmendiyeke din a bêhempa ya ku carinan nayê dîtin û bi mijara me re têkildar e ev e: "Hêz û qedir cilên wê ne" (Şîretên Silêman 31:25). Bi gotineke din, ew rûmetê weke kincekî ne ji yê me cuda li xwe dike; her kes dikare vê bibîne û vê ferq bike. Îcar dilpakiya wê ya dawî çi ye?

> "Delalî derew e, bedewî pûç e,
> Lê jina ji Xudan ditirse hêjayî pesnê ye." (Şîretên Silêman 31:30)

Ev hurmeta ji bo REB ye, ango tirsa pîroz e! Va ye rastiya sosret: ew esalet û rûmeta ku ji bo vê jinikê hatî gotin, ji bo her jin û mêrê ku ji Xweda ditirse derbasdar e. Di nav salên rêwitiya xwe de, min

gelek rêber û mirovên girîng nas kirin. Gelek ji wan bandoreke mezin li ser civakê kirin lê tişta ku ji her tiştê ku wan ava kiriye bêtir bala min kişandî, dîtina jinek an jî mêrekî biesil bû. Di hebûna wan de giraniyek heye. Ew ronahî, hezkirin, rûmet û esaletê belav dikin. Zarokên wan ji wan hez dikin û rûmetê didin wan; hevkar û dostên wan jî ji nêzîkbûna wan kêfxweş dibin. Balkêş e ku piraniya wan ne mirovên navûdeng in. Nexwe kartvîzîta wan çi ye? Ew ji Xweda ditirsin!

Soza sêyemîn a di ayeta me ya di destpêkê de "jiyan" an jî "temenê dirêj" e. Ev soz ji nêz ve bi nefsbiçûkiya rastîn re girêdayî ye. Em ê di beşa din de vê sozê berfirehtir bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Li ber dergehan, li ber devê bajêr, Li ber deriyên bajêr diqîre û dibêje: Kesên ji min hez dikin, ez ji wan hez dikim, Kesên ji dil û can li min digerin, min dibînin. Rûmet û dewlemendî, Serweta domdar û fireh bi min re ye." (Şîretên Silêman 8:3, 17-18)

**Ramana sereke:** Tirsa pîroz û nefsbiçûkî; soza dewlemendî, rûmet û jiyaneke dirêj dide. Dewlemendî ne bi pere an jî mal û milkan, bi şiyana me ya alîkarîkirina kesên din re tê pîvandin. Rêzdarî û rûmet, ne bi unvan an jî meqama me ve girêdayiye lê bi karekterê me ve girêdayî ye.

**Ramanên kûr:** Gelo ez bi nêrîneke tenduristî li dewlemendiyê dinêrim? Ma ez ji ber bêewlehî, tirs an jî çavbirçîtiyê daxwaza dewlemendiyê dikim? Ma ji bo min çêtir e ku ez bikevim pey tirsa pîroz û ez baweriya xwe bi soza firehiyê bînim ku bikaribim bandorê li kesên din bikim? Li xwe kirina rûmetê a weke kincekî ji bo min tê çi wateyê?

**Dua:** Bavê min ê delal, gava ez li pey nefsbiçûkî û tirsa pîroz diçim, wê soza xwe ya ji bo ez peywira xwe ya xizmeta ji bo kesên din pêk bînim; dewlemendiyê, rûmetê û temenê dirêj bidî min bi cîh bîne. Bi navê Îsa, amîn.

**Daxuyanî:** Bavê min ê Asîmanî soz daye min ku gava ez bidim dû tirsa pîroz û nefsbiçûkiya rastîn, wê dewlemendî, rûmet û temenê dirêj bide min.

“MIROVÊ FÊMBAR RIYA XWE RAST DIKE”

– ŞÎRETÊN SILÊMAN 15:21

# 41| XELASKIRINA BI SERFIRAZÎ

Heta ku em jiyana baş û xelaskirina bi serfirazî daxil nekin, em nikarin bi temamî li mijarê binêrin. Me di beşa 18an de hinekî behsa mijara temenê dirêj kiribû lê di vê beşê de em ê berfirehtir bikin û binêrin ka grîngiya rola tirsa Xweda û nefsbiçûkî bi çi awayî ye.

> "Xelata nefsbiçûkî û tirsa Xudan,
> Jiyan, rûmet û dewlemendî ye." (Şîretên Silêman 22:4)

Fêdeyeke mezin a tirsa pîroz jî zêdebûna rojan e. Em wisa dixwînin: "Tirsa Xudan emrê mirovan dirêj dike" (Şîretên Silêman 10:27). Çi sozeke mezin! Û ev ne bûyereke yekcarî ye ji ber ku dîsa şarezayiya tirsa pîroz dibêje ku "wê rojên te zêde bin, Wê salên emrê te bêtir bin" (Şîretên Silêman 9:11). Ji me re bi tenê ne soza jiyana salên dirêj tê dayîn, di heman demê de ji me re soza jiyana rojên bi xêr û bereketir jî hatiye dayîn.

Piştrastkirineke din jî ji "Deh Fermanan" yek jê ye. Tirsa Xweda îlhamê dide me ku bêyî şert û merc em rêzdariyê nîşanî dê bavê xwe bidin. Û dema em vê yekê dikin ji me re soza "Da ku qencî li te bibe û

li ser erdê emrê te dirêj be" (Efesî 6:3) tê dayîn. Careke din, em bi tenê ne temenê dirêj bi dest dixin, em di heman demê de berhemdariyê jî dibînin. Ev sozên wisa ne ku em dikarin bi duayan bixwazin.

Li gel vê yekê divê em vê jî bînin ziman ku bêyî kalîteya jiyanê kêfa ku mirov ji salên zêdebûyî distîne kêm dibe. Silêman di salên xwe yên reşbîn de wisa nivîsîbû: "Roja mirinê ji roja bûyînê çêtir e" (Waiz 7:1). Diyar e ku dema wî ev peyv nivîsandine, wî tu tam ji jiyanê nedigirt. Nexwe bi çi awayî jiyan bi kalîte dibe? Nefsbiçûkiya rastîn û tirsa ji Xweda.

Berî bi salan, dema min dua dikirin min ev ayet xwendibû:

"Di sala mirina Ûzziyayê Padîşah de, min dît ku
Reb li ser textekî berz û bilind rûniştibû.
Daw û delingê xiftanê wî Perestgeh tije dikir." (Îşaya 6:1)

Îşaya, Reb bi hemû mezinahiya xwe dît. Weke ku di beşeke berê de jî hat nîqaşkirin; wî Ew ê Herî mezin li ser textê Wî, ferîşteyên Wî yên weke dewan û hejandina dergehên perestgehê ya bi dengê wan dît. Piştî vê serpêhatiyê, jiyana wî ji serî heta bînî, ji binî ve guherî.

Piştî ku min ev vebêjî xwend, ez qîriyam û min got: "Xwedayê min, tişta ku ez hewcedar im ev e; dîtbariyeke taze ya di derbarê Îsa de!" Giyanê Pîroz di dilê min de wisa kir pistepist: "Min ne bi vî awayî dest bi ayetê kir. Vegere û careke din bixwîne."

Ez heyirî bûm lê min dîsa jî bi ya Wî kir û vê carê vegotina "Sala ku Qral Uzziya mir" ji rûpelê firiya û li ber çavên min ket.

Piştre min ev bihîst: "Ji bo ku Îşaya bikaribe Min di dîtbariyeke nû de bibîne, divê Uzziya bimiraya."

Wê demê min Uzziya nas nedikir, min tenê dizanibû ku ew yek ji gelek qralên Îsraêl an jî yê Yahûdayê ye. Lêbelê gava min dest bi lêkolîna jiyana wî kir, min hinek rastiyên balkêş kifş kirin. Dema weke qralê Yehûda tac dayî ser serê xwe hîn şazdeh salî bû û pêncî û du salan hukumdarî kir. Eger ez berawirdkirinekê bikim, ji dema ku min ev nivîs nivîsandiye û vir ve, di pêncî û du salên dawî de deh serokên cuda serokatiya Dewletên Yekbûyî kirin. Ango Uzziya demeke pir dirêj hukumdarî kir.

Di şazdeh saliya xwe de, dema birêvebirina bi mîlyonan mirovan radestî wî kirin, wî tiştekî pir şarezayane kir: Li Xweda geriya. Em weke

“Di rojên ku ew li Xwedê geriya de Xwedê ew bi ser xist” (Dîrok II, 26:5) dixwînin. Wey wey, ew bi ser ket! Ew şarezayiya ku Xweda dabûyê, ew gîhand mezinahiyeke ecêb. Aborî baş kir, bajar nû kirin, artêşeke xurt ava kir û ew erdên ku bav û kalên wî winda kiribûn, ji nû ve bi dest xistin. Em wisa dixwînin: “Bi alîkariya bêhempa, ew gelek hêzdar bû. Nav û dengê wî gihîşt deverên dûr” (Dîrok II, 26:15).

Lêbelê weke ya Silêman, tirsa Xweda nebû xezîneya wî. Bûyer bi awayekî trajîk qewimîn:

> “Lê gava hêzdar bû, Ûzziya qure bû û ev bû sedema helaka wî.” (Dîrok II, 26:16)

Piştî demekê, wî nefsbiçûkî û tirsa xwe ya pîroz winda kir. Li vir rastiyeke girîng heye: Ev dilpakiyên “cêwiyên hêzê” wê lezeke berhemdar ava bike û her çiqasî ev dilpakiyên ku serkeftinê didin destpêkirin û bihêz dikin êdî nemabin jî, bi gelemperî wê serkeftin berdewam bike. Tiştên ku em ê ji niha û pê ve bixwînin têra xwe balkêş in:

> “Ew bi Xwedayê xwe Xudan re nedilsoz bû. Rojekê ew ket Perestgeha Xudan ku li ser gorîgehê bixûr pêxe.” (Dîrok II, 26:16)

Giyanê Pîroz ji min pirsek pirsî: “Kurê min, dema quretî kete dilê Uzziya, gelo li gorî te ew bêtir giyanî bû an jî kêmtir giyanî bû?” Min di cîh de fêhm kir ku bersiv deraqil e. Ez her dem wisa hizirîme ku gava quretî bikeve dilê kesekî, ew kes kêmtir giyanî dibe. Lêbelê Uzziya ji bo ku li ber hizûra Xweda çalakiyeke giyanî bike ketibû perestgehê. Eger Giyanê Pîroz ev pirs nekiriba, min nedikarî vê yekê ferq bikim.

Ez bi matmayî û bi dengekî bilind qîriyam: “Ew hîn bêtir giyanî bû!”

Giyanê Pîroz di dilê min de wisa kir pistepist: “Giyanê quretiyê û giyanê olperestiyê dest bi dest dimeşin û xwe di nava hev de vedişêrin û hevdu xurt dikin.” Quretî, nahêle mirov qebûl bike ku ew olperest e û ol jî bi reftarên giyanî quretiyê vedişêre. Piştre ez li Ferîsiyên serdema Îsa fikirîm. Weke Uzziya, dibe ku van rêberan jî bi hezkirineke jidil û bi tirseke pîroz a ji bo Xweda dest pê kiribûn lê ji cîhekî û şûnde bi awayekî quretî kete dilê wan. Ew ji Xweda hîn dûrtir ketin lê di heman

demê de beşdariya wan a di nav çalakiyên giyanî de jî zêdetir bû.

Uzziya bi kahînan re hat hemberî hev, kahînan anîn ziman ku ew bi reftarên li dijî Nivîsên Pîroz tevgeriyaye. Gava ku bo rastiyê li ber Uzziya rabûn û gef lê xwendin, Uzziya ji kahînan aciz û hêrs bû (vê diyar dikir ku wî nefsbiçûkiya xwe ji dest daye). Ji nişka ve li ser eniya wî nexweşiya çerm derket holê. Jiyana mayî ya vî qralî trajîk e, neçar ma ku di xaniyekî cuda de bijî. Kurê wî berpirsyariya rêveberiya qesra qral kir û di dawiya dawî de Uzziya ji ber nexweşiya çerm mir.

Werin îcar em bi çavê gel jî li vê bûyerê binêrin. Ji bo gelê Yehûda û Orşelîmê tenê rastiyeke eşkere hebû ku qralê wan bi nexweşiya çerm ketibû. Hûn dikarin xeyal bikin bê ka wê vê bûyerê li ser tora civakî çawa deng vedabûya? Wê ji şîroveyan bi ser ve çûbûna hemû torên civakî: "Nabe! Qralê me bi nexweşiya çerm ketiye, çi trajediyeke mezin e!" Tu kesî nedizanî ka sedema rastîn a vê nexweşiyê çi ye. Lêbelê Giyanê Pîroz rastiya vê ji me re vedibêje: Windakirina tirsa pîroz û nefsbiçûkiyê.

Dema min ev dît, min pirsên di derbarê serdema me de ji Reb pirsîn. Di tevahiya jiyana min de, ji ber têkçûna gelek rêberan dilê min şikest. Gelek caran ji ber têkiliyên li derveyî zewacê lê carinan jî ji ber alkolîzmê, hînbûna maddeyên begîtiyê, çavbirçîtî an jî hînbûnên din ên xerab û tevgerên kirêt. Min bi xemgînî li tekçûna rêberên beriya me, ên di dema me de an jî yên piştî me dest bi xizmetê kirin, temaşe kir. Her yekî bi xîreteke jidil ji bo Îsa mezin bikin, dest bi xizmetê kiribû. Ew çawa ji ber van tevgerên wisa xerab têk çûn? Ma wan nedît ku yên din jî dabûn ser heman rêyê?

Giyanê Pîroz dîsa bi min re axivî: "Kurê min, pirsgirêka van rêberên têkçûyî ne hormon bûn, pirsgirêka wan quretî bû." Tişta em hemû bûne şahid, ew nexweşiya çermî bû ku li ser eniya wan derketibû holê -têkiliyên wan, bêexlaqiya wan an jî tevgerên wan yên din ên ku bûn sedema têkçûna wan. Tişta ku me nedidît jî quretiya wan bû ku ketibû şûna tirsa pîroz û nefsbiçûkiya wan. Bi tenê Xweda dizanîbû ku ev kengî û bi çi awayî qewimîbû. Rêber bixwe jî pê nizane ji ber ku quretî, nahêle ku qurbanê wê rastiyê bi zelalî bibîne.

Ji ber wê leza ku bi serkeftinê derketî holê, em dikarin bi hêsanî ji bîr bikin bê ka çi em gihandine wê merheleyê -bi nefsbiçûkiyê, bi tirsa pîroz û bi xîret lêgerîna li Xweda. Ha ji ber vê yekê, gelekî grîng e ku di serfiraziyên xwe de jî divê em peyvên Îsa ji bîr nekin: "Bêyî

min hûn nikarin tu tiştî bikin” (Yûhenna 15:5).

Ya rast, Giyanê Pîroz wê rojê ji min re wisa got: “John, her ku quretiya di dilê te bimire, tu yê bibî xwediyê vîzyoneke derbarê Îsa de.” Veguherîn mecbûrî ye û bêyî vîzyoneke nû ya di derbarê Wî de, em derfeta ku bêtir bişibin Wî winda dikin. Gelek jin û mêrên mezin xebatên xwe bi serfirazî bi dawî nekirine lêbelê wan hemûyan bawer dikir ku wê bikaribin xwe ji encama misoger ya windakirina nefsbiçûkî û tirsa pîroz rizgar bikin. Nexapin! Nefsbiçûkiya rastîn bidomînin, bendewariya xwe a pak ji Îsa nebirin û tirsa pîroz bikin xezîneya xwe. Dema hûn vê bikin, Xweda soza dewlemendî, rûmet û jiyaneke dirêj dide we.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** “Lawo, bibihîze û gotinên min bi dest bixe Ku salên jiyana te gelek bin.” (Şîretên Silêman 4:10)

**Ramana sereke:** Her ku quretî ji holê rabe, em ê di derbarê Îsa de bibin xwedî vîzyoneke nû. Nefsbiçûkiya rastîn ji tirsa pîroz tê. Nefsbiçûkî ew e ku mirov bizanibe bêyî Îsa nikare tu tiştî bike. Loma, em bi temamî û her awayî bendewariya bi Wî hildibijêrin.

**Ramanên kûr:** Ma nefsbiçûkî di jiyana min de rastiyek e? Gelo mijarên wisa hene ku ez bi helwesta “ez ê çareser bikim” nêzîk dibim? Ma ez berî ku bi Xweda re bişêwirim planan dikim? Ma ez bêyî ku di dilê xwe de li şahidiya Wî bigerim, biryaran didim? Eger wisa be ez vê helwesta xwe çawa dikarim biguherînim? Spasdarî bi çi awayî min hem wêrek û hem jî nefsbiçûk dike?

**Dua:** Bavê me yê delal, bi navê Îsa, ji bo quretiya min a di van qadên jiyana min de, min bibexşîne. Ez tobe dikim ku ez ji xwe bawer bûm û min xwe ji kesên din çêtir didît. Min bi xwîna Îsa pak bike. Ez xwe li ber çavên Te biçûk dibînim û bi vî awayî jî ez ê kesên din ji xwe çêtir bihesibînim û wisa bibînim. Amîn.

**Daxuyanî:** Da ku ji jiyana min re bibe rêber ez nefsbiçûkiyê û tirsa Xweda hildibijêrim.

EZ BI PIRANÎ WISA DUA DIKIM:

"XWEDAYÊ MIN, HIŞYARIYEKE TOBEYÊ Û TIRSA REB BIŞÎNE KU HEMÛ WELAT TÊXE BIN BANDORA XWE, JI BO KU EM NEYÊN DARIZANDIN Û EM TE RÛMETDAR BIKIN!"

– A. W. TOZER

# 42| DÎTINA XEZÎNEYÊ

(Nîşe ji bo xwendevan: Ji bo ku em peyamê bi awayekî rast bi dawî bikin, ev beş wê ji ya normal hinekî dirêjtir be. Eger hûn roj bi roj dixwînin, min ev beş weke du beşan, sibê û êvarê, parve kiriye.)

**Xwendina Sibehê: Kurteya Fêdeyan**

Kûrahiya fêdeyên ku tirsa pîroz peyda dike, ewqasî pir in ku di pirtûkekê de bi cîh nabin. Nîqaşkirina wan a bi hûrgulî wê narek pirtûk bigire. Ev nêzîkî sîh salan e ez lêkolînan dikim û ez hîn jî bi tiştên ku Giyanê Pîroz di Nivîsên Pîroz de eşkere dike heyirî dimînim. Ji ber vê yekê, werin em bi nêrîneke kurt a li ser çend sozên din, vê pirtûkê bi dawî bikin. Her yekî ji wan weke destpêkekê bibînin ji bo ku hûn bêtir lêkolînan bikin û kifş bikin. Van sozan di dilê xwe de himbêz bikin. Hewl nedin ku hûn wan ji jiyana xwe derxin an jî hin wateyên din bidin wan. Wan bînin bîra Xweda. Ji bo kesên ku ji Xweda ditirsin, ev weke cewherên ku divê mirov wan bibîne û ji destê xwe bernede.

“Xwezî bi wan ku ji Xudan ditirsin,
Di riyên wî de dimeşin!
Tê keda destê xwe bixwî,
Ewê dilgeşî û firehî ya te be.” (Zebûr 128:1-2)

Bala xwe bidinê ku peyva “bextewarî”yê di van ayetan de du caran derbas dibe! Kesekî ku bi rastî ji Xweda ditirse, bextewar e. Aliyekî bextewariyê ku bi taybetî tê diyarkirin jî keda me ye. Ez ê tu carî bûyereke ku di destpêka salên 1980’yî de, gava ez di IBM’ê de weke endezyar dixebitîm, nejîm û bandor li jiyana min kiriye, ji bîr nekim. Me salvegera 38’an a di kar de ya hevalekî xwe yê endezyar pîroz dikir. Gava me dest bi rojê kir, em di ofîsa wî de taximek zilam li hev kom bibûn.

Di cîhekî de, wî mêrê ku me salvegera wî pîroz dikir, gotineke wisa ji devê wî derket: “Ev sîh û heşt sal in, min ji her roja ku ez hatim vê tesîsê nefret kir.” Yên din keniyan û bi serê xwe ew piştrast kirin. Ez, bibûn çend meh ku di vê pozîsyona xwe de dixebitîm; ez ciwan û nezan bûm lê aniha serê min tevlihev bûbû. Min jê pirsî û got: “Naxwe hûn çima xebitîn?”

Wî bi hemû kesên din ên ofîsê re berê xwe da min, lêvên xwe xwar kirin û got: “John, ji vê re dibêjin ‘kar!’ Ji bo ku tu xwarin û vexwarinê û lixwekirinê bi dest bixî, tu mecbûr î bixebitî.” Min ji rûyê mêrên din fêhm kir ku ew jî di heman ramanê de ne. Ji ber ku min dît ew ne mirovên xwedî hikmet in, min fêhm kir ku divê ez tiştekî din nebêjim.

Sedema ku min endezyarî xwendibû, tenê ew bû ku ez ditirsiyam karekî ku meaşê wî baş pêde nekim. Şîroveya wî, ev tirsa min a “ne pîroz” derxist holê. Wê rojê, min biryar da ku ez ê piştî sîh û heşt salan, heman gotinan nebêjim. Wê vê tirsê rêbertî ji jiyana min re nekira, min ê bawerîya xwe bi Xweda bianiya. Ji wê rojê ve ez dikarim bi bextewarî bibêjim ku ez berhema keda xwe dixwim û ev soz ji bo her kesê ku ji Xweda ditirse.

Nivîskarê Zebûrê wisa berdewam dike:

> “Di hundurê malê de jina te, wê bibe wek dêliya berdar; Zarokên te, wê wek şaxên zeytûnê li dora sifrê bicivin. Va ye, zilamê ku ditirse ji Xudan, Bi vî awayî tê pîrozkirin.” (Zebûr 128:3-4)

Hûn ê berhema keda xwe bixwin, wê jina we berdar be û zarokên we yên jidil wê bixwazin bi we re bin. Gelek kes ji van tiştên di van beşan de hatine ziman bêpar in; ev rewş kêmasiya mezin a civaka me

pênase dike. Her çiqasî pir pereyan qezenc bikin jî gelek kes ji jiyanê tahmê nastînin. Bi jinên xwe re li hev nakin û zarokên wan naxwazin tu tiştî bi malbatên xwe re bikin. Malbatên wan li şûna ku geş bibin, diçilmisin lê hêvî ji Xweda nayê birîn.

Hêviya vê sozê taybet û bêhempa ye. Ev ne ji bo her kesê ku diçûn dêrê an jî îdia dikin ku bi Îsa re têkiliya wan heye. Bi eşkereyî wisa dibêje: "Ha kesê ku ji REB ditirse, wê bi vî awayî bê pîrozkirin."

Xwendevanên delal, we rêwîtiya xwe ya di vê peyamê de hema bêje qedand. Bi hatina we ya heta vir, we hilbijart ku hûn ji Xweda ditirsin ji ber vê ev sozek e ku hûn dikarin bi duakirinê bixwazin. Ji bo dîtina pêkhatina van sozên tirsa pîroz, weke Îshaq li ber Xweda biherin. Bi mehan me dît ku ev soz di mala me de pêk nedihatin; nîşaneyên ku dibe ew pêk neyên hebûn lê me xwe bi hêviya sozên Xweda ve girt û bi duayan me ji bo wan li ber xwe da. Niha em dikarin bibêjin ku di gelek salên dirêj de bi malbatên me re pêk hatin.

Werin em li zebûreke din vegerin a ku bi kûrahî behsa kesên ji Xweda ditirsin dike:

"Pesnê Xudan bidin!
Xwezî bi wan ku ji Xudan ditirsin,
Bi emrên wî gellek dilşa dibin!
Wê nîjada wan li rûyê erdê hêzdar be,
Wê nîjada rastan pîroz be." (Zebûr 112:1-2)

Em careke din dibînin ku peyva "bextewarî"yê bi tirsa pîroz re girêdayiye. Bextewarî hêzeke giyanî ye û ne bi şert û mercan ve girêdayî ye. Berevajî vê, şahî di Gotina ebedî ya Xweda de bingehê ava dikr, ew hêza me ye. Ew me hîn bêtir berhemdar û biber dike.

Ji xeynî vê di vê ayetê de em dibînin ku tirsa pîroz bi gelemperî bandoreke mezin li ziriyeta me dike. Em ê ne tenê serkeftî bin, soza van tiştan ji bo zarokên me jî tê dayîn. Em berdewam bikin:

"Wê mala wî di firehî û dewlemendiyê de be,
Rastdariya wî her û her bimîne.

Ew tu car naleqe,
Yê rastdar her û her tê bibîranîn.
Ew natirse ji xebera xerab,
Bi Xudan ewledar e, dilê wî bêleq e.
Ew mêrxas e, natirse,
Di dawiyê de, têkçûna dijminên xwe dibîne."
(Zebûr 112:3, 6-8)

Berî bi çendakî ez bi bawermendekî re diaxivîm û wî got ku gava rojekê em ji vê jiyanê bar bikin, wê ebedîyeta me dest pê bike. Min jî di cîh de wisa bersiv da: "Na, ji bo kesên weke me ku wê ji nû ve çêbibin, wê ebedîyet dest pê bike." Keda me ya ku xwe spartiye hezkirina aniha, wê heta hetayê berdewam bike. Lêbelê kesên ku ji tirsa pîroz bêpar in, ne xwediyê vê sozê ne -ya rastî tam berevajî ye: "Hezkirina wan, nefreta wan, Hesûdiya wan ji zû ve nemaye. Di her tiştê ku li ser rûyê erdê tê kirin de, Êdî her û her para wan tuneye" (Waiz 9:6).

Kesên ku ji Xweda ditirsin ji nûçeyên xerab natirsin. Tora civakî, medyaya giştî û nûçeyên din û çavkaniyên guftûgoyên derew ku di roja me de zêde ne, nûçeyên xerab di asta herî bilind de ne. Gelek kes ji tiştên ku wê bên serê wan ditirsin. Lêbelê ji bo kesên ji Xweda ditirsin, tirsa peşerojê an jî tiştekî eletewş tune ye, ew di ewlehiyê de ne û bêtirs in. Careke din wisa tê gotin:

"Kesê ji Xudan ditirse di ewlehiya qewîn de ye,
Wê sitargeha kurên wî be." (Şîretên Silêman 14:26)

Ewlehîyeke hundurîn bi tirsa pîroz re heye. Ev tiştekî wisa ye ku gelek kes bêriya wê dikin lê di demeke kurt de dibînin ku gihîştina wê ne hêsan e. Hevalekî min ê bi navê John Hagee heye ku li Texasê pastorekî pir bi rêzdar e. Ew bi qasî hemû rêberên ku ez wan nas dikim ji Xweda ditirse. Di sala 1973'ya de mêrek hatiye dêrê û bi qasî sê metreyan nêzî wî bûye û bi demançeyeke 38an şeş fîşek berdane wî. Pastor John, bi awayekî ji xwe bawer sekiniye û ji cîhê xwe neqeliqiye. Her şeş fîşek jî di ber re çûne û lê neketin. Di dema nivîsandina vê nivîsê de ango piştî pêncî salên din jî ew hîn sax e û wazan ji Mizgîniyê dike. Di rewşeke wisa de

pir kes kontrola xwe winda dikin, diqîrin, xwe davêjin erdê an jî li cîhekî digerin ku xwe têde veşêrin. Lê John ji cîhê xwe nelivî û çavên xwe yên tije bawerî ji ser wî mêrê bi çekdar neda alî. Ji me re wisa tê gotin:

> "Dora yên ku jê ditirsin, dipêçe milyaketê Xudan, Û xelas dike wan." (Zebûr 34:7)

Ferîşte hatine peywirdarkirin ji bo kesên ku ji Xweda ditirsin biparêzin. Pisporên edlî yên tibê, piştre tespît kirin ku nîvê fîşekan di milê çepê yê Pastor John re û nîvê din jî di milê rastê yê bedena wî re derbas bûne. Kesê gule berdabûnê, ji sê metreyan lê nexistibû! Kesekî bê tecrube jî dikare ji sê metreyan herî kêm fîşekekê li hedefê bixe. Em piştrast in ku ferîşteyeke Xweda berê fîşekan guherandibû.

Qralê Yehûda Yehoşafat, mirovekî wisa bû ku "Dilê wî di riya Xudan de wêrek bû" (Dîrok II, 17:6). Di sala sêyem a qraltiya xwe de, wî kahîn şandin her bajarê welatê xwe ji bo ku Gotina Xweda fêrî gel bikin. Em wisa dixwînin:

> "Ji ber ku tirsa Xudan li ser padîşahiyên welatên derdora Cihûdayê jî hebû, wan li dijî Yehoşafat şer nekirin." (Dîrok II, 17:10)

Girêdayîdayîna bi tirsa pîroz re parastineke mezin ava dike. Mînakeke din a di Pirtûka Pîroz de Yaqûb e ku malbata xwe ber bi tirsa Xweda ve bir û hişt ku ew pûtên xwe bişkînim. Gava ew vê dikin, "tirsa Xwedê bi ser bajarên bi der û dora wan ve hat û kesî neda pey wan" (Destpêk 35:5).

Ji bo kesên ku xwe fedayî tirsa Reb dikin, soza gelek bereketan ji wan re tû dayîn. Li van gotinan binêrin:

> "Bila dilê te hesûdiya gunehkaran neke,
> Lê herdem bi tirsa Xudan bijî.
> Bi vî awayî wê pêşerojek hebe,
> Wê hêviya te winda nebe." (Şîretên Silêman 23:17-18)

Li vir bi taybetî bala xwe bidin du peyvan. Ya yekem; di roja me ya ku

"hêvî" tê de kêm e, gelek rêberên giyanî îlhamê dikin armanca xwe ya sereke û Gotina Xweda weke tiştekî li qiraxê ye lê dinêrin. Ji bo guhdarên cîdî aş bikin, behsa ayetekê an jî du ayetan dikin lêbelê bala wan a sereke li ser çîrokên wan bi xwe ye ku bawer dikin ev çîrok îlhamdar in. Her çiqasî ev çîrok ji bo demeke kurt fêdeyê bidin mirovan û bihêlin ku tevbigerin jî -weke fîlmekî Hollywoodê ku îlhamê dide- ew ê nebin xwediyê wê "pêşeroja" ku di tirsa pîroz de soza wê hatiye dayîn.

Tirsa Reb bi gelek awayan me xelat dike: Daxwazên ku hatina cîh (Binêrin: Zebûr 145:19), dost (Zebûr 119:63, 74, 79), şîfaya ji bo bedenên me (Methelok 3:7-8), nasname (Zebûr 60:4) û ew rêvexistina ku gelek kes bêriya wê dikin.

"Her kî ku bitirse ji Xudan,
Ew hînî wî dike riyan.
Ewê bi firehî bijî ew însan,
Nîjada wî mîras bistîne erdan." (Zebûr 25:12-13)

Mirov nikare fêhm bike bê çima kesek qîmetê nade tirsa pîroz. Ez ji dil daxwaz dikim ku hûn qedir û qiymeta vê bibînin û vê ji bo xwe veneşêrin, ku hûn di qada xwe de bandorê bikin û hûn bibin weke Qral Yehoşafat ku tirsa Xweda fêrî hemû mirovan kir.

**Xwendina Êvarê: Dîtina Tirsa Pîroz**

Ji sîh salî zêdetir çêbû, Reb ji min re got ku tevgera dawî ya Xweda ya di vê heyamê de wê derxistina pêş ya tirsa pîroz be. Fêdeya herî mezin a vê hişyariyê wê pêkhatina pênaseya "bûk"ê be, ya di Nivîsê Pîroz de ku Îsa wê vegere ji bo ku rahije wê. Her çiqasî eleqeya li ser windahiyan girîng be jî, ew ê ne dêreke ku tenê "eleqedar" e. Her çiqasî ji bo avakirina dêreke bihêz rêberî pir girîng be jî, ew ê ne "dêreke bala wê li ser rêbertiyê" be. Ji ber ku mirov dema bi têne bimîne ne baş e, her çiqasî civat girîng be jî, ew ê nebe "dêreke civatê." Ha vaye, tekane pênaseya wê bûka ku Ew ê ji bo wê vegere:

"Da ku Civînê bi rewneqiya wê ve pêşkêşî xwe bi xwe bike, ku tu

leke an qermîçek an tiştekî wek van li ser wê nebe, lê belê ew pîroz û bêleke be.” (Efesî 5:27)

Ev ê bibe dêreke pîroz! Xwendevanê delal, ji ber ku pîrozî di tirsa Xweda de bêhempa û kamil dibe, daxwaza herî jidil a Rebê me ew e ku hûn di vê hişyariya mezin de bibin xwedî bandor. Ji ber vê yekê, girîng e ku em nîqaşa xwe bi vê mijarê bi dawî bikin: Em ê tirsa xwe ya pîroz çawa zêde bikin?

Destûrê bidin ez we vegerînim wê dema hebandina bêhempa û bibandor ya li Malezyayê. Di dema eşkerebûna hebûna Wî ya bi rûmet û hêzdar de, ez di nav xofê de dilerizîm û min di dilê xwe de digot: “John Bevere; hay ji xwe hebe, gotineke şaş nebêje an jî tevgereke xelet neke.”

Gava ez li vê difikirîm û li ser platformê diçûm û dihatim, gotineke wisa ji devê min derket ku guhên min cara yekem tiştekî wisa dibihîstin. Ez berê tu carî li vê nefikirîbûm an jî min bala xwe nedabûyê. Bi wêrekî min got: “Ha Giyanê tirsa Reb ev e!”

Ji nişka ve di hişê min de şewq vêketin û vemirîn. Ez di nava xwe de qîriyam: “Ha ev e, ev e -ev yek ji diyarî û xuyakirinên Giyanê Pîroz e!” Min berê tu carî ev hemû nanîbûn bi ser hev de lê di Nivîsên Pîroz de ji bo Îsa wisa tê gotin:

“Wê Ruhê Xudan, Ruhê şehrezabûn û fêmdariyê,
Ruhê şîret û hêzdariyê,
Ruhê zanîn û tirsa Xudan li ser wî be.
Wê bi tirsa Xudan şa bibe.
Wê li gorî dîtina çavê xwe dadbar neke
Û li gorî bihîstina guhê xwe biryarê nede.” (Îşaya 11:2-3)

Heft rêyên xuyakirina Giyanê Pîroz hatine rêzkirin û Îsa di nava van hemûyan de meşiya lê zewqa Wî tirsa pîroz bû. Naxwe wisa be pirs ev e: “Em ê çawa giyanê tirsa Reb bi dest bixin?” Îsa ji me re wisa dibêje: “Bi ser ku hûn xerab in jî, hûn dizanin diyariyên qenc bidin zarokên xwe. Îcar Bavê ezmanî hê çiqas bêtir wê Ruhê Pîroz bide wan ên ku ji wî dixwazin” (Lûqa 11:13).

Tekane tişta ku divê em bikin, xwestina ji Bavê xwe yê Asîmanî ye. Lêbelê ev ne daxwazeke ji rêzê ye, ev lava û qîrîneke ku ji kûrahiya dilê me ye ku bersiva "na"yê napejirîne. Berî van gotinan Ew ji me re wisa dibêje: "Bixwazin, wê ji we re bê dayîn, Lê bigerin, hûnê bibînin, Li derî bixin, ewê ji we re vebe" (Lûqa 11:9). Li vir isrargeriyeke ku li ser tê sekinandin heye.

m vegerin sala 1994'a, wê konferansa ku pastor ez ji ber axaftina li ser tirsa Reb serast kiribûm. Roja din li şantiyeyê, min dest bi duayan kir û min got: "Gelo min li kuderê xeletî kir?" Lê di dawiyê de ji bo min tirsa pîroz min dest bi girî kir û bû qîrqîra min. Ev daxwazeke bi biryar bû; daxwazeke ku bersiva "na"yê nedipejirand. Wê demê min bi girîngiya wê kêliyê nizanîbû lê niha ez wê weke yek ji bûyerên herî girîng û veguherîner ên jiyana xwe dibînim. Aniha jî, hema bêje her roj, ez bi bi dil û can ji Bavê xwe yê Asîmanî dixwazim ku dilê min bi tirsa Reb ji nû ve dagire. Em berê xwe bidin beşeke din a Nivîsên Pîroz ku wê têkiliyeke wê ya mezin bi nîqaşa me re hebe:

> "Lawo, heke tu gotinên min qebûl bikî,
> Emrên min di dilê xwe de hilînî,
> Heke tu guhdariya şehrezayiyê bikî
> Û dilê xwe ber bi fêmdariyê ve meyildar bikî,
> Heke tu gazî têgihîştinê bikî
> Û dengê xwe ji bo fêmdariyê bilind bikî,
> Heke wekî zîv li wê bigerî
> Û wekî xezîneyê li pey wê bikevî,
> Wî çaxî tê tirsa Xudan fêm bikî
> Û zanîna Xwedê peyda bikî."
> (Şîretên Silêman 2:1-5)

Ji bo tirsa pîroz; ji xeynî lêgerîneke bi xîret, divê hawareke ji dil hebe; tam weke gava ku hûn li hingulîskeke nîşanê ya ji elmasê ku winda bûyî an jî li zêrekî windabûyî digerin. Ez bawer im we jî li fîlmên li ser kesên ku li xezîneyan digerin temaşe kirine. Yek ji wan fîlmên honandî yê ku derdikeve pêş, fîlmê bi navê "National Treasure" (Xezîneya Neteweyî)

ye. Fîlm di sala 2004'an de hatiye kişandin. Behsa zilamekî bi navê Benjamin Gates dike ku jiyana xwe bi lêgerîna xezîneyeke ku di salên 1700'î de hatiye veşartin, derbas dike. Ji bo dîtina xezîneyê, wî hemû dem, enerjî, rûmet û azadiya xwe xistiye rîskê û xerc kiriye. Her çiqasî hemû tiştên ew lê digere em diza in ku wê rojekê nemînin jî, divê israra wî ya bêrawestan îlhamê bide me.

Eger em bi heman biryardayînê nêzî Gotin, zanyarî, şîretên Wî yên xwedayî û tirsa Wî ya pîroz ya Xweda bibin, em ê gelekî bên pîrozkirin. Em ji bo tiştekî ku tu carî winda nabe diqîrin, ev xezîneya Xweda ye. Wî ev xezîne ji ber me venedizî lê ji bo me veşart û hilanî. Ji bo me wê bibînin me teşwîq dike û gava em bi ser vedibin jî kêfa Wî tê. Gava em xelatên Wî diceribînin, Ew vê pîroz dike.

Bi alîkariya Giyanê Pîroz, hêviya min a herî mezin ew e ku tiştê wê sibehê li qada wê înşeatê di hundurê min de şîn bû, di hundurê we de jî şîn bibe: Birçîbûneke ji tirsa Reb têr nabe. Qedir û qîmetê bidin vê zanibin û weke ku hebûna we ya herî mezin e wê himbêz bikin. Eger hûn vê bikin, hûn ê ji tiştên Xweda jê hez dike hez bikin û ji tiştên Ew jê nefret dike, hûn ê nefret bikin. Tiştê ku ji bo Wî girîng e, wê ji bo we jî girîng be. Hûn ê ji mirovan jidil hez bikin û ji gunehên ku ew xistine vê rewşê, hûn ê bi rastî nefret bikin. Hûn ê qada bandora xwe biguherînin û di seran serê ebediyetê de hûn ê ji ber ku we ev kiriye bextewar bibin.

Ez rîca dikim ji bîr nekin, "ya girîng ne ew e bê me çawa dest bi vê pêşbirkê kir, ya girîng ew e bê em çawa wê bi dawî dikin." Di vê rêyê de ez dixwazim du ayetên ku hêvî û hêzeke mezin didin mirov parve bikim:

> "Xilaskarê me Xwedayê tenê, dikare we ji ketinê biparêze û bi şahiyeke mezin, bêleke we derxe ber rûmeta xwe." (Cihûda 1:24)

> "Ew jî wê we heta dawiyê qayîm bike, da ku hûn di Roja Xudanê me Îsa Mesîh de bêqusûr bin." (Korîntî I, 1:8)

Bidawîkirina baş, aliyê herî girîng ê jiyana baş e û Xweda ji bo ku em vê bi dest bixin, tirseke pîroz daye me. Ji bo ez we bi ser vê xezîneyê vekim, ji min re bûye rûmetdayînek. Ji kerema xwe re vê ji xwe re

veşêrin, têra her kesî heye. Vê peyamê di bin bandora qada xwe de parve bikin. Eger hûn vê bikin, di rojên pêşerojê de em ê dêreke saxlemtir û windahiyên kêmtir têde bibînin.

Niha hilbijêrin ku hûn bibin perçeyek ji tevgera veguherîner û bihêz a tirsa pîroz, ya ku wê "Bûkê" ji bo vegera "Zava"yê me amade bike. Nebin kesekî ku ji derve ve lê dinêre. Bi himbêzkirina tirsa pîroz re hûn ê bi Zava re nêzîkahiyeke kûr ava bikin, wê xelasiya we bigihîje kamilbûnê, hûn ê pir bi berhemdar bibin û hûn ê mîraseke herheyî ava bikin.

## TAKEKESÎKIRIN

**Pasaj:** "Xilaskarê me Xwedayê tenê, dikare we ji ketinê biparêze û bi şahiyeke mezin, bêleke we derxe ber rûmeta xwe; bila ji beriya deman ve, niha û her û her, bi destê Xudanê me Îsa Mesîh rûmet, mezinahî, karîn û desthilatî jê re be. Amîn." (Cihûda 1:24-25)

**Fikra sereke:** Bidawîkirina baş, aliyê herî girîng ê jiyana baş e. Xweda bi rêya diyarîya tirsa pîroz, wê we heta dawiyê rê xurt bike ji bo ku hûn bêqisûr bin.

**Ramana kûr:** Ji bo ku ez di jiyana xwe de tirsa pîroz zêde bikim, divê ez çi bikim? Gelo ez daxwaza tirsa pîroz weke xezîneyekê dikim û ji ber vê bêrawestan li dû wê diçim? Gelo ez ê wê weke hebûna xwe ya herî biqîmet biparêzim? Ji bo parastina wê, divê ez bi rêkûpêk çi bikim?

**Dua:** Bavê me yê delal, ez li ber Te digerim ku Tu min bi Giyanê Reb, bi Giyanê zanyariyê, bi Giyanê têgihiştinê, bi Giyanê şîretê, bi Giyanê hêzê, bi Giyanê zanebûnê û bi Giyanê Tirsa Reb dagire. Ji bo ku ez di roja Rebê me Îsayê Mesîh de bêqisûr bim, min heta dawiyê xurt bike. Ez bi navê Îsa dua dikim, amîn.

**Daxuyanî:** Tirsa Reb xezîneya min e.

PÊVEK

# NÊRÎNEK LI MEZINAHIYA XWEDA

Di cîhekî dîroka Îsraîlê de, Xweda hewl dide ku bi vê pirsê tirsa pîroz a gelê Xwe bilind bike:

> "Hûn min dişibînin kê Ku ew hempayê min be?" (Îşaya 40:25)

Di dîrokê de eger demek hebe ku divê mirov li ser vê pirsê bi kûrahî bifikire û di ser vê re tu carî derbas nebe, ew ev kêlî ye. Di roja me de, "mezinahiya" mirovahiyê di tora civakî, televîzyon û her platformên din de her tim tê weşandin. Pesnên ku ji bo werzîşvanên jêhatî, stêrkên Hollywoodê yên bedew, hunermendên jêhatî, serokên karîzmatîk û kesên navdar têne dayîn, her dem li ber çavan in. Navûdengê wan tê bilindkirin û her çiqasî ev tişt bêzerar xuya bike jî, xwedîderketina li mezinahiya mirov bi vî awayî, me ji raman û kûrbûna li ser rastiya mezinahiya Xweda dûr dixe.

Ez û Lisa, nêzîkî berî bîst û pênc salan gava me çar kurên xwe mezin dikirin, em bi vê rewşê re rûbirû man. Wan deman lêz û beza

agahiyan ne ewqasî zêde bû ji ber ku sepanên me yên dîjîtal û tora me ya civakî tune bûn. Lê wê demê jî me dît ku kurên me zêde bala xwe didin lîstikvanekî basketbolê. Ew wê demê werzîşvanê herî navdar ê Amerîkayê bû û gelek kesî ew ji xwe re weke îdeolekî didît. Piştî bi dehan salan jî navûdengê wî hîn jî berdewam dike.

Me weke malbat li Aliyê Rojhilat, xizmet dikir û em di otelekê de ku li qiraxa okyanûsê bû diman. Piştî ku me çend saet li qiraxa avê derbas kiribûn, em nû vegeriyabûn odeya xwe. Zarok di nav pêlên Okyanûsa Atlantîkê de li hev qulipîbûn û li hemberî hêza okyanûsê hem pir kêf kiribûn hem jî jê tirsiyabûn.

Ez rûniştim ji bo ku bi her sê kurên xwe re biaxivim. Min deriyên cam ên balkonê vekirin û min ji wan pirsî: “Zarokno, li derve okyanûseke weke hûtan heye, ne wisa?”

Hemûyan bi hev re bersiv dan: “Erê bavo!”

“Hûn tenê çend kîlometreyên wê dibînin lê ya rastî okyanûs bi hezaran kîlometreyan berdewam dike.”

Zarokên ku xwe di nav germahiya destmalên xwe de xwe pêçabûn, bersiv dan û gotin: “Weyy bavoo!”

“Û ev ne okyanûsa herî mezin e, okyanûseke din a mezintir bi navê Okyanûsa Pasîfîk heye. Ji bilî van her duyan du okyanûsên din jî hene.”

Gava wan bi hev re guhdariya dengê bihêz ê pêlan dikir, bi awayekî matmayî serê xwe dihejandin.

Di dema rêwîtiya me de playofên NBA’yê bi hemû hêza xwe berdewam dikirin. Serkeftinên wî superstarê basketbolê di çapemeniyê de, di ESPN’yê de û di nav kurên min û hevalên kurên min de her tim dihatin axaftin. Ji ber ku wî bi destekî tenê goga basketbolê bi rehetî girtibû, kurên min pir di bandora vê de mabûn. Bi zanîna zêdebûna ava ku berî niha min ji kurên xwe re behsa wê kiribû û wan jî hinekî ev fêhm kiribû re, min ji wan piraî: “Zarokno, ma hûn dizanin ku Xweda ev hemû avên ku hûn dibînin û hemû okyanûsên min behsa wan kir, di kefa destê xwe de wezinandine?” (Îşaya 40:12). Li ser rûyê wan matmayineke bi rastî çêbû.

Piştre min bi termên herî hêsan ne tenê mezinahiya okyanûsê, min

behsa hêza wê jî ji wan re kir. Min ji wan re got, eger meteorek bi qasî kîlometreyekê li okyanûsa Atlantîkê ya ku nêzî sed kîlometre dûrî New Yorkê, bikeve; wê pêleke wisa mezin çêbibe ku wê hemû bajarên li peravên Amerîkayê, Karayîp û Amerîkaya Başûr li ber xwe bibe û here. Ev ne tiştek e, ew pêla wisa mezin wê di nav okyanûsê re berdewam bike û gelek bajarên li peravên Awrûpa û Afrîkayê jî wê li ber xwe bibe. Dîsa jî, ev pêl wê bi qasî kûrahiya Atlantîkê ne dirêj be. Ji ber vê yekê min ji wan pirsî: "Eger hemû giraniya ava okyanûsê li dijî mirovahiyê serbest bê hiştin, wê çi bibe? Di okyanûsên cîhanê de hêzeke pir mezin heye lê Xweda her dilopeke vê avê di kefa destê xwe de diwezinîne!"

Piştre bi şev min nîqaşa ezmanan bi wan re kir. Zarokên ku aniha matmayî mabûn, min pirsî û got: "Ma hûn dizanin bê Pirtûka Pîroz derbarê mezinahiya Xweda de wekî din çi tiştan dibêje?"

"Çi bavo?"

"Xweda bihosta xwe ezmanan dipîve" (Îşaya 40:12). Min destê xwe li ber wan danî û min nîşanî wan da ku bihostek, ji serê tiliya mezin heta serê tiliya qilîcankê ye. Wê rojê pirsa ku min ji kurên xwe pirsîbû, niha ez li vir ji we dipirsim: "Ma hûn tu carî li ser mezinahiya ezmanan, yanî gerdûnê fikirîne?" Ev tişt di ser têgihiştina hişê me re ye. Belkî eger em hewl bidin ku li mezinahiya gerdûnê binêrin, em ê gaveke din nêzî dîtina mezinahiya Xweda bibin.

Tiştê ku ez ê niha binivîsim hinekî teknîkî ye lêbelê weke ku min ji bo kurên xwe kir, ji ber ku min hewl da ku vê yekê sade û hêsan bikim, ez pêşniyar dikim ku hûn berdewam bikin. Gava em li ser van rastiyan difikirin, mezinahiya Wî di nava me de saw û xofekê şiyar dike ji ber ku ji me re wisa hatiye gotin: "Ezman berziya Xwedê didin nîşan" (Zebûr 19:1).

Zanyarên li ser gerdûnê dixebitin, wisa texmîn dikin ku bi milyaran galaksî di gerdûnê de hene û di nava her yekê ji wan de nêzî 100 mîlyon stêrk hene. Mezinahiya van galaksiyan li gorî valahiya di navbera wan de, gelekî biçûk in.

Roja (tav) me di nava van galaksiyan de cîh digire. Galaksiya me ewqasî mezin e ku gava em bi şev li ezmên dinêrin, em ne gerdûnê, em tenê galaksiya ku em jê re dibêjin "Rêya Kadizê" dibînin, ku ew bi xwe jî li gorî

gerdûnê galaksiyeke pir biçûk e. Heta em hinekî din jî bi pêş ve herin; em ne hemû Rêya Kadizê dibînin, tenê beşeke ji wê dibînin ji ber ku piraniya stêrkên di galaksiya me de ewqasî dûr in ku bi çavan nayên dîtin.

Ji ber vê yekê, werin em tenê behsa wan stêrkên ku em her şev bi çavên xwe dibînin, bikin. Ji xeynî roja me, stêrka herî nêzî dinyaya me tenê 4.3 sala ronahiyê (light year) ji me dûr e. Aniha ji bo pir kesan ev tiştekî îfade nake ji ber vê werin em rave bikin: Tîrêjeke ronahiyê di saniyekê de 300.000 kîlometre rê diçe -ne di saetekê de, di saniyekê de! Ev jî nîşan dide ku di seatekê de nêzîkî 1.1 milyar kîlometre ye. Balafirên me di saetekê de nêzî 800 kîlometreyî difirin. Weke ku hûn dibînin, îcar tîrêjeke ronahiyê bi awayekî ku nayê xeyalkirin xurt e!

Ji bo ku hûn fêhm bikin bê ev çiqasî bilez e, em wisa lê bifikirin ku em ê jeteke jûmbo ber bi rojê ve bifirînin. Gava ez ji cîhê ku lê dijîm ber bi aliyê din ê dinyayê, ber bi Asyayê ve difirim, ev nêzîkî bîst û sê saetan dikişîne. Eger ez bi heman balafirê bêrawestan ber bi roja me ve bifiriyama, ev ê nêzîkî bîst û yek salan bikişanda! Bifikirin bê hûn bîst û yek sal berê li kuderê bûn û piştre xeyal bikin ku we bîst û yek salên xwe di balafirekê de derbas kiriye (ez hêvî dikim ku qoltixê we li ber pencerê be). Ji bo kesên ku erebeyê tercîh dikin jî... na na ev nedihat kirin ji ber ku navberên bêhnvedanê û yên dagiritina benzînê jî têde, wê nêzî du sed salan biajota! Îcar aniha em bipirsin: Gelo çiqas wext dikişîne heta ku tîrêja rojê digihêje dinyayê? Bersiv tenê 8 deqîqe û 20 saniye ye!

Werin em dev ji rojê berdin û berê xwe bidin stêrka herî nêz. Em jixwe dizanin ku ew 4.3 bi sala ronahiyê ji dinyayê dûr e. Eger me modeleke pîvankirî (ango biçûkkirî) ya dinyayê, rojê û stêrka herî nêz çêbikira, wê wisa bûya: Li gorî hevsengiyê, dinya wê bi qasî hebeke dermanê no/germ biçûk bibûya û roj jî wê bibûya bi qasî topekê ku çapa wê bîst santîm e. Li gorî vê pîvanê, dûrahiya di navbera dinya û rojê de wê bîst û çar metre bûya, yanî bi qasî ji çar paran parek seheya futbolê. Lêbelê ji bîr nekin, balafireke ku li gorî vê rewşa pîvankirî hatiye biçûkkirin wê vê dûrahiya bîst û çar metreyî, ji bîst û yek salan zêdetir here.

Eger modelên dinya û rojê ev bin, gelo îcar hûn dikarin texmîn bikin

bê stêrka herî nêz wê çiqasî dûrî dinyaya me ya “heba dermanê no” bûya? Hûn ê bibêjin hezar metre, du hezar metre an jî pênc kîlometre? Na, ev ne nêzîkî bersivê ne jî. Stêrka me ya herî nêz wê 6500 kîlometre dûrî heba dermanê no bûya! Ev jî tê wê wateyê ku eger hûn dinyaya me ya weke heba dermanê no deynin nava bajarê New Yorkê, li gorî modela me ya pîvankirî, stêrka herî nêz wê ji Los Angelesê bi wêdetir be, ango 1600 kîlometreyî wê di nava Okyanûsa Pasîfîkê de cîh bigire! Gihîştina vê stêrka herî nêz bi balafirê, bêrawestan wê nêzîkî 51 milyar salan biajota! Ev tê wateya 51.000.000.000 salan! Lêbelê tîrêja ronahiyê ya ku ji vê stêrkê tê, tenê di 4.3 salan de digihîje dinyayê!

Em hinekî din jî meseleyê vekin. Piraniya stêrkên ku hûn bi şev bi çavên xwe dibînin, ji sed salî û heta hezar salên ronahiyê dûrî me ne. Lêbelê, çend stêrkên ku em van bi çavan dibînin, ev stêrk nêzî çar hezar salên ronahiyê dûr in (ji bîr nekin, ev ne stêrkên herî dûr ên galaksiya me ya biçûk in). Ez di xwe re nabînim hesab bikim bê ka balafirek wê di çiqas wextî de bigihîje tenê stêrkekê ji van stêrkan. Lê ka bifikirin: Gava hûn bi şev derdikevin derve û li stêrkeke ku 4000 salên ronahiyê dûrî me ye dinêrin, hûn bi rastî li wê tîrêja ronahiyê dinêrin ku di dema Brahîm bi Sarayê re zewicîbû de, ji wê stêrkê derketiye û ji wê rojê ve bêrawestan bi leza 1.1 milyar kîlometre di saetekê de meşiyaye û niha nû gihîştiye dinyayê!

Ji bîr nekin, ev tenê stêrkên di galaksiya me ya biçûk a bi navê “Rêya Kadizê” de ye. Me hîn bi milyaran galaksiyên din keşf nekirine jî! Û ji bîr nekin ku di navbera galaksiyan de valahiyeke bêserûber û bêdawî heye! Weke mînak, galaksiyeke me ya cîran a pir nêzîk a bi navê Andromeda heye. Dûrahiya wê ya ji me nêzîkî 2.3 mîlyon salên ronahiyê ye! Lê bifikirin ku tîrêjeke ronahiyê di saetekê de 1.1 milyar kîlometre bi xurt diçe, nêzîkî du mîlyon sal dikişîne ku ji wê galaksiyê bigihîje dinyaya me! Û ev galaksiya qaşo cîrana me ya herî nêzîk e. Hîn bi milyaran galaksiyên din hene! Gelo em ji sînorê têgihiştina xwe derbas bûn?

Destûrê bidin ez careke din bi bîra we bixim, Îşaya radigihîne ku Xweda ev gerdûna bêdawî, ji tiliya xwe ya girdê heta tiliya xwe ya qilîcankê pîvaye! Ya rastî, Silêman bi rêya Giyanê Xweda wisa dibêje:

“Ma bi rastî jî wê Xwedê li ser vê erdê rûne? Ne ezman, ne jî ezmanê ezmanan têra te dike” (Padîşah I, 8:27). Hinekî hûn têdigihêjin û fikra we çêdibe bê em behsa kê dikin?

Piştî ku min ev hemû bi kurên xwe re parve kirin, statuya wî superstarê NBA’yê vegeriya ser perspektîfa xwe ya rast. Piştî ku li ser mezinahiya Afirînerê me fikirîn, êdî wan li hemberî kabîliyetên wî heyranîyeke sexte hîs nedikirin.

Lê ez dixwazim ji bo we xwendekaran, vê yekê gavekê din bibim bi pêş ve. Bavê me yê Asîmanî ne tenê di warê mezinahî û pîvanê de karên mezin kirine, di heman demê de hûrguliyên ku Wî danîne jî mezinahiya Wî îlan dikin. Qada zanyariyê ji bo li ser vê cîhana xwezayî bixebite û lêbikole, tiştekî pir zêde û mezin, dem û pereyan xerc dike. Dîsa jî, ew tenê xwedî pareke biçûk a wê şahrezariya Wî ne ku di afirandina xwe de ev nîşan daye. Hîn gelek pirsên bêbersiv hene. Sêwirandin û bingeha Wî weke mucîzeyekê hîn jî berdewam dikin.

Hemû formên jiyanê yên hatine afirandin, xwe dispêrin şaneyên zindî. Şane bingeha bedena mirovan, gîhayan, ajalan û hemû zindiyên din in. Bedena mirov ku bi serê xwe karekî bêhempa yê endezyariyê ye, nêzîkî 100.000.000.000.000 şaneyên pir cuda di xwe de dihewîne (Gelo hûn dikarin vê hejmarê fêhm bikin?!). Xweda bi zanebûna xwe ev şane ji bo pêkanîna peywirên taybet peywirdar kirine. Mezin dibin, zêde dibin û di dawiyê de dimirin -tam weke ku plan kiriye.

Her çiqasî bi çavan neyên dîtin jî, şane ne perçeyên herî biçûk in ên ku mirovahî pê dizane. Şane ji gelek binyadên biçûk ên ku ji wan re molekul tên gotin, pêk tê û molekul jî ji binyadên hîn biçûktir ên ku ji wan re atom tê gotin, pêk tên.

Atom ewqasî biçûk in ku di xala dawiya vê hevokê de ji milyarekê zêdetir atom têde hene. Atomek çi qasî biçûk be jî, hema bêje bi temamî ji valahiyê pêk tê. Aliyê mayî yê atomê ji proton, notron û elektronan pêk tê. Proton û notron, di sîsika pir biçûk û pir tîr de ya li navenda atomê, li hev kom bûne. Baqên biçûk ên enerjiyê yên ku ji wan re elektron tê gotin, bi sala ronahiyê li dora vê sîsikê dizivirin. Ev kevirên avahiyê yên bingehîn in ku her tiştî li hev digirin.

Baş e atom enerjiya xwe ji kuderê distîne? Û ew hêza ku parçeyên wê yên enerjiyê bi hev re digire çi ye? Zanyar ji vê re dibêjin hêzên “elektromanyetîk” û “nukleer.” Ev têgehên zanistî yên xemlandî ne ku tiştên hîn bi temamî nayên ravekirin, pênase dikin. Ji ber ku Xweda jixwe eşkere kiriye ku Ew “bi gotina xwe ya bihêz her tiştî berdewam dike” (Îbranî 1:3). Em di ayeta Kolosî 1:17’an de dixwînin ku dibêje “her tişt hebûna xwe di Wî de didomîne.”

Bisekinin û li ser vê bi kûrahî bifikirin. Ha ev Afirînerê mezin û bi rûmet ê ku em jê re dibêjin “Bav” gerdûn bi xwe jî nikare Wî di xwe de bihewîne. Ew dikare gerdûnê bihosta xwe bipîve lêbelê gava Wî ev dinyaya biçûk û zindiyên li ser wê sêwirandine, Ew ewqasî bi hûrgulî tevgeriyaye ku zanista modern piştî xebatên bi salan jî bi gelek pirsên bêbersiv re rûbirû maye. Divê em ecêb nebînin ku nivîskarê Zebûrê wisa diqîre:

“Gava ku ez dinêrim li ezman,
Karê destê te, heyv û stêran,
Hingê dipirsim ez ji xwe:
«Mirov çi ye ku tu wî bibîr bînî,
Kurê mirov çi ye ku tu wî bibînî?»”
(Zebûr 8:3-4)

Ez dibêjim hema ev yek her tiştî bi kinayî tîne ziman. Eger ez texmîn bikim, nivîsakarê Zebûrê belkî ramanên ferîşteyeka dêw a ku li dora textê Xweda ye, tîne ziman. Ji ber mezinahî û çawaniya Wî ya ku aqlê mirov tênagihêje, ew ferîşte berdewam dikin û weke “Pîroz” diqîrin. Van hebûnan dîtin bê Wî çawa gerdûna bêdawî û alozîya wê afirandiye, piştre jî li afirandina mirovan temaşe kirine û qîriyane: “Ev çi ye? Xweda çima ewqasî girîngiyê dide van mirovên biçûk ên li ser vê gerestêrka biçûk?”

Piştî axaftina min a ku min bi zarokên xwe re kir, ew êdî di bin bandora kesên navdar ên di vê serdemê de neman. Wan fêhm kir ku her tiştê li ser gerestêrka me, li cem mezinahiya Xwedayê me pir biçûk û lawaz dimîne. Ez hêvî dikim ev beşa ku weke pêvekekê min lê zêde kir, ji bo we jî heman tişt kiribe. Tiştên we xwendine, di bin ronahiya wê

pirsa ku Xweda bi rêya Pêxember Îşaya ji gelê xwe pirsîbû de bifikirin: “Hûn min dişibînin kê Ku ew hempayê min be?” (Îşaya 40:25).

Bêguman li ser bêhempayên ku Xweda afirandine û li ser zanebûna Wî ya di afirandinê de, mirov dikare gelek pirtûkan binivîse. Armanca min li vir ne ev e. Armanca min ew e ku li hemberî berhemên ji destên Wî derketine, di nava we de ecêban û matmayinan şiyar bikim ji ber ku ev berhem hemû mezinahiya Wî îlan dikin!

# HEQÊ QEDIR

*Qewata vê qencîya bîrkirî eşkere bikin*




Tu mesîhîyek naxweze Xwedê bide sînorkirinê, lê gelekên ji me, bi nezanî, şuxulkarîya Wî, ya nava jîyana meda, didine sînorkirinê, çimkî ew prînsîpeke ruhanî, ya qirarkir, Qedir, hesab hilnadin.

Qedir femdarîke usa ye, yê ku bi piranî nava kûltûra me da unda bûye, lê hûnê nava rûpelên vê kitêbê de bibînin, ku rola wê ya girîng nava hemû govekên jîyana me da çi cûreyî ye, bona ku wan goveka bikine bin tesîra padişatîya Xwedê.

Kitêba “Heqê qedir” de xudanê kitêba, yê bi nav û deng, Con Bîvêr, dide kifşê ku wextê ku hûn bersiva banga qedirgirtinê didin, hûn wî çaxî sîstêma Xwedê ya qîmetîya qebûl dikin û li ser tabîke usa disekinin, wekî hûn dikarin wî hemû tiştî bistînin çi ku Xwedê bona we qirar kirîye.

Bi yekkirina prînsîpên xwedêtîyê, yên kûr, tevî serpêhatîyên praktîke hukumdar, kitêbê ji nûva vê qencîya bîrkirî raberî we bike, û ew hemû tiştê diha girîng wê nava we da cedandinê pêşda bîne, kîjanê hûnê bikine nava her govekeke emirê xwe.

Di vê malperê de heye: MessengerX

# EWÊN KU BI HETA-HETAYÊVA DILIVIN

*Jîyan, kemala kîjanê roja  îroyîn  û heta-hetayê heye.*




Li ser vê dinîyayê jîyan hulm-gulm e, feqet gelek usa dijîn ku tê bêjî peyî wanra tu tişt wê tunebe. Lê ew yek ku em çawa vê jîyanê dijîn, wê ewê yekê qirar bike, ku emê jîyana heta-hetayê çawa derbaz bikin. Kitêba Pîroz li me eyan dike, wekî bona bawarmenda derecên heqdayînêye cûre-cûre hene:destanînên hineka wê bi temamî wextê dîwanê bişewitin, lê bona yên mayîn jî wê mecala serwêrîkirina tevî Mesîh bê dayînê.

Con Bîvêr anegorî prînsîbên B Korintî 5:9-a tîne bîra me, wekî hemû bawarmend wê li ber Mesîh bisekinin, bona ku wê yekê qebûl bikin, layîqî çi ew bûne nava temamîya jîyana xweda. Ji me gelek meriv wê zendegirtî bimînin, wextê ku pê bihesin, wekî me piranîya wedê xwe li ser tiştên usa xerc kirîye, yên ku wê layîqî heqdayîna heta-hetayê nebin.

Wî çaxî emê çawa bikaribin nava jîyana kardarda bijîn? Kitêba “Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin” wê we hîn bike ku hûn xwe eşkere bikin û wî hemû tiştî çendbare bikin çi ku Xwedê daye we. Eger hûn ji alîyê heta-hetayêda li jîyanê binihêrin hûnê qewatê bistînin, bona ku hûn bona meremên qewîn bişuxulin.

Di vê malperê de heye: MessengerX

# XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!

*Nava qûmistana xweda qewatê û merem bibîne*




Hûn xwe bîrkirî texmîn dikin nava jîyana xwe ya dijwarda, hûn difikirin: "XWEDÊ, TU LI KÎDERÊ YÎ?!" Diqewime berê Xwedê wera xeber dida, lê niha Ew bêdeng e.

Diqewime wekî hûn nava bawarîya xweda pêş diketin, lê niha hûn hazirîya Wî nabînin. Hûn bi xêr hatine qûmistanê, li wî cîhî, yê ku di navbera stendina sozê ji Xwedê û mîyaserkirina wîda ye.


Heyneser, behseke qenc heye: qûmistan cîhekî xwelî û bêmerem nîne. Xwedê qûmistanê dide xebatê, bo ku we hazir û sîlih bike, bo navê we, ew jî wî çaxî, heger hûn rast wê yekêra derbas bibin.Gelek meriv dikarin bifikirin, ku ew evê êtapa jîyana xwera derbas nabin, çimkî hîvîya Xwedê dimînin. Hûn gerekê vê beşa xebata xwe biqedînin, bona ku wêra derbas bibin, û xebata we gelekî mezin e. Heger hûn naxwezin wede xerc bikin û her dem li ser cîhekî bisekinin, ew yek girîng e ku hûn bizanibin ku qûmistan çi ye.

Nava vê kitêba bi eşkerekirinên vî cûreyîva tijî, xudanê kitêbayî bi nav û deng Con Bîvêr we hîn dike, eyantîya û serpêhatîyên pîroze girîng û kûrfikir dide xebatê, ên ku wê alî we bikin, ku hûn êtapên jîyanêye dijwar ra derbas bibin û wê yekê bistînin, çi ku Xwedê bona we hazir kirîye.

Di vê malperê de heye: MessengerX

# NÊZÎ XWEDA

*Jiyaneke nêzî Xweda*




Gelek caran Nivîsên Pîroz ji me re diyar dikin ku Xweda dixwaze bi me re pêwendiyeke nêzîk deyne. Gava em nêzîkî Wî bibin, em ê bibînin ku hebûna Giyanê Pîroz tecrîbeyeke herî bi heyecan(kelecan) û bi enerjiyeke veguherîner e ku heta niha me tu carî nedîtiye. Xwestina tiştekî ku em bi kêmasiya wê nizanin zehmet e. Mixabin gelek ji me qîma xwe bi pirşengiyeke rijî ku ji ol û aqil bêrî û ji nêzîkbûneke Xweda bêpar tînin.


Em hewl didin ku pîrozbûna Xweda di ser guhên xwe re biavêjin û bê ku em jiyana xwe paqij bikin em hêvî dikin bi Giyanê Wî bên dagirtin. Lê em hatin afirandin ku bi Xweda re nêzîkatiyeke hevpar deynin.

Vexwendina nûwaze ya Afrînerê gerdûnê ne ku tenê hebandina ji dûr ve ya bi gotin û ritûelên ji dûr ve em dikin. Herwiha ew naskirina dilê Wî yê ji nêz ve ya bi pêwendîdanîna watedar e.

Di vê malperê de heye: MessengerX


# MessengerX

*Ji bo her kesî û li deverî rêwitiya ku xwendekarekî ava bike*




- **Ji 130 zimanan zêdetir bêpere ye.**
- Weke sepanê û weke online mirov dikare pêde bike.
- Çavkaniyên ji bo hûn xwe bi pêş bixin.
- Paşeroja xwe û rêwitiya xwendekariya xwe bişopînin.






Ji bo hûn di hemû cîhazan de temaşe bikin, bixwînin an jî guhdar bikin; e-pirtûk, pirtûkên bideng, kurte fîlm, vîdeo, Pirtûkên Pîroz û hin tiştên ji van zêdetir ku di pirtûkxaneya çavkaniya xwendekaran ya Messenger'ê de cih digire, ji bo hûn xwe bigihînin wan serdana wê bikin

**MessengerX.com**

Daxîne ji ser App Store

Werbigire ji ser Google Play

Li temamîya dinîyayê li «App Store»-ê û «Google Play»-da


# Tirsa ji Xweda tê çi wateyê?

Hûn bi Afirînerê xwe re bêriya têkiliyeke bêtir jidil dikin gelo? Ev yek ji we dûr heta weke tiştekî ku nayê pêdekirin, xuya dike gelo? John Bevere, tîne ziman ku ya rastî Xweda nêzî me ye lê dibe ku di meşa me de ya bi Wî re, tiştekî ku bi temamî pêdivî pê heye, ango dibêje ku Tirsa Xweda kêm e.

Di Tirsa Xweda de Bevere, nêrîneke taze pêşkêş dike ku xelasiya we bi rêzgirtin û tirsê, çalak dike. Ev dilpakiya ku bi awayekî berfireh hatiye jibîrkirin, rêya jiyaneke berhemdar û tatmînkar di xwe de dihewîne. Di vê pirtûkê de hûn ê van taybetmendiyên tirsa pîroz kifş bikin:

- Ji bo têkiliyeke nêzîk ya bi Xweda re pir girîng e.
- Me ji hemû tirs û endîşeyên din azad dike.
- Niyet û motîvasyonên me yên hundurîn pak û paqij dike.
- Me ber bi zanabûn, têgihiştin û zanîna rastîn ve dibe.

Tirsa pîroz, jiyana me li gorî dilê Xweda bi rêkûpêk dike. Lêbelê gava ku em xwe li vê dilpakiyê bigirin û wê geş û xweş bikin, em ê bigihîjin wê aşitî, ewlehî û şahiya ku gelek kesan xwe negihandiye wê. Ji bedêla ku em li ber Afirînerê xwe bilerizin, hmbêzkirina tirsa Xweda wê me derxîne asteke bilindtir a jiyanê ku wê me heta hetayê biguherîne.



**JOHN BEVERE**, xizmetkarek e ku di qada navneteweyî de bi awayekî wêrek û bêyî ku ji Gotina Xweda tawîzê bide tê nasîn û nivîskarek e ku di vê qadê de pirtûkên wî herî pir tên firotin û li zêdetirî 130 zimanan hatine wergerandin. John û xanima wî Lisa, xizmetkar û avakarên Messengera Navneteweyî (Messenger International) ne ku jiyana xwe dane vî karî û di perwerdekirina xwendekaran de qadeke gerdûnî ava kirine û dîsa di vî warê de şoreşek çêkirine ku wan jiyana xwe daye pêşxistina bawermendên ku jidil û can bidin dû şopa Mesîh.

MessengerX

Ji bo hûn belaş meteryalan daxînin û vîdeoyan temaşe bikin, serdana navnîşana **MessengerX.com** bikin.

Hûn diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin:

Messenger INTERNATIONAL

Ev pirtûk xelata nivîskar e û nayê firotin.